Arşîva Bîra Kurdan: Ji Kendal Nezan gotara bi serenavê "Kurdên ji dewletê bêparhiştî, nabe ku dersên dîrokê ji bîr bikin" (1991) ▶ R. 12

LE MONDE diplomatique kurdî

Çirîya paşîn 2011 - Hejmar 24 www.lemonde-kurdi.com · info@lemonde-kurdi.com 24 Rûpel

**Wendy Kristianasen**
Erdogan, bi liv û tevgerên xwe li dû kîjan hesaban e? Tirkîye, piştî pêvajoyeke çawa ber bi makezagoneke nû ve diçe? Êrişên PKKê çima cardin dest pê kirin û hevdîtin rawestiyan?
▶ R. 6

**William I. Robinson**
Amerîkaya Latîn ku ji destpêka salên 1970yê ve weke laboratûwareke nûlîberalîzmê hate bi kar anîn, rûyê xwe diguherîne. Li Ekwator, Wenezûela, Hondûras û Bolîvyayê rewşa hêzên çepgir…
▶ R. 14

**Lucien Sève**
Germbûna klîmayê, gemarbûna erd, av û hewayê, xilasbûna serkanîyan û bikaranîna enerjîya nukleerî gelo dê me ber bi cîhaneke wisa bibe ku êdî jîyana mirovan lê ne gengaz be?
▶ R. 20

**Mona Chollet**
*Twittera* ku di sala 2006ê de derket meydanê û tesîra xwe li milyonan dike, ji bo bikarhênerên înternetê xizmeteke nû ya hêsan û belaş a ji bo berbelavkirina peyamên kurt pêşkêş dike…
▶ R. 21

**Frédéric Kaplan**
*Googleê* zemînek pêşkêş kir ku pergala kapîtalîzmê zimên jî bixe bin xizmeta xwe û peyvan jî bike milkên xwe… *Google*, çawa bi peyvan û lîstikên biçûk pereyên mezin qezenç dike?
▶ R. 22

HEVBEŞÎ Û CUDABÛNÊN PIRSGIRÊKA BASKÎ Û YA KURDÎ

# Baskîyek û kurdek

ZEKINE TÜRKERI *

Di berhema xwe ya 'Zilamê devliken' de **Victor Hugo** dibêje *'kesekî baskî, ne îspanyol, ne jî fransiz e, baskî ye'*. Bisporê Rojhilatê Navîn rojnameger **Manuel Martorell**, ku li Îspanyayê dema qala pirsgirêka kurd bê kirin, kesê pêşîn e ku tê bîra mirovan, dibêje *'Kurdek, ne ereb, ne fars, ne jî tirk e, kurd kurd e.'*

Teşbîheke weha helbet çarenivîsa gelên bask û kurd nake yek. Nemaze, heger em ferqa sed û pêncî salî ya navbera gotinên **Hugo** û **Martorell** bifikirin. Lê belê ev neqilkirin hin serpêhatîyên hevpar ên van her du gelan nîşan dide ku her du jî li ser axên xwe hewlê didin ku wekî xwe bijîn. Serpêhatiyeke sedsalî ya tenêbûn û înkarê.

## Gelek û zimanek

Herçend derbarê koka *baskîyan* de teorîyeke hevbeş nîne jî bêguman ew ji gelên herî qedîm ên nîvgirava *Îberîkê* ne. Hîna nayê zanîn ka zimanê baskan ***euskera*** endamê kîjan malbata zimanan e. Tiştên ku tên zanîn ev in: Yek ji kevintirîn zimanan e û li Ewropayê tenha zimanê berîya *Hînd û Ewropî* ye, ku zindî maye. Zimanên din ên prehîstorîk, ku digel vî zimanî jîyane, ji alîyê zimanên Hînd-Ewropî ve hatine helandin. Zimanzan zîndîmayîna vî zimanî wekî mûcîzeyekê bi nav dikin.

Ev gel bi sedan salan di tora du dewletên 'bisporên' kolonîzekirinê yên Îspanyol û Fransiz de maye, lê belê ji ber hêza xwe ya berxwedanê zimanê wan hîna jî dijî û ev yek hêja ye ku wekî mûcîze were bi nav kirin.

Zimanê baskî, nemaze ji salên dawî yên sedsala 19em û pê ve li hember zextan bû sîmgeya herî girîng a siyasî. Di derbarê têkilîya navbera vî gelî û zimanê wan de **Victor Hugo** weha dibêje: *'Zimanê baskî wekî welatekî, hema bibêjin wekî olekê ye.'* Di zimanê **Euskal Heria** de wateya navê wan ***'Gelê zimanê bask'*** e. Navekî weha bedew ê welatekî, xelateke spehî ya zimanê baskî ye ji bo cîhana me.

## Dîrokek

Baskîyan li ser xaka xwe bi qanûnên dîrokî/kelepûrî ya bi navê ***'fuero'*** xwe bi rê ve birin. 'Fuero'yên wan 'îmtîyazek' nîne, ku ji alîyê qralekî ve hatine dayîn, lê belê di wesfa 'maf' de ne. Ji ber ku ev qanûn digihîjin serdema berî qralan. Desthilatdarîya navborî wekî 'mîrîtîyên' herêmî ne. Ev qanûn, digihîjin dîroka kevin û mimkûn e ku biryarên meclîsên gel bin û bi sedan salan bi rêya erf û adetan derbasî nifşên nû bûne. Ev rêgezên derbarê jîyana siyasî, îdarî, aborî û edlî de ji sedsala 13em û pê ve hatine nivîsandin.

Qralîyeta ***Pamplon***, ku di sala 765ê de hatiye damezirandin, wekî yekem qralîyeta baskî tê zanîn. Ev qralîyet di dawîya sedsala 5em de dibe ***Pamplona*** û ***Najera*** û paşê jî dibe ***Qralîyeta Navara***, ku heta destpêka sedsala 16em berdewam kir.

Di serdema ***Qralê Sanchoyê Mezin ê VII***. (1194-1234) de, cara pêşîn heft herêmên dîrokî yên ***Baskî*** bi hev re ne. Yekîtîyên qralên katolîk di 1512ê de ***Qralîyeta Navarayê*** dagîr dike û wê tev li ***Qralîyeta Castîllayê*** dikin.

'Malîyeta' Şoreşa Fransiz ji bo baskîyên vî parçeyî dawîlêanîna qanûnên wan ên herêmî an ku dawîlêhatina desthilatdarîya wan dibe. Di vê serdemê de, bayê lîberalîzmê, ku li seranserî Ewropayê dihat, digihîje Îspanyayê jî. Di encama vê guherînê de, ku di sedsala 19em de bû sedema du şeran, di 1876ê de baskî di şerê ***Carlist ê II.*** de têk diçin û ***'fuero'*** yên wan tên belav kirin.

## Neteweperestîya baskî

Ji niha û pê ve ez dê serpêhatîya axên Başûrê Welatê Baskan vebêjim. Dema ku em dibêjin 'Neteweperestîya baskî' mebesta min ne neteweperestîyeke wekî Partîya Tevgera Neteweperest (MHP) e lê 'welatparêzî' ye.

Di naverasta sedsala 19em de sanayî pir bi lez bi pêş ket û vê yekê jî ji herêmên

▶ R. 4

Almanya: 4,50 €
Awûstûrya, Belçîka, Fransa, Holanda: 5,00 €
Brîtanya: 4 £, Danîmarka: 40 DKK, Norweç: 40 NOK, Swêd: 50 SEK, Swîsre: 6,50 CHF, Tirkiye: 7 TL

4 191764 204509 24

# Rehîneyên şerê dijberîyeke xwîndar

BIRGIT CERHA

***Pêşbazîya kevin a sedsalan ji bo serwerîya li ser Mezopotamyayê û veguherîna herêma kurdan ber bi xetereke nû ve***

Edalet ji bo heft endamên malbata wî. Ev têkoşîn çiqas dirêj jî bidome, **Şervan Hisên Mistefa**, kurdê ku li Brîtanyayê di penaberîyê de dijî, ev armanc ji bo dahatûya xwe daniye. Qedera **Şervan** şok dike, lê ev rewşeke bi tena serê xwe nîne. Ew yek tradejîya bûnewerîya gelê kurd ê sîvîl a di herêmên çîyayên Toros û Zagrosê de nîşan dide. Ji sedsalan zêdetir di nav şerên dijberîyekê de, ji alîyekî di navbera îranîyan ji alîyê din di navbera yûnan, rom, bîzans û osmanîyan de ku gelek caran bi xwînê pêk hatiye, şerekî ji bo desthilatdarî û çavdêrîya herêma ku Asyayê bi Ewropayê ve girê dide, wek rehîn hatine girtin. Ew heta roja me berdewam e.

**Şervan** bi biryar e ku wek gelek xemhevalên xwe yên kurd stûyê xwe bi êş li hember qedera xwe ya ku bi derbekê dê û bavên wî û pênc endamên malbata wî wergirt, netewîne. Rojeke tebaxa 2011ê bû, dema malbat wek her car diçû ser karê xwe yê cotkarîya çîyayên

▶ R. 3



SERPIL ODABAŞI: **Aliyê min ê reş**, 100 x 70 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

EDITO

# Çepîtî li ku ye?

SERGE HALIMI

Li gel ku kapitalîzm ji salên 1930ê û vir de di krîza herî cidî de ye jî, partîyên sereke yên çep, kerr û lal in, bê deng in û ji hev ketine. Di halê herî baş de, ji bo sîstemê li çareserîyên spînozî digerin. Gelek caran ew bi xwe jî, dikevin nav hesteke berpirsiyarîya ku ji lîberalan paqij bibin. Ev rewşa ha, ev lîstika polîtîk ya asêbûyî, dê heta ku derê berdewam be? Di demeke wisa de ku ji alîyekî din, hêrsa civakî her bilind dibe.

Amerîkîyên ku li dijî **Wall Streetê** xwepêşandanan li dar dixin, herweha navbênkarên wê yên di **Partîya Demokrat** de û **Qesra Spî** jî protesto dikin. Ew ji bîr dikin ku sosyalîstên fransî hê jî mînaka **Barack Obama** derdixin pêş. Li gor wan berevajî **Nicolas Sarkozy** ji wî hatibû ku li dijî bankeyan tedbîran bigire. Gelo bi rastî ev şaşfêmkirinek e? Kî naxwaze (yan jî nikare) xwe zer bike stûnên nîzama lîberal (fînansîalîzekirin, globalbûna herikên sermaye û malan) hewl dide ku felaketê bi kesan terîf bike, gunehê krîz û krîza kapîtalîzmê bixe stûyê şaşîyên têgehan yan jî birêveberîya muxalifê xwe yê li hundir. Li Fransayê şaşî wê bibe para "Sarkozy", li Îtalyayê ya "Berlusconî", li Almanyayê ya "Merkelê". Baş e, lê belê li deverên din?

Li deverên din û ne bi tenê li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê birêveberên siyasî yên ku çepa nerm demeke dirêj weke referans îşaret bi wan kirî jî, li karwanê herrabûyîyan rast tên. Li Yewnanîstanê serokê Înternasyonala Sosyalîst **Yorgo Papandreu** siyaseteke pir hişk a aborîyê ferz dike ku taybetkirinên zêde, jêbirina kar û îstîxdamê di karên dewletê de û devjêberdana ji serwerîya welatê xwe ya di warê aborîyê û civakî de ku bi dest "troyka"yeke lîberal ve berdide, bi hev re dimeşîne. (1) Hikûmetên Îspanya, Portugal yan jî Slovenyayê jî bi bîr dixin ku peyva çep ewqasî bêqîmet bûye ku êdî tu naveroka taybet a siyasî nayne bîra mirovan.

Yek ji dozgerên herî baş ê asêman û bistbûna sosyal-demokrasîya ewropî xuya ye **Benoit Hamon** e, berdevkê niha yê... Partîya Sosyalîst a fransî (PS). Di pirtûka xwe ya dawîyê *Tourner la Page* de Hamon van derdixe pêş: "*Di nav Yekîtîya Ewropayê de Partîya Sosyalîst a Ewropî (EPS) bi awayekî dîrokî lihevkirina wê ya ku wê bi demokrasîya xirîstîyan ve, bi stratejîya*

▶ R. 16

www.arsivakurdi.org

# Dîsa li ser 17ê çirîya pêşîn a 1961ê

DOMINIQUE VIDAL

Ji şerê cîhanê yê duyem û vir de, ev rûpel, di dîroka Parîsê de rûpela herî tarî ye: Di 17ê çirîya pêşîna 1961ê de, li ser banga liqê Fransa ya *Enîya Rizgarîya Neteweyî* (FLN), li hember biryara qedexekirina derketina kolanan ji bo "kesên ji Afrîka Bakur" ku ji donzde rojan ve berdewam dikir, xwepêşandanek li dar ket, di navbera 30.000-40.000 cezayîrî civîyan. Di vê bûyerê de 200 kes hatin kuştin, hinek ji wan bi guleyan, hinek bi darbeyên jopan, hinek bi fetisandinê û hinek jî bi xeniqandinê. Bi hefteyan, sansorê, rastîya vê bûyerê veşart. Û vê bêdengîyê bi vî awayî tam sîh sal ajot.

Heta ku nivîskarek û du dîroknas vê *omertayê* (bêdengî) dişikînin: **Didier Daeninckx** di 1984ê de, bi romana xwe ya polisîye ya bi navê ***"Kuştina Ji Bo Bîranînê"*** (1), ku **Laurent Heyneman**, her bi wî navî filmeke sinemayî çêdike; herweha **Michel Levine** di 1985ê de bi navê ***"Cirdonên Oktoberê"*** (*Les Ratonnades d'octobre)* (2); û **Jean –Luc Einaudi** jî di 1991ê de, bi navê ***"Şerê Parîsê"***(*La Bataille de Paris)* (3) heman fîlmî çêdikin.

Pêncî sal bi şûn de, çar weşanên nû ji nû ve derçûn, bi xêra wan ev şeva ku demeke dûr û dirêj hatibû ji bîr kirin, ji nû ve şîyar bû, derket ronahîyê û hate bi bîranîn. **Jean-Luc Einaudi** van lêkolinên xwe di çirîya pêşîn a 1961ê de dinirxîne; ***Komkujîyek li Parîsê*** (*Un massacre à Paris*). (4) *La Dêcouverte* cara yekem şahîdîya **Marcel** û **Paulette Péju** diweşîne: di 17ê çirîya pêşîn de, cezayîrîyan paşê ev yek bi "Komkujîyek sê car an veşartî " (*La triple occultation d'un massacre*) ya **Gilles Manceron** ve temam kir. (5) Ji bo vê çapê nivîsarên "bûyerên çirîya pêşîna 1961ê", yên wê demê dibin pêşgotin. (6) Û dîsa bi şêwa xêzefîlma bi nêrîna **Mohand** û xwişka wî **Khelloudja**, ku **Didier Daenincky** û **Mako** bi navê *Oktobera Reş* (7) pêşkêş dikin, pêşgotina wî jî ji alî **Benjamin Stora** ve hatîye nivîsandin. Piştî fîlmê dokumenter yê yekem yê **Mehdî Lallaoui** (1991) û ji nûve amadekirina "La Nuit Noir" (***Şeva Reş***) ya **Alain Tasma** (2005), mirov dikare herweha *Oktobera Parîsê* ji **Jacques Panijel** jî kişf bike. Demek dirêj ji alî sansorê ve qedexekiri û paşî ji alî amadekar ve û êdî îro mirov dikare vê dokumanterê li ser perdeyê temaşe bike. (8) Hewqas malzeme di derheqê vê bûyerê de, dîyar dike ku *"pêdivîyên bîranînê ji xebatên bîranînê nayên cudakirin"*. Ji pirsên ku dîroknas îro jî niqaş dikin, hinek ji wan balkêş û hinek jî gelek bi êş in:

Ji alîyê fransîyan ve, li ser sebeb û berpirsyarîya van kuştinan ku bi mehan bi awayekî kêfî, hovane û bê adaletî berdewam kir, di vir de, serekpolîsê giştî yê Parisê **Maurice Papon** tu sûcê wî tune bû û tu carî ev operasyon amade û îdare nekiribû. Bi vî awayî qesas û qatil bi alîkarîya Wezîrê Karûbarên Navxweyî **Roger Frey** ku pênc meh berê ev kar teslîmî **Papon** kiribû, hatin parastin. Mirov dikare bipirse, *"Ma gelo van qatilan îşaret ji hukûmetê û heta ji Serokkomar negirtibana, dikaribû ev sosreta mezin pêk bianîyana?"* Serokkomarek ku bi ***FLN*** (Enîya Rizgarîya Netewî)ê re dest bi hevdîtin û bazarê kiribû, gelo tehamûl dikir ku di vê rewşê de tevgereke bi hêz bibîne? An jî mirov dikare bifikire ku gelo ev operasyonek e, li hember Serokkomar bi xwe û ji alîyên nostaljîkên ku Cezayîr bi Fransî dizanibûn û nedixwestin tu bazarên siyasî çêbibin hatibû amadekirin, ku amadeyî jî ji Serokwezîr **Michel Debré** dest pê dikir? Vedizîn û veşartina vê bûyerê di demeke hewqas dûr û dirêj de, ger alîkarîya gelek kesên din tunebûya dikaribû her berdewam bûya?

Ji hêla cezayirîyan ve, gelo ***FLN***ê, di demek weha hesas de, rîskên meşeke di vê babetê de hesab kiribûn? Di demeke wûsa de ku, **Papon** li hezar sebeban digerîya ku polîs û hemû alîkarên wan, provoke bikin ku her cûre xerabî û pîsîtîyan bikin? Mirov dikare pirsê ji alîyê din yê Derya Spî, yanî ji hêla cezayîrîya bipirse: Gelo çima hewqas sal bêdengî? Gelo amadekarên vê xwepêşandanê bi wext ve ketin pozîsyona muxalefetê? Divê ku bersivek ji vê pirsa nahletî re bê peyda kirin! Bi taybetî ji alî partîyên komunîst û di destê yekem de ji alî partîya sosyalîst ve: Ev qirkirina ku di 17ê meha çirîya pêşîna 1961ê de, li navenda Parîsê, li ber çavên her kesî qewimî, ku du sed cezayirî hatin kuştin û şefê polîs yê Parîsê jî li ser vê yekê, rastîyê vedişêre û dibêje tenê du kes in, ew jî di şer de hatine kuştin. Li gel van derewên nedîtî û bûyera wahşî, tu kesî xwepêşandanek jî li dar nexist. Lê li alîyê din; dema ku di 8ê meha sibata 1962ê de, bûyera neh fransîyên ku ji alî eynî polîsan ve nêzîkî metroya Charonne hatibûn kuştin, pênc roj bi şûn de, nîv milyon fransî li kolanên Parîsê civand.

Di 19ê adarê de, bi qerara agirbestekê dawî li şerê Cezayîrê tê. Ev yek bi serê xwe sebebek e ku Fransa sûcên xwe yên dawîn ên kolonîyalîstî qebûl bike.

1 Coll. "Folio policier", Gallimard, Paris, 1998
2 Ramsay, Paris, 1985
3 Coll. "Points histoire", Seuil, Paris, 2007
4 Coll. "Pluriel", Fayard, Paris, 2001
5 La Découverte, Paris, 2011
6 Les Petit matins, Paris, 2011
7 Adlibris, Anthy-sur-Léman, 2011
8 Au cinéma Les Trois Luxembourg, 67, rue Monsieur-le-Prince, 75005 Paris

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

# JI ÇAPEMENÎYÊ

## Ka hikûmetên demokrat digel terorîstan bazar nedikirin?

Hefteyên çûyî çavê dinyayê li Îsraîlê bû ku beranber serbazekî xwe yê dîl zêdeyî hezar girtîyên filîstînî serbest berdan. Sebaret bi vê mijarê rojnameya brîtanî *The Independent* roja 13ê cotmehê gotareke şiroveyî weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê Robert Fisk ve hatiye nivîsandin tê gotin ku: *"Hebû tunebû di dema bihûrî de em di cihaneke weha de dijîyan ku tê de dihat bawer kirin ku hikûmetên demokratîk digel 'terorîstan' bazarî nake. Tu welatî bi qasî Îsraîlê piştgirîya vê gotina beradayî nedikir û tu serokekî îsraîlî jî bi qasî* ***B. Netanyahu*** *ev gotina pîroz dubare nedikir. Jixwe, Amerîkayê tu car rê neda terorîstan û Brîtanya jî tu car bi wan re rûnenişt."*

Nivîskar wekî din bi bir dixe ku di sih salên çûyî de Îsraîlê beranber 19 girtîyên îsraîlî 7.000 girtîyên filîstîni serbest berdane û lê zêde dike: *"Bi rastî, heger Fransayê ji bo xatirê rehîneyekî fransî hezar girtî serbest berdabûna- ku xwedê neke- Obama, Clinton û Cameron ji qehra dê Fransa bi tirsonekîyê tawanbar bikiraya. Lê belê duh li hember vê 'peymana' îsraîlê ya digel neyarên 'terorîst', ne ji Washingtonê, ne jî ji Londonê dengek derket: 1.027 filîstînî ji bo serbazekî îsraîlî."*

Gotar weha bi dawî dibe: *"Çi dibe bila bibe, bazara digel 'terorîstan' karekî qirêj û kambax e. Peyva riyakarî bi kar neynin. Û hêvî ji Obama nekin ku tiştekî bêje. Di talîyê de, feqîro Obama dixwaze ji bo careke din were hilbijartin."*

## Ferqa PKK û ETAyê digel IRAyê

Herçend ji bo çareserîya pirgirêka kurd modelên ETA û IRAyê tên rojevê jî gotarnivîsê rojnameya *Radîkal*ê **Murat Yetkîner** di gotara xwe ya 22ê cotmehê de van her sê rêxistinan dide ber hev. Di gotarê de tê bi bîr xistin ETA dawî li têkoşîna xwe ya çekdarî anîye, lê belê serokwezîrê îspanî **Jose Luis Zapatero** bi daxuyanîya wan ne bawer e, ji ber ku ETA berê jî agirbest ragihandibûn, lê dîsa êrişên xwe berdewam kiribûn. Gotarnivîs dibêje ji vî alîyê de PKK û ETA dişibin hev du.

Di nivîsê de herweha tên bin xêz kirin ku cudatîyên IRAyê digel ETA û PKKyê ji wekhevîyên wan zêdetir in û weha berdewam dike: *"ETA û PKK bêhtir nêzî hev in. Tiştekî IRAyê ji wan cudatir dike serokatîya siyasî ye ...* ***Sinn Fein*** *di sala 1905ê de hat damezirandin û Artêşa Komarperwer a Îrlandayê jî di 1921ê de wekî baskê çekdar hat damezirandin. Lê belê, hikûmeta îngîlîz jî tê de herkesî dizanîbû ku muxatab Sinn Fein e, ne IRA. IRA bi ya* ***Sinn Feinê*** *dikir ne ku Sinn Fein bi ya IRAyê dikir. Li Îspanyayê û li Baskê weha nebû.* ***Herri Batasuna*** *di 1978ê de wekî partîyeke siyasî hatibû damezirandin lê belê ETA ji 1959ê ve hebû...* ***PKK*** *jî wekî rêxistineke nepenî û çekdar di 1978ê de hatibû damezirandin, lê belê partîya pêşîn ku xwedî heman girseyê bû an ku* ***HEP*** *di sala 1990ê de hat damezirandin... ku navê wê îro* ***BDP*** *ye."*

Ji alî din de gotar ferqa herî mezin weha bi nav dike: *"Him di têgihiştin û him jî di rastîyê de BDP li ser PKKyê xwedî mafê gotinê nîne, lê belê berevajî vê yekê ye.Çawa ku* ***Herri Batasuna*** *li Îspanyayê, ku endameke YEyê ye, red dike ku çalakîyên terorê yên ETAyê şermezar bike, BDP jî bi awayekî aşkere red dike ku çalakîyên terorîstî yên PKKyê şermezar bike. Di mînaka IRAyê de serokatî di destê siyasiyan de ye, lê belê li cem PKK û ETAyê serokatîya siyasî di destê çekdaran de ye. Di nav sedemên dijwarbûna muzakere û dîyalogê de çawanîya serokatîya siyasî di rêza yekem de ye. Ev pirsgirêk li pêşiya wê rêyê, ku diçe çareserîya siyasî, astengîya herî mezin e."*

## Hewldanên Erdogan: Kurdê baş- Kurdê xerab

Piştî êrişa gêrîlayên HPGyê yên li dij armancên leşkerî yên li Çelê rojnameya almanî *Süddeutsche Zeitung* di 20ê cotmehê de derbarê siyaseta kurd ya serokwezîrê tirk **Erdoğan** de gotarek weşand. Di gotarê de, ku ji alîyê **Kai Strtittmater** hatiye nivîsandin weha tê gotin: *"Heta berîya demeke kurt hikûmetê digel nûnerên rêxistinê hin hevdîtinên nepenî dikirin. Lê belê piştî êrişa kujer a roja çarşemê şik û guman rast derketin... Dîsa aştînexwaz ketin dewrê. PKKyê dîsa dest bi êrişên xwe yên kujer kir û AKP jî, ku hewl dabû ku hin reformên wêrek pêk bîne, her ku diçe dişibe partîyên berê yên dewletê."* Nivîsa nirxandinê her weha balê dikişîne ser siyaseta Erdoğan a ji bo ji hev cuda kirina kurdan û şiroveyeke weha dike: *"AKP navbera kurdên baş (muhafezekar) û kurdên xerab (çepgir û neteweperwer) de cudagerîyê dike û hewlê dide ku tevgera neteweperwer a kurd têk bibe. Lê belê ev yek ehmeqîyeke mezin e."*

## Sûrîye û karta kurd li hember Tirkîyeyê

Piştî terorkirina siyasetmedarê kurd a ji alîyên kesên nenas, rojnameya amerîkî *Wall Street Journal* di 10ê cotmehê de weha nivisî: *"mumkin e ku birêveberîya Esed li hember Tirkîyeyê kurdan wekî gefekê bi kar tîne."* Rojname wekî din balê dikşîne ser wê yekê ku kurd heta niha di raperînên li Sûrîyê de beşdar nebûne, lê belê weha xuya dike ku mebesta kuştina Meş´al Temo ew e ku kurdan bikişînin nav protestoyan.

Gotar herweha şirove dike ku heger kurd jî derkevin kolanan, wê demê muxalefeta li dij serokkomar **Beşar Esed** hêzdar be, lê belê heger weha be, welatên cîran ên wekî Tirkîyeyê, ku hejmareke mezin a kurdan lê dijî û ew jî serî radikin, helwêsta wan a nerm a li hember krîza Sûrîyeyê biguherîne.

Di encamê de WSJ rewşê weha dinirxîne: *"Ji ber kurdên li welatê xwe Tirkîye dikare piştgirîya xwe ya bo muxalefeta Sûrîyeyê vekişîne. Her weha, çalakvanên sûrîyeyî dibêjin dibe ku Sûrîye, kurdên ku li herêmên ser sînorê Tirkîyeyê dijin, wekî gefekê li dij Tirkîyeyê bi kar tîne ku ji ber piştgirîya wê ya bo muxalefetê, Tirkîyeyê hişyar bike."*

## Erdheja Wanê

**Ji 600 kesî zêdetir mirî,**
**Nêzîkî 5.000 birîndar,**
**Ji 3.000 zêdetir avahîyên hilweşîyayî,**
**Û kesên wenda li dû xwe hişt.**
**...**
**Hikûmeta tirk, her sê rojên pêşîyê alîkarîyên navnetewî nepejirand.**

**Cîgirê Serokwezîrê tirk Beşir Atalay, li ser vê sosretê ragihand ku, ew bi vê yekê dixwazin ku hêza xwe biceribînin.**

**Ceribandinek li ser jîyana kurdan…!**

**Le Monde diplomatique kurdî**
Ji aliyê Independent Kurdish Media Group GmbH ve tê weşandin

**INDEPENDENT KURDISH MEDIA GROUP GMBH**
Carnotstr. 4
10587 Berlin / Almanya

**Lijneya Weşanê**
Murad Satik
Riza Dînç

**Le Monde diplomatique kurdî**

**Redaksiyona Zimanî**
Mahmûd Lewendî
Remzî Kerîm

**Alîkarên vê hejmarê**
Yado Ciwan
Semra Polat
Ergün Yetkiner
Celîl Kaya
Nedîm Baran

**Revîzyona Wergeran**
Feryal Guladawîya
Luqman Guldivê

**Berpirsê Hunerî**
Hasan Huseyîn Deveci

**Designer**
Fabio Biasio

**Web Developer**
Erhan Yekta

Tel: 00 49 (0)30 330 990 420
Fax: 00 49 (0)30 330 990 429
info@lemonde-kurdi.com
www.lemonde-kurdi.com

**ABONETÎ**
Independent Kurdish Media Group GmbH

Berliner Volksbank
Konto: 2284 123 010
BLZ: 100 900 10
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 00
BIC/SWIFT: BEVODEBB

**Abonetiya Salane:**
Almanya: 50 €
Derveyî Almanyayê: 60 €
Abonetiya dîjîtal: 20 €

**Le Monde diplomatique**

**Damezrîner**
Hubert Beuve-Méry

**Birêveberê giştî**
Serge Halimi

**Serniviskar**
Maurice Lemoine

**Cîgirên Serniviskarî**
Martine Bulardi
Philippe Rivière
Anne-Cécile Robert

**Redaksiyon**
Alain Gresh
Mona Chollet
Pierre Rimbert
Dominique Vidal

**Birêveberê hunerî**
Alice Barzilay

**Dokumantasyon**
Olivier Pironet

**Sekreter**
Sophie Durand
Monique Salomé

Tel: 00 33 (0) 153 94 96 01
Fax: 00 33 (0) 153 94 96 26

1-3, rue Stephen-Pichon,
F-75013, Paris, France

www.rojnamakurdi.org

# Rehîneyên şerê dijberîyeke xwîndar

(Dewama rûpela 1)

Qendilê li Îraqa bakûr. Ji dûr ve guregura teqînan hatibû. Pîlotên tirk bi jetên xwe yên şer li ser çîyayên bilind ên asê digeriyan û bi hêvîya ku li baregehên gerîlayên *Partîya Karkerên Kurdistanê* (PKK) bixin, wek gelek demên din dîsa bombe davêtin newal û kozikên veşartî yên çîyayên Qendîlê. Malbata kurdên îraqî di pîkapa xwe de ber bi bajarê ***Ranya***yê ku nêzîkê wan deveran bû, direviya. Bi rê de ketibûn nav xeta bombebarana balafirên şer ên tirk "ku laşên wan kiribûn parçeparîyên bê hejmar". Wiha rave kiribû **Şervan** ji ***Kurdish Globe*** re (19.9.2011). *"Bi salan jî berdewam bike"* **Şervan** bi biryar e ku bi alîkarîya komîteyeke parêzgerên dadgehên navneteweyî *"edaletê ji bo malbata xwe bi dest bixim"* û gelek kurdên sîvîl ên din ku mirovên xwe di bin bombebarana topên tirk û îranî de winda kirine. Divê dadgehên navneteweyî vê xwînrijîya hêzên herêmî yên mezin li dijî gelê kurd ê li ser sînoran dijî, wek "sûcê navneteweyî" li dijî mirovahîyê mehkûm bikin, daku ev rewş hîn jî di dinyayê de wek "sûcê herêmî" bê çavdêrî nemîne û neyê ji bîr kirin.

## Çalakîyên leşkerî, ne ji bo PKKê?

Malbata **Şervan** di tebaxê de mir. Piştî ku PKKê 24 leşkerên tirk kuştin, di meha mijdarê de tirkan car din bi tundî hêriş kir, 10.000 leşker ketin bakurê Îraqê. Ev bizava leşkerî û qêrîna xelkê tirk ji bo qisasê ji berê ve dîtbar bû. Çima provakasyona PKKê? Kîjan stratejî, kîjan armanc bi vê yekê tê şopandin? Ravekirina generalekî tirk dikeve bîra mirov: Serleşkerîya artêşê dikare kengê pêwîst bibîne, hertim sedeman ji bo çalakîya leşkerî li bakurê Îraqê bibîne. Û kevnerêveberê berê yê îstixbaratê û stratejîst **Mahir Kaynak** li ser hêrişa tirk a ser bakurê Îraqê a meha mijdarê difikire ku ne "terora PKKê" bûye sedem, lê mebesta Enqereyê ku dixwaze "tesîra Îranê" di vê herêmê de "bavêje paş". **Kaynak** pêşbînîyên xwe yên li ser nearamîya peywendîyên di navbera Îran û Tirkiyeyê de ji bo salên dahatû jî dibêje. (Zaman, 16.10.2011).

Hertim û hertim car din lîstîka xwîndar ji nû ve dest pê dike: Hêrişên piçûk ên gerîla, PKK û hevkarên wan ên Îranê ***PJAK*** (Partîya Jîyana Azad a Kurdistanê) li dijî hedefên leşkerî li Tirkiyeyê yan li Îranê. Wê demê hêrişên hember yên îranî û tirkan ên hewayî, ketina yekîneyên welatên cîran, îhlalkirina sînoran, serwerîya Îraqê; kesên kurd ên sîvîl ji gundên sînor tên derxistin, erd û heywanên wan bi armanca "kembera ewlekarîyê" tên qir kirin daku di wan sînoran de yên ku hêzên kolonyalîst li gor kêfê kişandibûn û eşîr, qebîle û heta malbatan ji hev veqetînin, cîyên bê însan çêbikin. Komelgeha navneteweyî xemsar e: Her du dewlet li dijî çalakîya şidetê a PKK û PJAKê bi tenê xwe diparêzin.

Lê di rastîyê de Îran û Tirkiye xwe di ***Kurdistana Bakurê Îraqê*** de ji bo kevneşerê dijberîyeke ji nû ve yê serwerîya li ser Mezopotamya û li hemû herêmê bi dest bixin, bi cî dikin. Kî dê valahîya îktidarê dagire, eger yekîneyên Amerîkayê heta Noelê xwe ji Îraqê bi paş ve bikişînin? Li gor çavkanîyên dîplomatîk Washington dixwaze li dijî geşedana tesîra "dewleta xudayî" ya îslamîya Îranê, Tirkiyeyê wek temsîlîya sîstemeke laîk mîna pireyeke berepêş bixe –di serî de li Îraqê.

## Dijberî û dostanîya bi mebest

Gava xanedanîya mîrîtîyên ***Sefewî*** di destpêka sedsala 16ê de herêmên ku piranî îranî tê de niştecî bûn ber bi qralîyetekê ve bi hev ve girêdan, hindikayîyan jî, mîna kurd li rojava tê de bi cî kirin û piranî alîgirên xwe vegerandin ber bi îslamîya şiî, tovê bîrewerîya îranîyeke neteweyî avêtin. ***Împaratorîya Persî*** ku bi hêz dibû xwe ne tenê ji alîyê Uzbekan li Bakurê Rojhilat, ji alîyê Afganan li Rojhilat û Mezinmoxolên tesîrdar ên hindî di bin metirsîyê de didît, herwiha daîm li Rojava ji ***Împaratorîya Osmanî*** ku di bin desthilatdarîya sunîyan de bû. Şer qonaxên hevkarîyê ji hev vediqetandin. Bi vî awayî îranî û tirk bûn dijberên siruştane yên jeostratejîk ku di heman demê de jî ji alîyê dostanîyeke zorak a ji hev bêbawer bi hev re dihatin girêdan. Pevçûna di navbera her du hêzan de bi piranî li ser erdê Mezopotamya û Kurdistanê diqewimî. Niha rewşeke nû wek encama bêîstikrarîya dramatîk li seranserê Rojhilatê Navîn li benda hatinê ye. Ew tehdîtkar e ku hîn herêmeke berfireh bikşîne nav xwe.

Herçiqas jeopolîtîka salên dawîyê bû alîkara "Komara Îslamî" ku Îran saya şerên Amerîkayê li Afganistanê û berîya giştî li Îraqê piştî têkçûna dijminê wê yê ebed **Sedam Huseyn** 2003, karibû tesîra xwe gelek berfireh bike; lê polîtîkaya derva ya Tirkiyeyê jî, di bin serokatîya **Recep Tayip Erdogan** de xurt bû. Her du hêz li Rojhilatê Navîn li pey vîzyonên dijber hev in.

Ji roja hatina "Partîya Dad û Geşedanê" (AKP) a bi meyla îslamî ser hikumetê û serpereştîya dewletê 2002, li Tirkiyeyê guherîneke civakî û siyasî çêbû. Komeke bijarte ya nû xwe bi tesîra aborî û siyasî ne li Rojhilatê Navîn berfireh dike, belê di hemû cîhana îslamî de. Ev "siyaseta neo-osmanî" wek medya wiha jî bi nav dikin, bingeha xwe ji dîtinên **Ahmet Davutoglu**, şêwirmendê **Erdogan** ê bi salan û wezîrê derva yê niha, digire; bi kurtahî di bin têgeha bi cîranan re "sifir-pirsgirêk" vedibêje – konsepteke di herêmeke wisa tevlîhev de ku ji Rojhilatê Navîn heta Qafkasya û Asyaya Navîn dirêj dibe, gelek xwedî îdîa ye. Ji bo stratejîstên Enqereyê dahatû di demên bihurkê de ye; nûvejîna peywendîyên Împaratorîya Osmanî bi cîhana erebî re, xurtkirina xizmatîya misilmanî ji bo "kurahîya stratejîk" bi cîranan re pêk bê, xwe wek pirehê di navbera Rojava û cîhana îslamî de berepêş bike û encama dawî hêzeke cihanî ava bike.

## Redkirina hestejêrî ji bo Erdogan

Ji bo vê armancê hikumeta-AKPê dîplomasîyeke sift a herêmî ajot, peywendîyên aborîyê bi cîranan re xurt kirin, bi taybetî bi Îran û Suriyeyê re û bi vî awayî zerar da hewldanên hevalbenda-NATO (USA) DYAyê ku dixwast van her du welatan îzole bike. Tevî berdewamîya dostanîya zindî bi Washingtonê re jî, Erdogan hewl dide ku siyaseta derva ya serbixwe ku hew bi giştî li gor Rojava û EU (Yekîtîya Ewropa) be. Lê bi pêşketina "bihara erebî" re stratejîya tirk a "sifir-pirsgirêk" xirab têk çû. "Sifir-pirsgirêk" di rastîyê de perdeya li ser "dostanî bi dîktatoran" re bû, ji **Qedafî**yê lîbyayî, **Esad**ê sûriyeyî heta **Mehmûd Ehmedînejadê** îranî. Çalakvanên "bihara ereb" ên ku bi mehan jîyana xwe di şerê azadîyê de ji mirovahîyê û serbilindîyê dixistin xeterê û hîn jî dixin, li Erdogan nabihurînin ku wî arîşeya bindestîya gelên ereb, bi salan ji ber têkilîyên hevalbendên xwe yên zordar ji çavan dûr dixist, dervayê tacîzî, îhlalkirina mafên mirovan li ser xelkê xwe yê kurd.

Bi vî awayî **Erdogan** redkirina hestejêrîyekê dît gava ku wî xwast piştî têkçûna dîktatoran li Misir, Lîbya û Tunusê xwe wek parêzvan û alîkarê modeleke siyasî ya hêvîdar ji bo cîhana îslamî şanî bide, hêvî dikir ku ew dê bibe hêza nû ya mezin a herêmê. Ev tirkê ku dixwaze arîşeyên xwe yên bi niştecîyên xwe yên kurd re bi îşkence, girtîgeh û bikaranîna artêşa xwe –badilhewa-çareser bike û hertim zerarê dide serwerîya dewletên cîran, di herêmê de gelek kêm kes hene pê bawer dikin. Ew çiqas bi peyvên vala derdên herî hestiyartijî yên ereban, filistînîyan bîne zimên jî, daku ew şova parêzera dengberz a mafê çarenûsa Filistînê ji Tehranê bidize, bi kêr nayê. Ne tenê Erdogan e ku di dawîyê de serkeftî nebûye, zordana hevalbendê xwe yê stratejîk (li dijî PKKê) **Esad** ber bi reforman birin, tesîra qels derxist holê ku Tirkiyeya îro li cem cîranên wê, li cem cîhana ereb gişt heye. Gelek îşaret pê hene ku Esad PKKê li Suriyeyê germ dihêle daku eger pêwîst be, wek bavê xwe, ew mîna karteke xurt li dijî Enqereyê bi kar bîne.

Guherîna bi lez a siyasî -dûrbûna ji Esad- ji bo avakirina bawerîyê kêm alîkar e. Bi wî awayî Enqere di herêmê de hêza dîplomasîyê zêde winda kir, li alîyê din lîstikbazê hember dilerize ku dê derîyê wê yê girîng ê cîhana ereb, ber bi şiîyên Lubnanê û ber bi sînorê dijminê îsraîlî, bi muhtemel hilweşîna naçar a rejîma **Esad** re heta hetayî bê girtin. Herwiha **Erdogan** pêewlebûna siyaseta xwe ya derva ya zixtxwar bi tehdîtên şer diparêze, mînak di arîşeya kolana mafê bîrên petrolê li pêşîya beşê Qibrisê yê ku ji alîyê yekîneyên tirk ve hatiye dagîr kirin, yan jî tehdîta ji alîyê Îsraîlê ve rexnebar e, yanî birina alîkarîyên di bin parastina keştîyên şer de ji bo Filistînîyên ku di girtîgeha mezin Gazayê de ne.

**Sinan Ülgen** ji ***Think Tank* Carnegie Endowment** wiha analîz dike: Bi gavên wiha curetkar ên ser sehneya dinyayê Tirkiye dixwaze ji xwe re li hember Rojava cîyên manewrayê çêbike û zelal bike ku ew nikarin dev ji rola navbeynkarîya Enqereyê berdin. ("Testing Turkey´s Influence", 28.9.2011)

Tehran lîstika masûlkeşanîdana tirkan bi dudilîya kêf û nearamîyê dişopîne. "Sîstema laîkiyê ne modeleke baş e kevneserokê muhafizên şoreşê yê Îranê û şêwirmendê "serokê rûhanî" yê Xameney general **Rehîm Sefevî** dest datîne ser birîna tirkan. Siyaseta Enqereyê bi îdealên xelkê misilman ên Tirkiyeyê re li hev nayên, dibêje. (Tehran Times, 8.9.2011). Modela dewleta Îranê qet dilgirî pê re nemaye, ne xema wê ye.

## Tehdîdên Îranê

Wekî din soza Enqereyê bi DYAyê re ku destûrê dide bicîhkirina sîstemeke rakêtparêzîyê ya NATOyê bû sedema hêriş û tehdîtên rejîma Îranê ku daxwaza siyaseta wê ya derva bi temamî serbixwebûn û herêmeke parastî ye ji hêzên (mezin) ên rojavayê. Tirkiye -wisa îdîa dike Sefevî- dê "bedeleke mezin" bide eger ew "xeletîya xwe ya stratejîk" ya dawîyê sererast neke (press tv.ir., 20.10.2011). Tirkiye bi vî awayî dijminîya eşkere beramber "Komara Îslamî" şanî dide ku ew bûye hevalbenda herî girîng a aborî û dixwaze têkilîyên dualî yên tîcaretê bike du qat, derxîne ser 30 mîlyar dolaran, wiha li Tehranê hêrs bilind dibe; serokatî xwe bi îtirazên **Erdogan** ku dibêje elaqeya rakêtan bi hêrişên Îranê yên li dijî Îsraîlê tuneye teselî nake. Îsraîl dê jixwe têk biçe, derdorên tund yên fermî li Tehranê tînin zimên. Û hevalbendîya bi mebest ên her du dijberan her diçe zêdetir sar dibe.

Lê wek hertim di dîrokê de îro jî beşek heye ku ser her mixrikî digire: Daxwaza hevbeş ku şansekî piçûk jî, ji bo çarenûsîya mafdar nedin kurdên bê dewlet ên li erdê xwe. Dîktatorê Suriyeyê divê biçe, bi hêvîya sempatîya muxalefetê, êdî **Erdogan** eşkere davêje û ji bo cûrbicûr konferansên stratejîk yên li ser dahatûya dewleta cîran bê qebîleya **Esad**, comerdane mazûbanîtîyê dilîze. Baş e, lê eger di Sûriyeyeke nû de du milyon kurd li gor mînaka Îraqê otonomîyê bi dest bixin? Çi dibe, eger Sûriye di geremolê de têk biçe û kurd qamçîyê rejîmê yê dehsalan ji hev bixînin û çalak ji bo azadîya xwe têbikoşin û ji bo bira û mirovên xwe yên ji xwîna xwe re yên li Tirkiyeyê jî vê yekê bixwazin? Bergehên wiha xof dixin dilên stratejîstên Enqereyê û bi heman awayî yên Tehranê jî. Serokatîya ereb ya li Bexdayê jî bûyerê bi endîşe dişopînin. Ma di herêmê de kî dixwaze ku ev gelê herî mezin ê bê dewlet xwe bi xwe îdare bike? Gelo ne çêtir e ku hikumdarî di destê **Esad** de bimîne, lê ew wiha bê xurt kirin ku ne hevalbendê wî yê stratejîk Îran, lê ev alîyê sînorê tirk jî xwedî gotin be? Xafikeke dualî ya naçar ku bihara ereb **Erdogan** jî avête nav.

**Şelal Gedo** serokê ***"Partîya Kurd a Çep li Sûriyeyê"*** vekirî gilîyan dike, (Rudaw, 22.9.2011) dibêje, Enqere hertiştî diceribîne ku muxalefeta Sûriyeyê *"bixe xizmeta xwe"* daku *"kurd di qanûneke nû ya Suriyeyê de neyên parastin"*. Nûçeyên ku kurdên Sûriyeyê -destpêkê fedîyok be jî-dest pê dikin ku di bin afîşên kurdî de li dijî **Esad** bi rêk dixin û sempatî şanîdana PKKê ji bo birayên di tengasîyê, di dewleta cîran de tirsa vebûna enîyeke nû di vê herêma geremol de peyda dike.

## Ewrên tarî li ser Kurdistanê

Arîşeya girîng ji bo Erdogan ew e ku postên li Îraqê bi taybetî jî yên li Kurdistana wê derê ji Îraneke ber bi firehbûnê ye, biparêze, eger bi paşvekişîna yekîneyên DYA (USA) ji bo her duyan şansên nû ji bo meşa stratejîk vebin. Kurd bi taybetî hestiyar beramber vî şerê dijber ê jeostratejîk ê nû ne.

Ji têkçûna dîktatorê Îraqê **Sedam Huseyn** 2003, tirkan ewrekî mezin a tarî raxist ser Kurdistanê. Di dawîyê de bi zora ***Washington***ê Erdogan naçar ma wê birêveberîya otonom a tirsdar a kurd bipejirîne. Li dijî vîrûsên tehdîtkar ên serbixwebûnê ku ji wê derê tehdîda xwe berfirehkirina ber bi birayên xwe yên li Tirkiyeyê dikir, Enqere bi aqilane û bi stratejîyeke gelek serfiraz têkoşî. Eger wê nikaribûya li pêş otonomîyê bibe asteng, divîyabû di bin pîrozî û girêdana sedesed a tirk de dewam bikira. Bi vî awayî hertim fetisandina wê mimkun bû. Tirkiye bi hewes kolan û firokexane û gelek avahîyên din ên stratejîk çêkirin û bi vî awayî bi lingekî ketibû herêma cîran a kurd ku mafê xwe yê dîrokî jî tê de didît. Nîvê fîrmayên bîyanî yên ku li Kurdistana bi nîsbet ewlekar hene, hejmara wan 1200 yên tirkan in, bi dehan hejmar yên îranî ne. Ji sedî 80ê malên ku îro dikevin Kurdistanê ji Tirkiyeyê ne, beşekî piçûk ji wan ji Îranê ne.

Ji alîyê leşkerî ve Tirkiye ji salên 90ê ve li Kurdistanê ye, ji wî şerê bextreş ê di navbera pêşmergeyên Serokê Kurdistanê yê îro **Mesûd Barzanî** û Yekîtîya Niştimanî Kurdistanê yê serokê Îraqê ê niha **Talabanî** de çêbûbû. Di hefteyên bihurî de Parlamena Kurdistanê ya li Hewlêrê bang li Tirkiyeyê kir ku baregehên xwe yên ku di dema xwe de ji bo parastina Barzanî li dijî Talabanî hatibûn ava kirin û avahîyên din ên saloxgerîyê bigire daku Kurdistana Îraqê cardin nebe cîyê şerekî nû. ("alsumaria.TV").

## "Bendeyên" Tirkîyeyê?

Herçiqas serokatîya kurdên Îraqê -destpêk- kêfa mîweyên materyal ên hevkarîyê bi dijminê berê yê kurd re derdixe jî, li derdorên taybet li Bexdayê di nav siyasetmedarên ereb de dengê xemdar bilind dibin, ew ditirsin ku Enqere çavdêrîya aborî û siyaseta Iraqa Bakûr bi dest bixe û de fakto wîlayeta Musulê *"eşkere bi hikumdarîya tirk ve girê bide"*. (United States Institute of Peace: "The Coming Turkish Iranian Competition in Iraq", June 2011). Û hin siyasetmedarên kurd jî bi şikbarî tên guvişandin ku ji bo herêmê bike "bende", Erdogan dixwaze Kurdistanê ji alîyê aborî ve bi xwe ve girê bide.

Tehran jî stratejîya Enqereyê ya Îraqê bi bêaramîya mezin dişopîne. Tirkan dest pê kir ku li Iraqa Başûr jî, herêma navend ya di bin tesîra Îranê de ye, bi giranî şiî tê de dijîn, cîyê xwe bigirin. Ji alîyê din jî tehdîta berxwedana nû li dijî armanca Îranê ku Iraqeke qels di bin tesîra wê de ji alîyê şiîyan ve bê bi rê ve birin: Erebistana Siûdî, dijmina dijber sunî di herêmê de. Şerê sar ê bi salan di navbera her du dewletan de diajot, piştî hewladana hêrişeke li dijî sefîrê Siûdîyê li Washingtonê derket holê ku muhtemel tilîya Îranê tê de heye, dê ber bi şerekî xwîndar ve, mîna piştî têkçûna **Sedam Huseyn** li serzemîna Iraqê biçûya. Çavkanîyên dîplomatîk radigihînin ku ***Riyad*** li ser mebesta serokê DYAyê **Obama** şok bûye ku dixwaze heta dawîya salê hemû leşkerên DYA ji Iraqê bi paş ve bikişîne û bi vê yekê, siûdî wiha têdigihîjin, derî û dergeh li pêşîya serdestîya Îranê veke. *"Îran ne tenê ji bo qralîyeta (siûdî) xetereke rasterast e, herwiha ji bo hemû sunîyên herêmê",* endamekî sereke yê rejîma Riyadê hişyar dike. *"Eger Washington di herêmê de nikare berjewendîyên me biparêze, wê demê divê em bi xwe bikin."* ("Wall Street Journal", 17.10.2011).

Di encama dawî de dîsa siûdî bûn ku piştgirî dabûn berxwedana dûredirêj a şidetane li dijî şiîyan -û Amerîka jî- li Iraqê û cîhadên siûdî şandin herêma şer ya Ferat û Dîjleyê. Wê demê jî pirs ew bû ku meşa Îranê berepaş vegerînin.

Demên geremol li benda iraqîyên êşkêş û li benda kurdan e jî ku bi salan e aramî û kamranîyeke newaze dijîn. Li ser çîyayên Zagrosê îranî baregehên xwe datînin daku çavdêrîya her livbazîyê li welatê têrşer bikin, tirk li her deverê ne û siûdî derîyên vekirî dibînin. Di navber de pelişandî dijminê ezelî kurd heye ku li ba birayên iraqî-ereb jî pêbawerî tuneye. Îran û Tirkiye çi ji destên wan bê, dê bikin da ku plana gelek kevin bibin serî: Li ser sînorên xwe avakirina "herêmên parastinê" yên bê însan da ku tenê ew li ser "azadîya" Kurdistana Iraqê biryarê bidin û gelê wê derê wek rehîn bigirin.

Wergera ji almanî: Hüseyin Kartal

# Baskîyek û Kurdek (Dewama rûpela 1)

din ên Îspanyayê rê li koçên komî yên bo Welatê Baskan vekir. Bi bandora koçkirinan jî zimanê baskî dike, wenda bibe. Welatparêzîya baskî jî wekî nerazîbûna li dij vê yekê bi mebesta azadîyê derdikeve holê.

**Sabino Arana**, ku zimanê baskî paşê hîn dibe û wekî bavê neteweperwerîya baskî tê nasîn, di 1895ê de ***Partîya Neteweperest a Bask*** (PNV) ava dike. Ji ber xebatên xwe yên siyasî du caran dikeve girtîgehê û di 1903ê de di 38 salîya xwe de dimire. **Arana** herweha ew kes e ku ala baskî dîzayn kiriye û ji bo 7 herêmên dîrokî yên baskî jî navê ***Euzkadî*** datîne.

Di navbera 1923-30ê de di serdema dîktatorîya **Primo de Rivera** de li welatparêzên baskî pir tade tê kirin.

## Di Kuvezê de statuyeke baskan

Di bihara 1931ê de, ragihandina Komara Îspanyayê ya Duyem di warê bidestxistina statuyekê de hêvî da neteweperwerên baskî. Partîya Neteweperest a Bask (PNV) ji bo çar herêmên baskî doza statuyê dike, lê ji ber lidijderketina hikûmeta Madrîdê herêma ***Navara*** ji nav tê derxistin.

Di hilbijartinên giştî yên sibata 1936ê de, koalîsyona komarperwer, sosyalîst û komunîstan ***Frente Popular*** (FP-Enîya Gel) bi ser dikeve. Piştî 5 mehan artêşa îspanî li dij hikûmeta komarperwer a Madrîdê ji qişleyên xwe derdikevin û dadikevin kolanan. Hikûmeta Baskî, radigihîne ku ew li dij darbeyê, piştgirîya komarperweran dike. Li ***Bizkaia*** û ***Gipuzkoayê***, ku neteweperestên baskî lê hêzdar in, li dij alîgirên **Franco** 'yekîneyên parastinê' tên ava kirin. Li Navarayê jî alîgirên Franco hêzdar in.

Statuya Baskan di 1ê cotmeha 1936ê de dikeve merîyetê. Ev statu, ku di nav şer de teşe girtibû, mirov dikare wekî 'otonomîyeke di kuvezê de' bi nav bike. Jixwe di 7 mehîya xwe de jî dimire. Ji bo baskan berdêla şerê navxweyî ya Îspanyayê 50 hezar mirî, 10 hezar girtî û bi dehan hezar sirgûnî. Herweha ***Guernika*** ye, ku bi tabloya navdar a **Picasso** ev der vediguhere 'sembola karesatên şer'.

## Frankîzm komkujîya Guernikayê ye

Ji ber ku ên serkeftî dîrokê dinivîsin, tê bawer kirin ku ***Guernika*** jî ji ber ku hatibû bombebaran kirin, navdar bû. Lê belê ev navçeya bask a dergûşa demokrasîyê, ji ber ku dilê baskîyan bû hatibû bombebaran kirin: di 26ê nîsana 1937ê de firokeyên ***Legion Condor*** ên alman bajêr bombebaran dikin û kevir li ser kevir nahêlin. Roja din, çapemenîya cîhanê bi serenavê *'di dîrokê de cara pêşîn bajarek ji asîmanan hat bombebaran kirin'* derdikevin.

Sê nirxên dîrokî yên gelê bask li vê derê ne: ***'Dara Guernika', 'Avahîya Meclîsê'*** û ***'Pirtûk'***. Baskî ji serdema naverast û vir ve meclîsên xwe di bin vê darê de kom kirine. 'Pirtûk' jî serhevdeya qanûnên vê meclîsê ye ku ji 1452ê pê ve hatine nivîsandin. Avahîya Meclîsê, di 1876ê de li kêleka vê darê tê ava kirin.

Şerê navxweyî yê Îspanyayê di 1ê nîsana 1939ê de bi sekeftina **Francisco Franco** bi dawî dibe. Franco, ku leqeba wî ya di artêşê de ***'Franquito'*** bû (Francoyê Piçûçik) xwe him wekî ***'Generalisimo'*** (generalê generalan) û him jî wekî ***'Caudillo'*** (Rêberê Pîroz) ragihandibû. Ew herweha di dîrokê de îmze diavêje tiştekî neditî û cara pêşîn welêt ji komarê vedigerîne qralîyetê. Lê belê ev qralîyet qralîyeteke bê qral e.

Mînaka herî berbiçav a pêkanînên frankîzma çil salî yên li xakên bask Gernîka ye. Ên ku bajar bombebaran kiribûn, dê li çavê gelekî binihêrîya û ji bo wan û tevahîya cîhanê bigotaya ku baskîyan bixwe welatê xwe bombe kiriye. Gernîkayîyên ku ji êrişê filitîbûn, dema qala vê komkujîyê dikir, wan bi tenê dikaribû navê ***'Şewata Guernika'*** lê bikin.

Di projeya 'Neteweya yek û yekgirtî ya îspanyol' a Franco de ***'baskîyê herî baş ew e ku ji îspanyolan bêhtir piştgirê îspanyolan e'.*** Heger wî ji 'çepgiran' carekê hez nedikir, ji wan kesan ku digot 'ez ne îspanyol im, baskî me' du caran hez nedikir.

Zimanê wan, sembolên wan û her tiştê din, ku têkilîya wî bi baskbûnê re hebe, tên qedexe kirin. Lê belê ev tişt nayên wê wateyê ku hemû baskî di bin tade û zulma Franco de mane. Di dema Franco de gelek asayî ye mirov di nav wezîr, şaredar û balyozan de rastî paşnavên baskî were. Gelek karsazên 'baskîyên baş' wê di dema dîktatorîyê de bêhtir dewlemend bibûna.

Ev tişt ***Kurdistanê*** tîne bîra me? Ne tenê Guernikayek, gelek Guernika bi serê kurdan de hatin. Salek piştî wê ***Dersîm*** jî wekî ***Guernika*** ji asîmanan hat bombebaran kirin, piştî pêncî salan jî ***Helepçe***...

Guernika komkujî ye, Dêrsîm nijadkujî ye. Cîhan li alîyekî, haya cîranên Dêrsimê jî jê nebû. Ên ku jê filitîbûn nikaribûn bêjin ***Şewata Dêrsimê*** jî. Di her malekê de fotografê ***Serokê Pîroz***, dev ne bi tûncê, lê bi betonê seyandî, li bajarekî nû yê bi navê ***Tunceli*** diviyabû dest bi jîyaneke nû bikin.

Serokê Pîroz Franco, ewqas derew kirin, lê belê tucaran negot demokrat im. Resmê xwe li her daîreya dewletê da daliqandin, kuçe bi wêneyên wî hatin xemilandin, lê belê mal û çîyayên baskî li derveyî vê yekê girt.

## Ji baskîyên ciwan qefdek li Frankîzmê: ETA

Ber bi salê 1960ê ve Îspanyaya Franco di warê aborîyê de baştirîn dema xwe jiya. Di heman salan de, nifşekî baskîyan, ku di dema dîktatorîyê de mezin bûne, dengê xwe bilind dike. Zimanê baskî di vê demê de jî sembola herî girîng a vê berxwedana siyasî ye. ***Îkasto***, ku di zimanê baskî de tê wateya dibistana zimanê baskî, li malan tê ava kirin. Pêşî zimanê baskî tê hîn kirin, dûre jî perwerdehîya bi zimanê baskî. Di salên 1960ê de Îkasto ji malan derbasî avahîyan dibe. Di salên 1970yê de ji îllegalbûnê derkdikeve û hêzên hikûmetê têkilî pê nake. Êdî 100 Îkosta 25 hezar baskîyan perwerde dike, ên ku vî karî encam didin zarokên neteweperestên baskî ne.

Muxalefeta ku di heman salan de peyda dibe û dibe şevereşka Franco jî 'Welatê Bask û Azadî' an ku 'ETA' ye. Mebesta vê rêxistinê, ku di 1959ê de tê damezirandin, ji bo dewleta îspanî 'azadî' ji bo welatê xwe jî 'serxwebûn' e. ETA di sala 1968ê de şefekî polîsan **Meliton Manzanas**, ku bi îşkencekarîya xwe navdar bû, li bajarê ***Gipuzkaoyê*** dikuje û bi vî awayî dest bi têkoşîna çekdarî dike. Rejîm jî li vî bajarî rewşa awarte ragihdîne û zexta xwe zêde dike. Ber bi dawîya salên 1970yê de 6 endamên ETAyê bi tawabarîya kuştina vî şefê polîsan tên îdam kirin. Ev rewş ne tenê li Welatê Baskan, lê belê li seranserî welêt cara pêşîn rê li xwepêşandanên dij-Franco vedike.

Di dawîya sala 1973yê de li naverasta Madrîdê makîneya serokwezîr **Luis Carrero Blanco** tê teqandin. **Carrero** di 1951ê û vir ve destê rast ê Franco ye. Dîrokzan vê bûyerê wekî 'destpêka dawîlêhatina Frankîzmê' bi nav dikin. Piştî wê bûyerê, heta Franco bêhna xwe ya dawîyê dide, xwepêşandanên li kuçeyan, grev û destgîr kirin berdewam dikin. Li wan, protestoyên dîplomatîk ên li dij rejîmê jî zêde dibin.

## Ji dîktatorîyê derbasbûna demokrasîyê: vebûna îspanyol

Di 20 sermaweza 1975ê de dema **Francisco Franco** mir, zengilên ku dihatin lê dan ne tenê ji bo wî herweha ji bo 'berhema' wî jî bû. Muxalefetê, herçend di salên dawîyê de xelek li Franco teng kiribin jî, rejîm dê nikaribûya berdewam bike, ji ber ku mîada xwe tije kiribû. Li Ewropaya Rojava êdî jê re cih nemabû.

**Juan Carlosê I.** li ser wasîyeta **Franco** û bi biryara parlamentoya wî wekî qral tê ragihandin. Ew jî **Carlos Arias Navarro** wekî serokwezîr tayîn dike da ku dest bi reformên siyasî bike. Piştî ku rûtişên wî nikare dengê muxalefetê bibire, di tîrmeha 1976ê de di şûna wî **Adolfo Suarez** tê tayîn kirin. **Suarez**, yek ji burokratên **Franco** ye lê belê alîgirê reforman e. Karê wî yê pêşîn ew e ku *'Qanûna reforma siyasî'* derdixe ku tê de efûyeke giştî, qanûnîkirina partîyên siyasî (serxwebûnxwaz jî tê de), hilbijartinên serbest û komîsyona destûrê hene.

Di hilbijartinên giştî yên hezîrana 1977ê de *Yekîtîya Navendî ya Demokratîk* (UCD), ku piranî ji alîgirên **Franco** pêk tê, bi ser dikeve. **Adolfo Suarez** vê carê bi hilbijartinan dibe serokwezîr. Li welatê **baskî** partîya PNV dibe partîya yekem.

## Destûra îspanyolî û modela îspanyolî

Komîsyoneke Destûrê tê ava kirin. ***Partîya Neteweperest a Baskî*** (PNV) û ***Partîya Mebest û Yekîtî ya Katalanî*** (CIU), ku li herêmên xwe partîyên yekem derketibûn, da ku di komîsyonê de cih bigirin komên xwe yên parlamentoyê pêk tînin.

Destûra îspanyol, ku di 6ê berfanbara 1978ê de diçe referandûmê, di esasê de berhema *Partîya Sosyalîst a Karkeran a Îspanyol* (PSOE) û ya *Yekîtîya Navendî ya Demokratîk* (UCD) ye. Destûr li seranserî welêt dora 88 dersedê dengên erê distîne, lê belê ev rêje li welatê baskan nagihîje 50 dersedî jî. PNV neçû ser sindoqan û partîya **Heri Batasuna** (HB, Yekîtîya Gel), ku partîya sereke ya welatparêzên çepgir ên baskî ye û wekî baskê siyasî ya ETAyê tê nasîn, dengê na bi kar anî. Sedemên her duyan jî eynî ne; mafê self-determînasyonê nas nake û axên welatê baskan kiriye du herêmên xweser.

Herçend li Îspanyayê bi tenê ***bask, katalan û galîçyayîyan*** doza xweserîyê dikir jî, destûrê bi modeleke herêmî ya îdarî bersiva van daxwazan da û welat kir 17 herêmên xweser.

Madeyên têkildar a destûra îspanyol weha dibêje:

Madeya 2. Destûr, yekîtîya neteweya îspanyol, ku nabe were belav kirin, û welatê hevpar ê hemû îspanyolan, ku nabe were perçe kirin, ji xwe re esas digire.

Madeya 3.1. 'Castellano' (zimanê îspanyolî) zimanê fermî yê dewletê ye. Hemû îspanyol divê wê him bibin xwedî wî mafî ne ku wî zimanî bi kar bînin.

Madeya 3.2. Li cem civakên xweser jî li gor statuyên wan, zimanên din ên îspanyol ên wê herêmê jî zimanên fermî ne.

Mebesta *'zimanên din ên îspanyol'* ***baskî, katalanî û galîçyanî*** ye.

Tiştê ku dê Vebûna îspanyol bikiraya, reformeke berfireh bû. Di şert û mercên wan rojan de ji alîyê gelek kesan ve dê bihataya pejirandin û formûleke weha bû ku di encamê de serkevtî yan jî şkestîyê wê nebû. Wekî mînak ji francoyîyan dê hesab nehatana pirsîn. Dijberên vê formûlê gelek bûn, lê belê di nav wan de ku ev formûl bi giştî red dikir di serî de ETA dihat.

Rêxistin, di 1974ê de wekî ETA-M (leşkerî) û ETA-PM (siyasî, leşkerî) bûbû du beş. Heta ku **Franco** mir, piranîya wan polîs û cenderme bi giştî 44 kes hatibûn kuştin, lê belê di dema derbasbûna piştî **Franco** de her du rêxistin çalakîyên xwe yên çekdarî zêde dikin. Navbera 1978-80ê de dibin sedema mirina 228 kesan. Di vê serdemê de 'derdorên bêkontrol ên dewletê' li ser kar in. Ew jî bi dehan kesan dikujin.

Di vê demê de hikûmeta îspanyol digel her du ETAyan çendîn caran hevdîtinan pêk tîne. Di 1977ê de efûyek tê derxistin, lê belê ev efû li jêr bendewarîyan dimîne, nemaze yên ETA-M. Endamên ETAyê bi şertê derketina derveyî welat û tu caran venegerîna welêt hatibûn serbest berdan.

Di 23ê sibata 1981ê de komeke cendermeyan diavêjin ser parlamentoya îspanî. Ev hewldana darbeyê, ku bi çend saetan diajo, di encamê de bi ser nakeve. Di hilbijartinên giştî yên 28ê cotmeha 1982ê de ***Partîya Sosyalîst a Karkeran a Îspanî*** bi 48 dersedê rayan dibe hikûmet. Li cem gelek dîrokzanan ev yek xala dawî ya derbasbûna ji dîktatorîyê bo demokrasîyê ye. Di heman salê de ETA-M fesîhkirina xwe radigihîne.

Hin kes vê pêvajoyê bi endametîya Yekîtîya Ewropî ya sala 1986ê bi dawî tînin. Ji ber ku du sal berîya wê rêxistina wekî kontrgerîlla GAL li îspanyayê hespên xwe xweş bezandibûn.

## Xweserîya baskî

'Koma Xweser a Baskî', ku di 25ê cotmeha 1979ê de li ***Gipuzkoa, Bizkaia û Alavayê*** di referandûmekê de hatibû deng kirin; statuyek bû, ku ji alîyê Partîya Sosyalîst a Karkeran (PSOE), Yekîtîya Navendî ya Demokratîk (UCD) û Partîya Neteweperest a Bask (PNV) ve hatibû amade kirin. Li gor vê yekê Euskadi an ku Welatê Baskan wekî xweser e. Herçend PNV li dij wê yekê derdikeve jî li Navarayê xweserîyeke din tê ava kirin. Lê belê li destûra îspanî madeyek tê zêde kirin ku dibêje 'Li ser daxwazê, **Navara** dikare di encama referandûmekê de tev li Welatê Baskan bibe.'

Hevdem, xweserîyên ku statuyên wan di referandûmê de tên deng kirin, bi tenê Welatê Baskan, Galîçya, Katalonya û Endulusya ne. Destûrmendîyên 13 herêmên xweser, ku Endulusya jî tê de ye, wekî hev in. (1)

Di nav 17 herêmên xweser de, a ku xwedî destûrmendîya herî berfireh e, Welatê Baskîyan e. Li dû wî Katalunya, Navara û Galîçya tên. Li van xweserîyan him du zimanên fermî û him jî pergala perwerdehîyê hene. Lê belê modela perwerdehîya du zimanî li hemû xweserîyan ne wek hev e, her yek li gor mercên wan hatiye dîyar kirin.

Li Welatê Baskîyan, pergaleke bi sê modelî tê sepandin. Modela A: Perwerdehî bi zimanê îspanî tê dayîn û zimanê baskî wekî dersekê tê xwendin. Modela D: berevajî modela A ye an ku perwerdehî bi zimanê baskî tê dayîn û îspanî wekî dersekê ye. Modela B: Nîvê dersan bi baskî nîvê din jî bi îspanî ne. Malbat modelan bi xwe hildibijêrin û hikûmeta baskî jî şertên mercên modelê garantî dike. (2)

Welatê Baskîyan xweserîyek e ku xwedî darayîya xwe ye. Ev tê vê wateyê: Bac, ji alîyê her sê hikûmetên herêmî ve tên berhev kirin. Komîsyonek, ku ji van hikûmetên herêmî û birêvebirîya Welatê Baskîyan an ku ji hikûmeta Baskî pêk tê, %1ê budçeyê da ku di warê artêş, karûbarên derveyî welêt û lêçûnên malbata qralîyetê were bi kar anîn, dişîne Madrîdê. Derbarê budçeyê de Komîsyon bi xwe biryarê dide ka ew dê çawa were par ve kirin. Navara jî xwedî mafê darayîyê ye. 15 hêrêmên din ên xweser xwedî vê destûrmendîyê nînin.

Ji serokê hikûmeta baskî re ***'Lehendakari'*** tê gotin û li jêra wî 10 ***'concejero'*** an ku wezîrên xweserîyê hene. Tiştê ku vê xweserîyê ji yên din cuda dike ew e ku xwedî polîsê xwe ye: ***Etrzainza*** (Polîsê baskî). Li seranserî welêt di warê gumruk û sînoran de cendermeyên îspanî û ji ewlekarîya navxweyî jî polîsê îspanî berpirsyar e. Li Welatê Baskîyan di warê meseleyên 'têkildarî ewlekarîya dewletê' de ev destûrmendî di navbera polîsê îspanî û baskî bi awayekî koordîne tê bi kar anîn. Li Welatê Baskîyan ji ewlekarîya navxweyî bi tenê polîsê baskî berpirsyar e. Navara û Katalunya jî xwedî yekîneyên polîsan in, lê belê destûrmendîya wan gelek sînordar e, wekî polîsên trafîkê.

## Di serdema xweserîyê de pirsgirêka baskî û siyaset

Ne tenê li Welatê Baskan herweha li Galîçya, Navara û Katalunya jî du cure partîyên siyasî hene. Partîyên sereke, ku li seranserî dewletê bi rêxistî ne, ev in: *Partîya Sosyalîst a Karkeran a Îspanî* (PSOE), *Partîya Gelperwer* (PP) û *Çepgirên Yekgirtî* (IU). Herweha hin partîyên neteweperest/welatparêz jî hene ku bi tenê li herêman rêxistî ne. Li Welatê Baskan partîyên sereke jî ev in: *Partîya Neteweperest a Baskî* (PNV) û *Bildu* (Yekgirtin)

PNV, nûnerîya rastgirên navendî/lîberal a baskan dike. (Mirov dikare bêje wekî KDP ya Barzanî) ***Bildu*** navê îroyîn ê wê partîyê ye ku zêdeyî 20 salan wekî ***Heri Batasuna*** (HB, Yekîtîya Gel) dihat zanîn. Lê belê Bildu blokek e ku îro nûnertîya derdorên berfirehtir dike. Partîya HB, ku nûnertîya 'Çepgirên Welatparêz ên Baskî dike, ji destpêka salên 2000ê û pê ve navê xwe çendîn caran guherand ku bi navê Batasuna (Yekîtî) dest pê kir. Piştî her qedexekirinekê bi navekî din dihat damezirandin. Jê re destûr nayê dayîn ku di hilbijartinên pênc salên çûyî de beşdar bibe. Bildu jî di sala 2011ê de hat damezirandin.

PNV ew partî ye ku di dumahîya xweserîyê de dengê herî bilind stendîye: Navbera % 30-40. Vê partîyê heta sala 2009ê yan bi tena serê xwe yan jî bi koalîsyonan hikûmeta baskî bi rê ve bir. Di van hilbijartinan de herçend wan % 39 deng bi dest xist jî cara pêşîn nebû hikûmet. PSOE ya ku % 31 bi dest xistibû digel piştgirîya PP, ku % 14 stendibû, hikûmet ava kir. Ev yek li Welatê Baskan îqtîdarbûna pêşîn a partîyên alîgirên îspanyol in.

Li gor ***PNV***, ku neteweperesta bask e, û li gor hin partîyên baskperwer xweserî bi qismî bûye dermanê pirsgirêka baskî. Lê belê hîna jî pirsgirêkeke siyasî ya baskî berdewam dike. Dîsa li gor van derdoran divîyabû ku ***ETA***yê herî dereng di 1980-1981ê de çek berdana. Piştî wê demê tenê tişt ku ETAyê kir zirardayîna doza baskî bû. Li gor ETAyê û baskê wê yê siyasî, xweserîyê ne tenê pirsgirêka baskî çareser nekiriye herweha li pêş çareserîyeke nîhayî jî bûye asteng.

Li gor îqtîdara dewletê an jî hikûmeta Madrîdê ev yek di destê PSOEyê de ye ku ji 1982ê heta 1996ê pir bi lez ji çepgirîya sosyalîst ber bi çepgirîya lîberal de çû. Paşê jî navbera 1996-2004ê de ev yek di destê PP de ye, ku nûnertîya rastgirîya navendî ya îspanyol dike. Di du serdemên dawîyê de desthilat di destê PSOEyê de ye. Li gor van her du partîyan xweserîyê

pirsgirêka baskî çareser kiriye. Heger, hîna jî pirsgirêkek hebe navê wê bi tenê dikare 'neteweperestîya baskî' be. Herweha, pirsgirêka terora ETAyê heye. Pirsgirêkeke siyasî nîne. Helwêsteke weha 'îspanyolparêz' herweha di heman demê de siyaseta fermî ya dewleta îspanî ye jî.

Jixwe, ji dawîya 1983ê heta destpêka sala 1986ê, kontrgerîlayê îspanî GAL (Komên Rizgarîyê yên Dijterorîstan), ku ji kuştina 28 kesên piranîya wan sîvîl berpirsîyar e, berhemeke PSOEyê ye. Ev rêxistin, bi agahdarîya serokwezîr **Felipe Gonzalez**, ji alîyê wezîrê navxweyî, Mudîrê Ewlekarîya Dewletê, rêveberên vê partîyê yên li Welatê Baskan û gelek karbidestên payebilind ve hat bi rê ve birin. Piştî beşdarbûna Îspanyayê di Yekîtîya Ewropî de sala 1986ê de dawî li çalakîyên GALê tên anîn û heman koma ku GAL bi rê ve biribû piştî çend mehan dest bi hevdîtinên digel ETAyê dikin: Hevdîtinên Cezayîrê. Hevdîtinên herî dirêj û girîng ên navbera rêxistin û hikûmetê heta naverasta 1989ê berdewam dikin.

Serdema ***GAL*** jî tê de, di domahîya salên 80yê de rêxistin dora 35-40 kesan dikuje. Di 1987ê de li pêşîya avahîyeke asûkîyê de di encama teqîna mekîneyeke bombebarkirî de 19 kes tên kuştin û dora 50 kesan tên birîndar kirin. Rêxistin piştî bicihkirina bombeyê xeberê dide polîsan. Çend saet dûre jî teqîn pêk tê. Herçend ***ETA*** paşê lêborîna xwe bixwaze jî berpirsîyarîya bûyerê dixe stûyê hikûmetê.

Piştî vê bûyerê, îqtîdar bang li civak, partîyên siyasî û hemû derdoran dike ku di siyaseta bi tenê hiştina terorîstan û alîgirên wan de li cem hikûmetê cih bigirin. *'Bloka Demokratîk'*, ku bi beşdarbûna van hemû partîyan pêk dihat, *'Pakta Ajuria Enea'* îmze dikin, ji bilî çend partîyên piçûk. Ne tenê ETA herweha her kesê ku wê şermezar neke, dê bihata tecrîd kirin. Xebatên vê paktê digihîje wê merheleyê ku her kesê ku silavekê bide 'welatparêzên çepgir' tên şermezar kirin. Ji alîyekî ev tişt pêk tên, ji alîyê din de jî hikûmet hevdîtinên xwe yên digel rêxistinê berdewam dike. 7 salan piştî bûyera Barcelonayê, Dadgeha Neteweyî biryarê dide ku, herçend ew hatibûn agahdar kirin jî polîs xemsarî kiriye û avahîya asûkîyê vala nekiriye. Lê belê cezayê ku tê birîn bi tenê dûrxistina ji kar e.

Bûyerên wekî: GAL û koma ku GAL ava kiribû paşê digel ETAyê hevdîtin pêk anî, polês pêşî li bûyera Barcelonayê negirt, ku rê li tecrîdkirina welatparêzên çepgir vekir, û ev bûyer hemû li dû hev hatin, siyasetên li Kurdistanê tîne bîra mirov. Heta rojên îroyîn jî.

Di salên li dû wê de, hejmara mirinan serê salê dora 10-15 ye. Ji alîyê din jî, piştî ku GAL tê teşhîr kirin, destgîrkirinên pêşîn ên li dij wê di 1995ê de pêk tên. Ev yek tê wateya dawîlêhatina hikûmeta **Felipe Gonzalez**. Û di 1995ê de **ETA** şexsîyetên siyasî jî ji xwe re dike hedef. ETA dest bi kuştina endamên partîya rastgir a *Partîya Gelperwer* (PP), ku bi çavekî misoger lê dihat nihêrtin, ku di hilbijartinên sala pêşî de dê bi ser keve. Xerabtirîn bûyer di 10ê tîrmeha 1997ê de bi revandina **Miguel Angel Blanco** yê 21 salî dest pê dike, ku li Welatê Baskan li navçeya *Ermuayê* endamê meclîsa şaredarîyê ye. ETA daxwaz dike ku girtîyên baskî, ku li girtîgehên seranserî welêt hatine belav kirin, di nav 48 saetan de bişînin Welatê Baskan. Bi hezaran kes derdikevin kolanan û bang li ETAyê dikin ku **Blanco** were serbest berdan. Piştî ku muhleta dayî tije dibe, **Blanco** li daristanê tê dîtin, ku guleyek bera serê wî hatiye dayîn. Berî ku bigihîje nexweşxaneyê bi rê de dimre.

Ev roj, ew roj e ku çepgirên welatparêz ên baskîyan ji xwe fedî kir. Êdî, ew kesên ku piştî her kuştina ji alîyê ETAyê derdikevin kolanan ne tenê Yekgirtina Gel (HB) lê belê herweha PNV û baskperwerên din tewanbar dikin. Ku ev derdor jî bi salan bû ku di van xwepêşandanan de beşdar dibûn.

Piştî salekê, HB, PNV û derdorên din, ku wekî baskperwer tên zanîn, digel ETAyê peymanekê datînin. ETA agirbesteke nesînorkirî radigihîne. Ev derdor, herweha zorê didin Madrîdê ku digel Rêxistinê derbarê bêçekkirin û rewşa milîtan û girtîyan de hevdîtinan pêk bînin. Ji bo çareserîya siyasî, ji bo naskirina mafê self-determînasyonê hemû partî bi hev re têkoşînê dikin. Di vê rêyê de hin gav tên avêtin û hikûmeta Madrîdê digel ETAyê çend hevdîtinan pêk tîne. Rêxistin, PNV, ku li Welatê Baskan hikûmet e, bi pasîfbûnê tewanbar dike û di destpêka sala 2000ê de agirbestê betal dike.

## Bi biryara parlamentoyê hevdîtinên ETA û hikûmetê

Paşê ji bo ETAyê û baskê wê yê siyasî serdemeke dijwartir dest pê kir. Piştî ku rêxistinê agirbesta xwe ya vê carê jî betal kir, yekser rêya dawîlêhatinê vekir. Di hilbijartinên dema agirbestê de baskê siyasî ya ETAyê HB dengên xwe du qat zêde kirin û gihand % 16an. Di hilbijartinên din de, ku ji ber ku HB hatibû qedexe kirin û di şûna wê de ***Batasuna*** tê de beşdar bûbû, rêjeya dengan ket % 8an. Ev yek li ETAyê wekî cezayek e, ku derfeta xwe ya dawî jî ji dest dabû. Dewletê her partîya nû ya siyasî girt. Êdî, girseyên mezin jî nayên dîtin, ku van qedexekirinan protesto bikin.

Dema ku rewş weha ye, serokê PSOEyê **Luis Rodriguz Zapatero**, ku di hilbijartinên sala 2004ê de bi ser ket, pêşengîya pêşveçûnekê, dike ku jê nedihat guman kirin. Bi pêşnîyaza wî, di hezîrana 2005ê de Parlamentoya li Madrîdê biryareke dîrokî dide û ji hikûmetê dixwaze ku digel ETAyê hevdîtinê pêk bîne. Ji bilî partîya sereke ya muxalefetê Partîya Gelperwer (PP) hemû partîyan dengê erê bi kar anî. Di adara 2006ê de ETAyê agirbesteke nesînorkirî ragihand. Rayedarên PSOEyê yên li Welatê Baskan, di encama hevdîtinên digel PNV û serokê Batasuna ya qedexekirî yên li ***Loyolayê*** (navçeyek li Welatê Baskan) peymaneke lihevkirinê amade dikin. Di fînala van hevdîtinan de nûnerekî Vatîkanê jî wekî garantor beşdar dibe, ku nushayeke peymanê digel xwe bibe Vatîkanê. Batasunayê, merheleya dawî ya peymanê nîşanî hin kesan (an ku ETAyê) dide. Roja îmzekirinê, **Otegi** doza lêzêdekirina madeyeke din dike, ku li gor wê madeyê divê ***Navara û Welatê Baskan*** bibin yek. Ev, wekî daxwazkirina tiştekî nemumkin e. Jixwe, ê ku vê yekê daxwaz dike ETA bixwe ye. Hevdîtin bi dawî dibin.

Bombeya ku ETAyê li balafirgeha Madrîdê bi cih kiribû, da ku zorê bide hikûmetê ku dest bi hevdîtinan bike, bû egera mirina du koçberan. Tê îdîa kirin ku piştî vê bûyerê carek yan du carên din digel rêxistinê hevdîtin pêk anîne. Lê belê, ev serdem piştî hevdîtinên ***Loyolayê*** tê girtin.

Di serdema piştî wê de, nemaze di du salên dawîyê de, tiştê ku çepa welatparêz bike ew bû ku hewlê bide ku ETAyê îqna bike da ku çekên xwe deyne. Ew di heman demê de li dû piştgirîya navneteweyî jî digerin. Ev piştgirî, piştî çekberdanê, ji bo aqûbeta mîlîtanên ETAyê û nemaze ji bo girtîyên ji ber 'endametî, alîkarî û vehewandinê' girîng e. Herweha, ji bo *Konferansa Navneteweyî ya Aştîyê* ya li *Donostiyê* (bi îspanyolî **San Sabastian**) bû, ku di paşperdeya wê de **Tony Blair** hebû. Dûre jî, ETAyê ragihand ku wê dev ji têkoşîna çekdarî berdaye.

Di vê navberê de, di hilbijartinên herêmî yên gulana çûyî de, ***Bilduy***ê (Yekgirtin), bi piştigirîyeke zêdetirî çepa welatparêz a baskî % 25ê dengan stend. Ev yek jî xwedî çend wateyên girîng e: Ev, bilindtirîn rêje ye ku vê derdorê di dîroka xwe de bi dest xist. Herweha, kesên deng dabûn, ji alîyekî ve xwestibû ku ***ETA*** dev ji çekan berde û ji alîyê din de jî wan rê nîşan dabû ku pêşî ew dê hewlê bidin ku pirsgirêka çekdarî bi rêbazên pasîfîst were çareser kirin û paşê jî ji bo çareserîyeke siyasî dê bi hev re xebatê bikin.

Helwêsta hikûmeta Madrîdê, ku di encama hilbijartinên vê mehê (an ku sermawez) de aşkere bibe, dê di pêvajoya çekberdana ETAyê de dîyarker be. Bi çavekî misoger tê guman kirin ku PSOE dê têk biçe û di şûna wê de PPya rastgir bi ser keve. Kîjan were bila were, wan her du jî sînyal da ku ew vê pêvajoyê asê nakin. Jixwe, tu kes jê şik û guman nake ku li Welatê Baskan, ku heger lê çek neyê bi kar anîn, çareserîya siyasî dê hêsantir bikemile. Heta îro hikûmeta Madrîdê, her gava baskperweran bi gotina *'heta ku şidet hebe tu tişt nikare were nîqaş kirin'* paşguh dikirin. Lê belê êdî ev hincet nikare were bi kar anîn.

## Pirsgirêka kurdî çiqas dişibe pirsgirêka baskî û PKK çiqas dişibe ETAyê?

Bersiva vê pirsyarê him gelek hêsan, him jî dijwar û tevlihev e. Da ku em di vê tevlihevîyê de nefetisin, ez dê hewlê bidim ku vê berhevdayînê ji sedsala dawîyê bikim. Kurdistan li Rojhilatê Navîn, ku çavê wê li demokrasîyê neketiye, bûye çar perçe. Li Gerdûnê ne tenê ewên ku dest danîne ser welatê wan, lê belê hemû dinya li hember dengê gelê kurd ê netewebûyînê xwe ker kirine. Daxwazên wan ên herî bingehîn jî bi komkujîyan hatine bersiv dan, serbilindîya bingehîn jî lê zêde hatiye dîtin. Gelê kurd ji alîyê wan çar dewletan ve tûşî reftareke weha bûye, ku zulm û zordestîya çîrokên serdema naverast li hember wan sivik dimînin. Ev çar dewlet, ku ji hev du hez nakin, li dij kurdan bi hev re dixebitin û şewqeke mezin kurdan naxin şûna mirovan û ên ku doza mafê xwe dikin jî bi xwînsarî qetl dikin.

Gelê baskî jî di sê çaryekên pêşîn ên sedala 20em de tûşî gelek zordestîyan dibe. Zulma ku wan dît jî versîyona 'Ewropaya Rojava' bû. Lê ew jî têkoşîyan ku wekî neteweyekê bijîn.

**Txemo Montero** yê baskî, ku di dawîya sala 1980yê de endamê Parlamentoya Ewropayê bû, di xebatên xwe yên li ***Bruksel***ê de kurd nas kiribûn. Berîya deh salan, di hevpeyvîneke me de dîyar kiribû ku dema ku kurd dibêjin ku *'me baş têkoşîn neda'* neheqîyê li xwe dikin û weha dirêjahî pê dabû: *'Têkoşîna ku baskîyan li dij **Franco** meşand, li hember wê têkoşînê, ku kurdan di sedsala 20em de meşand, ne tu tişt e.'*
***Kurdistan*** welatekî mezin e, ***Euskal Heria*** jî welatekî gelek piçûk e. Gelheya kurdan ji ya baskîyan 10 caran zêdetir e. Çawa ku mezinbûn li Rojhilatê Navîn bûbû 'belaya' serê kurdan, piçûkbûn jî li Ewropayê bû 'bêbextîya' baskîyan. Ji ber ku, ***Euskal Heriayeke*** mezin dê bi awayekî hêsantir azadîya xwe bi dest xistibaya. Perçebûna navbera du welatan jî têkoşîna wan gelek zehmettir kir. Herî baş baskîyek dikare bizane û fêm bike ka ***PEJAK***ê li hember Îranê çima agirbestek îlan kir. Kurdek jî dikare fêm bike ka ***ETA*** çima li Fransayê têkoşîneke çekdar nameşîne.

Mafên ku li ***Herêma Xweser a Welatê Baskan*** hatine nas kirin, zêdetir e ji wan mafan, ku ***Federasyona Başûrê Kurdistanê*** di van çend salên dawîyê de bi dest xistine. Jixwe, garantîya statuya vî parçeyê Kurdistanê jî ne dîyar e.
Di warê berhevdayîna ETA û PKKyê de, her du jî zarokên wan kesan in, ku hebûna wan tê înkar kirin. Her du jî wekî bersiva zextên dîktatorîyê derketine. Lê belê ez jî, wekî gelek baskperweran, di wê bawerîyê de me ku piştî naskirina statuya xweserîyê, ***ETAyeke çekdar xizmeta bidestxistina çêtir nake, berevajîya wê zirarê dide doza baskan***. Lê belê, ev yek nabe sedem ku, serdema 30 salî ya xweserîyê jî tê de, siyaseta dewleta îspanî ya li hember pirsgirêka baskî û herweha ETAyê, ku perçeyek e vê pirsgirêkê ye, biheq bibînim.



SERPIL ODABAŞI: **Notirvanên rewiştê**, 50 x 70 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

Hejmara mîlîtanên ETAyê tu caran negihişt 200an. Hejmara gerîlayên PKKyê jî tu caran daneketîye binîya 6-7 hezaran. Piştgirîya xelkê baskî ji bo ETAyê di demên wan ên herî baş de jî bi ser % 15yî neket. Bi tenê dengên **Batasuna** û BDPyê didim ber hev. Dengên BDP û selefên wê tu caran neketin binîya % 50î. Berhevdayîna derfetên wan ên hilbijartinê jî dihêlin ji bo bextê xwendekaran. Rastîya ku partîya herî hêzdar a Welatê Baskan her tim bi rêjeya % 30-40 Partîya Neteweperest a Bask (PNV) e û ev yek ne detayek e.

Di vê gotarê de me qala hevdîtinên **ETA** û ***Madrîd***ê vegotin. Agahîyên me yên derbarê hevdîtina ***PKK*** û Enqereyê bi tenê 'kirtikek' e. Berhevdayîna tiştên ku tê zanîn jî ji xwendekaran re dihêlim. Helwêstên hevserokên *'îttîfaqa şaristanîyan'* **Erdoğan** û **Zapatero** yên li hember van pirsgirêkan pir bi aşkere dîyar dikin ku ka gelê kurd û bask bi çi re rû bi rû ne. Zapatero, di axaftina xwe ya di parlamentoyê de, ku li dij encama wê destûra muzakereya digel ETAyê derketibû, dîyar kiribû ku ' da ku dawî li vê şidetê were, ev hevdîtin hêja ne, herçend ew bi ser nekevin jî.' Wî qala şidetekê dikir, ku di salê de dibû sedema mirina 2-3 kesan.

Lê belê **Erdoğan**, li dij PKKyê aqûbeta Gerîlayên Tamîlê, ji bo Kurdistanê jî *'Modela Srî Lankayê'* pêşnîyar dikir, herçend bi ser nekeve jî. Mafên ku muxattabê wî dixwaze, çareserîyek e ku dişibe 'Modela Îspanyol', ku 30 sal berê di dema serokwezîrîya **Adolfo Suarez** ê frankoyîyekî reformîst de hatibû danîn. Anku xweserî ne tenê ji bo kurdan, ji herkesî re. Gelo dîsa 'şert û mercên Tirkîyeyê gelek taybet in?' Tenê hevoka îngîlîzî ku Franco dizanî û bi salan dubare kir: *'Spain is different'* [(Rewşa) Îspanyayê cuda ye.]

Pêşnîyareke dilnizm: Heger **Erdoğan** 'vebûnekê' bide dest pê kirin, divê digel qralê îspanyol **Juan Carlo** bipeyive, da ku hîn bibe ka şert û mercên Îspanyaya 'serdema derbasbûnê' (an ku serdema vebûnê) çawa *'gul û gulistan'* bûye. Nikare ji hevpayeyê xwe **Suarez** bipirse ji ber camêr berîya deh salan mir. Paşê jî bila digel **Zapatero** bipeyive. Ez, bixwe bawer nakim ku ji bo wê çareserîyê ku îspanyol pêşnîyaz bikin, kurd dê bêjin na.

Erdê dîrokî yê baskî an ku ***Euskal Heria***, 20.664 km2 ye. Ji heft herêman pêk tê û di navbera du welatan de hatiye par ve kirin. Bakurê Welatê Baskan, % 14ê welêt pêk tîne û navê **Iparalde** lê tê kirin. Ev herêm bi tenê % 0.5ê Komara Fransayê ye. Başûrê Welatê Baskîyan, ku ji çar herêman pêk tê, % 3.5ê Qralîyeta Îspanyayê pêk tîne.

Gelheya giştî ya **Euskal Heria** dora 3 mîlyonan e. Li gor 2009ê, gelheya Bakurê Welatê Baskiyan 288.922, a Başûrê Welatê Baskîyan jî li Xweserîya Nafaroayê (Navara) 630.578, a Euskadî (Welatê Baskan) 2.155.546 e. Euskadi, ji herêmên û/ yan bajarên Gipuzkoa (Guipuzcoa), Bizkaia (Vizcaya) û Araba (Avala) pêk tê. Navên di parantêzê de navên îspanî ne. Îsal, parlamentoya îspanî erê kir ku herdu navên bi zimanê baskî bêne bikaranîn.

* Rojnamevan, nivîskara pirtûka ''Bask Meselesi''

1 Li wê xweserîyê ku wekî Welatê Baskan tê zanîn, sê herêm û/ yan parêzgeh hene (Bizkaia, Gipuzkoa û Alava) ku her yek xwedî parlamentoyên piçûk in (Juntas Generales). Herweha hikûmeteke wan jî heye. Ev dezgeh di pêvajoya dîrokî ya baskîyan de dezgehên dîrokî ne. Vebûna îspayol ev dezgeh careke din kirin legal

2 Di navbera 1983-84ê de di asta berîya zanîngehê de hejmara xwendekaran 78 dersed bû, lê ev rêje di 2010-2011ê de daket 19 dersedî. Rêjeya Modela D jî ji 7 dersedî derket 59 dersedî. Model B, ya du zimanî jî dora 22 dersedî ye. Niha rêjeya du zimanîyan (baskî û îspanyolî) dora 40 dersedî ye. 17 dersed jî 'du zimanîyên pasîf' in anku ev kes bi baskî têdigihîjin, lê belê nikarin bi rehwanî bipeyivin

Wergera ji tirkî: Celîl Kaya

Piştî zelzeleya ku li Wanê û der û dora wê xist, Partîya Demokrasî û Aşitîyê (BDP), alîgira kurdan, destek da "Tevkarîya Neteweyî" li gel ku li alîyê din, artêşa tirk bersiva êrişên Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) dida. BDP, wek Ankarayê, dixwazê şansê diyalogê biparêze û bibe terefgira avakirin û guhertinên makezagonî.

DOSYEYÊN HESAS, LI PÊŞÎYA SEROKWEZÎR ERDOGAN

# Hikûmeta tirk û gefên li ser kurdan

WENDY KRISTIANASEN *

**R**ecep **Tayyip Erdoğan** ji xwe re digere: Di du mehên çûyî de serokwezîrê Tirkîyeyê çû seredana Misir, Tûnis û Lîbyayê û ew herweha li Washingtonê jî hat pêşwazî kirin. Wî berdewam kir û bi ser Îsraîlê ("Zarokê serxwereçûyî yê Rojavayê") de çû, piştgirî da serhildanên ereban, ji Cema'ata Cîhanê ya Ereban re got ku li cem Neteweyên Yekgirtî (NY) deng bidin ji bo dewleta Filistînê ("ne wekî alternatîf, lê belê wekî mecbûrîyet"), kêfa kolanên ereb anî û bi piştgirîya xwe ya ji bo sekularîzmê, îslamîyên Misirê aciz kirin. Mebesta liv û tevgerên wî berîya hertiştî ji zexmkirina siyaseta xwe ya herêmî bû ku li welêt xelk piştgirî didê.

Lê belê li paş van dîmenan, hesab û berjewendîperestî hene: Erdoğan bi pejirandina mazûvanîya mertala mûşekan a NATOyê, li dij Îranê temînatek da Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA); wî herweha têkilîyên xwe yên digel **Beşar Esed** ê Sûrîyeyê birîn, ku **Ese**d guh nedabû şîretên **Erdoğan** ên ji bo reforman. Û herçend Tirkîyeyê têkilîyên xwe yên leşkerî yên digel Îsraîlê dabe rawestandin jî, **Erdoğan** têkilîyên xwe yên aborî yên digel vî welatî ranewestandin. **Erdoğan** hetta di gotûbêjên digel ***Hamas***ê yên li ser serbestberdana leşker **Gilad Shalit** de beşdar bû û xêrhatina 11 dîlên filistînî bo Tirkîyeyê kirin, ku ji alîyê Îsraîlê ve hatin serbest berdan, lê belê vegera wan a bo herêmên dagirkirî hatibû qedexe kirin.

Her weha, **Erdoğan** bi lidijderketinên navxweyî re jî rû bi rû dimîne, ku doza heman hesab û berjewendîperestîyê dike. Di çend mehên çûyî de *Partîya Karkerên Kurdistanê* (PKK) şideta xwe zêde kir, revandin, bombekirin û kuştina sivîlan pêk hatin, ku maqamên tirk bi destgîrkirinên komî bersiv da wan. Her çiqas ev yek, ji bo niha, ne vegereke bo wan rojên kujer ên salên 1990ê be jî, ji meha hezîranê û vir ve nêzîkî 180 kes hatin kuştin.

## Bêdilîya gelêrî

Ev pêla şidetê piştî "vekirina demokratîk" a sala 2005ê hat, ku wê demê hikûmeta Partîya Dad û Geşedanê (AKP) şert û mercên kurdan (ku % 15-20 a gelheya Tirkîyeyê pêk tînin) siviktir kirin û di refaha nû ya welêt de parek da wan. Li dû geşedana li herêma *Başûrê Rojhilat,* bi bernameyên televîzyonî yên 24 saetî, pişkivîna çandî, kampanyayên hilbijartinê yên bi kurdî û bi teşwîqkirina çandê, qedexeyên li ser kurdî bi awayekî qismî hatin rakirin *(heta vebûna demokratîk hat wê merheleyê ku di vê cotmehê de di Zanîngeha Artûklû ya Mêrdînê de beşa ziman û wêjeya kurdî hat vekirin)*. Dawî li êşkenceya li girtîgehan hat û hikûmet bi awayekî dizî bi PKKyê rûnişt da ku mijarên wekî dawîlêanîna pevçûnê, ragihandina efûyeke giştî û baştirkirina rewşa zindanê ya serokê PKKyê **Abdullah Öcalan** (yan jî hefsa li malê) nîqaş bikin.

Di cotmeha 2009ê de pêngaveke sembolîk hat avêtin û heşt gêrîlayên PKKyê û 26 dilxwaz ji Iraqê vegerîyan. Lê belê, ew lehzeya ku divîyabû ji bo aştîyê bibe fetilokek, veguherî karesateke têkilîyên raya giştî: Bi deh hezaran kurd bi çoş vegera lehengan, ku bi cil û bergên xwe yên gelêrî yên şer hatibûn, pîroz kir. Raya giştî ya tirk, ku ji bo tiştekî weha ne amade bû, ev dîmen bi awayekî matmayî ji televîzyonê temaşe kirin.

**Erdoğan** ji ber tirsa wendakirina piştgirîya xelkê, kir ku însîyatîf were rawestandin, lê belê gotûbêjên navbera hikûmetê û PKKyê heta 2011ê berdewam kirin, wekî ku ji tomarên dengî yên 13ê îlonê, ku di çapemenîyê de cih girt jî dîyar dibin navbera 2009 û 2010ê de li Osloyê gotûbêj pêk hatine. Serokê parlamentoyê **Cemîl Çîçek** gotûbêj piştrast kirin û got: *"Komara Tirkîyê wekî Brîtanya, Îspanya û wekî welatên, ku ji terorê bêzar in. Ev welat jî di rabûrdûyê de digel ETA û ÎRAyê rûniştibûn."*. (1) Çend roj piştî wê, parlamenterê temen mezin ê BDPyê **Şerafettin Elçi** dîyar kir ku protokolek, ku tê de hemû daxwazên sereke yên kurdan cih digirin, him ji alîyê **Öcalan** û him jî ji alîyê MÎTê ve hatiye erê kirin û ji bo îmzekirinê pêşkêşî **Erdoğan** hatiye kirin. (2) Lê belê çend rojan piştî tomarên dengî, êrişên nû yên PKKyê pêk hatin (ku êrişeke bi makîneyeke bombebarkirî li navenda Enqereyê jî tê de bû)

Sedem çi bûn: Gelo Tirkîyeyê jidil muzakere dikir? Gelo komeke tundrew a nav PKKyê muzakere sabote kirin? Yan jî gelo careke din Sûrîyeyê li hember neyartîya Tirkîyeyê ya li dij rejîma Essed, ku her ku diçê mezintir dibe, karta kurdî bi kar anî? Sedem çi bin jî, Erdoğan gotûbêj dan rawestandin. Û roja 19ê cotmehê, li Colemêrgê di êrişekê de, ku ji 1980yê û vir ve êrişa herî cidî û baş koordînekirî bû, 24 leşker û polîs hatin kuştin. Piştî ku komandoyên tirk sînorê Iraqê derbas kir, Erdoğan banga sikûnetê kir. *"Em dizanin ku panzehîra terorê mafên mirovan û demokrasî ne."* Wî herweha got: *"Em sebr û aramîya xwe ji dest nadin."*

Gelek kes hîna jî ji bo xweserîya kurdan ne amade ne. Hevgirtina kambax a leşker û mafyayê, -ku wekî "dewleta kûr" (3) tê nasîn- û tirk wê bi zêdekirina tengezarîya siyasî û aborî tewanbar dikin, hîna di cihê xwe de ye û ji her du alîyên vê pevçûnê sûdê werdigire. (çek, hişbir ûhwd). Hin kesên nav PKKyê jî normalîzasyonê naxwazin, ku gelek kurd dixwazin pêk were, heger pêk were êdî ew nikarin dewleta tirk bidin rawestandin û kontrola xwe ya li ser gelheya kurd wenda bikin.

**Ümit Firat**, rewşenbîrekî kurd ê nermrew ku bi tu tevgerên siyasî re ne girêdayî ye, veguherîna kurdan weha vedibêje: "Berê me digot self-determînasyon tenha çareserî ye. Lê belê, di dema **Turgut Özal** û demokratîkbûnê de me got, em çima nabin parçeyeke demokratîkbûna Tirkîyeyê? Bi mebesta endametîya Yekîtîya Ewropî, ev yek bû faktoreke berbiçav. Utopyaya Kurdistaneke yekbûyî êdî ne ewqas cazîb bû û herweha mimkûn xuya nedibû. Bi rastî, Tirkîyeyek, ku di pêvajoya demokratîzasyonê re derbas dibe, ji bo cîranên li Kurdistana Iraqê rehetîyek e."

Ew lê zêde dike: "Kurdên me niha dixwazin berê xwe bidin rojavayê" û weha dirêjahî pê dide: "Him ji ber berjewendîyên aborî û him jî ji ber xaçerêya herêmî, kurd dahatûya xwe di Tirkîyeyeke demokratîk de dibînin, ku mafên wan nas bike." Ev maf tên wateya dawîlêanîna cudagerîya etnîk, naskirina nasnameya kurdî bi awayekî giştî -ku mafê xwendina kurdî ya dibistanan jî tê de- û adem-î temerkuz, ku dê rê li xweserîyekê veke. Ji bo wan hemû reformên destûrî divên.

Hevseroka Partîya Aştî û Demokrasîyê BDP ya kurdperwer û parlamentera berê ya Dîyarbekirê **Gülten Kışanak** dibêje: "Me destûreke nû divê ku tê de gotinên hemwelatîyan û demokrasî hebin, lê belê tê de tu referansên nasnameya tirkî nebin." Wê lê zêde kir: "Nasnameya me ji destûra pêşîn a sala 1924ê û vir ve her tim hat paşguh kirin û ev yek sedema nebûna aştîyê dîyar dike."

**Kışanak** jî wekî kurdên din bawer dike ku reformên destûrî divê ji bêçekkirinê bi awayekî serbixwe pêk werin. Ew dibêje bi tenê bi destûreke nû pirsên dijwar ên wekî xweserî dikarin werin nîqaş kirin. Weha dirêjahî pê dide: "Divê herkes bikaribe fikr û ramanên xwe derbibire, herçend ew bibin sedema lihevnekirinan jî. Li Tirkîyeyê ne hêsan e ku mirov tiştan nîqaş bike; lê divê weha nebe." Destûra heyî ya Tirkîyeyê piştî darbeya leşkerî ya sala 1980ê hatiye nivîsandin û heta niha gelek caran hatiye guherandin, divê an ji nû ve were nivîsandin û heger ev yek nebû divê bi awayekî berfireh were guherandin.

Serkeftina 12ê hezîranê ya AKPyê, ku deng vedabû, rê li pêşîya wê vedike ku bikaribe di rêya reforman de bixebite. AKPyê bi rêjeyeke 50 dersedî (an ku bi 326 kursîyên parlamentoya 550 kursî) ku ev yek ji rêjeya beşdarîya hilbijartinan ya sala 1987ê (86.7 dersed) û vir ve bilindtirîn rêje ye. Ji destpêka jîyana pirpartîyî ya sala 1946ê û vir ve AKP yekemîn partî ye ku sê serdeman li ser hev dengên xwe bilind dike.

Lê belê, ev yek jî heye ku serkeftina **Erdoğan** li jêr "piranîya super" -330 kursî- de ma ku heger bi dest xistibaya **Erdoğan** dê bikaribaya bêyî ku bi parlamentoyê bişêwire, destûreke nû binivîse û bikaribaya pergala serokatîyê, ku wî dixwest, ava bike. Lê belê, wî tirk temîn kirin ku partîya wî dê "dilnizm be" û hewlê bide ku ji bo reformeke destûrî li lihevkirineke berfireh bigere. Heger AKP nikaribe digel partîya herî rastgir a Partîya Tevgera Neteweyî (MHP) li hev bike, ku 13 dersedê dengan wergirt û xwedî 54 kursîyan e, wê demê naçar bimîne ku digel partîya sereke ya muxalefetê an ku digel Partîya Komarî ya Gel (CHP) ya sekuler tevkarîyê bike, ku 26 dersedê dengan wergirtibû xwedî 135 kursîyan e. (4) BDP jî parlamentoyê xwedî 36 kursîyan e.

Le belê ji hezîranê û vir ve BDPyê ji bo protestokirina di çarçoveya qanûna li dij terorê de destgîrkirina şeş endamên xwe yên hilbijartî, rûniştinên parlamentoyê boykot kirin. Li hember şidetê, ku her berbelav dibe, vegera BDP ya parlamentoyê ya 1ê cotmehê ji bo hêvîyên reformên destûrî xwedî girîngîyeke jîyanî bû, ku pevajoyê reformê dikare rê lê veke ku hikûmet û kurd dawî li pevçûna salan bînin, ku ji 1984ê û vir ve tê de 30 hezar kes hatin kuştin.

## Dawîya hêza milan ya li hember artêşê

Derbasbûna Tirkîyeyê bo dewleteke demokrat û rêveberîya sivîl bi piranî vê havînê pêk hat. Di 29ê hezîranê de serfermandarê giştî û fermandarên artêşê, hêzên asmanî û deryayî ji nişkan ve dest ji kar kişandin. Ev yek dikarîbû wekî krîzeke mezin were têgihiştin, lê belê pir bi aramî hat pêşwazî kirin, heta bêjin bi xemsarî. Erdoğan bi lezgînî serfermandarekî nû û apolîtîktir tayîn kir. Di marketan de tu pêl ranebûn.

Destjikarkişandin mohra xwe li hemleya dawî ya Tirkîyeyê bo demîlîtarîzasyonê da. Di navbera artêş û AKPyê de ev çendîn sal in ku têkoşînek hebû. Hewldanên ji bo qedexekirina AKPyê ji ber xebatên ji bo avakirina desthilatdarîyeke olî berevajî bandor kir û populerbûna wê di nav xelk de zêde kir. Ji ber tawanbarîyên ji ber beşdarbûna planên darbeyê û komployên li dij AKPyê artêş jî qels bû, ku niha di çarçoveya dozên ***Ergenekon*** û ***Balyozê*** de darizandin pêk tên. (5) Hevdem, li Tirkîyeyê veguherîneke siyasî jî ji zû de dest pê kir: Ji bo endametîya YE diviyabû "Lijneya (metna îngîlîzî de 'state' an ku dewlet/rewş hatiye bi kar anîn lê bawer im mebest lijne ye an ku MGK) Ewlekarîya Neteweyî" were belav kirin, ku pê artêşê hêza xwe datanî, nemaze di dema serokatîya siyasî ya qels a salê 1990ê de.

Fermandarên artêşê çima dest ji kar kişandin? Serfermandar **Işık Koşaner**, ku serdema wî ya fermandarîyê dê di tebaxa 2013ê de biqedîya, dîyar kir ku ji ber destgîrkirina "neheq" a hevkarên wî, ji bo wî êdî "ne mimkun e... ku bikaribe xizmeta xwe berdewam bike." Gotinên wî fikareke berfireh a Tirkîyeyê nîşan dida, ku li gor vê fikarê meşrûbûna doza Ergenekonê ji ber delîlên têrnekir û destgîrkirinên çawalêhato (ku gelek rojnameger jî hatin girtin) û hêdîbûneke bêdawî tê kêm kirin. Piştî ku nêzîkî ji sisiya yek a hemû generalan û gelek efserên teqawît hatin girtin û darizandin, **Koşaner** xwest ku rutbeya 250 efseran, ku tên darizandin, bicemidîne; lê belê hikûmetê xwest ku wan teqawid bike.

Niha weha xuya dike ku hêzên çekdar ên Tirkîyeyê bi yekîneyên kêmtir profesyonel ji nû ve werin saz kirin da ku pêdivîyên Tirkîyeyê bi cih bîne, da ku bibe xwedî rêvebirîyeke sivîl ku di rêya modernîzmê de ye. Dibe ku di statuya serfermandar de, ku li hember serokwezîr berpirsîyar e û herweha di statuya hin wezîrên hikûmetê de hin guhertin pêk werin. (6) Di meha tebaxê de, sê rojan piştî destjikarkişandina fermandaran, di dumahîya kombûna Şûreya Bala ya Leşkerî (YAŞ) de **Erdoğan** sînyalên pêwîstîya bi guhertinê dan. Bi awayekî sembolîk, Erdoğan wekî berê li kêleka serfermandar rûnenişt û di şûna wê de bi tena serê xwe li ber masê rûnişt.

Dadgehên leşkerî dikarin bi dawî werin û budçeya leşkerî dikare ji bo çavdêrîya parlamentoyê were vekirin. Reforma herî girîng guhertina madeya 35 a Qanûna Xizmeta Navxweyî ye, ku hîmê qanûnî yê hemû darbe û hewldanên darbeyê pêk tîne û "peywirê" dide artêşê ku komarê li hember xeteran biparêze. Partîyên siyasî jî piştgirî didin guhertina vê madeyê ku êdî artêş nikare "xetereke" weha bi nav bike, lê belê heger jê hat xwestin alîkarîya hikûmetê bike.

Piştî deh salên wekî serokwezîr, **Erdoğan** û AKP niha di dîyarê hêza xwe de ne. Ew çavdêrîya derbasbûna Tirkîyeyê bo demokratîzasyonê û desthilatdarîyeke sivîl dikin û welatekî refahê ava dikin, ku xwedî azwerîyeyê ku li Rojhilatê Navîn bibe hêzeke sereke. Herçend ev yek ne hêsan e jî, reformên destûrî û naskirina mafên kurdan -ev yek du xal nabin ku ji hev werin cuda kirin- ji bo wan gavên herî girîng in, ku di rêzê de ne.

* Wendy Kristiansen, gerînendeya edîtorî ya Le Monde diplomatique îngîlîzî ye û nivîskara pirtûka Rêwîtîya bo Dilê Cîhana Îslamî: Civakên îslamî yên cur bi cur, Editions du Cygne, Paris, 2011

1 "Çiçek li ser gotûbêjên digel PKKyê wekhevîyên IRA, ETA nîşan da", *Hürriyet Daily News*, Istanbul, 15 îlon 2011

2 Fikret Bila, "Asta ku PKKyê danî ", *Hürriyet Daily News*, Istanbul, 27 îlon 2011

3 Binihêre Wendy Kristianasen, "Serkeftina hêza nerm a Tirkîyeyê", *Le Monde diplomatique*, îngîlîzî, sibat 2010

4 Serokekî nû, Kemal Kılıçdaroglu, şûna Deniz Baykal girt. Lê belê herçend wî soza reforman dabû jî parçebûna navxweyî ya CHPyê nehişt ku partî xwe ji rabirdûya xwe ya dewletparêz dûr bixîne

5 Ergenekon û Balyoz rêxistinên dizî ne ku ji 2003ê û vir ve bi komployên li dij dewletê tên tewanbar kirin. Ew versîyona tirk a Gladyoyê ye, toreke nepenî ye ku li hember dagîrkerîya Sovyetan ji alîyê NATOyê ve li Ewropaya Rojava hatiye bi cih kirin, lê belê li Tirkîyeyê wê piştî dawîlêhatina şerê sar jî berdewam kir

6 Da ku di civînên NATOyê de pirsgirêkên protokolê rû nedin wezîrê berevanîyê di heman demê de digel serfermandar nakeve kombûnan

Wergera ji îngilîzî: Celîl Kaya

www.arsivakurdi.org

### Li pey lêkolînên enerjîyên nû

# Çîn ji ber komira xwe nexweş e

Any Bourier *

Têkilîya di navbera Çîn û komirê de ku ji hezar salan ve dest pê kiriye, di sedsala 21ê de ji modernîzasyona welêt re bû gaveke rastîn. Felaketa ekolojîk ku aşîkar e, ji ber sedemên gazên serayê li atmosferê belav dibin û belengazî û bobelatên civakî peyda dikin, sebeb jî; awayên derxistina maden û mineralan e, lewma divê ku hikûmet metodên xwe yên kevin di ber çavan re derbas bikin û awayên nû û nûjentirîn ên peydakirina enerjîyê bibînin û bi kar bînin.



SERPIL ODABAŞI: **Neçû-ma**, 40 x 70 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

Trêna bilez ya Çînê (*China Rail Highspeed* – li vir jêre ***CRH*** dibêjin) ji Pekînê dide rê û saetê bêtirî sêsed kîlometroyan lezê dike da ku bigihîne paytextê Şanxyiyê Taiyuanê. Ev herêma bakurê Çînê bi rêyên xwe yên mişt, çûnûhatina xwe ya bêserûber a kamyonên zêde barkirî yên ku ber bi bajarên mezin ve diçin, demeke dirêj herêma sereke ya hilberandina komira welêt bû. Mongolistana hundir ew di vê mijarê de ji textê wê xist. Gund li pey hev tên hemû cûn û xembar in. Li ser her tiştî, yan jî hema hema li ser her tiştî mohra komirê heye: Dîmenê hawîrdorê, lê belê herweha deverên şên, xweza û mirov –yên ku beden û rûyên wan ji ber karê di kanan de reş bûyî– û rengê avê jî: Şuştina komira ji kanan tê derxistin, her roj bêtir çeman, herweha rezervên avê yên bin erdê dilewitînin, bi vî awayî dikin ku av bi kêrî avdanîyê û bikaranîna nav malê neyê.

Tevî modernbûna hê jî dewam dike, alîyê derve yê kanan di rastîyê de ji sedsalan ve neguheriye. Li pêşîya ketina wan lodên mezin ên komirê li benda kamyonan in. Li ser texteyên reş ên bi dîwarên avahîyan ve kirî, ew avahîyên weke buroyên birêveberîyê bi kêr tên, peyamên ji bo berpirsyarên komên xebatê, şîara rojê yan jî bibîrxistina biryarên dawî yên Birêveberîya Dewletê hene; birêveberîya ku xwedîya hêza mutleq der barê ewlekarîya kanan de, ya ku niha **Zhao Teşuyî** birêveberê wê ye. Qezayên di hundirê bîr û kanan de sala 2010ê ji nû ve dest pê kirin, zêde bûn, li gor daneyên fermî 1 403 qezayan rû da, 2 433 kes mirin. (1)

Çîn çiqasî bixwaze zêdetir santralên nukleer ava bike û hê jî avakirina barajan plan bike jî, komir madeya sereke ya hilberîna elektrîkê (3) ye û birêveberîyên şirketan, bi taybetî yên herêmê, wê tercîh dikin. Li gor komisyona şaredarîyan a pêşketin û reformê, pekînîyên ku her diçe zêdetir komirê serf dikin, di 2010ê de salê 10 ton komir bi kar anîn û wê di 2015ê de 20 ton komir serf bikin. Sê tişt dibin sedema vê rewşê. Çîn yek ji hilberînêrên sereke ya komirê ye ku bi piranî li bakur û bakur-rojhilat tê dîtin, li wir deranîna wê zêde zehmet nîne; li gor texmîna Birêveberîya Dewletê ya ji bo ewlekarîya kanên komirê, rezervên komirê 118 milyar ton in. Li alîyê din sektora komirê hejmareke zêde ya karkeran dixebitîne û dike ku bersiva pêdivîya bi kar ya ku li gundan timî zêdetir dibe, bi hêsanî bê dayîn. Sedema dawî jî ew e ku serfkirina madeyekê ku derxistina wê pir erzan e, awayê herî baş ê hilberandina enerjîya erzan e û di heman demê de pêşketina aborî bi leztir dike.

Ji deh salan û vir ve, bi xêra derfetên ku têkîlîyên nû destpêkirî, bi welatên bi pêş dikevin ên *Afrîkayê* û bi welatên *Amerîkaya Başûr* pêşkeş dikin, pirrengkirina çavkanîyan di rojevê de ye. Li van welatan ev madde têra xwe belav e. Kanên servekirî yên *awustralî* jî bala ***Pekînê*** dikşînin. Lê heta niha hilberîna komirê ya neteweyî % 60ê pêdivîyê misoger dike. Li gor hejmarên fermî, ku ji alîyê ajansa fermî **Xinhua** ve hatine weşandin, li tevahîya welêt qederê deh hezar kanan dişuxilin. Lê li gor bisporan, eger em kanên qaçax jî li ser hejmara van kanan zêde bikin, hingê dibe ku hejmar du qat zêde bibe.

Li ber vê rewşa ku weke xirab tê hesibandin, çend projeyên hêvîbar ji bo navendîkirina hilberînê û avakirina kanên derxistina komirê yên mezin hatin amade kirin, da ku yekitîya hilberînê pêk bînin. Di 2006ê de *Komisyona Reform û Pêşketina Neteweyî* bernameyeke ku divê di 2015ê de biqede weşand. Tê de avakirina pênc an jî şeş komên dêw ên şirketên şixulandina kanan heye ku wê bi rêya fuzyona şirketan an jî bi girtina şirketên piçûk li herêmên sereke yên hilberîner pêk bê. Bi vî rengî ***Heilongjiang Longmei Holding Group***, yek ji van komên dêw ên şirketan, hat saz kirin û 88 hezar karkeran dixebitîne. Mînakeke din, *Datong Coal Mine Group* e ku hîsseyên wê li borsaya ***Şangay***ê tên firotin. Di 2011ê de fermî 21 komên mezin hene ku dewlet wan bi rê ve dibe. Ew di encama yekkirina şirketên kanên komirê û girtina bîrên piçûk derketin holê; ev bîrên piçûk ên ku piranîyan wan taybet in, dibûn sedema piranîya qezayan. Bi vî awayî hejmara kanên komirê ku di 1995ê de 87 000 bû, di sala 2005ê de daket 26 000an û di sala 2010ê de bû 12 000.

Di çarçoveya heman hewldanê de, sibata 2010ê projeya vekirina kaneke dêw a komirê li wîlayeta ***Gansu*** hat ragihandin. Li gor hesaban, rezervên ku sûd ji wan dikare were girtin bêtirî heft mîlyar ton in. Bi ferehîya xwe ku digihîje 1100 km2, divê karibe salê bist mîlyon ton komirê hilberîne. (4) Navê ***Ningzheng*** lê tê kirin, ku ji navê bajarê lê ye hatiye girtin û ji niha ve weke kana komirê ya herî mezin a dinyayê tê nirxandin.

Ji bo biryarên fermî bidin qebûl kirin û ji bo bîna raya giştî fireh bikin, ev projeyên dêw û ev daxwaza navendîkirinê timî ligel argumanên ewlekarîyê tên pêşkeş kirin. Li ser dîwarên kevirî yên kanên li ***Şanxî*** yan jî ***Henanê*** nivîsên wisa tên dîtin: *"Ewlehî prensîpa me ya sereke ye"; "Werin em reforma kanan a pêk tê pîroz bikin"*. Lê belê sazkirina şirketên dêw bikêrbûna xwe piştrast nekir. Herçiqasî hejmara rekor a qezayên mirovkuj ya sala 2009ê (6 995 kes mirin) bilindtir nebûbe jî, li hember ji nû ve zêdebûna hejmara qezayan di van du salên dawîyê de hêrsa xelkê radibe. Di 2007ê de li bakurojhilatê welêt, cara yekem malbatên kesên di teqîneke gazê ya grîzû de jîyana xwe jidestdayî pere standin. Biqasî 25 000 euroyan tezmînat dan malbatên karkerên kanan ên mirî. Ji hingê ve tezmînata malî bêtir bûne adet. Lê belê tezmînatê tehlûkeyeke din ji bo karkerên kanan derxist holê: Mafyayên herêmî.

Hin çete ji bo li şûna wan tezmînata rayedarên dewletê yan jî xwedîyê kanan didin, bistînin, bûne bisporên kuştina karkerên komirê û van kuştinan weke qezayan –ên ku hejmara wan her diçe zêde dibe– nîşan didin. Çend skandal li bajarên ***Hebeî, Yunan*** û ***Sişuan***ê derketin holê. Bi alîkarîya patronên kanan, çeteyên organîzebûyî rêzekuştinên di kanan bi xwe de û di cihên ku ev *mingong* (karkerên xizan) lê dimînin, bi hesanî û bêtirs pêk tînin. Di sala 2003ê de sînemavan **Lî Yang** di fîlmê dirêj bi navê *Blind Shaft* de behsa wê felaketê dikir, ku dihat serê karkerên komirê. Ev film adaptasyoneke romana bi navê *Le puits* [bîr] ya **Liu Quingbag** e. (5) Ev filmê ku li derveyî welêt gelek xelat wergirtin, yekem film e ku zêdebûna van kuştinên di tarîya bin erdê de diqewîmin, şermezar dike. Di bin erdê de (di kanên komirê de) qanûna herî bi hêz ferz e. Em dikarin behsa skandala sala 2010ê medyaya çînî ew eşkere kirî, bikin: weqfeke taybet a hewandina kêmaqilan 62 kesên kêmaqil kirîn, paşê ew firotin da ku li kanên komirê yên ***Sîşûanê*** weke kole werin xebitandin. Mehkemeya sûcdaran gelek hêjayî dîtinê bû.

## Qirêjkirin, wek her kesî.

Li hemberî nerazîbûn û hêrsa zêde ya gel, desthilatdarîyê dest avêt tedbîrên hişktir. Piştî teqîneke grîzû ya ku li **Guangxiyê** îlona 2010ê bû sedema mirina 35 kesan, serokwezîr **Wen Jiabao** bi awayekî fermî fermana daketina zemîna kanan ragihand xwedîyên kanan, ji wan re dihat gotin: "*Wezîfeya we ye ku hûn rîsk û xeteran bi karkerên xwe re parve bikin da ku hûn misoger bikin ku rêz ji qaîdeyên ewlekarîyê re tê girtin*".
Bi awayekî kêmtir spektakuler, lê belê bêguman bitesîrtir hukûmet dixwaze derxistina komirê misoger bike, bi girtina gaza metanê ya ku berpirsyara piranîya teqînên kujer ên grîzû ye. Li gor birêveberê rêxistineke şêwrê ya di wesayeta hukûmetê de ***Chinise Coal Information Instituteê***, Huang Shengchu, "*Çînê biryar daye ku ji bo teşwîqkirina ji gazê paqijkirina kanan berîya derxistina komirê, her sal qederê 200 mîlyon euroyan bide*". Metana ku bi vî rengî hatî bidestxistin, ber bi santralên elektrîkê ve tê veguhestin û li wir bi awayekî parzûnkirî dikare weke sotemenî were bi kar anîn. Hin ezmûn jî encamdar bûn, weke ya ku li **Jînşengê** li wîlayeta ***Şanxiyê*** pêk hatî; li wir ji 2008ê ve navendeke girîng a dabînkirina metana ji kaneke komirê ya herêmî, dixebite.

Lêgerîna li çareserîya teknolojîk ji bo têkoşîna li dijî acizîyên ji bikaranîna zêde ya komirê ne nû ye. Ji gelek salan û vir ve santralên termîk ên ku li gor teknîka hûrkirina komirê ya derdorê pir qirêj dike dixebitin, bûne armanca protestoyên parêzvanên jîngehê. Ji bo ku îmaja xwe ya welatê bi hezaran kulekên dûyê xwe yê bi bîhna kukurdê berdide hewayê tune bike, desthilatdarîyê çareserîyeke guncav a ji bo astengkirina qirêjkirina hewayê di hostetîya teknolojîyên "komira paqij" de dît, di vê demê de ku Împeretorîya Navîn [ango Çîn, têbînîya wergêr] veguheriye welatê herî zêde CO2yê berdide hewayê. Çînê bi şewitandina *"super-krîtîk"* dizane, ku pê hilma pir bi şid dewisandî randimaneke çêtir û kêmkirina gazên tesîra serayê dikin, mumkin dike. Ew mehê santraleke bi vî rengî ava dike bi buhayekî ku % 30ê kêmtir e ji yê santraleke adetî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê.

Bi her halî, heke birêveberan protokola **Kyotoyê** mohr kiribe jî, ew difikirin ku mafê wan ê heman îmtiyazên dîrokî heye ku welatên pîşesazîya xwe temamkirî ji bo aborîyên xwe bi pêş bixin, jê sûd wergirtibû; encama vê berdana hewayê ya bêtir CO2yê jî be.

Li gor ***Greenpeaceê*** *"berdana hewayê ya gazên tesîra serayê dikin ji niha heta 2030ê dikarin du caran li berê zêde bibin û bigihêje salê 3 û 4 mîlyar tonan"*. (6) Divê mirov qirêjkirina avê jî li vê zêde bike, ***Greenpeace*** dibêje: "*ji bo her tona komira hilberandî 2.5 ton av tê lewitandin û ji ber vê yekê çavkanîyên avê kêm dibin. Ava ku ji bo şuştina komirê tê bi kar anîn û tê avêtin % 25ê tevahîya avên li welêt pêk tîne û mîqdarên mezin ên metalên jehrî jî dihewîne.*" Encamên pêwendî tenduristîyê yên dramatîk ên vê qirêjbûnê hene: Li gor lêkolîneke OECDyê 190 mîlyon mirov mexdûrên nexweşîyên ji ber ava qirêj in û her sal 30 000 zarok di encama îshal û zikçûna ji ber qirêjê dimirin. (7)

Rayedarên ku haya wan ji van ziraran heye, hewl didin çavkanîyên enerjîyên curbicur bikin, nexasim jî enerjîya rojê bi kar bînin. Di dema bipêşxistina heftemîn plana pênc salan (2012-2016), hikûmetê weke armanc danî pêşîya xwe ku pirbûna komirê (8) di nav pênc salan de % 17 kêm bike. Ev karekî lezgîn e, lewra komira Çînê para xwe li fetisandina dinyayê zêde dike.

* Rojnamevan, Pekîn

1 *China Daily,* Pekîn,10ê gulana 2011ê

2 Sala 2010ê, enerjîya nukleer % 1.1 hilberîna elektrîkê ya Çînê pêk dianî. Ji niha heta 2015ê yan jî 2020ê divê % 4ê pêk bîne

3 Santralên bi komirê li Çînê % 83yê elektrîkê, li Awustralyayê %80yê, li Hindistanê % 70yê û li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê hinekî bêtirî %50yê elektrîkê dabîn dikin

4 Kan wê ji alîyê şirketa Shengua Zhungeer Energy Company were xebitandin. *Bixwîne* "China approves Gansu coal mining plan (Çîn plana kana komirê ya Gansuyê erê dike)", *Peoples's Daily*, Pekîn, 8ê sibata 2010ê

5 Liu Quingbang, *Le Puits (bîr)*, Bleu de Chine, Parîs, 2003. Film li Çînê hatibû nîşan dan

6 Mao Yushi, Sheng Hong, Yang Fuqian, "The true cost of coal (berdêla bi rastî ya komirê)", Greenpeace, îlona 2010ê

7 Rêxistina Hevkarî û Bipêşketina Aborî (OECD), "Examen environnemental de la Chine 2007-2008 (Ezmûna Jîngehî ya Çînê 2007-2008)", Cenevre, 2008

8 Pêwendîyên di navbera bermayeyên CO2 û hilberandinê de

Wergera ji Îngilizî: Luqman Guldivê

Kongreya Amerîkayê û Qesra Spî cara yekem e ku wek hev difikirin, li hember Çînê tedbîrên wisa digirin ku ev îş dikare şerekî bazirganîyê peyda bike. Li gel zahmetîyên îroyîn yên konjukturel yên Washingtonê, DYA bi zahmetî kêmbûna şiyana xwe qebûl dike û vê rastîyê danaqurtîne. Bi taybetî li herêmeke wisa ku welatên Rojava, wek baxçeyên mala xwe dizanîn.

## BRÎTANÎYA MEZIN, DEWLETÊN YEKGIRTÎ YÊN AMERÎKAYÊ, ÇÎN…

# Împarator çawa têk diçin?

PHILIP S. GOLUB *

Şiyana Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê, di çi şertan de, çawa durust bû? Çawa di nava sed û pêncî salan de kolonîyên kevin yên brîtanîk, di warê aborî, leşkerî û çandî de ewrûpî derbas kirin? Bi awayekî du alî, tevgera belavbûn û pêşketina aborî û kolonyalîst; ***Ewrûpaya Rojava***, di sedsala 19an de, dibe navenda biryarên girîng yên navneteweyî û newekhev: sîstema cîhanê ya berê ku ne sentralîze û bê hiyerarşî bû, sîstema wan ya cîhanî bêtir otonom bû, *(Împeratorîya Osmanî, Ewrûpaya Rojava, Çîn, Împeratorîya Moxolî...)* Sewîyeya wan ya pêşketina aborî kêm hindik wek hev bû, li Ewrûpaya Rojava, sanayî û kombûna şiyan û dewlemendîyê sîstema aborî ya cîhanê bi temamî karakter guhert.

Berfirehbûna aborî û ya fezayê ya ***Ewrûpaya Rojava*** û yên berdewamên wan kolonîyên Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê (DYA), bi hev re beşdarî dînamîkeke kollektif dibin. Bi rengekî gelemperî ev herdû babet berfireh bûn, di pêvajoya vê sedsalê de xwe dikin yek, ji bo bikaribin strukureke hiyerarşîyeke nû ya têkilîyên navnetewî ava bikin, ku ji alîkî ve dabeşî li du waran dibin: yên "navend" dagirker, serkar û serdest, Ewro- Atlantîk dagirker, ji alîyê din yên li qiraxan dimînin yanî yên li "periferîk"ê, kesên bindest û hewcedar.

Bi taswîra wan ya ronakî ya li ser dahatûya dinyayê û globalîzasîyonê, **Karl Marx** û **Friedrich Engels** di wê demê de, di salên 1848ê de bi zanebûn digotin: "*Berfirehbûna bazara cîhanî karakterek navnetewî û kozmopolit dide malên tên avakirin û xerckirin û bikaranîna wan. Vê yekê karaktera bazara sanayî ya neteweyî şkand û ew anî hola navneteweyî."* Disa weha dibêjin: *"Ji cîhê ku îhtiyacên kevn ku ji bo pêwistîyên neteweyî dihatin avakirin, ji îro pê ve pêwîstiyên nûjen tên holê û însan berhemên ji welatên dûr û cûda, ji îklimên cûr be cûr dixwazin. Ji cîye ku sînorên teng û girtî, yên tenê ji bo xwe û di nav xwe de dijîn, tixûb vedibin, netewe xwe vedikin, têkilîyên cîhanî û peymanên navnetewî dest pê dikin. Pêwîstîya insanan dibe pêwistîyeke ku her kes û her netewe pê ten girêdan, unîversalîzm dertê holê"*. (1)

Lê belê, ev sîstema global ku berfireh dibe, ne bi qayde û dûzen e û bê aheng e. Welatên nû sanayî, di destpêkê de bi avantaj bûn; zengînî li cem wan dicivîya, zanîn û bikaranîna zanînê di xizmeta wan de bû û nedihîştin ev zengînî here cîhekî din. Wek ku **Fernand Braudel** bi kurtayî dinivîsand *"Merkez noxteya herî serhukum e, yanî struktura herî qewî ya kapîtalîst ya hemû avahîyê ye. Wek ku perspektifên wan hevdû temam dikin pêwistîyên wan mecbûrî hev in, ger pêwistîya merkezê bi jêrê hebe, dê ji perîferîkan peyda bike, her weha neteweyên dûr jî bi pêwistîyên xwe bi merkezê ve girêdayî ne û ev qanûn ji alî merkezê ve tê tayîn kirin)."* (2)

Herweha yekîtiya aborîya cîhanê di nav zor û şidetê de damezirî. Bi berdewamîya şer û êrişan, îşxalên her dayîm, piranîya herî mezin ya cîhanê kete bin tora berhem û malguhertinên împaratorên metingehkar. Di sala 1750ê de hîn gelek zehîf bûn, (27 milyon) kes di bin hukmên dewletên Ewrûpî de, ev tişt di sedsala 19ê de, di 1830ê de, 205 milyonî derbas dike, 312milyon di salên 1880ê de û 554 milyon di sala 1913ê de. Ji derveyî miletên ku li ser axa van imparatoran dijîn, miletên din yên ku di gotinê de serbixwe ne jî zêde dibin. Lê di bin sîstemek mecbûrî û di bin kontrola derveyî û disiplîna emperîyal, lê ne zêde bi qaîde û rê û rêbaz dijîn. Di destpêka sedsala 20ê de, nêzî nîvîyê miletên dinyayê xwe bi zor û mecbûri di bin nîrê sîstema kar ya bersîva pêwistîyên welatên nûjen- sanayî de didîtin.

### Efsaneya tecrîta amerîkî

Brîtanyaya Mezin, ji derheqê vê sîstemê baş tê û baş nas dike. Di dema xwe de, wek malbata şoreşa sanayî û teknîkî, welatê ku herî pêşketî yê vî warî, heta salên 1890ê, Brîtanyaya Mezin, hakimî deryayê ye û îmalat, bazar û belavkirina wê jî di destê wê de ye. Di nîvê sedsala 19ê de, bi nifûsa xwe ya % 2yê dinyayê Brîtanyaya Mezin, % 53 hesin, % 50 komir û lînyîtê diafirîne û % 50ê pemboyê dinyayê ji bo sanayîya xwe ya tekstîlê bi kar tîne. Bikaranîna wê ya enerjîyê ya wê demê pênc caran ji ya Amerîka an jî Prusyayê zêdetir bû, herweha şeş caran ji ya Fransa û sed û pêncî caran ji ya Rûsyayê zêdetir bû. Bi tena serê xwe, ji sisîya yekê zêdetir bazirganîya dinyayê di destê wê de bû, herweha ji sisîya duduyê afirandinên manûfaktorî; ji sisêya yek bezirganîya deryayê ya dinyayê dîsa di destê wê û bandora wê de bû.

Her çiqas ku di salên dahatû de, Almanyayê paşê di warê sanayîyê de ew qefalt û Amerikayê jî derbas kir, Împaratorîya axa Brîtanîk ji Pasîfikê heta Atlantîka ku di Asyaya başûr re derbas dibû, digîhîşt Afrîka û Rojhelatê Navîn, di wê demê de di salên 1913ê de, ji sisêya yekê gelê cîhanê di bin hîmayeya xwe de dicivand. Di bin vî navê resmî de, Împaratorîyek gelek stûr ya pera ku ji yê xwîyayî gelek mezintir dîyar dibe. Ew nuxteyeke herî hesas ya sîstema dan û stendinê ya tîcareta navnetewî ku navenda wê li Ewrûpayê ye. Londra dilê finans û sermayeguzarîyên navneteweyî ye. Bi pêşketinên berdewam, ev sermayeguzarîyên global ku bi taybetî li navçeyên Amerîkaya Latînî û Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA), di sala 1914ê de, %10ê hatinên cîhanê bi dest dixist.

Berî vê dîrokê, ekonomîstê navdar, **John Maynard Keynes** ji bo ku rewşa aborîya cîhanê ya dawîya sedsala 19ê karibe tehlîl bike, weha digot: *"Mirovekî londonî, dema ku çaya xwe ya sibê vedixwe, dikare di eynî wextê de, bi telefonê ji her derê dinyayê berhem û malzemeyên cûda cûda yên bi qasî ku jê re pêwîst in bi dest xe (...); her weha dikarê malê xwe li her der, di hemû çavkanîyên xwezayî û di hemû şirketên cîhanê de bi kar bîne (...) dikare xizmetkara xwe bişîne bankaya cîran û kannên gelek giranbuha bi qasî ku jê re lazim be peyda bike; û her weha dikare ji dîyarên xerîb jî, bêyî ku ziman, dîn û ededên wan binase, dikare bi xêra zengînîya pereyan hemû tiştên dilê xwe bi dest xe"*. (3) Ger hemû rûniştevanên Londonê karibana ji xwe re xizmetkar bigirtana, ev gotina navdar, ku ji pirtûka wî derketîye -Encamên aborî yên aşîtîyê- bi awayekî eşkere ramanên imtîyazkaran diyar dike, ev e ku cara yekem cîhanîbûnî (mondialisation) ava dibe.

Ev rewş, bi carekê de di sala 1914ê de, dawî lê tê, di dema ku yekîtîya nîjadperestî û qaweta leşkerî derbeyeke mezin ya dawîn li pergala navneteweyî ya ji alî Ewrûpayê ve îdarekirî ya sedsala 19ê da. Herba cîhanê, dubendîyên di navbera mantiqa neteweyî ya êrîşker û belavker û ya mantiqa navneteweyî ya kapîtalîzmê. Vî tiştî împraratorên Ewrûpî hejand, wek ku dibêje serokê konservator û muhafezekar yê brîtanî **Lord Cruzon**, "pêşveçûnek ku zor tê bawerkirin" yê qawet û bawerîyên li hember kolonîyalîzmê. Ji alîkî ve li Rûsyayê rê li şoreşa Bolşevîk vekir, ji alîyê din de jî meydan ji faşîzmê re vekir. Ya herî girîng jî, bi taybetî ku Ewrûpa, axa kevin bi vêya gelek westîya û ecele ecele xwe avêt hemêza Amerîkayê (DYA).

Ev mesele li vê derê dibe destpêka xelekeke girîng ya zencîra mondîalizasyona yekem. Tew berî serxwebûna 1776ê, kolonîyên brîtanîk li bakurê Amerîkayê wek şaxên bingehîn yên sîstema aborî ya alîyê din yê Atlantîkê, ku li ser bingeha ku ji mal û bazirganîya çavkanîyên kolonîyan dihatin avakirin. Piştî serxwebûnê, Amerîkayê roleke gelek mezin di çûn û hatinên wî alîyê Atlantîkê de leyîst.

Endustrîya navneteweyî ya pembo vê pêşketinê gelek xweş dîyar dike. Ber bi 1850ê, ev sewîye hatibû % 20ê temamîya net ya îxracatê û % 50 qîmetên îxracata brîtanîk. (4) Di eynî demê de, Amerîka bi xêra çandina pembo li hêla başûr bû welatê yekem yê gîhandina pembo. Di salên 1820ê de, bû çavkanîya % 20 ya cîhanê di warê gîhandina pembo de. Çil sal bi şûn de, ev hêjmar bû ji sisêya dudo, berî ku şerê sivîl yê hundurîn sîstema koletîyê ji holê rake: li gor dîroknas **Morton Rothstein**, ji alî debarê ve, ji alî beşên afirarandinê ve û ji alî karkerên ku bi zorê tên xebitandin ve, başûrê Amerîkayê di wexta xwe de, ji alî aborîya çandina pembo ve, yê herî girîng bû, lê ji ber vê rewşê, ev tespît hinekî bi guman e.

Ji sedsala 19 an ve, têkilîyên Amerîkayê û Ewrûpayê bê şik bi hev ve girêdayî ne, ên tenê bi têkilîyên bazirganî, her weha bi çûn û hatinên sermaye û mirovan yên navnetewî jî, bi hev re girêdayî bûn. Heta destpêka nîvîyê sedsalê, ev çûn û hatin ji bicîhbûnên bi zordestî û bo rêk û pêkirina kolonîyan rê vekirin. Ev dema dagirkarîya erdan bê sekin, pêwist e bê zanîn wek dagirkerek kolonîyalîst yê ji hêla ewrûpîyên trans-osyanîk, yanî ewrûpîyên ji alîyê din yê Okyanûsê. Ev tişt reha xwe di nav temsîlkirina çand û hemnîjadîya kolektîf ya hemû civatên dagirker ya tevgera global û dagirker ya wê demê de dibîne.

Tevayî ku Amerîkayê bi îzolasyonîzma xwe dihat nasîn, Amerîka (DYA) di bilindbûn û pêşketinê de cîhekî gelek mezin di warê navnetewî de girt: Ew gelek caran ketin nava operasyonên bêyî ku kes wan dawet bike, li hember kolonîyên nû, gelek caran li kêleka hêzên leşkerî yên ewrûpî: Di navbeyna 1846ê û 1898ê de, Amerîkayê (DYA) 28 mudaxeleyên lêşkerî li Amerîka Latînî pêk anîn û 19 caran dîsa mudaxeleyî herêmên Asyaya Pasîsîfîk, herweha di nav xwe de jî li hember çermsoran li ser axa xwe, li parzemîna Amerîkayê ev tişt dimeşandin.

Şerê li hember Îspanyayê, di sala 1898ê de, dagirgehîya Kuba û Filipîn, wek rêvekirinek ji bo dagirkirinê tê hesabkirin, ji ber ku piştî sala 1945ê ev tişt gelek berfireh bû. Di nîvê sedsala 19ê de, dagirkerên amerîkî îşgal û berfirehkirina erdan ji xwe re wek *bexşa Xwedê* dihesibandin. (5) Ev tişt, ji bo mezinbûna xwe li parzemînên cîhanê şanî bidin û jê zêdetir vê li hemû cîhanê bela bikin û bi herkesî bidin zanîn. Ev fikirê dagirker, ji alî rojnamevanekî başûr, **John O`Sullivan**, ji bo ku karibin vegirtina *Teksas*ê wek heqê xwe bidin nîşandan, ku paşê di salên 1845ê de bû dewletek koledar û her weha bikaribe şerê li hember Meksîkayê ya sala 1846ê biheq derxe, ev raman û stratejî ji wan re bû fersendek ku piştî şerê sivîl yê hundurî, di salên 1890ê de, karibin erdên nû di çarçeveya navneteweyî de dagirin.

Piştî ku Amerîkayê di warê manufaktorîyê de serdestî girt destê xwe, (% 23,5ê berhemdarîya cîhanê, ev tişt % 18 bû li Britanîya yê di salên 1900ê de) dest pê kirin dîroka cîhanê li gor hêza xwe ya nû, ji nû ve tercûme bikin û ev fikir ji alîyê hemû dagirkeran ve wek pêvajoyeke dirokî û berdewam û cîhgirtina împaratorên demê berê ji alî Amerîkayê dihat qebûlkirin .

Di wexta xwe de, hevalekî **Theodore Roosvelt** ku terafdarekî bê şert yê ekspansyonîzmê bû û serkevtina mezinbûna Amerîkayê ji wexta xwe zûtir beyan dikir, di sala 1900ê weha digot : *"Tu sebeb tune ku Amerîka (DYA) rojekê bibe navendeke zengînîyê û bi hêza xwe ji Romayê, ji Konstantînoplê û ji Brîtanîyayê bi qûdrettir û mezintir nebe"*. (6)

Herdû şerên cîhanê, ku bi wan Amerîka (DYA) bi ser ket û zengîntir bû, ji alîkî ve vê fikra jorîn teyîd dike. Çend roj piştî şer, elîtên Brîtanya Mezin dest pê kirin fikra *"Pax anglo-saxonica"* parastin, yanî raste rast parvekirina "berpirsîyarîya" cîhanî bi Yekîtîya Amerîkayê re. Lê belê Amerîkî ku dest pê kiribûn bibûn navenda fînans, dirav û fabrîkeyên cîhana Rojava, ji nuha ve xewna "*Pax Amerika"*yê didîtin.

Di sala 1939ê de, enternasyonalîstê mezin **Walter Lippman** weha digot : *"Di dema neslê me de, bûyerek herî girîng ya diroka însanîyetê pêk hat. Hêza herî mezin ku medenîyeta rojava temsîl û kontrol dike, ji Atlantîkayê derbasî alîyê din bû" "Roma di dema antikîyê de çi bû, Britanya Mezin di dema modern de çi bû, Amerîka jî, ji bo dinya siberojê ew e "*. (7)

Sala 1940ê, berî ku Amerîka (DYA) têkeve şer, weşangerê amerîkî **Henry Luce** dîyar dikir ku *"ku ev bûyer, ji bo Amerîkayê bûyereke sedsale ye"*. Her weha serokkomar **Harry Truman** di sala 1946ê de, eynî fikrê diparêze û dibêje ev bûyer, nîşân dide ku Amerîka bû berdewama împaratoran. *"Ji dema Îrana*



SERPIL ODABAŞI: **Penaber**, 50 x 70 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

*Darîusê 1., Yûnana Îskenderê Mezin, ji Brîtanya Mezin ya Viktorîa, tu netewek an jî grûbek netewe, berpirsyarîya ku li ser milê me ye ne girtîye ser milê xwe".* (8)

Piştî sala 1945ê, Amerîkayê (DYA), di navenda dunyayê û li zîrweya bilindbûnê de xwe dibîne: wan Ewrûpa qat qat derbas kirin, aborîya kapîtalîst ya cîhanê modernîze kirin û ji nû ve strukture kirin. Herweha sîstema yekîtî û hevalbendîyên navneteweyî û ewlekarîyê qewîn kirin û dezgeh ava kirin . Wek mînak NATO, ku îro jî tesîra xwe berdewam dike. Li gel ku cîhan bibû du beş, di navbeyna blokên sosyalîst û komunîst de jî, salên piştî şerê cîhanê, Amerîkayê dîsa bandora xwe domand û serdest derket. Ev her weha heta salên 1960ê û zêdetir jî dewam kir. **Raymond Aron** (sosyologê mezin) di vî warî de : *"wan xwe mezinên dinyayê didîtin û ji vîya jî gelek haydar bûn"*. Tam tersê bawerîyên zû îfadekirî "ketin" a salên1970ê û 1980ê, piştî şerê sar, îro xwe dîsa di dema duwem ya mondîyalîzasîyonê de dibînin. Tenê bi serê xwe, wek "hêza super" di aborîyeke kapîtalîst ya global de, cîhe xwe digire.

Amerîka (DYA), *"wek hêza super ya aborîya kapîtalîzma global",* elîtên wê, ji nuha ve xewna *"sedsaleke nû ya Amerîkayê"* dibînin. Di sala 1998ê de, **Zbigniew Brzezinskî** beyan dikir ku: îro bi qaweta xwe li dinyayê tu cîh tuneye ku Amerîka li wir ne amade be û ew di vê warê de qaweta tenê ne. (9) Sê sal bi şûn de, di sala 2001ê de, **Henry Kissinger** weha digot : *"tesîra Amerîka eynî wek împaratorên berê berjêr dibe."* ev bawerî ji alî gelek kesan ve dihat parastin. (10) Di sala 2003ê de, profesor **John Ikenberry**, weha digot : *"Ferqek bê sînor, mezin ket navbeyna qawetên mezin, ya Amerîka û hemû dewletên din, piştî salên 1990ê, Amerîka di diroka dunyayê de bû hêzeke wisa ku tu hêz hewqas mezin nebû ".* Ji alîyê xwe ve, *"Neo konservator weha difikirin ku ew seroketîya dewletekê normal nakin, lê ew li ser împaratoreke dinyayî ne".* Vê dema serkevtinê zêde neajot. Di wir de du şer û krîzek aborî û fînansê derbas bû. **Barack Obama**, dixwaze vê yekê ji nû ve îdare bike û "sedsaleke Amerîkayê" (11) li dar xe, berpirsyarên emperiyal xwe li ser vê ramanê dikin yek. Hemû bawer in ku ev sedsal dê bibe sedsaleke nû ya Amerîkayê.

Wek du dîrokzanên navdar yên împaratorîya Brîtanîk weha digotin: *"berpirsîyarên împratorên mezin, nikarin bifikirin ku dema ku dawîya împaratorîya wan tê, pê re dawîya dinyayê nayê, nikarin bifikirin ku vê qawetê bi kesên din re parve bikin".* Halbûkî pêvajoya îro, bê şik ber bi sîstemeke dinyayê ya piranîya qawetan û polîsentrîzmê ve diçe. Di van deh salên dawîn de, derketina holê ya welatên Asya û hinek welatên paş kolonyalîzmê û welatên wek Çînê rewşa sîyasî ya cîhanê guhertin, rolek din di sîyasetê de peyda kirin, ev rol jî, mirov dikare jê re bibêje "navenda nîv otonom ya kapîtalîst a cîhanê". Vê sîstemê hesab û şêweyên xebata sîyasî ya navnetewî dan guhertin. Ev navend, ji du sed salan û vir de, li Ewrûpa û Rojava bû, lê dest pê kirîye hêdî hêdî cîh diguhere. Dinya ji nuha pê ve dê bibe sîstemeke bi gelek navend. Amerîka (DYA), bê guman ji nuha pê ve jî dê wek welatekî bi qudretek gelek mezin berdewam be. Lê ji nuha de, di nav sîyeseta navnetewî de pêwîst e hesabên welatên din jî bike û haya wî ji rola wî ya ku biçûk dibe hebe, mecbûr e fêrî parvekirina qudret û şiyanê bibe.

* Profesorê Universîteya Amerîkî ya Parîsê (AUP), nivîskarê gotara "çîrokeke din a şiyana amerîkî" (Seuil, Paris, 2011), ku em beşek ji wan rûpelan diweşînin.

1 Karl Marx û Friedrich Engels, Manifeste du Parti Communiste (*Manifestoya Partîya Komunîst*), 1848

2 Fernand Braudel, La Dynamique du capitalisme *(Dînamîzma Kapîtalîzmê),* Arthaud, Paris, 1985

3 John Maynard Keynes, Les Conséquences économiques de la paix, *(Encamên ekonomîk yên Aştîyê)* Gallimard, Paris, 1919

4 Eric J. Hobsbawm, Industry and Empire : From 1750 to Present Day, *(Endustrî û împeratorî, ji 1750 heta Roja îro)* Penguin Books, Londres, 2000

5 Lire Reginald Horsman, Race and Manifest Destiny. The Origins of American Racial Anglo-Saxonism, *(Eslê amerîki yê nijadî anglo-saksonîzm)* Cambridge, Mass., Harvard University Press, 1999

6 Brooks Adams, America Economic Supremacy, *(Serdestîya Amerîkayê ya Ekonomîk)* The Macmillan Company, New York, 1900, p. 51

7 Walter Lippmann, "The American Destiny" *(Qedera Amerîkayê),* Life Magazine, New York, 1939


8 Cité par Donald W. White, " History and American Internationalism. The Formulation from the Past After World War II ",*(Dîrok û enternasyonalîzma amerîkî. Şekildayina piştî şerê cîhanê yê duwem)* in Pacific Historical Review, vol. 58, nf0 ‹ 2, mai 1989

9 Zbigniew Brzezinski, The Grand Chessboard. American Primacy and its Geostrategic Objectives,*(Textê mezin yê setrencê. Pêştirîyetî yên Amerîkayê û armancên wî yên jeostratejîk)* New York, Basic Books, 1998

10 Henry Kissinger, Does America Need a Foreign Policy? *(Gelo pêwîstîya amerîkayê bi siyaseta derve heye?)* Simon & Schuster, New York, 2002

11 Remarques du président Barack Obama devant une séance conjointe des deux chambres du Congrès le 24 février 2009. *(Balkişandina Serok Barack Obama, li pêşberî rûnishtina herdu alîyan di Kongreya 24ê Sibata 2009ê de.)*

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin



SERPIL ODABAŞI: **Diya min şemî**, 50 x 70 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

## TEVGEREK KU NERAZÎBÛNA GELÊRÎ ÎFADE DIKE

# Wall Street di armancê de

JEFF GOODWIN *

Tea Party (Partîya Çayê), ku di 2009ê de ava bû, bû sebeb ku Partîya Komarî nêrînên xwe yên muhafazekar tûjtir bikin. Gelo tevgera "Wallstreetê dagîr bikin", dê bikaribe Barack Obama ji sirîkatîya wî ya finansî dûr bixe?

Krîza gerdûnî ya kapîtalîst di çend salên bihurî de li welatên cur bi cur ên xizan û dewlemend, rê li xwepêşandan, serhildan û hetta şoreşan vekir. Dirûvê ku vê tengezarîya siyasî girt ji alîyê hin faktoran ve hat teşe dayîn, ku xwezaya vebirî ya krîzê jî, ku di bingehê de rû da, di nav de ye. Wekî mînak, di destpêka îsal de li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê (DYA) teserufên budçeyê û êrişên li ser mafê bazarîya komî yê karmendan li hin dewletan bû sedema xwepêşandanan, ku di serî de ***Wisconsin*** dihat, ku lê bi sed hezaran derketin kolanan û avahîya rêveberîya dewletê dagîr kir.

Tevgera civakî ya girîngtir û radîkaltir, ***Wall Streetê Dagîr Bike*** (OWS), niha bilind bû. Vê tevgerê meha çûyî bi dagîrkirina parkeke piçûk a li taxeke fînansê ya ***Manhattanê*** dest pê kir, lê belê talîyê li seranserî DYAyê li sedan bajar û navçeyan belav bû. Ji protestoyên li ***Wisconsinê*** cudatir, tevgera dagîrkirina ***Wall Streetê*** ne li dij pêşnîyarqanûn, budçe yan jî gefxwarineke dîyarkirî ya hikûmetê ye. Di şûna wê de, ***OWS*** li dij hêzên hevkar ên him di teşeya aborî û him jî di teşeya siyasî de, tawanbarîyeke bihêrs, berbelav û dijwar pêşnîyar dike. Vê tawanbarkirinê li cem gelek kesan deng veda, ku tevger îdîa dike ku ew nûnerîya % 99ê gelheya welêt dike. ***'Danezana Dagîrkirina Bajarê New Yorkê',*** ku ji alîyê çalakvanên OWSê ve hat nivîsandin, bi bandoreke hêzdar a îqnakirinê perspektîvên wan ên demokratîk û dij-sermîyandaran -û her weha ya enternasyonalîst- radigihîne:

*"Em vê danezanê dinivîsinin, da ku her kesê ku xwe wekî mexdûrên hêzên sermîyandar ên cihanê hîs dikin, bizanibin ku em hevgirên wan in. Wek yek gel, gelekî yekgirtî, em rastîyê dîyar dikin: ku ji dahatûya nîjada mirov tevkarîya endamên wê divê, ku hikûmeteke demokratîk hêza xwe bi tenê ji xelk distîne, lê belê sermîyandar ji bo bidestxistina dewlemendîya mirovan û ya dinyayê li razîbûnê nagere; ku tu demokrasîyeke rast domdar nabe, heger rêbaz ji alîyê hêzên aborî ve werin dîyar kirin. Em di demeke weha de tên cem we ku sermîyandar li hikûmetan hikûm dikin, ku ji bo wan berjewendî berî mirovan, dewlemendbûn berî edaletê û zordestî berî yeksanîyê tê."*

Bi vî awayî, herçend OWS banka û dezgehên fînansê, ku wekî ***'Wall Street'*** tên bi nav kirin, ji xwe re kiribe armanc jî, aşkere ye ku ev tevger him li DYAyê û him li seranserî cîhanê bi giştî sermîyandar wekî çavkanîya pirsgirêkên van % 99 dibîne. Li welatekî, ku lê kapîtalîzm bi kêmî ve qelsî be jî hatibe, li dij derketin ev welat aşkere ye ku ev ne siyaseta DYAyê ye.

Rastîyeke vebirî ye ku çalakvanên OWSyê yên li ***New Yorkê*** ne marksîst in. Ew hewlê didin ku 'sermîyandarîya çavbirçî' birûxînin ne kapîtalîzmê. Lê belê aşkere ye fikir û îdealên sosyalîst û anarşîst bandor li ser wan kiriye. Di vî warî de, OWS 'tevgera gerdûnî ya edaletê' careke din vedihewîne, ku di 1999ê de li ***Seattleê*** teqiyabû, herweha wê tevgera heyî ya *los indignados* (hêrsxwaran) a Îspanyayê û xwepêşandarên ji ***Atîna*** heta ***Parîsê***.

### Patronîyeke çiqas famker

Taktîka dagîrkirina daîmî ya qadên vekirî, ji ber para wê, aşkere ye li jêr bandora dagîrkirina Meydana Tahrîrê ya li Qahîreyê maye, (1) ku sibata çûyî pêk hatibû. Girîng e ku ev yek ne tevgereke basît a li dij bêkarî, temahkarî, heczkirinên malan, zextên li ser sendîkayan, xerabkirina jîngehê, deynên xwendekaran, yan jî di siyasetê de hêza pere, ku mirovan dixurifîne. Di şûna wê de, çalakvanên OWSyê tevahîya van sedeman û wan bi hêza sermîyandaran a serxwereçûyî re, bi sedemên krîza niha re girêdidin, ku ew wan sedeman ne rasterat be jî wekî aborî û siyasî dibînin.

Gelo tevger heta niha bi ser ket? Bêguman. OWS bi ragihandina dengê wan kesan, ku bi banka û şirketan- û bi sîyasetmedaran, ku wan delalî radikin, hêrs ketine, xizmeteke vekirî ya girîng encam da û dîyar kir ku ew ne bêxwedî ne. Tevgerê herweha li seranserî DYAyê wan gotûbêj û gengeşî dan dest pê kirin, ku di salên dawîyê de hema bêjin qet neketibûn rojeva raya giştî: hêz û bêcezamayîna sermîyandaran, newekhevîya her ku diçe li Dewletên Yekgirtî zêde dibe û herweha gendelîya li cem her du partîyên mezin.

OWSyê wekî din li New Yorkê û li gelek deverên din rê li xwepêşandan, protesto û însîyatîfên siyasî vekirin. Di bingeha van çalakîyan de ev yek hebû ku OWS ji bo komên cur bi cur ên wekî sendîka, komên civakî, xwendekar, komên dijî şer, çalakvanên jîngehî, ku ji heman derdî bêzar bûn, bûbû xala sereke ku li dora wê civîyan. Çapemenî û raya giştî jî alaqeyeke mezin nîşanî tevgerê da. Dibe ku tê zanîn bi rastî jî ***'Hevgirtina OWS'*** van hemû koman di nav xwe de vedihewîne. Jê wêdetir, ji bo hin kesan sazkirina jîyana demokratîk û siyaseta beşdar a li cem kampên OWSyê bala xelkê kişand- ev kamp li hember çanda giştî, ku debara wê ji alîyê şirketan ve tê kirin, alternatîfeke bi heyecan a jîyanê ye-

Di vê merheleyê de pirsa sereke ku bêbersiv maye ew e ku gelo tevgera OWSyê dê bikaribe hêrs, hêz û heyecan ku bi xwe re anî veguherîne û bixe naverasta hêzeke rasteqîn an ku unsureke fişarê, û ev yek dê çawa pêk were.

Mixabin, piranîya çalakvanên sereke yên OWSyê yan xwendekar in, yan jî ciwanên bêkar in (yan jî daîmî kar nakin) ku roleke stratejîk nalîzin, yan jî li ser banka û şirketên, ku wan rexne dikin, xwedî tu bandoran nînin. Herçend hewlê bidin ku hêza tevgerê zêde bikin jî, hêza mezin dê ji komên rêkxistî werin, ku li cem dezgehên girîng xwedî bandor in, ku ev dezgeh êdî digel OWSyê kom dibin.-Ev dezgeh ji rêxistinên civakî, komên xwendekaran û nemaze ji sendîkayan pêk tên-. Lê belê krîzê ev kom û yekîtî, ku ji berê de ne hêzdar bûn, qels hiştin. Bi ser de jî, karbidestên sendîkayan ên li DYê (ji bilî çend awarteyan) digel fikra dij-sermîyan yan jî taktîkên mîlîtan ên çalakvanên OWSyê hevbîr nînin. (2)

Herweha, gefxwarineke din a li dij OWSyê ji siyasetmedarên lîberal demokrat tê, ku hewlê didin enerjîya vê tevgerê veguherînin û kanalîze bikin da ku di 2012ê de ji bo kampanyaya hilbijartinê bi kar bînin. Helbet, wekî **Robert Reichê** wezîrê kar û xebatê yê serok **Clinton**, di demên dawîyê de dest nîşan kir ku ne mimkûn e ku OWS bikaribe zorê bide *Partîya Demokrat* da ku siyaseteke li dij şirketan hembêz bike. Pêdivîya *Demokratan* gelek bi pereyên şirketan, çapemenî û têkilîyan heye, lewma pozîsyona xwe ji santîmek yan jî du santîman zêdetir naguherîne.

Lê belê, hin siyasetmedarên demokrat bêguman hewlê didin ku xwe li cem raya giştî wekî gelperwer û dij-sermîyan nîşan bidin -wekî ku serok **Obama** di 2008ê de kiribû, herçend têkilîyên wî yên nêz digel ***Wall Streetê*** hebûn jî- da ku bikaribin enerjî û heyecana OWSyê ber bi xwe ve bikişînin.

Gelo ev stratejî dê bi OWSyê re bixebite? Aşkere ye ku ne digel çalakvanên sereke, ku henekên xwe bi demokratên wekî **Obama** û favorîyekî din ên ***Wall Streetê*** Senatorê New Yorkê **Charles Schummer** dikin. Lê belê,, mirov dikare bi çavekî vebirî lê binihêre ku hin kom û sendîkayên ku di asta berfireh de endamên koalîsyona OWSyê ne, sala din dê digel hin xwendekar û komên din, ku hêza şirketan bi giştî rexne nakin, di kampanyaya hilbijartinê ya ***Partîya Demokrat*** de beşdar bibin û ***Partîya Demokrat*** dê xêrhatina van çalakvanên OWSyê bike. Dema ku sezona hilbijartinê dest pê bike, heyecana ku îro heye dikare biçilmise.

* Di Zanîngeha New Yorkê de profesorê civaknasîyê ye. Herweha nivîskarê pirtûka bi navê No Other Way Out: States and Revolutionary Movements, 1945-1991(Rêya rizgarbûnê nîne: Dewlet û Tevgerên Şoreşger) *(Cambridge, 2001)*

1 Max Rousseau, "Tevgera bê-tevgeran" Le Monde diplomatique, tîrmeh 2011

2 Shannon Bond û Jeremy Lemer, "Serokên hevkar û navdar dibêjin ku ew protestoyan fêm dikin" Financial Times, Londres, 18.10.2011

Wergera ji îngilizî: Celîl Kaya

Di dema pêleke prostestokirina bertîlxwariya hikûmeta serokwezîr Manmohan Singh de, operasyonên leşkerî yên li dijî gerîlayên maoîst û gelên eşîretî bûn sedema nerazîbûneke mezin. Heta Dadgeha Bilind mecbûr ma ku nirxên destûra bingehîn bi bîra desthilatê bixe. Tevî rêbazên pirr caran bişîddet, naksalît piştgiriya hejmareke di bilindbûnê de ya rewşenbîrên çepgir distînin.

### OPERASYONA LEŞKERÎ YA HIKÛMETÊ LI DIJÎ NAKSALÎTAN

# Hindistan: Rewşenbîr, îdîaya maoîst û zordestî

NICOLAS JAOUL Û NAÏKÉ DESQUESNES *

Operasyona "Green Hunt" (Nêçîra Kesk) a ku wezîrê karên navxweyî **Palaniappan Chidambaram** di cotmeha 2009ê de îlan kiribû, armanca nehêlana serîhildana maoîst -ku herweha jê re naksalît jî tê gotin- a deverên daristanî û eşîretî yên naverasta rojhilata Hindistanê dabû ber xwe. Pêncî hezar paramîlîter di pênc eyaletên -kilît ên raperîna maoîst: Jharkand, Chhattisgarh, Bihar, Orissa û Bengala rojava de hatin belav kirin û li çar hezar *Special Police Officers* ên mîlîsa Salwa Judum (nêçîrvanên aştîyê) ya ku di herêma Chhattisgarhê de çalak e, hatin zêde kirin. Ev feraseta ewlehîperestîyê li axaftinên fermî yên li ser mezinbûna aborîyê tê û weha li helwêsta otorîter a ku di dîrokê de bûye taybetmendîyeke pêşketina hindistanî -pirî caran li hember xelk û demokrasîya xwecihî- zêde dibe.

Komunîkasyona hikûmetê ya ku medya bi berfirehî radigihîne, "Green Huntê" ji bo pêşketinê weke gaveke pêwîst a pasîfîzekirinê dide xuyan. Lê belê, helwêsta hin rewşenbîran, ber bi modeleke nûlîberal ve nîşanên vegereke baldarî û gumanê ye ya ku dibe sedema binpêkirinên giran ên mafên mirovan jî. Potansîyela kangehî ya herêmê ewqas mezin e ku hikûmet û derdorên aborî aniha dixwazin bi saya van projeyên derêxistina madenan bigihîjin armancên xwe yên mezinbûna duhejmarî.

Piştî daxuyanîya "Green Hunt"ê, bangên alarmê yên rewşenbîran, qulipîneke hêzên pêşverû ya ber bi naksalîtan ve dida hesandin, tevî ku terciha veşartîbûnê û radîkalbûna teze ya van, ew hîn zêde ji civaka sîvîl qût kiribûn. Sumanta Banerjeeyê dîroknasê naksalîzmê bi riya epeyamê ji me re weha şirove dike: *"Em gihîştin vê noqteyê ku rewşenbîrên hindî êdî mecbûr in alîyekî bigrin. Ji taktîka maoîstan razî nebin jî, divê ew li hember siyasetên êrîşkar ên endustrîyalîzasyona hikûmetê rawestin, ji ber ku encama van siyasetan zeftkirina hektarên axa têrbereket, xirakirina çeman û koçberkirina bi hezaran gundîyan ji cihê wan e.* (…) *Berxwedana leşkerî ya maoîstan û ya dijşidetî ya gandhîperestan di dijberîyeke zelal de a li hemberî modela nûlîberal a pêşketinê ya hikûmeta hindî diparêze, digihîjin hev".*

## Li ser navê têkoşîna li dij terorîzmê

Lewre ku maoîst li holê nînin, medyatîzebûna mezin a vî şerî dike ku rewşenbîrên çepgir ên mêvanên medyayan bêhemdî xwe bibin berdevkên wan, tevî ku ew bi tenê têkoşîna eşîretan diparêzin û li dijî neheqîyan derdikevin. Ew xwe weke "welatîyên eleqedar" nîşan didin û bawerîya xwe ya ji bo modeleke wekhevîparêz a pêşketinê dîyar dikin. Xuya ye ku meraqên wan di sazûmanan de jî deng vedidin. Biryara Dadgeha Bilind a 5ê tîrmeha bihurî vê yekê piştrast dike: Wê bikaranîna *Special Police Officers* (şûngirên polîsê yên ji nav xelkê sîvîl hilbijartî) li dijî destûra bingehîn îlan kir, xwest tavilê endamên nû yên hêza mîlîs werin bêçek kirin û li hikûmeta navendî ferz kir ku hew alîkarîya pareyî bidiyê. Hikûmeta *New Delhî* bi *"feraseteke tam xelet a berpirsyarîyên xwe yên destûrî"* tê mehkûm kirin. Ev banga vegera li berpirsyarîyan ji xêra înîsîyatîva welatîyan çêbû, yên ku di 2007ê de ji ber zerara li berjewendîyên giştî gilîyê eyaleta ***Chhattisgarh*** kir. Li serê van welatîyan, **Nandini Sundar** a dîrektora ciwan a beşa civaknasîyê û seroka Zanîngeha Delhîyê, di hewldana xwe ya welatî de serkeftî bûye. Ev cenga hiqûqî ya ku niha ji çaralîyan tê silav kirin, bi hesteke îzolebûn û heta piçûkdîtina çepgirên radîkaltir ên heyranên têkoşîna çekdarî jî hat meşandin. Tevî ku ew ne ji projeya siyasî û ne ji rêbazên maoîst razî ye jî, nivîskar û mîlîtana jîngehparêz û pir medyatîk **Arundhati Roy** weha fikirên xwe yên dijşidetî yên berê guherandin û ew aniha minasibîya wan a di paşxaneke şerê navxweyî de red dike. Wê li adara 2010ê di *Outlook* a yek ji heftaneyên mezin ên welêt de nivîsareke sî û du rûpelî weşand û tê de sefera xwe ya di daristanê de li gel serîhildêran vegot û bi vî awayî bû sedema nîqaşan. (1) Nefretkara bi zimanekî tûj ya terza jîyanê ya serfkira sinifên navîn, ew li dijî xweperestîya wan a sinifî, îdealên siyasî yên serîhildanê nîşan dike û bi vî rengî neyarîya li hemberî rewşenbîran heyî, li ser xwe kom dike.

## Xetera herî mezin ya li hember ewlehîyê yan artêşeke feqîran?

Tevî ku, di nivîsarên din de, ew rexne li naksalîtan jî digire -cotmeha 2010ê, hîn di *Outlook* ê de, wê modela siyasî ya otorîter û tunebûna bernameya jîngehparêzî ya dîyar şermezar dikir-, di *"Walking with the comrades"* de, ew mafê axaftinê dide gundîyên ku tevlî *People's Liberation Guerilla Army* bûne. Ev hewldana *"rojnamegerîya li ser zemîn"* cara yekem versîyona gerîlayan dide xuyan û dîtineke kalîtatîv a şerî pêşkêş dike; medyayên hindî dîtineke weha bi awayekî sîstematîk piştguh dixin û nêzîkatîyeke teknîkî bi kar tînin, li gel bîlançoya kuştîyan û pînekirineke tarîfên endîşeçêker ên ji semantîka fermî dertên (*"deverên tûşîkirî", "imhakirin", "xetera maoîst"*, hwd). Tevî ku serokwezîr **Manmohan Singh** di 2004ê de maoîst weke *"xetera herî mezin a li hember ewlehîya hindûrîn"* nîşan dan, nivîskar bi romantîzmeke qebûlkirî û safbûneke xweşik portreya artêşeke feqîran diresimîne. *"Gandhî, rahêje demançeya xwe!"*, ew bi jêhatîbûna xwe ya ji bo formulên îkonoklast dibêje û weha helwêsta xwe ya li hember piçûkdîtina fermî ya jîngehparêzî û mirovparêzîyê dîyar dike.

**Himanshu Kumar**ê mîlîtanê gandhîparêz koçî New Delhî bûye da ku ji qanûna ewlehîyê ya taybet a eyaleta *Chhattisgarhê* li 2005ê pesind kir, bireve, û wî jî bawerîyên xwe yên dijşidetî guherandin. Dê û bavên wî yên parêzvanên **Mohandas Karamchand Gandhî** ew di perestgeheke Hindistana Bakur de mezin kir. Ew di daristana *Dantewada* ya kela maoîst de bi cih bûbû da ku *"bi rastî hêza dijşidetî biceribîne"*. (2) Li gulana 2009ê, perestgeha wî ya ku ji bo xelkê herêmê navenda civakî û tenduristîyê ye, ji hêla bi sedan polîs û paramîlîterên hikûmeta navendî ve tê xira kirin. Sedema muhtemel a vê êrişê: Alîkarîya hiqûqî ya ku rê da şeş sed *adivasi* (xelkê xwecihî yê hindistanî) ku li dijî binpêkirinên hêza mîlîs dozê vekin, û pêşwazîkirina endamên civaka sîvîl ên ku ji bo lêkolîna li ser binpêkirinan hatibûn. Tevî ku wî xwest di şer de bêalî bimîne, êriş birin ser wî û ew niha berxwedana leşkerî ya di vê paşxanê de rewa dibîne.

Piştî qonaxeke fraksîyonalîzma xurt, baska tundrew a tevgera naksalît, ya ku di dawîya salên 1960ê de piştî serîhildana eşîretî ya ***Naxalbarî*** çêbû, 2004ê dîsa di bin navê CPI (Maoîst) de û li dora bernameyeke têkoşîna çekdarî ji deverên eşîretî yên naverasta Hindistanê kom bû. (3) Di paşxana piştî-11ê îlonê de, desthilatê ew bi problematîka navneteweyî ya "terorîzmê" ve girêda: Awayekî minasib a ji bo rewakirina nêzîkatîya wan a xwerû ewlehîperest ji bo pirsgirêkeke tevnî ya ku hem aborî, hem civakî, hem jîngehî û hem jî siyasî ye. Li gor heman mantiqî, hin karbidestên fermî carina rewşenbîr û çalakvanên civaka sîvîl ên bi awayê herî dîyar alîgir in, krîmînalîze dikin û xwedêgiravî piştgirîya wan a ji bo "terorîstan" şermezar dikin. Mînaka herî navdar a "doktorê pêxwas" û çalakvanê mafên mirovan **Binayak Sen** e ku, tevî kampanyayeke navneteweyî ya mezin ji bo azadîya wî, du sal di zindanê de ma. Dadgeha Bilind nîsana 2011ê cezayê muebetê yê ku dadgeha mezin a *Chhattisgarh*ê ji ber " cudaxwazî û komploya " bi maoîstan re lê birî, betal kir; ev ceza li ser bingeha ziyaretên pijîşkî yên ji bo girtîyekî maoîst li zindana *Raipur*ê hatibû birîn.

## Raperîna çekdarî û bilindbûna tansîyona civakî

Bi heman awayî, li New Delhîyê, adara 2010ê, serokê zanîngeha Jawharlal Nehru, navendeke xurt a çepa zanîngehî ku cihê perwerdehîya çalakvan û kadroyên marksîst ên pirhejmar e, hewl da ku hin çalakîyên çandî û siyasî yên li ser kampûsê sansûr bike û di dawîyê de li hember lêxwedîderketin û alozîya siyasî ya navbera pro û antî-"Green Huntê" ya li ser kampûsê têk çû. *"Bi tenê destûra civînên vekirî, pêşkêşkirina fîlman û pêşangehên ku saxî, aheng û ewlehîya neteweyî naxin xeterê, wê werin dan"*, îlana ku Forum Against War on People ji xwe re dikir hedef, dîyar dikir.

Di derdorên marksîst de, serîhildana maoîst tansîyoneke dîrokî ya li nav parêzvanên raperîna çekdarî û hiqûqparêzan dîsa radike. Ev çend sal in ku piştgirîya rewşenbîrên marksîst a ji bo komûnîzma parlamenî ya *Partîya Komûnîst a Hindistanî* (marksîst) - CPI (M) ji ber siyaseta wî ya piştevana sazkirina şirketên pirneteweyî li Bengala rojava, bi giranî kêm bû, ku ew li wir di hilbijartinên gulana 2011ê de têk çû, piştî ku ji sê dehsalan zêdetir li ser kar bû. (4) Adara 2007ê li Nandigramê, zordarîya aloz û ihlalên ku mîlîtanên partîyê û polîs bi hev re li hember dijberên devereke aborî ya taybet dan meşandin, bûne sedema mirina çardeh kesan û di raya giştî de pêleke nerazîbûnê rabû. Divê radîkalbûna çepê hindistanî li gor hesta netewperest jî bê analîz kirin. Dijberîya li hember nûlîberalîzmê, dîsa dibe sedema hesteke antî-emperyalîst. Berxwedana çekdarî ya eşîran, îdealeke kevin a hikumdarîya xelkê, li dor xwe dicivîne, ya ku jî têkoşînên dijdagîrkerî û pê ve li Hindistanê rengê xwe dide raperînan. Serîhildana heyî dengê têkoşînên cotyarî yên serdema dagîrkerîyê vedide, yên ku mohra xwe li çepê zanîngehî xist û piştgirî da rexneyên wê yên li ser netewparêzîya hindistanî ya burjuwa, piştî ku ji hêla pêla hîstorîyografîk a *Subaltern studies* ve dîsa hatibûn keşif kirin. Parêzvanên doza eşîrî, ango *adivasi* (maneya wê ya gotin bi gotin, "niştecihên eslî" ye) herweha cudahîyeke bingehîn a li gel têkoşînên cudaxwaz ên dehsalên bihurî, ku di deverên sînorî yên weke Kaşmîr, Pencab an jî Bakur-rojhilatê de cih digirt, binxêz dikin. Berevajîya van daristanên *Dandakaranya*yê li dilê erdê neteweyî ne. Herweha, dewleta hindistanî ji serxwebûnê ve xwe weke parêzvana xelkê eşîrî da nîşan kirin, ku modernbûn terza wan a jîyanê dixe xeterê. Di pir alîyan de, xelkê eşîrî li ber çavên netewparêzan "yê din ê li hundir" bi gewde dikin, hem kevnare, nazik, eslî û li cem sinifên navîn ên bajarî di derbareya wan de hesteke tevlîhev a ji piçûkdîtin û êşa wijdanî peyda dike.

Şermezarkirina berdêla mirovî û jîngehî ya endûstriyelbûna bi darê zorê ya erdê wan, li ser deverên aborî yên taybet wezneke exlaqî ya nû dide rexnegirîya zagona 2005ê. Rexnegirên vê modela nû ya pêşketinê behsa ihlaleke hikumdarîya neteweyî dikin û bang li hestên raya giştî jî dikin. Ew devjêberdana modela sosyalîst a ku retorîka fermî ya dema serxwebûnê tijî dikir, weke xiyaneta li sozeke sembolîk nîşan didin: Soza ku ewê bi biryardarî rûpela rabihurîya mêtingerîya hêzeke bîyanî biqulipînin. Ew weha girêdana navbera mêtingerîya kapitalîst û dagîrker a ku berê li navenda rexnegirîya dijdagîrkerî û mêtina dewlemendîyan bû, xuya dikin. Siyaseta hikûmetê ya di herêmên eşîrî de, li sewîyeyên cihê nîşana ji rê derketina karbidestan e; li gor projeya neteweyî ya di serxwebûnê de hilbijartî. Sazkirina hikumdarîyeke otorîter a ku mêtingerîya serkanî û hêza xebatê bi xwe re tîne, tê maneya zeftkirina pergaleke demokratîk a hikumdarîya xwecihî. Ev jî di demeke weha de tê ku derdorên xizan xwendatir dibin û dest bi fêmkirina awayê xebatê yê sazûmanan dikin û wê ji bo parastina mafên xwe bi kar tînin.

## Nîqaşa li ser dijtundîyê

Seferberîya rewşenbîrên bi rabûna sinifên navîn re rû bi rû mayî, herweha ji bo wan awayekî qûtbûna li gel serfperestîya derdorên wan û şermezarkirina dûrbûna wan a ji modela nehrûwî ye: Modela burjuwazîyeke neteweyî ya ronahîdar, li hember pirsgirêkên xelkî berpirsyarkirî û xemxwara pêşketina wî.

Ji bo ku mirov têkilîya van derdoran digel maoîzmê fêm bike, divê bizane ku komunîzma hindistanî di dîrokê de pir rayedar û kadroyên xwe ji nav burjuwazî û kastên bilind hilbijartin. Hevaltîyên li ser kursîyên zanîngehên herî nirxbilind çêbûyî, dikin ku tevgera maoîst bi awayekî xuya di beşên rewşenbîrî de û heta di sinifên bîrêveber de jî hîn weke xwedîyê niyeteke baş tê dîtin.

Wek muqayeseyê, tevgera dijkastan a *dalit*an ("dest lê nayê dan") tu carî ji dostanîyeke weha sûd wernegirt. Bêbawerîya dualî û kevin a li nav rewşenbîrên çep û *dalit*an, tevî hiqûqparêzîyeke kûr û piştgirîyeke bêqisûr a ji bo modela komarî jî, vê kêmanîya rewatîyê îzah dike. Ji salên 1990ê û pê ve, bawerîya bi entelîjensîya çepgir jixwe ji ber vê têkoşîna ku *dalit*an biryar da, ku bi xwe û ji bo xwe bimeşînin, kêm bû. Rewşenbîrên marksîst ji ber endametîya kastên brahmanî ji tevgerê dûr hatin hiştin û heta weke xwedîyên paternalîzmeke xirabniyetî û dijminên rizgarbûnê hatin nîşan dan.

## Çalakvanên civaka baş a sîvîl û "xelkê herêmê" û semptoma elîtîst ya têkilîya bi şidetê re

Berevajîya wê, tevî ku xwe bi biryardarî weke tevgereke dijzagonî û bişidet nîşan dide, maoîzm ji hewayê rengekî devjêberdana ferdî ya di têkoşîna ji bo îdealan de sûd werdigre. Eger mirov bi çavên *dalit*an li meseleyê binihêre, zihniyeteke paternalîst bi rihetî di binê vê nihêrînê de tê dîtin, ji ber ku xelkê eşîretî bi qasî *dalit*an rêxistinkirî û polîtîzekirî nîne û wekî wan li dij rêbertîyeke ji derve dernakevin. Fikireke elîtîst a lêhaynebûyî jixwe di kampanyayên tevgera dij "*Green Huntê*" de heye û carina weha xuya ye ku têgiha welatîbûnê ji bo çalakvanên "civaka baş" a sîvîl veqetandî ye û xelkê eşîrî tenê weke "xelkê herêmê" tên danasîn.

Çawa ku aborînasê marksîst **Biblap Dasgupta** bi bîr dixe, têkoşîna naksalît a xwendekarên *bhadralok* ên li destpêka salên 1970yê ya elîta kevneşopî ya bengalî li Kalkûtayê derketî, faktoreke bihêz a rewakirina civakî ji bo maoîzma hindistanî pêk anîbû: *"Wan nedikarî tevgerê weke di bin kontrola çete û marjînalan de red bikin, ji ber ku elît tê de xwedî roleke sereke bû"*. (5) Gelo dema ji bo tevlîbûna nav refên tevgerê veşartî zarokên esilzade yên xwedî îdealekê dev ji jîyaneke rihat û serkeftî berdidin, ev yek li ber çavên rewşenbîran têra pîrozkirina raperînê dike? Çîrokên maoîst ên pesna "şehîdên" serîhildanê didin, jixwe tevlîbûna altruîst û bîîdeal derdixînin pêş, prestîjeke ku ji elîtan re veqetandî ye, li alîyê din gundî bi xwe bi tenê berjewendîyên xwe yên sinifî diparêzin.

## Yan ji Hindistanê hez bike, yan biterikîne

Pirsa têkilîya bi şidetê re semptomeke vê fikira lêhaynebûyî ya elîtîst a çepê hindistanî ye. Parêzvanên *adivasi*yan li nav kesên ku şidetê mehkûm dikin û yên wê rewa dibînin dabeşkirî ne, herdu alî jî hev û du bi nêzîkatîyeke îdealîst û dûrî rewşa li cihê cih, mehkûm dikin.



SERPIL ODABAŞI: **Dinya yek e dabeş nabe**, 50 x 50 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

**Dilip Simeon** li Delhîyê, li zanîngehê profesor e û kevnemaoîstê bûyî gandhîst e. Ew derdibire ku naksalît ji bo rewakirina şidetê pêwendîyeke platonîkî ya bi îdealan ve derdixin pêş, ya ku qurbankirina gîyanên "jêrîn" (xelkê eşîrî) bi teorîyeke "jorîn" (marksîzm) meşrû dike. Lê belê, gelo piştgirîya wî ya bêşert a ji bo dijşidetîyê jî bi serê xwe pêwendîyeke wekî vê ya bi îdealên Gandhî ve nîne, ku rastîya zemîneke şideta rojane ji bîr dike? Piştî sefera xwe ya di kelehên maoîst de, Royê li ser kanala NDTVê fikireke weha diparast: *"Ji bo ku dijşidetî bibe çekekî rasteqîn, divê rayeke giştî û guhdarên wê hebin. Lê dema ku hezar paramîlîter nîvê şevê tên gundekî, divê çi bê kirin? Gundîyên birçî dê çawa terciha greva birçîbûnê bikin? Di paşxaneke weha de, şidet jixwe dijşidetek e, ku bersivê dide şideta dewletê"*.

Nivîskar li dijî van kesên xweşfikir derdikeve ku ji prensîpa pozîsyoneke "alînegir" hildibijêrin û şideta dewletê û ya serîhildanê dişibînin hev. Ev *"teorîya sandwîçê"*, bi gotina wê, jixwe rola xelkê herêmê kêm dike, heta tenê weke qurbanên nav çakûça zordarîyê û sindana maoîst vegirtî bên nîşan dan, ev yek jî ji destpêkê ve derfeta terciheke siyasî ya di angajmana wan de ji destê wan distîne.

Bertekên dijber ên li dij têkoşîna Royê nîşan didin ku medya bûye meydana bangkirina li rewşenbîrên muxalif da ku li gor terzeke fikir û rabûn û rûniştina "neteweyî" tev bigerin. Di sekvenseke televîzyonê ya dê bimîne de, rojnamevana IBN Liveyê, kaneleke ji grupa CNNê, ji nivîskarê re dibêje *"yan ji Hindistanê hez bike yan wê biterikîne"* Tehdîdên girtinê yên li ser Royê piştî axaftina wê ya piştgirîya mafê çarenivîsê ya Kaşmîrê, piştrast dike ku çi di sazûmanan û çi di derdorên rastgir de pêleke her diçe bêhtir dijberî azadîya îfadeyê di raya giştî de heye. Beşa jinan a Bharatiya Janata Party (BJP, neteweparêzên hindû) êriş bir ser îqameta wê û dadgeheke herêmî ev yek ji bo vekirina dozeke bi sedema cudaxwazîyê kir hincet. (6)

Ji bo bisporên serbixwe, çûyîna **Chhattisgarh**ê jî zehmet bû. **Sundar**, **Kumar** û **Roy** ji hêla polîsê vê eyaletê ve weke kesên nexwestî hatin îlan kirin. Çalakvan û devjêberdêrê (7) hindû **Swami Agnivesh** jî, ku ji bo muzakereyên aştîyê înîsîyatîv dan dest pê kirin, bû hedefa çavtirsandinên bi vî rengî. Li dawîya adara 2011ê, girseyeke ji hêzên ewlehîyê û mîlîsan pêkhatî dema ku diçû yek ji sê gundên ji hêla paramîlîteran ve şewitandî ku li wan tecawuzî jinan hatibû kirin û sê mêr jî hatibûn kuştin, êriş bir ser wî û ew ji serî birîndar kir,. Ev êrişa zêde û hem jî li dij navekî di raya giştî de rêzdar pêk hat, helbet tesîra xwe li ser biryara dadgehên Dadgeha Bilind kir.

## Encama bûyeran, wê Hindistana paşerojê tarîf bike

Bi awayekî giştî, têkoşîna ji bo xizanan, tevî ku berê ji hêla **Gandhi, Jawaharlal Nehru** û **Bhimrao Ramji Ambedkar** ên damezirînerên Hindistana serbixwe dihat meşandin, bû hedefa êrişên bênavber ên dewletê. Rewşenbîr dikarin bala beşeke ji raya giştî bikişînin, ji ber ku bi gotinên Sundarê yên di pirtûka wê *Subalterns and Sovereigns* (8) de cih digrin, hesteke weha heye: *"Encama bûyerên li wir, wê Hindistana paşerojê tarîf bike"*. Biryara Dadgeha Bilind ev fikara gilîkerê di cih de dît, dema ku li ser helwêsta hikûmetê behsa *"tarîtîya ku li ser biryardêrên me yên siyasî dikeve, yên her ku diçe bêhtir ji nirx û aqildarîya destûrî dûr dibin"* kiriye. Sazîya fermî ya herî bilind weha guman li ser rewatîya exlaqî ya sinifa serdest çêkirin û got ku *"çanda ezperestîya bêsînor û çavbirçîtîya ji ber îdeolojîya aborîya nûlîberal çêbûyî"* ew xist bin bandora xwe.

Tevî serkeftina wê ya piştî dadgeheke zehmet a li dij eyaleta Chhattisgarhê çar salan dom kir, Sundar hê jî reşbîn e. Ligel ku guherandina wezîran a 12ê hezîrana 2011ê fersend dida jikaravêtina wezîrê karê navxweyî, **Palaniappan Chidambaram**, serokwezîr ew di karê xwe de hişt, lê wezîrê dadê **Veerappa Moily** şand ji bo wezareteke din, lewre ku wî nedikarî rê li ber biryarên Dadgeha Bilind bigre, yên ku hikûmet bi cihneanîna berpirsyarîyên xwe mehkûm kiribû. Ne bi tenê ji bo vê dozê, lê herweha ji bo dozên berîya demeke kurt ên bertîlxwarin û nedana bacê jî.

Xeta bi biryardarî zordar û nûlîberal a wezîrê karê navxweyî divê rê bide hikûmeta niha ku piştevanîya dengdarên sinifên navîn ên bajarî dîsa misoger bike, ku jixwe Partîya Kongreyê ew nû ji BJPê qut kiribûn û ber bi xwe ve anîbûn. Da ku hilbijêrên pêrîşan jî winda neke, partî herweha rûyekî "sosyaltir" bi saya Sonia Gandhi ya seroka wê û kurê wê Rahul nîşan dide. Bi axaftinên xwe, ew dixwazin bidin ji bîr kirin ku hikûmeta heyî berî hertiştî berjewendîyên kangehî diparêze.

Hinek aniha ditirsin ku piştî vê biryara dadê dawîya hêza mîlîs tê û dibe sedem ku dewleteke polîsî û heta desttêwerdana artêşê rû bide. Lê belê leşker bi xwe terciheke weha di warê siyasî de pir hesas dinirxînin: Operasyonên artêşê yên li dijî miletê xwe çawa dikarin bên rewa kirin? Maoîstan weha tevahîya sazûman û sinifên rayedar xistin nerihetîyê. Piştevanîya rewşenbîran ew xurt kirin û weha xuya ye ku ew hê jî xwedîyên avantajeke îdeolojîk û exlaqî ne, ji ber ku bi awayekî jêhatî xwe weke parêzvanên rasteqîn ên xwerû yên exlaqekî neteweyî yê berpirsyarîya li hember gel nîşan didin.

* Bi dorê, yê pêşî antropolog û lêkolînerê Navenda Neteweyî ya Lêkolîna Zanistî (CNRS) li Enstîtûya Lêkolînên Navbeşî yên li ser Pirsên Civakî (IRIS) ye, ya duyem redaktora bispora Asyaya Başûr li *Courier International* e.

1 "Walking with the comrades" ["Bi hevalan re meşiyan"], *Outlook*, New Delhî, 29 adar 2010

2 "If Gandhi were alive today, he'd be in a jail in Dantewada: Himanshu Kumar" ["Heke Gandhi îro sax bûya, ewê di zîndaneke Dantewadayê de bûya: Himanşu Kumar"], hevpeyivîneke li ser Daily News and Analysis, Bombay, 23 gulan 2010, www.dnaindia.com

3 Bixwînin Cédric Gouverneur, "En Inde, expansion de la guérilla naxalite" ["Belavbûna gerîlaya naksalît li Hindistanê"], *Le Monde diplomatique*, mijdar 2007

4 Bixwînin Cédric Gouverneur, " "Didi", ou la politique du grand écart" [" "Didi", an siyaseta li herdu alîyan"], *Le Monde diplomatique*, tebax 2011

5 *The Naxalite Movement [Tevgera naksalît]*, Allied Publishers, Bombay, 1975

6 Sucekî ku di Qanûna Cezayan de cih digre da ku "*gotin, nîşan an jî temsîlên nefretê, piçûkdîtinê û heznekirina ji hikûmeta ji alîyê qanûna hindistanî ve saz kirî teşwîq dikin*" ceza bike

7 Kesê ku jîyana feqîrekî gerok dijî

8 Nandini Sundar, *Subalterns and Sovereigns. An Anthropological History of Bastar (1854-2006) [Subaltern û hikûmdar. Dîrokeke antropolojîk a Bastarê (1854-2006)]*, pêşgotina çapa duyem, Oxford University Press, New Delhi, 2007

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Nîqaşên li ser biryara Dadgeha Bilind

Ji ber qedexekirina hêza mîlîs **Salwa Judum** û bikaranîna şûngirên polîs yên ji xelkê xwecihî pêkhatî *(Special Police Officers)* û meaşên wan ên nizm, ku pirî caran ji hêla hikûmeta navendî ve tên dayîn, lewma biryara Dadgeha Bilind a 5ê tîrmeha 2011ê ji ber gazinceke biheyecan a li dij modela nûlîberal a pêşketinê bû sedema nîqaşan. Ew vê modelê weke sedema şerê navxweyî ya li ***Chhattisgarhê*** û xetereke piralî li ser welêt û nirxên destûrî nîşan didin. Li alîyê ekolojîk, ew *"awayên êrişkar ên kapîtalîzmê"* teşwîq dike û ji *"talankirin û dizîna serkanîyên xwezayî"* fayde digire. Ji alîyê civakî û mirovî ve, ew *"perîşanîyeke mezin û bêhêvîbûna"* xelkê saz dike û li Chhattisgarhê, bi rejîmeke binpêkirinên berbiçav ên mafên *mirovan"* bi dawî tê. Talîyê, ji alîyê siyasî û exlaqî ve, ew ber bi *"têkçûna dewletê"* li hember berpirsyarîyên wê yên destûrî ve diçe. Retorîka fermî û metna biryarê ya ku dibêje *"paradîgmayeke pêşketinê ya bi vî rengî pêwîst e û encamên wê mecbûrî ne, nayê qebûl kirin. Destûra bingehîn bi xwe bi tarîfên zelal ji dewletê dixwaze ku ew bê navber biratîya hemû welatîyên xwe teşwîq bike"*.

Ji bilî rojnameyên herî pêşverû yên weke *The Hindu* an *Tehelka*, ku banga vegera li çarçoveya hiqûqê weke belgeyeke dîrokî silav kir, meyla giştî ya çapemenîya ingilîznivîs şermezarî bû. *The Pioneer* a pozîsyonên wê pir caran reaksîyoner in, xwe jê venade ku dadger weke întellektuelên ji rastîyên deverê qut û tênegihiştine ku mîlîs berî hertiştî *"tevgereke gelî"* ne, nirxandin; pirî nivîsarên din jî bikaranîneke xirab a fonksîyon û serdestîya exlaqî şermezar dikin. Seredaktorê *The Indian Express* henekên xwe bi dadgeha herî bilind a welêt dike û biryarê weke xwedîya *"kûrahîya entelektuelî ya xwendekarekî masterê ya zanîngeha JNU"* nîşan dide -Jawaharlal Nehru University (JNU) li Delhîya Nû, biprestîjtirîn zanîngeha ilmên mirovan e, bi rengekî sîstematîk dibe hedefa bangên bi vî hawî ya ji bo "nêçîreke cadûyan", ji ber ku ew di dîrokê de bûye cihê perwerdehîya rewşenbîrên çepgir.

Piştî serdemeke heyecana ji bo vê biryara ku weke manîfestoyê tê hesibandin, hin rewşenbîrên çepgir jî rexne lê digrin. Lekolîner **Bela Bhatia** weha nivîsarek di *Economic and Political Weekly* de weşand û derdibirî ku bi sedema ku bala xwe bi tevahî daye ser şeş hezar û pêncsed zilamên milîs, biryar behsa aktorên sereke yên şerî nake: Hêzên adetî yên polîs û çil hezar paramîlîterên di resmiyetê de berpirsyarên operasyona *Green Huntê* û tilîya wan di binpêkirinan de jî heye. Lê belê dadgerî li hemberî van hêzên hiqûqî dikare çi bike? Lewre jî, tevî ku qedexekirina bikaranîna mîlîs û *Special Police Officers* a di operasyonên weha yên ewlekarîyê de ji bo paşerojê qezenceke baş e, ew bi tenê *"şermezarîyeke hin alîyên awayê şerkirinê ye, ne şermezarîya şerî bi xwe"* ye. Li gor wê, Dadgeha Bilind ji aktorên zordarîyê re weha dibêje: "Bila AK-47 li cem we bin, lê hûnê bêyî sîlehên destan şer bikin".

**N. J. - N. D.**



Hezîran 1991

BIRÎNÊN VEKIRÎ LI ROJHILATÊ NAVÎN


# Kurdên ji dewletê bêparhiştî, nabe ku dersên dîrokê ji bîr bikin

KENDAL NEZAN *

## ARŞÎVA BÎRA KURDAN

Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê Kendal Nezan bi vê nivîsa xwe ku demeke girîng ji dîroka Kurdistanê di salên 90ê de şirove dike, rewşa tevgera kurdî, zehmetiyên heyî, siyasetû dîplomasiya li ser kurdan tên meşandin, radixîne ber çavan. Mustafa Barzanî bi dijwarî û astengiyên çawa re rûbirû ye, dewlet û welatên Rojhilatê Navîn bi çi armancê tevdigerin û tevgerên kurdan yên wê demê bi çi zehmetiyan li ber xwe didin, belawelabûna kurdan di çi radeyê de ye, dijminên kurdan li dijî wan çi metodên şer û siyasî bi kar tînin ûwd. hemû mijarên vê nivîsê ne. Ev nivîs ji aliyekî din jî girîng e: Şanî me dide ka têkoşîna gelê kurd ji çi rojên dijwar derbas bûye û gihîştiye hêza xwe ya îro.

LMdkurdî



SERPIL ODABAŞI: **Vatandaş Türkçe konuş!** (Hemwelatî bi tirkî bipeyive!) 70 x 40 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

2 mîlyon kurdên ji zextûzora rejîma baas reviyayî, di mijara vegera malê de bi dudilî tevdigerin, tevî ku zêde ne xurt jî bin garantîyên ewlekarîyê yên ku hebûna eskerên amerîkî yên li sînor û derfetên RNY (Rêxistina Neteweyên Yekbûyî) pêşkêşî wan dikin. Li alîyê din, muxalefeta kurd ji bo bidestxistina xweserîyê û demokratîkbûna welêt, neçar ma xwe bide ber peymaneke dijwar. Ji bo vê neteweya ji dewletê bêparhiştî, dersên dîrokê nikarin bên ji bîr kirin.

Kurdên Iraqê yên êdî bawer kirin ku ketin binê herî kûr ê kendalê, hêvî dikirin ku şerê Kendavê wan ji kabûsa herî dirêj a dîktatorîyê rizgar neke jî, qet nebe, wê di çarenivîsa wan de başbûneke berbiçav pêk bîne. Piştî "bihara wan a azadîyê" ya zêde demkurt, kurd careke din dibînin ku ketina nav tofana herî xedar a dîroka xwe ya bi livûtevgeran û bûyerên trajîk honandî. Kurdên careke din bûn gorîyên siyaseta reel û xeyalên xwe yên xapînok, niha bi qiriktahlî hîs dikin ku felekê felaketa herî mezin bi serê wan de aniye; ew çi dikin bila bikin, ew çendî wêrek bin bila bibin, awayê têkoşîna wan, daxwazên wan çiqasî mutewazî jî bin, ji wan tirê ku ew neçar in heta hetayî bibin qurbanên şer û aştîyê, weke netewe li derveyî lîstikê hatine hiştin, bendewarîyên wan û hetta hebûna wan bixwe, zêde nerihetîyê didin berjewendîyên bicihbûyî û ji ber vê yekê ew bi awayekî ji awayan hatine lanet kirin.

Berevajîyê bedbextîyên gelek neteweyên din, malkambaxîya kurdan ne ji ber dijberî û dijwarîya xwezaya welatê wan e. Sirûşta welatê wan ê mîna Fransayê mezin, bi çavkanîyên xwe yên avê, bi erdê xwe yê bi xêrûber a ku mirovan cara pêşî li ser wê çandinîya genim kiriye, bi petrola xwe û çavkanîyên xwe yên din ên madenî yên ku wê karibûya bextiyarî bianîya ji bo gelekî ji 25 mîlyon kesan pêk tê û mîrasgirê şaristanîyeke xweser a bi hezaran salan e, bûye warê civakeke ku bi zimanê xwe û hevrengîya çanda xwe têra xwe balkêş e.

Kurdistaneke serbixwe ya bi van avantajan xemilandî, îro wê karibûya bibûya yek ji dewletên herî halxweş û xurt ên Rojhilatê Navîn û bi nifûsa xwe ya boş û qelebalix, ew ê bibûya hêzeke sereke li nav welatên endamên *Rêxistina Neteweyên Yekbûyî* ne. Ev welatê ku di salên 1920ê de ji alîyê Tirkîye, Îran, Iraq û Surîyeyê ve bû mexdûrî parvekirineke kolonyal, îro giranîya wî kêmtirî ya *Luksembûrg* an jî girava *Maltayê* ye û li nav civata neteweyan ne xwedî dengek e, ne jî xwedî statuyeke besît a çavdêrîyê ye.

### Sozên jibîrkirî, peymanên binpêkirî

Encam pir zelal xuya dike: Li serdema *dewlet-neteweyan*, bêyî dewleta xwe, gelê kurd rizgar nabe. Kurdên ku heta nîvê sedsala nozdehem, di çarçoveyên *Împaratorîyên Osmanî* û *farisî* de, bi pazdeh mîrekîyan, xwedî xweserîyekê yan jî nîv-serxwebûnekê bûn, ji hebûna qanûneke wisa dijwar a serdemên nûjen hinek bi derengî haydar bûn. Şerên ji alîyê mîrek û pêşengên manewî yên kurdan ve pêvajoya dirêj a sedsala dawî ji bo yekbûnê û serxwebûna ***Kurdistan***ê hatin meşandin, li himberî Împeretorîya Osmanî ya dor bi dor ji alîyê brîtanîyan û almanan ve dihat destek kirin, hemûyan şikest xwarin û têk çûn. Li gel vê yekê jî, bi wan şer û têkoşînan, kurdan vîna xwe ya ji bo bidestxistina dewleta xwe, nîşanî hêzên serdemê dan. Hema dor(tir)a rojê ya yekemîn şerê cîhanê ev daxwaz ji alîyê serokê amerîkî **Woodrow Wilson** ve li ber çavan hat girtin ku di projeya xwe ya statuyên *Civata Neteweyan* (SDN) de, di nav hebûnên şerqî yên *Împeretorîya Osmanî* de pêşbînîya avakirina sê dewletan dikir: *Erebistan, Kurdistan û Ermenistan*. Wekî din, peymana navneteweyî ya ***Sevr***ê ya di tebaxa 1920ê de di navbera Fransa, Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û Qralîyeta-Yekbûyî (Brîtanya) de morkirî, di benda III. de (xalên 62-64) mafê xwedîbûna dewleteke ji bo gelê kurd dihat nas kirin.

Li gel vê yekê jî, li pey serhildana nasyonalîst ya generalê tirk **Mustafa Kemal**, ev peyman nehat bi cih anîn û li şûna wê di 1923yê de ***Peymana Lozanê*** hat bi cih kirin û bi vê peymana dawîyê Tirkîyeyê beşa mezin a Kurdistanê bi ser xaka xwe ve kir, îlhaq kir. Di wê navberê de, bi peymana *franco-brîtanî* ya 20ê cotmeha 1921ê, herêmên kurdan yên li ser *Cizîrê* û *Kurd-dagê* bi Surîyeyê ve hatibûn girêdan. Lê hê jî wilayeta kurdan Mûsil mabû û tirk û brîtanîyên ku çav berdabûn çavkanîyên wê yên dewlemend ên petrolê, dixwestin wê jî li axa dewleta îraqî ya nû afirandî, zêde bikin. Wezîfedarkirî ji bo çareserkirina vê pirsgirêkê, *Civata Neteweyan* di çileyê 1925ê de bi lezûbez komîsyoneke di bin pêşengîya kontê macarî **Teleke** de şand herêmê: Di dawîya du mehên lêkolîn û lêgerînê de, ev komîsyon gihîşt wê encakê ku ji heştan heftê şênîya vê wîlayetê nedixwest bikevin bin nîrê desthilatîya tirkan ne jî bi Bexdayê ve bên girêdan; tiştê ku wan dixwest avakirina ***dewleteke kurd a serbixwe*** bû.


Tevî vê destnîşankirina têra xwe darîçav û vekirî, Konseya SDNê di 16ê kanûna 1925ê de, li gor berjewendîyên Împeretorîya Brîtanî, ya ku teyîd dikir ku, bêyî petrol û dewlemendîyên çandinîyê yên vê axê, Qralîya Îraqî wê nikaribe xwe li ser piyan bigire, biryar da vê wilayeta kurdan bi Iraqê ve girê bide. (1) Di berdêla rizanîşandana vê plana brîtanî, Fransa û Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê her yek ji wan bû xwedî para ji sedî 23,75ê hîseyên şirketa *Turkish Petroleum* (paşî navê *Iraq Petroleum Co* lê hate kirin) a ku kanên petrolê yên bin erdê yên Kurdistanê dertanîn û bi vî awayî heta sala 1972yê ji hatinên petrola kurdan îstîfade kirin.




Di nav xemeke xuyayî ya dadwerîyê de, Konseyê soz dabû ku ji bo kurdên vê wîlayeta ku bû Kurdistana iraqî, xweserîyê an jî rêveberîyeke xweser nas bike. Zimanê wîlayetê wê bi kurdî bûya û karmendên wê jî wê kesên xwecihî bûna. Ev soz ti caran nehat bi cih anîn, û serhildanên ji bo daxwazkirina nîşandana rêzgirtinê ji bo wê sozê, ji alîyê RAF a brîtanî ve hem hingê hem jî piştî bidawîhatina hîmayeya brîtanî û bi awayekî fermî serxwebûna Iraqê jî, bi dijwarî hatin perçiqandin. Çawa Fransa bi tenê çalakîyên çandî ji bo kurdên Sûrîyeyê rewa dîtin, Londonê jî, ne zêdetirî wê, ji kurdan re, bi tenê di weşanan de azadîya bikaranîna zimanê wan qebûl kir. Her çi hukûmeta Enqerêyê bû, wê jesteke wisa piçûk jî nîşan neda ji bo gelê kurd ê ku wê di pêvajoya şerê îstîqlala Tirkîyeyê de, soza xweserîyeke pir nêzî federalîzmê dabûyê. Di 3yê adara 1924ê de hukûmeta tirk gelê kurd û hemû nirxên wî yên nasnameyî qedexe kirin, dibistan û rojnameyên kurdî girtin û Meclîsa pêşî ya neteweyî ya ku tê de, bi reng û nasnameyên xwe, heftê û pênc parlementerên Kurdistanê jî hebûn, pelişand û ji hev xist. Tirkîye êdî dibû dewleta yek û neparvebar a tenê tirkên *"efendî û begên welêt "*, hemû kesên bi *" koka xwe, ne tirkên saf bin, tenê xwedî mafekî ne, mafê xulambûyîn, mafê kolebûyînê "*. (2)

Bi çarenivîsa vî gelî ji destpêka salên 20ê ve bi vî awayî hat lîstin, çarçoveya ezmûn û bedbextîyên wî yên paşerojê jî ji bo demeke dirêj wisa ma û dewam kir. Sînorên nû êdî wê neguhêrbar bûna û tiştê para vî gelî diket ew bû ku hewl bida weke "hindikahî" li nav dewletên ku ji alîyên rejîmên zordar ve dihatin bi rê ve birin, rewşa xwe hinek çêtir bikira. Bi gotineke din, her du lingên wî ketibûn solekê û ew ê bi qedera xwe razî bibûya. Gelek serhildanên wî yên di salên 1920-1930ê de, pirî caran bi sûdwergirtina ji desteka teknîk û siyasî ya *Yekîtîya Komarên Sovyetên Sosyalîst* (YKSS), Qralîyeta-Yekbûyî û Fransayê, ji alîyê

www.arsivakurdi.org






Tirkîye, Îran û Iraqê bi xwînrijî hatin perçiqandin. Van hêzan gelek caran li dijî kurdan lihevûdin kirin (peymana tirk-îranî ya 1930ê, lihevkirina tirk-îraq-îranî ya ***Saadabad*** a 1937ê ku di 1956ê de bi navê lihevkirina Baxdayê careke din hat nû kirin).

Li dawîya duyemîn şerê cîhanê, kurdan demekê bawer kir ku ew ê karibin bextreşîya xwe têk bibin û di çileyê 1946ê de li ser beşeke axa kurdan a li Îranê, ***Komara Kurdistanê*** ava kir û ***Mehabad*** jî weke paytextê wê îlan kir. Piştî vê hebûna ku 11 mehan xwe ragirt û li ber xwe da, ev komara jiyankurt jî ku pêkanînên wê yên çandî di hişê me de mane, ji alîyê artêşên şahê Îranê ve bi desteka brîtanîyan hat perçiqandin. Serokê wê, **Qazî Mûhemmed** û du wezîrên wê hatin bidarvekirin. Kurd careke din bi awayekî pir zelal gihîştin bawerîyekê: Ew nikarin bi hêza xwe ya xweser dewleta xwe ava bikin; diviyabû ew êdî di çarçoveya karîna xwe de biketana nav lêgerîna ji bo peydekirina stratejîyeke nû ya li gor heqîqetên rewşa herêmî û navneteweyî.

Ev stratejî, di eslê xwe de, ji alîyê general **Mustafa Barzanî** ve hat amade kirin. **Barzanî**, piştî têkoşîna xwe ya salên 1930ê ji bo serxwebûna Kurdistana Îraqî, fermandarîya xwe ya sala 1946ê ji bo artêşên kurt ên ***Komara Mehabadê*** û derbaskirina dozdeh salan weke penaber li YKSSyê, li pey hilweşîna Qralîyeta Iraqê ya di tîrmeha 1958ê de, vegeriyabû Iraqê. Bi xwesipartina ezmûnên salên dirêj ên têkoşîn û penaberîyê, ew gihîştibû wê bawerîyê ku li cîhaneke ku reqabeta Rojhilat-Rojava mohra xwe lê xistî, ti guhertineke sînoran ji alîyê hêzên mezin ve wê bi xweşbînî nehata pêşwazî kirin. Ji ber vê yekê, diviyabû kurdan, bi taybetî jî yên Iraqê, di nav çarçoveya dewletên heyî de ji bo bidestxistina xweserîyeke herêmî dest bi têkoşînê bikira. Xweserî ku di eslê xwe de şêwazeke xwecihî ya demokrasîyê ye, wê nikaribe xwe li ser piyan bigire bêyî biserûberkirina demokrasîyeke parlementer a pluralist a ku hindikahî jî di navê de derfetê dide tevahîya civakê daku xwe îfade bikin û mafên xwe biparêzin.

## Têkoşînên ji bo xweserîyê (otonomîyê)

Di awir û plana pêşî ya **Barzanî** de ev stratejîya nû, bi awayekî realîsttir, diviyabû wekî prensîp bi navgînên siyasî û aştîyane bihata meşandin. Li gel vê yekê jî, zêdetir dijwarbûna rejîma iraqî, qedexekirina rojnameyên bi kurdî, derqanûnîkirina ***Partîya Demokrat a Kurdistanê*** (PDK) mîlîtanên wê careke din neçar kirin ku xwe vekişînin nav îlegalîteyê. Dûre, zêdebûna sînornenas a zextan bû sedem ku di îlona 1961ê li çîyayên Kurdistanê berxwedaneke çekdarî bigewde bibe. Di dawîya vê tevgera reaksîyoner û reaktîf de ku pêşî takekesî û xwecihî bû, dûre jî bû kollektîf û gelemperî li dijî zextên hukûmetê, şerê çekdarî hem weke navgîna xweragirtina siyasî, hem jî weke zexteke ji bo hukûmeta navendî neçarî muzakereyan bike, xwe ferz kir. Şerê çekdarî li herêmên gundewar bi taybetî jî bi desteka gundîyan hat meşandin. Ji ber egerên çandî û siyasî her cure şideta li dijî sîvîlan, bo nimûne êriş û reşkujîyên terorîst ên mîna yên filistînîyan, ji alîyê **Barzanî** ve bi hişkî hatin qedexe kirin û **Barzanî** heta dawîya jîyana xwe jî, hewl da ku tevgera wî dûr nekeve ji rêzikên rûmeta mirovî yên ku civaka kurd jî pêvajoya sedan salan xwe lê girtibû û li gor wan rêzikan nedibû ku dozeke mafdar bi bikaranîna navgînên der-sincî û exlaqî ve bê lewitandin.

Tevî zehmetîyên mezin ên lojîstîk ên ji ber tecrîdbûn û dorpêçkirina Kurdistanê, vî şerê çekdarî yê ji bo xweserî û demokrasîyê, di qonaxa xwe ya destpêkî de serkeftinek bi dest xist. Hem li hundirê Iraqê, hem jî li derve, hişt ku hişmendîya têkildarî dijwarî û girîngîya pirsgirêka kurd zêde bibe û li Tirkîye, Îran, Sûrîyeyê û herwiha li nav kurdên YKSSê bi kêrî pêşketina tevgera neteweyî ya kurdan hat. Kurdên ku ji destpêka zaroktîya xwe ve bi çîrok û destanên li ser serpêhatî û bûyerên çekdarî yên lehengên xwe yên neteweyî, an jî eşqîyayên şerefê mezin bûne û îro jî di şevbêrkên xwe yên dirêj de bi kêf û coşeke mezin bêhejmar çîrok û destanên dişibin helbestên **Homeros** vedibêjin, dîyar e ku di berxwedana **Barzanî** ya li dijî artêşên iraqî de, ji bo xwe tiştekî hêjayê serbilindbûnê dîtine. **Barzanî** bi vî awayî bû lehengekî efsanewî yê ji alîyê gelê xwe ve hezkirî û ji alîyê erebên Iraqê ve jî rêzgirtî. Hêjayê gotinê ye ku hin erebên iraqî jî ji bo têkoşînê diçûn tevlî nav refên pêşmergeyan dibûn. Tesîra **Barzanî** li ser ***asûrî*** û ***keldanîyên*** Kurdistanê jî heye û ji ber vê yekê van ên dawî hertim di hemû demûdezgehên berxwedana kurdan de di asta rêveberîyê de jî cih girtine. Mesela yekî ji wan, pêvajoya gelek salan li herêmên rizgarkirî wezîfeza serokatîya dadgeha bilind meşand, herwiha şervaneke din a xiristîyan, **Margaret George**, bûbû "*Jeanne d'Arc a Kurdistanê* "...

Ev têkoşîna ji bo demokrasîyê ya ku bi bîrbirineke xweşbînane û lehengane dihat meşandin, li herêmeke nexweşbînîya olî û siyasî û dîktatorîyên eskerî lê serdest bûn, bi awayekî dramatîk di qada navneteweyî de hat tecrîd kirin û wisa ma. Li hundir ew bi kêrî hilweşîna general **Qasim,** dûre jî di 1963yê de bi kêrî hilweşîna hukûmeta pêşî ya ***Partîya Baas*** hat û herî dawî ew bû egereke girîng di têkçûna dîktatorîya birakên **Aref** de, tevî vê yekê jî ew ti caran negihîşt asta pêkanîna hebûneke bi awayekî cidî alternatîf li himberî rejîmê. Tevgera kurd a ji bo ku karibe xwe li ser lingan bigire, neçar dimîne ji Îranê, ku yekane welatê cîran e ku berjewendîya wê di destekdayîna muxelefeta kurd de heye, desteka lojîstîk bixwaze, her diçû mecala wê ya livûtevgerê kêm dibû. Ji derfetên pêwist bêparhiştî, tevgera kurd ti hêvîyên wê nemabûn ji bo ku karibe serkeftineke eskerî ya dîyarker bi dest bixe û Bexdayê neçar bihêle ku rejîmeke demokratîk a rêzê ji mafên gelê kurd re bigire, saz bike.

Li alîyê din, rêveberên iraqî jî nikaribûn hêza pêşmergeyan bi temamî ji holê rakin. Bi vî awayî rewş gihîştibû asteke wisa ku yekîneyên pêşmergeyan beşeke mezin a gundewarîyê dixist bin kontrola xwe, hukûmetê jî bajarên mezin û kanên petrolî yên Kurdistanê di bin kontrola xwe de digirtin. Ev rewşa ku bi salan e xitimîbû û dibû sedemê endîşe û tengijînan hem li enîya kurd (veqetîna **Talabanî** di 1966ê de) hem jî li ya hukûmetê, bi tenê bi teqwiyekirina hêmanên nû dikaribû bihata guherandin. Di tîrmeha 1966ê de bi derbeyeke eskerî bi hatina ser deshilatîyê re ***Partîya Baas*** xwest bi destpêkirina *"êrişa berfireh a dawî li dijî der-qanûnîyan"* wê xitimînê ji holê rake. Ev yek jî, tevî livûtevgera mezin a çavkanîyên eskerî yên Iraqê neçû serî û bû sedem ku Bexda taktîka xwe biguherîne û pêşnîyar bike ku ew daxwazên xweserîyê yên kurdan vedinase.

Peymaneke aştîyê ya di navbera general **Barzanî** û alîkarê serokê Iraqê **Saddam Huseyn** de di 11ê adara 1970yê de ket meriyetê. Ev lihevhatina ku ji alîyê her du alîyan ve jî weke dîyardeyeke dîrokî hat bi nav kirin û ji hingê û şûn ve hem ev alî hem ew alî weke referans bi kar tînin, *"yekbûneke azad a neteweyên ereb û kurd di nav Komara Iraqê de"* îlan dikir, kurdî weke duyemîn zimanê fermî yê welêt dinasî û xweserîya herêmên şênîyên wan bi piranî kurd, pêk dihat û di çarçoveya rêjeya xwe ya nifûsî de kurd tevlî nav hukûmeta navendî dihatin kirin. Ji bo bicîhkirina dezgehên xweser çar sal wext dihat dest nîşan kirin û pêwist bû ku di wê navberê de sazîya serjimarîyê şênîya etnîk a bajarên mijara guftûgoyan (Kerkûk û Xaneqîn) ên ku ji alîyê petrolê ve dewlemend tesbît bike û hilbijartineke azad li tevahîya Iraqê bê li dar xistin. Ji bo kêlîyekê be jî, mirov dikaribû bawer bike ku stratejîya ji alîyê **Barzanî** ve dihat pêkanîn, têra xwe berhemdar û bi tesîr bû, madem ku di encamê de mafên gelê kurd dihatin nas kirin. Lê belê vê xweşxeyalê zêde dewam nekir. Pir zû derket holê ku Bexdayê bi temamî bi armanca taktîk ew tawîz dabûn. Wê xwestibû ku mecalê bibîne daku xwe komî ser hev bike û ji ber vê yekê aştîya ku îlan kiribû ji bilî agirbesteke bêhnvedanê ne tiştekî din bû.

## Derbeya dawî ya Peymana Cezayîrê

Di nîsana 1972yê de, Iraqê li gel YKSSê îmze avêt bin peymaneke dostanî û hevkarîyê ya ku mecal dayê ku çendeyeke mezin a çekan bi dest bixe û artêşa xwe nûjen û xurt bike. Ji bo pêşîyê li vê hevgirtinê bigire, **Barzanî**yê ku ji gelek êrişên reşkujîyê yên servîsên îstîxbarata iraqî xwe rizgar kiribû, îca keta nav lêgerîna wergirtina alîkarîya Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê. Di adara 1974ê de di dawîya wextê ji bo pêkanîna têkûz û bi tesîr a lihevhatina kurd-îraqî ya têkildarî xweserîya Kurdistanê hatibû nas kirin, Bexdayê vê carê jî bi awayekî yekalî qanûneke xweserîyê ya ji ya berê pir paşvetir derxist pêş û bi gefa êrişên dijwar ji rêveberên kurd xwest ku bi tiştê ji wan re tê pêşkêş kirin razî bibin. Sozên têkildarî serjimarîyê û lidarxistina hilbijartinên giştî li tevahîya Iraqê nedihatin girtin. Rejîma Iraqê ya ku xwe di rewşeke pir bihêz de hîs dikir, di dawîya adara 1974ê de biryar da "şerê xwe yê topyekûn" li dijî berxwedana kurdî bixe dewrê.

Şerekî zêde kujer ê ku salekê dewam kir, dîsa jî li qada şer artêşên **Saddam** negihandin serkeftineke dîyarker. **Saddam**, bi yek ji çerxkirinên ji nîşka ve yên ku mohra xwe li karîyera wî didin, bi carekê biryar da bi Şahê Îranê re li hevhatinekê pêk bîne, ji bo ku tevgera kurd dorpêç bike û wê ji her cure desteka lojîstîk a derveyî bêpar bihêle. Ev lihevahtin di heman demê de bû peymana navdar a ***Cezayîr*** ya 6ê adara 1975ê, ku pê Şahê Îranê, li dijî kurdan di berdêla hevkarîya xwe ya li gel Bexdayê, hesabê bidestxistina avantajên mezin dikir, bi taybetî jî di warê kontrolkirina rêya avê ya ***Şat-ûl-Ereb*** de.

Lihevhatina îraq-îranî bû sedemê pelişîna berxwedana **Barzanî**yê ku qet pişta xwe bi welatên cîran girê nedida, bi taybetî jî bi îranê û wî bi awayekî ecêb helwêsteke birûmettir û bi exlaqtir hêvî dikir ji DYAya ku soza piştgirîyê dabûyê heta ku rejîma **Saddam Huseyîn** bihata hilweşandin û bi tevahî 16 mîlyon dolar alîkarî dabûyê (ev nîsbet bi alîkarîya amerîkî ya ji bo Afganan, reqemeke pir piçûk e). Ji bo gelek telegrafên ku ji Waşîngtonê re şandibûn û tê de sozên jê re hatibûn dayîn bi bîr dixistin, wî ev gotina qeba weke bersiv ji **Henrî Kissinger** wergirt : *"Divê lihevhatina veşartî bi karûbarekî misyonerî re neyê tevlîhev kirin!"* Xefika pir tirsnak a lihevhatina ***iraq û îranî*** bi peymaneke ***sovyet-iraqî*** ya li dijî kurdan, rewşa wî hê dijwartir dikir. Ew gihîşt wê encamê ku di şertên erdnîgarî yên Kurdistanê ya berê wê li ti deryayê venabe û ji alîyê dewletên dijmin ve dorpêçkirî ye, şerê çekdarî, tevî wêrekî û fedakarîya nadîde ya şervanan jî, bê paşeroj bû û ji bilî komkujîyên bêdawî, hilweşîn û kavilbûna welatê kurd, şerê çekdarî wê tiştekî din bi xwe re neanîya. Ji ber vê yekê wî biryar da ku bi temamî dest ji dozê bikşîne û ji ber vê yekê pêşî çû li Îranê bû penaber, dûre jî li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê û li wê derê di adara 1978ê de nefesa xwe ya dawî da. Biryara **Barzanî** bi berfirehî hat rexne kirin û ji alîyê hin kesan ve weke *"firarkirin"* û hetta weke *"îxaneta li dozê"* hat nirxandin. Tevgera Kurdan a îraqî, ya ku heta hingê yekane bû, li gelek fraksîyonên raqîp parve bû û hinan ji bo demekê li dijî hev ketin nav şerekî birakujîyê. Li dijî rejîma Îraqê ya ku ji pelişîna berxwedana **Barzanî** û vir ve lez dabû siyaseta xwe ya erebkirina Kurdistanê û ji bo vê yekê li seranserî sînorên Tirkîye û Îranê *"**cordon**eke sanitaire"* ya 20-30 km berfireh saz dikir û gundên di nav kordonê de vala dikirin û şênîyên wan jî li deverên din bicih dikirin, wan fraksîyonên kurd di 1977ê de ji nû ve şerê çekdarî da dest pê kirin.

Hilweşîna şahîtîya Îranê di sibata 1979an de, di pey re jî pevçûna Iraq û Îranê mecal dan partîyên kurd ên Iraqê ku bêhneke rihet bistînin û di têkoşîna xwe ya li dijî Bexdayê de bibin xwedî derfetên mezintir, lê belê vê rewşê, tevî hin serkeftinên xwecihî yan jî wextî, nekarî bi awayekî cidî li ser hukûmeta navendî bibe hêmaneke tehdîdê û ji ber vê yekê rejîma Bexdayê siyaseta xwe ya hilweşandina gundên kurdan a ji bo têkilîyên pêşmerge û gundîyan ji hev qut bike, berdewam kir. Li pey xurtbûna hêza şer a îraqî ku gelek çekên nûjen û giran hem ji Rojhilat hem jî ji Rojava standin, dengeya hêzan jî li dijî kurdan diguherî. Derbeyên ku di hin şer û operasyonan de peşmergeyan li yekîneyên artêşa Iraqê didan, nekarî tesîreke mezin li paşeroja rejîmê bike, lê belê rewşa sîvîlên ku êdî di destê hêzên Bexdayê de bûbûn mîna rehîne û dibûn hedefên êrişên tolhildanê yên artêşa Iraqê, her diçû xirabtir dibû. Komkujîya adara 1988ê bi çekên kîmyewî ya li ***Helepçe***yê ku tê de 5 hezar kes hatin qir kirin, tenê beşeke dîyarbûyî ya tofana dirêj a *Qirkirinên li Kurdistanê* ye. Hejmara sîvîlên kurd ên di navbera 1974 û 1990ê de ji alîyê rejîma Bexdayê ve hatin qetil kirin weke 200 hezar tê texmîn kirin û hejmara gundên valakirî û şewitandî jî 4 600 e. Li Kurdistanê ne tenê mirov kom bi kom dihatin qir kirin, xweza jî dihat hilweşandin û qir kirin. Li berbanga şerê Kendavê, tevgerên berxwedanê yên ji gulana 1988ê ve dest pê kirin, li bin banê *Enîya Kurdistanê* li hev kom bûn, li xwe mikur hatin ku stratejîya wan xetimîye. Stratejîya ku wan ji dema têkçûna general **Barzanî** ve dişopand, qet nebe weke neserkeftî dihat îtîraf kirin, lewre di dawîya bîst û du salên têkoşînê de, piştî ewçend qurbanî û fedekarîyan, dîktatorîya **Saddam Huseyin** hê jî li cihê xwe bû, ji berê jî xurttir bûbû û li dijî kurdan ji hemû deman zêdetir bi zordarî tevdigerîya. Kurd hê pir dûrî bidestxistina mafên xwe bûn, Kurdistan bi piranî hatibû wêrankirin û bûbû mîna kavil, gundên wê û hejmareke mezin berhemên wê yên dîrokî ji ser nexşeyê hatibûn birin, kes êdî li gundan nemabû, hemû gundî hatibûn surgûn kirin, an jî bi darê zorê di wargehên komî de hatibûn bi cih kirin.

Ji hingê ve, şikesta trajîk a serhildana kurd a li Iraqê bû sedemê elektroşokeke mezin li tevahîya Kurdistanê ku şerê çekdarî weke navgîneke başkirina qedera gelê kurd her diçe zêdetir rastî îtîrazan tê. Mîlîtanên kurd ên xwedî tecrube jêpirsînê dikin û bi dengekî bilind ji xwe dipirsin ka bi vî awayî wan tilîya xwe nedixist qula mozan û rewş dijwartir nedikir, an jî gelo wan kapasîteya dijberên xwe zêde biçûk nedidît û nebe ku rahiştina şerê çekdarî macerarestîyek be di şertên jeopolîtîk ên pir dijwar ên Kurdistanê de, bi taybetî jî piştî şikestxwarina têra xwe berbiçav a **Barzanî**.

Bangkirina ji bo komkirina konferanseke navneteweyî ya pir girîng tê nirxandin, amadekirina stratejîyeke alternatîf, wê bi salan wext bigire û bêderz û bêderd wê pêk neyê. Tiştekî wisa, bêguman, dimîne li ser pêşveçûnên demokratîkbûna li welatên têkildar, lê belê herwiha dimîne li ser vîn û kapasîteya welatên demokratîk ên handan û sazkirina demokrastîyeke wisa, bi wergirtina tedbîrên berbiçav û eger pêwist be bi pêkanîna zextên aborî û siyasî. ***Rêxistina Neteweyên Yekbûyî***, eger bi rastî jî bixwaze li Rojhilatê Navîn aştî û aramîyê saz bike, divê bêderengî bi awayekî cidî dest bavêje pirsgirêka kurd a ku bi kevinbûna xwe, bi girîngîya hejmara nifûsa xwe ya eleqedar û hejmara serpêhatî û pevçûnên ji salên 20ê ve lê qewimîne, pirsgirêka herî giran, giring û bikunêr a herêmê ye. Bi bîrbirineke wisa, divê *Konseya Ewlekarîyê ya Neteweyên Yekbûyî* vê heqîqetê binirxîne bi taybetî li demeke ku beramberî çarenûsa gelê kurd ji bo ku alîkarîya wê ji çarçoveya humanîter a biryara ***688***ê zêdetir gavê bavêje, raya giştî pir hatiye hesas kirin. Ev yek bi wergirtina însîyatîfa bangkirina lezgîn ji bo konferanseke herêmî li ser pirsgirêka kurd a bi tevlîkirina hemû welatên eleqedar, dikare pêk bîne û tê de ramana ku berê jî hema hema bi yekdengîya dezgehên nûner, *Parlemena Ewropayê* û *MeclîsaParlementeran a Konseya Ewropayê* hatibû qebûl kirin ku ji bo kurdan di çarçoveya sînorên dewletên heyî de mafê xweserîyeke berfireh bê nas kirin. Tiştekî wisa di heman demê de wê karibe bibe awayekî birûmet ê telafîkirina neheqîyên berê, pêşîlêgirtina felaketên nû û bi awayekî maqûl qulibandina rûpelên şerê bi êşûelem ê Kendavê.

* Serokê Enstîtuya Kurdî ya Parîsê.

1 Binêre li nivîsa Jacques Thobie, "Sînor, birînên sotîner ên parvekirina kolonîyal ", *le Monde diplomatique,* mijdar 1990

2 Daxuyanîya M. E. Bozkurt, Wezîrê Dadê yê tirk, ji rojnameya *Milliyet* a 31ê tebaxa 1930 hatiye wergirtin

Wergera ji fransî: Baran Nebar

### Gelo mirov dikare cîhanê biguhere?

**Guherandina sîstemeke rûniştî her tim zahmettir e ji berdewamkirina wê. Di dîrokê de projeyên weha herdaîm li dora guheztinên sosyal şekil girtine, hêzên çep, li ser stratejîyên serkevtinên dayimî bela wela ne. Reform an jî şoreş? Debata sendîkalî ya 1914ê li Dewletên Yekgirtî yên Amerîkayê îro bi rêya bayekî "sor-pembe" li Amerîka Latinî deng vedide. Li Ewropayê, tenê bicîhkirinên fedîyok yên di warê aborîya bazarê de tên minaqeşe kirin û di rojeva wan de tenê ev heye, ew jî ji ber ku hêzên lîberal înîsîyatîfa siyasî digirin dest. Civakên utopîk û şêweyên mijûlbûnê yên îtalî zorê didin da ku bersîvan ji vê rêça girtî re peyda bikin. Ma gelo ev xebat têr dike ku perspektîfek ji hêzên çep yên ewropî re peyda bibe?**

**(Nivîsarên têkildar yên dosyaya mehê di rûpelên 13 heta 19ê de cih digirin)**

# Rêyên Sosyalîzmê li Amerîkaya Latînî

William I. Robinson *

Niha jî Peru? Amerîkaya latînî ya ku ji destpêka salên 1970yê ve weke laboratuareke nûlîberalîz-mê hat bi kar anîn, di demên dawîyê de rûyê xwe guherand. Ev nêzî dehsalekê ye ku beşeke mezin a herêmê "derbasî alîyê çepê bûye", dîyardeyeke ku pir caran weke pêlekê tê wesif kirin *(li kronolojîya me binihêrin)*. Vê pêlê aniha qeleyeke nû ya rastgiran bi dest xist. Di êvara hilbijartina serokkomarî ya perûyî ya hezîrana 2011ê de, **Ollanta Humala**yê çepgir û berbijêrê serkevtî weha dida zanîn: *"Êdî hikûmet wê tucarî ji bo berjewendîyên elîta ku dewlemendîyên kangehî yên Perûyê ji şirketên pirneteweyî re difiroşe, nexebite. Divê ev hemû bê guhertin"*. Gelo guhertinek çêdibe? Di heman axaftinê de, Humala bi heman awayê tund soz dida ku ew ê di modela aborî ya perûyî de tiştekî neguherîne.

Rast e ku pêleke pêşverû li ser Amerîkaya latînî veda, lê belê ev pêl gelek caran bi rengekî "sor-pembe" tê tarîf kirin, ji ber ku meylên tê re diçin, ji hev pir cuda ne. Hewqas cuda ne ku hin hikûmetên herêmê yên bi piştgirîya sinifên gelêrî piranîyên hilbijartinî pêk anîbûn, aniha di bin metirsîyeke dualî de ne: Li alîyekî, veşiyarbûna rastê (bi rêya sindoqan, weke 2010ê li Şîlîyê, an jî bi darê zorê, weke 2009ê li Hondurasê); li alîyê din, tevgerên protestoyê yên ji ber hêvîyên şkestî yên beşeke nifûsê rê didin. Ev herdu insûr jî têkelî hev dibin û sînorên hundir û derve yên pêvajoyên siyasî yên Amerîkaya latînî dest nîşan dikin.

Sibeha 30ê îlona 2010ê, êrişek li dijî **Rafael Corea**yê serokkomarê *Ekwadorê* pêk hat. Corea di hewldanên muzakereyê ligel polîsan bû ku bînayên îdarî yên navenda *Quîtoyê* îşgal kiribûn da ku li hember zagoneke kêmbûna avantajên wan ên meaşî pêş didît, protesto bikin. Di encama êrişê de, ew hat revandin, berî ku operasyoneke bi çekên giran a komandoyeke hêzên taybet wî rizgar bike (1) di nexweşxaneyeke leşkerî de hat girtin. Hin çavdêrên ku bawerîya xwe bi darbeyeke muhtemel nedianîn, ev bûyer weke "tevgereke civakî" ya ji ber hêrsa beşeke hêzên polîsê destpêkirî analîz kiribû. Lê belê çalakî baş hatibû organîze kirin: Li çarhêlên welêt, yekîneyên polîs û artêşê, otorê û herweha balafirgehên navneteweyî yên *Quîto* û *Guayaquîl*ê asê kiribûn, Parleman îşgal kiribûn û bi ser bînaya televîzyona neteweyî ya *TV Ecuador* de girtibûn. Gelo ev bi tenê rabûneke hêrsê bû, an jî darbeyeke ji ber piştgirîya kêm a artêşê têkçûyî bû?

## DYA bi pereyê baca amerîkîyan çapemenîya Venezûelayê dikire

Daxwaza rasta ekvadorî û teyrebazên amerîkî ya ji desthilatdarîyê xistina **Corea**, kesî matmayî nahêle. Jixwe, serokkomarî hîmê balafirî yê amerîkî yê Mantayê, li ser erdê welatê xwe dabû girtin û cotmeha 2007ê weha anîbû zimên ku *"hebûna hîmekî weha dê tenê mimkin bibe roja ku Dewletên Yekbûyî destûra sazkirina hîmekî ekwadorî li Mîamîyê bidin"*. Ji desthilatdarbûna xwe, wî wekî din îlegalbûna beşeke deynê bîyanî îspat kir û karî vî barê giran ji 3.2 mîlyar dolaran sivik bike. Dawîyê, Corea soza înşakirina "sosyalîzma sedsala 21ê" da û *Ekwador* kir endama *Hevpeymanîya Bolîvarî* ya *Gelên Amerîkaya Me* -peyama bazirganîya gelan (Alba-TCP), înîsîyatîveke entegrasyona herêmî ya Venezuela û Kubayê dabû dest pê kirin.

Lê ne bi tenê elît ji ber vê îdareyê aciz dibin. Ji dema hilbijartina xwe û vir ve, serokkomarê ekwadorî hêdî hêdî mesafe xist navbera xwe û rêxistinên xwecihî, sendîka û komeleyên gelêrî yên ew dabû hilbijartin û hîn bingehê hilbijêrên wî pêk tînin. Tevî şermezarkirina hewldana darbeyê ya 30ê îlona 2010ê (û destnîşankirina *"hêzên emperyalîst"* û tevgerên rastgir ên ku tê gotin, ew plan kiribû), *Konfederasyona Neteweyên Xwecihî yên Ekwadorê* (CONAIE) ya bihêz, di daxuyanîyeke êvara bûyerê weşandî de, weha digot: *"Eger hikûmet hevpeymanîyên ligel rêxistinên sazbûyî û civaka sîvîl çênake an jî xurt neke, pêvajoyeke guherandinê, çiqas şermok bibe jî, tim bi tehlûkeya ketina bin destê rastê re rû bi rû ye"*. Wê lê zêde dikir ku siyaseta Corea ya li hember *"sektorên herî reaksîyoner û berjewendîyên fînansî yên di rabûyînê de"* zêde rehet e, ev hewldana ji desthilatdarî xistina wî xurt kiribû û rê li ber vekirîbû. Herçi **Cléver Jimenezê** endamê *Pachakutik*, baskê siyasî yê CONAIEyê, xwest ku *"tevgera xwecihî û tevgerên civakî enîyeke neteweyî ya xwerû pêk bînin, da ku daxwaza ji deshilatê ketina serokkomarê Corea bikin"*. Tevî ku bi vê gotinê, wekî piştgirên hewldana darbeyê xuya dibûn.

Li Venezuelayê, muxalefetê di hilbijartinên parlemanî yên 2010ê de nêzî % 50 dengan bi dest xist û bi heybet derket holê. (2) Tevî ku partîya **Hugo Chavezê** serokkomar, *Partîya Sosyalîst a Yekbûyî ya Venezuelayê* (PSUV) karî cihê xwe biparêze, wê piranîya ji sisiyan didû ya Meclîsa Neteweyî winda kir. Serkeftineke weha ya rastgiran, bêguman girêdayî kampanyaya xirakirinê ye, ku Amerîka li seranserê welêt dide meşandin: Rojnamevan **Jeremy Bigwood** demeke berê weha dîyar kir ku di navbera 2007 û 2009ê de, wezareta karê derve ya amerîkî nemaze li Venezuelayê çend mîlyon dolar dan rojnamevanên latîn-amerîkî. (3) Lê belê, encama dengdana 2010ê herweha dev ji dozê berdana beşeke parêzvanên "şoreşa bolîvarî" nîşan dide. Sedemên vê yekê pir in: Zehmetîyên aborî yên bi taybetî ji ber kêmbûna qezenca neftê, neewlehî, (4) bertîlgirîya endemîk, berjewendîperestîya elîtên "şoreşger", hêdîbûna pêvajoya guherandina civakê, hwd. Di vê paşxanê de, daxuyanîya fermî ya kansera serokkomar **Chavez** a 30ê hezîrana 2011ê weşiya, rohnî li ser kêmanîyeke din a pêvajoya venezuelî daye: Kombûyîna desthilatê li dor îmaja serokdewlet û gumanbarîya çepê li ser warisên muhtemel ên rayedarê niha.

## Ticareta herêmê dikeve destê supermarketan

Li Bolîvyayê, serokkomar Evo Morales ji destpêka sala 2010ê ve bi pêleke bênavber a grev û tevgerên protestoyê re rû bi rû dimîne; yên ku di bin serokatîya sendîka, civatên xwecihî û rêxistinên gelêrî yên cihêreng de tên meşandin. Tevgerên herî nû derketî ji bo şermezarkirina înşaata riyeke li nav parkeke neteweyî ya parastî û di erdê xwecihîyan de diçe di îlona 2011ê li dar ketin û piştî mudaxaleyeke sert a hêzên ewlehîyê, çend endamên hikûmetê îstîfa kir. Daxwazên xelk bi giranî li dor meaş, tedbîrên kember şidandinê û guhnedana hikûmetê ya ji bo hilbijartîyên herêmî û gel, bi taybetî derheqê xebitandina serkanîyên xwezayî, dicivin. *"Di van salên dawîn de, çi hatiye guhertin?"*, rewşenbîrê navdar û nûlîberal ê bolîvî **Roberto Lasena** berî niha bi demeke kurt, bi tinazî dipirsî. *"Eger em çavdêrîya pêvajoyê di perspektîveke demkurt a li gor axaftin û sembolan de bikin, pir hatiye guhertin. Lê belê, di perspektîveke demdirêj a li gor nihêrîneke tevnî an meylên aborî û civakî de, pir hindik hat guhertin"*. (5) Gelo ev bi tenê provokasyon bû?

Mînak jixwe pir in. Hikûmetên pêşverû yên herêmê, yek bi yek digihîjin sînorên terciha xwe ya vebelavkirina *di çarçoveya* kapîtalîzmê *de* (ku jixwe, ji destpêka krîza fînansî ya 2008ê ve hîn dijwartir bûye).

Lê belê, ji ber ku em wan bi "îxaneteke" muhtemel mehkûm bikin, divê em bikaribin welatên weha bibînin ku, aniha, ji wan bêhtir ji kapîtalîzmê rizgar dibin: Gelo welatên bi vî rengî hene? Ji bo ku ji aborîya bazarê derkevin - bi riya netewekirina tevaya aborîyê ku hin kes daxwaz dikin-, divê ew karibin ji van teknolojîyan sûdê werbigrin ku makeşirketên bîyanî ji bo şubeyên xwe yên li Amerîkaya latînî vediqetînin, herweke ji kadroyên dikarin şûna serokşirketên jikaravêtî bigrin (6): Eva hanê ji tevger an partîyên desthiladar ên niha re kêm in û ew bi zehmetî kadroyên nû perwerde dikin.

Wekî din, dîroka latîn-amerîkî xeterên li ser projeyên ji bo Waşîngtonê zêde "radîkal" baş tarîf dike. Çend hefte piştî hilbijartina **Salvador Allende** li Şîlîyê, şêwirmendê ewlehîya neteweyî, **Henry Kissinger**, weha digot: *"Bi tenê ji ber bêberpirsyarîya gelê xwe, sedem tune ku em bihêlin welatek bibe marksîst"*. (7)

Encam çi ye? Tevî ku 2010ê, gelek welatên Amerîkaya latînî dusedsalîya serxwebûna xwe pîroz kir, ew hê jî bi kûrahî di pergala aborî ya dinyayî de cih digrin: Ji xwe, vê pergalê rê da pêşketina wan a aborî û siyasî, ji dagîrkirina 1492ê heta serdema globalîzma lîberal. Produksyona pîşesazî, cotyarî-xwarinî, bankavanî, turîzm, ticareta perakende: Di destpêka sedsala 21ê de, serkanîyên qezencê bi firotina kanan sînor nabin û girêdanên ligel "navenda" pergala dinyayî zêde bûn. Wek mînak, îroj % 70 ticareta herêmê di destê zincîrên supermarketên navneteweyî de ye, ji % 10 heta % 20 di salên 1990ê de. (8)

Belkî ji herêmên din bêhtir, vê pêşketinê mohra xwe li Amerîkaya latînî xist. Di navbera 1980 û 2004ê, hejmara kesên ku di bin rêjeya xizanîyê de dijîn du qat bilind bû, ji 120 mîlyon bo 210 mîlyonan. Di vê parzemîna herî neheq a dinyayê de, qedera sinifên zengîn hewqas biêş nebû. Ev guhertin herweha bûn sedema rabûna tevgerên protestoyê yên mezin, herweke hatina hikûmetên soza dawîya siyasetên duzkirina tevnî dida ser desthilatê.

## Di 15 salan de hejmara feqîran daket

Rewş diguhere. Di navbera 1988 û 2003ê, 90 mîlyar dolarên malên giştî ji hêla dewletên Amerîkaya latînî ve hatin xerc kirin, (9) lê belê "pêla pembe-sor" taybetkirin dan rawestandin. Serfên giştî zêde dibin -mîqdara wan a li serê niştecih di navbera 1999 û 2008ê li Venezûelayê sê qat bilind bû- û programên civakî yên mezin dest pê dikin, an jî bi pareyekî zêde dewam dikin: "Plana acilîya civakî" li Ûrûgûayê, "Borsa malbatan" li Brazîlê, (10) "Alîkarîya gerdûnî ya ji bo zarokan" li Arjantînê, (11) hwd. Li herderê, mafên xebatkaran bêhtir parastî ne, meaşê asgarî, herweke budceyên lojman û perwerdeyê zêde dibe: Nexwendewarî weha li tevahîya herêmê kêm dibe. Dema ku digel xwepêşandanên girseyî, Fransayê taloqbûneke temenê malnişînê li ser gel ferz kir, Bolîvyayê ev temen ji 65ê daxist 58ê. Mînakeke din: Li Brazîlê, beşa meaşan a di nirxa lêzêdekirî de, di navbera 1999 û 2009ê de % 3,6 zêde bû û gihîşt % 43,6. (12) Di heman demê de, ew li piranîya welatên din ên cîhanê kêm bû. Ev pêşketin nayên înkar kirin. *(li çarçoveya "Kêmtir feqîr" binihêrin)*

Siyasetên bi vî rengî, bêguman hezkirina berdewam a ji bo hikûmetên çepa latînî-amerîkî şirove dikin. Lê belê, berî ku ji ber krîz û şîyarbûna rastan lawaz bibin, gelo ev siyaset ji daxwazên sinifên gelêrî re bûbûn bersiv?

Rast e ku hikûmetên pêşverû, berê beşeke qezencên ji ihracatên maddeyên pêşî bi xelkê herî belengaz daye. *"Guherîneke tevnî nîne, lê belê readapatasyona şikleke kevn* a *komkirinê, hatinên aborî ye ku dewlet tê de beşeke mezintir ji qezencên derêxistina kangehî û petrolî distîne. Ev yek kêm zêde li ser aktîvîteyên şirketên pirneteweyî serdest e û beşeke firehtir a qezencên ihracatan bi riya programên civakî tê vebelav kirin"*, (13) aborînasê bolîvî **Alberto Acosta** yê kevnewezîrê kangeh û hawirdorê derdibire. *"Gelo ji bo înşakirina rê, dîspanser û mektebên ji me re kêm in û ji bo bersivê bidin daxwazên civaka me, çareyeke din heye?"*, **Alvaro García Linera** yê cîgirê serokkomarê welêt bersivê dide. (14)

Dîsa jî, tevî hin axaftinan, guherandinên mezin ên pergala neheq a vebelavkirina zengînîyan, ji ber piçûkbûna reformên bacdarî, vê qasê hindik dibin. Li Amerîkaya latînî, barê bacdarî yê naverast pir sivik dimîne: Bi navencî % 22,9 ê HHBê, li hember % 36,2 ji bo welatên Rêxistina Hevkarî û Pêşketina Aborîyê (OECD). Li Brazîlê, di navbera 2006 û 2007ê, *"hejmara ferdên xwedîyên bêhtirî 1 mîlyon dolarên hîsseyên fînansî % 19,1 bilind bû"*, aborînas **Piere Salama** dide zanîn. (15) Dîroknas **Pery Anderson** weha texmîn dike: *"Hikûmeta* [Luis Inacio Lula da Silva (2003-2010)] *ji bo zengînan qet ne metirsî ye û berevajî vê yekê, wê pir xizmet da wan."* Li gor wî, *"kapîtalîzm herî pir di bin desthilata **Lula** de bi pêş ket. Derdorên fînansî û pîşesazî yên brazîlî di nav piştgirên hikûmeta Lula de cih digrin. Borsa brazîlî derbasî hemû bazarên din ên dinyayê bûye. Subvansyonên di çarçoveya programa "Bolsa Familia" de dayî, bi tenê % 0,5 HHBê* [Hatina Hindûrîn a Brût] *ne û xizmeta deynê giştî % 6, % 7 zêde bû û asta bacan jî neguherî, heta kêmtir bû"*. (16)

## Axayên herêmî û mutehitên şoreşê pir dibin

Wek welatên din ên çepgir, Brazîl guherandineke tevnî ya dikare sedemên xizanî û neheqîyan ji holê rake neda meşandin: Başkirina şert û mercên jîyanê pir lawaz e, lewre ku ew pişta xwe dide programên hikûmetî yên dikarin bên rawestandin û heta betalkirin jî, bi pey guherîneke hikûmetî yan jî planeke kemerşidandinê ya vekişandineke aborî "ferz" kiribe... Ji xwe, peyva "ferdîkirinê" ya îdareya Lula qedexe kiribû, di axaftinên warisa wî **Dilma Rousseff** de dîsa derbas dibe.

Li Venezûelayê, reform di çarçoveya projeyeke mezin a guherandina dewletê, têgiha mulkiyeta ferdî û xurtkirina beşdarîya gelêrî li nav pergala demokratîk de, bi awayekî kûrtir çêbûn. Ji 2005ê ve, **Chavez** berê welatê xwe da riya "sosyalîzma sedsala 21ê", bi gotinên wî û wî herweha hewl da ku blokeke dijlîberal pêk bîne, bi piştgirîya Kubayê û bi doktrîna xwe ve kişandina hin welatên cîran weke ***Bolîvyaya*** **Morales** û ***Ekwadora*** **Corea**. Di hersê welatan de, meclîsên destûrî yên bi referandûmê destnîşankirî civiyan, da ku destûra bingehîn li gor berjewendîyên şînên xizan biguherînin, siyasetên nûlîberal ên herî nîşandêr berevajî bikin, sektora enerjî û serkanîyên xwezayî ji nû ve neteweyî bikin da ku pare di programên civakî de bê razandin.

Tevî ku, 2010ê, sektora ferdî hîn berpirsîyarê % 70 produksyona dewlemendîya neteweyî bû, îdareya **Chavez** ji wergirtina desthilatê ve hejmareke mezin a şirketên sektorên enerjî, telekomunîkasyon, derêxistina kangehî, xwarin, înşaat an bankavanîyê kirin netewî. Wî herweha teşwîqî sazkirina bi hezaran şirketên piçûk ên di kooperatîvan de kombûyî kir û çend mîlyon hektarên erd li cotyaran ji nû ve belav kir (gaveke ku Bolîvya û Ekwadorê hîn neavêtiye).

Ev hikûmetên ku ji hêla çavdêrên nerm û lîberal ve wekî "radîkal" tên bi nav kirin, di pey hilbijartinan re, desthilat xistin destên xwe û ketin serê dewletên bertilxwarî, mişterîperest, burokratîk û olîgarşîk. Ev çend hilbijartinên dawîyê tiştekî xuya dikin: Belkî metirsîya herî mezin a li ser van welatan ne ji rastgiran, lê ji "hundirê" bloka desthilatdar tê. Tehsîsat, nepotîzm, axatîyên herêmî: Ligel kêmbûna kadroyên jêhatî, "mutehîdên şoreşê" carina bi ser dikevin. Ew jixwe pir naxwazin rewşê biguherînin, ji ber ku bûne sinifa nû ya biîmtiyaz.

Herweha, ligel pêşketina asta jîyana xwe ya şexsî, beşeke nifûsê acilîya guherîna civakî kêmtir dibîne...

Ligel dirûşmên *"Ne kapîtal û ne burokrat -Zêdetir sosyalîzm û zêdetir şoreş"*, bi hezaran sendîkavan, endamên partîyên çep û nûnerên komeleyî, dawîya 2010ê û destpêka 2011ê, ji bo ku xurtkirina qanûna xebatê, berdewamîya pêvajoya netewekirina pîşesazîyên stratejîk, xurtkirina hêza karkeran di çarçoveya yekîtîyên sendîkayî de li kolanên bajarên mezin ên Venezûelayê meşiyan, nemaze li cihên berî demeke kurt, netewekirî, bixwazin. Lê belê, kapîtalîzma transneteweyî bi rihetî nayê hejandin... Hin kes vê yekê dinasin û ji bo niha, jê razî bûyî xuya dikin. Gelo bi rastî wisa ye?

## Xeta di navbera hevkarî û xwefirotinê de zirav e

Bi hêvîya telafîkirina xirabeyên ji ber krîza 2008ê çêbûyî û derxistina qezencan bi vekişandina kapîtalên navneteweyî, serokkomarê ekwadorî 2009ê qanûneke li ser derêxistinên kangehî îmze kir û destûr da şirketên pirneteweyî ku kangehan bixebitînin, bêyî ku berê bi civatên eleqedar re bişêwirin: Ev ihlaleke peymanên Rêxistina Navneteweyî ya Xebatê (ILO) ye. Qanûneke nû herweha mafeke bijartî ya li ser avê ji bo pîşesazîyên kangehî, petrolî û cotyarî-xwarinî veqetand: Tê gotin ku ew amadekarîya şexsîkirina şebekeyên belavbûyînê dike. Civatên xwecihî yên ev meyl protesto dikir, carina bi mudaxeleya polîs û artêşê re rû bi rû man. Parastina hawirdorê, bingehên wê yên xwecihî û başbûna şertên jîyanê yên tevahîya nifûsê ne pir rihet e. Projeya ekwadorî ***Yasuni ITT*** vê yekê baş tarîf dike. Diviya vê projeyê ji alikarîya "civata navneteweyî" sûd werbigirta da ku serkanîyên xwezayî yên li navenda erdekî ji bo bîyo-cihêrengî pir hesas neyên xebitandin. Lê belê, pareyê sozdayî nayê. Gelo Quîto dikare bi serê xwe "dayika dinyayî" biparêze? Hin tevgerên civakî, nemaze xwecihî, vê yekê dixwazin.

Nivîskar Benjamin Dangl dînamîka welatên "pêla pembe-sor" dişibîne *"Di navbera tevgerên civakî û dewletê de gaveke dualî"* (17) a ku ligel mezinbûna krîza dinyayî xurt dibe. Ji bo nûnerên rêxistinên civaka sîvîl ên li cem desthilata giştî cih digrin bi perspektîva "guherandina" dinyayê, xeta di navbera hevkarî û xwefirotinê de zirav e. Eger ew peywira xwe ya temsîliyeta berjewendîyên bingehîn ji bîr bikin, ev bingeh bi awayekî mekanîk dev ji dozê berdide û îmkana rêxistinê ya tesîrdayîna biryarên siyasî yên neteweyî jî kêm dibe.

Ligel hemû nakokîyan, endeksek îşaret bi guherîna Amerîkaya latînî dide: Dewletên Yekbûyî û rastên latînî-amerîkî dijêrişa xwe berdewam dikin da ku meylên ne li gor dilê xwe berevajî bikin. Hikûmetên pêşverû yên Amerîkaya latînî weha di bin xetera elîtên herêmê de ne: Wek mînak, li Hondurasê, artêşê 2009ê, bi piştgirîya bêdeng a Waşingtonê, darbeyek li hikûmeta pêşverû ya **Manuel Zelaya** xist. Dewletên Yekbûyî herweha heyînîya xwe ya leşkerî li ser tevahîya parzemînê belav kir û hîmên nû jî dan saz kirin.

* Profesorê civaknasî û ilmên navneteweyî li Zanîngeha Kalîforniyayê. (Santa Barbara) Nivîskarê *America and Global Capitalism: A critical Globalization Perspective [Amerîka û Kapîtalîzma Global: Perspektîveke rexnegirî ya di globalîzmê de]*, Johns Hopkins University Press, Baltimore, 2010

1 Maurice Lemoine, "Etat d'exception en Equateur" *[Rewşa awarte li Ekwadorê],* La valise diplomatique, 1 cotmeh 2010

2 Renaud Lambert, "Législatives au Venezuela, une défaite à l'envers" *[Hilbijartinên parlemanî li Venezuelayê, têkçûneke serûbinî],* La valise diplomatique, 1 cotmeh 2010

3 Jeremy Bigwood, "Buying Venezuela's press with U.S. tax dollars" *[Kirîna çapemenîya Venezuelayê ligel dolarên bacên amerîkî]*, Report on the Americas, New York, îlon/cotmeh 2010

4 Maurice Lemoine, "Caracas brûle-t-elle?" *[Gelo Caracas dişewite?], Le Monde diplomatique*, tebax 2010

5 Roberto Laserna, "El Cambio que no cambia" *[Guherîna naguherîne],* Pulso, 8 tebax 2010

6 Álvaro García Linera, "Bolivie, "les quatre contradictions de notre révolution"" *[Bolîvya, "çar nakokîyên şoreşa me"], Le Monde diplomatique*, îlon 2011

7 Vegotî di Grace Livingstone, *America's backyard: The United States and Latin America from the Monroe doctrine to the war on teror [Hewşa Amerîkayê: Dewletên Yekbûyî û Amerîkaya latîn ji doktrîna Monroe heta şerê li dij terorê]*, Zed Books, New York, 2009

8 Thomas Reardon û Julio A. Berdegué, "The Rapid Rise of Supermarkets in Latin America; Challenges and Opportunities for Development" *[Rabûna bilez a supermarketan li Amerîkaya latîn; doz û fersendên pêşketinê], Development policy review*, hjm 20 cild 4, Blackwell publishers, Malden, 2002

9 Carlos Aguiar de Medeiros, "Asset-stripping the state" *[Ji hîsseyê kirina dewletê], new Left review,* Londra, çile-sibat 2009

10 Geisa Maria Rocha, "Bourse et favelas plébiscitent "Lula"" *[Borsa û favela piştgirî didin "Lula""],* *Le Monde diplomatique*, îlon 2010

11 Cécile Raimbeau, "En Argentine, les "piqueteros" s'impatientent" *[Li Arjantînê, "piqueteros" sebra xwe winda dikin], Le Monde diplomatique*, cotmeh 2011

12 Daxuyanîya hjm 47 a Enstîtuya Lêkolîna Aborî ya Cihanî (IPEA), gulan 2010

13 Carmelo Ruiz Marero, "The New latin American "Progressismo" and the Extractivism of the 21st Century" *["Progressismo" ya latîn-amerîkî ya nû û ekstraktîvîzma sedsala 21ê], Americas program,* 17 sibat 2011

14 García Linera, *op. cit.*

15 "Lula a-t-il vraiment fait reculer la pauvreté?" *[Gelo Lula bi rastî xizanî kêm kir?], Alternatives internationales*, hejmara taybet 7, Parîs, kanûn 2009

16 Pery Anderson, "Lula's Brazil" *[Brazîla Lula],* London review of Books, 33(7), 31 adar 2011

17 Benjamin Dangl, *Dancing with Dynamite: Social Movements and States in Latin America [Reqsa ligel dînamîtê: Tevgerên civakî û dewlet li Amerîkaya latîn],* AK Press, Baltimore, 2010

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Hilbijartin û ji nû ve hilbijartin -kronolojiya bijarte

**1998**: Hugo Chávez, Venezûela (kanûn).

**2000**: Chávez (tîrmeh).

**2002**: Luis Inácio Lula da Silva, Brazîl (cotmeh).

**2003**: Nestor Kirchner, Arjantîn (gulan).

**2004**: Tabaré Vazquez, Ûrûgûay (cotmeh).

**2005**: Manuel Zelaya, Honduras (mijdar).
Evo Morales, Bolîvya (kanûn).

**2006**: Li Meksîkayê sextekarîyeke mezin dibe sebeb ku Andrés Manuel López Obrador têk biçe û reqîbê wî yê rastgir Felipe Calderón di şûna wî de bê hilbijartin.
Lula da Silva (cotmeh).
Rafael Correa, Ekwador (mijdar).
Daniel Ortega, Nikaragûa (mijdar).
Chávez (kanûn).

**2007**: Cristina Kirchner, Arjantîn (cotmeh).

**2008**: Fernando Lugo, Paragûay (nîsan).

**2009**: Correa (nîsan).
José "Pepe" Mujica, Ûrûgûay (mijdar).
Morales (kanûn).

**2010**: Dilma Rousseff, Brazîl (cotmeh).

**2011**: Cristina Kirchner (cotmeh).



SERPIL ODABAŞI: **Cezayê min wê kengê biqede?**
50 x 70 cm, teknîka tevlihev

# Çîroka etîketeke siyasî

LAURENT BONELLI

Sinifandina partî, sîyasetmedar û hinek ramanan "wek rayên çep" ne gelek hêsan e. Dîrokeke vê kategorîyê heye û maneya wê bi tekoşînên polîtîk re, her tim ji nû ve tê tarîf kirin.

Çepgirbûn" çi ye? Ev pirs dibe ku kawik xuya bike, lewra ev nav nasnameyên rêxistinên siyasî (*"çepa parlemanter"*, *"şaredarîyeke çepgir"*) û nirxên ferdan (ji *"întelektuelê çepgir"* heta bi *"xelkê çepgir"*) ava dike. Dîsa jî dabeşbûna di navbera siyaseta çepê û rastê de tu tiştê xwezayî, nayê guherandin û heta pêwîst nîne.

Di sedsala 18ê de li Fransayê cihêbûna sereke arîstokrasîyeke xwedî erd ya xwedîyê desthilatdarîya siyasî û bûrjûwazîyeke bazirgan a ku rola wê bi tenê dana krêdîyan bû, dianî dijberî hev. Yekdestdarîya ku bûrjûwazîyê piştî şoreşa fransî bi dest xistî, wê bikira ku komarxwazên sedsala 19ê li dijî wê seferber bibin, ku kirin mafê dengdanê were fireh kirin. Li hember otorîteya civakî, şexsî ya malmezinan, yên nû hatî bi awayekî rêxistineke kolektîf, ango bi partîyê muxalefetê dikin. Bersiva belavkirina pereyan, vexwarin û xwarinê ya dema dengdayînê ew bi pêşxistina bernameyan û nirxandina îdeolojîyê didin. Hêdî hêdî ev rêzik û qaîdeyên lîstikê xwe li ser herkesî ferz dikin.

Lê belê ew têrê nakin ku *"nasnameyeke"* çepgir îzole bikin. Ya rastî dîrok di warê cihguhertina li ser qada lîstika kişikê ya siyasî de dewlemend e. Komarxwazên –yên ku navê *"oportunîst"* li wan hat kirin– nû bûn desthilatdar, derban ji *"yên ji ya xwe nayên xwarê"* û radîkalan dixwin. Piştre ev radîkal vediguherin armanca êrişên sosyalîstan, piştî ku **Georges Clémenceau** yê ku hingê wezîrê karê hundir bû, grevên sala 1906ê dan tepisandin. **Jean Jaurès** wê sala 1906ê weha biaxiviya: *"yên ku doh rexne dikirin ji ber tunebûna bernameyeke ji bo siberojê, niha bivênevê ketina nava tevgereke mirûzkirî ku bi zêdekirina karên eskerî û polêsî xwe dide der."*

Li alîyê din şaxê *Înternasyonala Karker ê Fransayê* (SFIO) jî rastî ewqasî êrişên komunîstan hat ku di kongreya li ***Tours***ê ya sala 1920ê ew hew karîbû xwe ragire û teqiya. Ev şerên li ser terîfa siyaseta çepê, misêwa ji nû ve teşe dide nirxên ku dikare xwedî li wan derkeve.

Heke siyaseta çepê ji serî ve weke alîgirîyeke nisbî ya di lîstika siyasî de xuya dike û ne weke nasnameyeke neguher, hingê çima behsa *"partîyên çepgir"* were kirin? Avahî û rêxistinên ku vî navî li xwe dikin hemû bi hev re di heman serdemê de peyda bûne, di serdema şoreşa pîşesazîyê û parlemanterkirina rejîman de. Pêngava pîşesazîyê bi rengekî nû pirsa ji nû ve parvekirina dewlemendîyên encama hilberandinê (nirxê lêzêdekirî,) derdixe pêş, em bi awayekî din bibêjin pirsa têkilîyên di navbera kar û sermayeyê de. Û siyaseta çepê bi awayekî biryardar li cem karkeran (nexasim karkerên fabrîkeyan) alîyê xwe digire, jixwe navê partîyên tên damezrandin jî ji wan tê girtin: ***Partîya Karkeran li Melikîya Yekbûyî*** (û kolonîyên wê); ***Partîya Sosyalîst Karkeran a Spanî*** (PSOE); ***Partîya Karkeran a Sosyalîst*** (*Sozialistische Arbeiterpartei*, pêşîya partîya sosyaldemokrat a îro) li Almanyayê, ***Partîya Karkerên Îtalî*** û hwd.

Armancên wan ber bi vî alîyî ve diçin, ew bi cihêtîyên neteweyî bizanin jî (nexasim li gor xurtbûna têkoşîna li dijî çîna xwedîerkên dînî). *"Qaîdeya"* çileya 1905ê qebûlkirî weke mînak dide zanîn ku SFIO *"partîyeke çînî ye ku armanca wê civakîkirina navgînên hilberînê û pevguherînê ye, ango civaka kapîtalîst veguherîne û bike civaka kolektîvîst yan jî komunîst, û weke navgîn jî rêxistina aborî û siyasî ya proletaryayê ye"*. ***Partîya Karkeran a Brîtanî*** komîteyeke nûnerîya karkeran ava dike ku diviya daxwazên sendîkeyan li qada parlemanterîyê derbibire.

Stratejîya beramberî sazî û dezgehên siyasî yên heyî duguherî. Ji bo yên herî şoreşger rejîmên parlemanter nûnerîya xwedî mal û milkan dike û divê bêyî xwesistkirinê mirov şerê wan bike. Ji bo yên din ew dikarin alîkarîyê bidin çareserkirina pirsgirêkên civakî. (1) Dema tevgerên siyaseta çepê bûn desthilatdar ev tansîyon zêdetir dibe. Hukûmetên ji şoreşa rûsî peyda bûn dawî li rejîmên milkanîyê anîn û hatinên kar ji xebata mûçegirîyê qut kirin. Wan aborîyeke bi derveyî qaîdeyên bazarê damezirand û pesnê xwe bi wekhevîyê dan. Wekî din ezmûnên reformîst hewl dan dijminahîya di navbera sermaye û kar de kêm bikin; bi rêya parvekirineke kêmtir nedadî ya dewlemendîyê. Rêya piranîya sosyal-demokratan dayî ber xwe, ev e. Di bin zexta organîk yan jî konjonkturî ya tevgerên karkeran, yên sendîkeyî yan jî civakî, wan qada paraztina karkeran fireh kir (teqawidbûn, sîgorteyên nexweşîyê, betlaneya bimûçe) û reformên bacî yên ji nû ve levakirinê jî pêk anîn.

## Pirsa rejîmên xwedî malûmilk ji proje û programan hema çi bigre winda bû

Dema ku tevahîya nîşanan îşaret bi *"ecêb zêdebûna"* para karan bi nisbet mûçeyan di piranîya aborîyên bipêşketî de dikin, mirov şaş dimîne ku pirsa parvekirina dewlemendîyan di nav hizirîn û projeyên çepê de xwedî cihekî evqasî piçûk e, û pirsa rejîmên milkanîyê hema hema bi tevahî ji holê rabû.

Jihevdeketina bloka komunîst di pratîkê de fikra alternatîfeke aborîya bazarê tune kir. Veguherînên kapîtalîzmê (fînansîyalîzekirin, transneteweyîkirin) û yên mûçegiran jî mijar tevlîhevtir kir. Lê belê pîşeyîkirina xebata siyasî jî bi rola xwe rabû. (2) Di destpêkê de bi awayekî nakokane ev yek şertekî pêwîst ê demokratîkbûnê bû. Ji bo malmezinan jîyana ji bo siyasetê hêsan bû, lewra hatinên wan ên madî ew hewceyî ti tiştî nedikirin. Li hember vê, yên nû hatî diviyabû karibin debara xwe ji siyasetê bikin. Hêdî hêdî armanc û navgîn li nav hev ketin. Pêdivîya partîyan bi hilbijartîyan heye da ku bixebitin û ya hilbijartîyan bi partîyê heye da ku karibin karê ku tê de bispor bûne dewam bikin. Zûzûka ev çerxa pîşeyîkirinê li neqandineke civakî zêde bû. Ji ber nebûna siyaseta bi vîn û dilxwazî ya teşwîqkirinê (çawa ku ya *Partîya Komunîst a Fransî* bi dehan salan hebû) yên herî xizan ji meqamên herî jor bêpar tên hiştin: Li Fransayê îro % 7ê hilbijartîyên *Meclîsa Neteweyî* ji komên karkeran, mûçegir yan jî personelê xizmetê ne, ku bi xwe % 60ê nifûsa karkeran pêk tînin...

Ango, qada siyasî meyildar e ku yên ku ne ehlê wê ne û siyaset ne pîşeyê wan e, li derve bihêle. Ya ku mirov ji milîtanan hêvî dike êdî bi tenê seferberkirina dema polemîkên hilbijartinan e. Hilbijêr bixwe, ew tevlî lîstikên siyasî dibin ku her diçe bêhtir bi wan neberbiçav û ezoterîk xuya dike. Bi heman rengî di hilbijartinên pêş ên berî demeke kurt ên sosyalîstan de, ji bo ku mirov girêdana Arnaud Montebourg bi François Hollande re fêm bike, diviyabû têra xwe agahîyên mirovî hebin, lewra Montebourg hema hema li ser her tiştî bi Hollande re li hev nedikir. Li alîyê din Benoit Hamon ê ku heta mirov bibêje bes bi Montebourg re li hev dikir, bixwe pişta **Martine Aubry**ê girt, tevî ku wî bi wê re hema hema li ser her tiştî li hev nedikir jî... Dibe ku sedema diljêman û heznekirina hilbijartinan a gelê jî ev yek be.

Civaknas **Robert Michels** dema ku destpêka sedsala 20ê xwendekar bû, û endamê partîya Sosyal-demokrat a Alman bû, hingê tesbît dikir ku serketina partîyên çepgir wê ji serî ve bi desthilatdarîya olîgarşîyeke siyasî –ya ku wê ji bo berjewendîyên xwe hukim bike– bi encam bibe û ne bi desthilatdarîya gelê ku deng dayî wan. Wî ev tesbîta hinekî tahl dîsa jî bi encama gihiştiyê nerm kir: *"li dijî xiyanetê bênavber gunehkar radibin ser xwe, yên ku piştî şerên bi îhtîşam û desthilatdarîya bêrûmet, tevlî nav çîna kevin a serdest dibin, cihê xwe ji muxalifên nû re dihêlin, yên ku bixwe li ser navê demokrasîyê êrişê dibin ser wan."* (3)

1 Sala 1900ê nîqaşa di navbera **Jules Guesde** û **Jean Jaurès** de ji bo vê muxalefetê mînakeke baş e. *Bigire li ber* Max Bonnafous (di bin birêveberîya wî de) *L'Œuvre de Jean Jaurès, VI, "Etudes socialistes II, 1897-190" (Berhema Jean Jaurès, VI, "lêkolînên sosyalîst II, 1897-190),* Les éditions Rieder, Parîs 1933

2 *Cf.* Delphine Dulong, *La construction du champ politique (avakirina qada siyasî)*, Presses universitaires de Rennes, 2010

3 Robert Michels, *Les partis politiques (partîyên siyasî)*, Flammarion, Parîs 1971 (1914)

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

# Çepîtî li ku ye? (Dewama rûpela 1)

lîberalkirina bazara hundir û Yek ji dozgerên herî baş ê asêman û bistbûna sosyal-demokrasîya ewropî xuya ye **Benoît Hamon** e, berdevkê niha yê... Partîya Sosyalîst a fransî (PS). Di pirtûka xwe ya dawîyê *Tourner la Page* de Hamon van derdixe pêş: "*Di nav Yekîtîya Ewropayê de Partîya Sosyalîst a Ewropî (EPS) bi awayekî dîrokî lihevkirina wê ya ku wê bi demokrasîya xirîstîyan ve, bi stratejîya lîberalkirina bazara hundir û bi encamên wê yên li ser mafên civakî û xizmetên dewletê ve girêdide, bi bîr dixe. Yên ku planên hişk ên aborîyê yên Yekîtîya Ewropayê û Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) doza wan dikir, bi muzakereyan dayî qebûl kirin, hukûmetên sosyalîst in. Li Îspanyayê, li Portugalê û li Yewnanîstanê helbet dijberî û protestoyên li dijî planên hişk ên aborîyê ji xwe re IMFyê û Komîsyona Ewropî dikin armanc, lê belê hukûmetên sosyalîst ên welatê xwe jî.* […] *Partîyeke çepa ewropî weke rasta ewropî, êdî li ber vê îddîa yê ranabe: Ji bo pêkanîna hevgirtina budceyî û dilê bazaran xweş bike divê dewleta refahê ya civakî bê fedakirin.* […] *Em li gelek deverên jîyanê li pêşîya pêşketinê asteng bûn. Ez serê xwe li ber vê natewînim.*" (2)

Yên din bixwe difikirin ku veger ji vê veguherînê nîne, lewra bingeha wê bûrjûwabûna sosyalîstên ewropî ye. Partiya Karker (PK) ya brezîlî tevî ku bixwe bêtir nerm e, dihizire ku çepa latîno-amerîkî divê şûna çepa Ewropayê bigire ya ku êdî pir zêde kapîtalîst, pir zêde amerîkîbûyî û her diçe hindiktir rewa ye dema ku xwe weke ku berjewendîyên gel diparêze nîşan dide. Belgeyeke amadekarîya ji bo kongreya PKyê ya îlona bihurî nîşan dide ku "*îro di warê cografî de birêveberîya îdeolojîk a çepa dinyayê cih guhertiye. Di vê çarçoveyê de Amerîkaya Latîn xwe cihê dike*. [...] *Çepa welatên ewropî ya ku ji sedsala 19ê ve ewçendê bandor li çepa li dinyayê kiriye, nedikarî bersivên guncav û lêhatî bide krîzê û xuya ye li hemberî serwerîya neolîberalîzmê serê xwe tewandiye, destên xwe ber xwe re berdane.*" (3) Paşketina li Ewropayê dibe ku herweha berbanga êvara sendîkalîzmê, sosyalîzm û komunîzmê be – ya ku ji yên din bêtir dîyar e, serî tewandina li ber têkbirina wan e.

Gelo hewqasî jî bi bin ketiye? Hilbijêr û mîlîtanên çepê yên ku girêdayî naverokan in û ne girêdayî beş û etîketan in, gelo welatên rojavayî jî di nav de, ew dikarin hêvî bikin ku zora rastê bibin tevî hevrêyên xwe yên ku lîberalîzmê ew bi dest xistine, belê hê jî di warê hilbijartinan de hegemonîk in? Ev reqs û lîstik ya rastî êdî veguherîne merasîmê: Çepa reformîst di dema kampanyayeke hilbijartinan de xwe bi xapandineke çavan ji muhafezekaran cihê dike. Paşê dema ku ew dibe xwedî derfet, ew dest bi kar dike û weke muxalifên xwe bi rê ve dibe, bi rengê ku nîzama aborî zivêr neke, bi rengê ku zêr û zîvên li qesrê biparêzin.

Veguherîna civakî dixwaze ku piranîya namzedên wê yên çepê yên xwedî erk û berpirsîyar ku behsa pêdivî û lezgînîyê dikin, van gotinan ne bi tenê weke retorîkeke hilbijartinan hesab bikin û li wan kûrtir bifikirin. Lê belê herweha... dixwaze bibin desthilatdar jî. Û li ser vê mijarê çepa nerm dersê dide "tundrew" û "nerazîyên" din. Ew napê, ew, "êvara mezin"; ew jî xeyala xwe danehevê nake ya ku di nav dij-civakeke ji gemara dinyayê qut de û mirovên îstîsnayî wê şên dikin. Em bi gotinên **François Hollande** ji nû ve bibêjin, mêyila wê ne "astengkirin belê kirin e. Ne rawestandin belê livîn e. Ne berxwedan e, belê bidestxistin e". Û li gor wê "*têknebirina rastê, parastina wê ango tercîhkirina wê ye*." (4) Li gor wî li hemberî vê çepa tundraw tercîh dike "*kîjan dibe bila bibe li hespê hêrsê suwar bibe*" li şûna ku "*realîzmê hilbijêre*" (5)

Ev koza wê ya sereke ye, hukûmeta çep "li vir û niha" xwedîya hêzên hilbijêr û kadroyên bêsebr û bêsemax e, ku destûrê didiyê bi bayê bezê bilindkirina xwe misoger bike. "Zora rastê birin" bixwe şûna bername yan jî perspektîvê nagire. Dema çep di hilbijartinan de bi ser dikeve, avahî û struktûrên li cihê cih –neteweyî, ewropî, navneteweyî– û dikarin li pêşîya daxwaza guherînê ya ku di dema kampanya hilbijartinê de tê derbirîn, bibe asteng. Li Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê **Obama** dikarî xwe lê deyne û bibêje ku lobîyên pîşesazîyê û astnegkirina parlemanî ya komarxwazan çal li ber dilxwazîyek û xweşbînîyeke ("*Yes we can*") piranîyeke pir mezin a gelî qebûlkirî kolaye.

Li deverên din hukimkerên çepê xwestin li wan neyê girtin ji ber dîqet û îhtîmama wan yan jî tirsonekîya wan a ku dixin stûyê "neçarî û zarûrîyetan", "mîrateyeke" (nebûna jêhatîbûna hevrikîya navneteweyî ya sektora hilberîner, asta deynan û hwd.) ya beşek ji firehîya qada manewreya wan kêmkirî. **Lionel Jospin** sala 1992yê vê analîzê dike: "*di jîyana me ya giştî de dubendîyeke ecêb û sosret serdest e. Li alîyekî em desthilatdarîyê* [socialiste] *bi berpirsîyarîya ji bêkarîyê, xirabîya li banlîyoyan, zivêrbûnên civakî, tundrewîya rastê, bêhêvîmayîna çepê gunehbar dikin. Li alîyê din em jê dixwazin ku dev ji siyaseteke aborî ya malî bernede ya ku pir zehmet dike tiştên em gazinan jê dikin ji holê rake.*" (6) Bîst salan piştre, awayê derbirîna vê nakokîyê hê jî di rojevê de ye.

Sosyalîst her carê bi bîr dixin ku ew sedem û egeran ji bo "dengên bi kêr bên" bi kar tînin: Şkestineke çepê di hilbijartinan de dike ku siyaseta rastgir cebilxaneyeke "reformên" lîberal – taybetîkirin, kêmkirina mafên sendîkayî, kêmkirina hatinên dewletê – bi kar bîne yên ku wê amûrên muhtemel ên siyaseteke din xira bikin. Ev şkestin dibe ku herweha nirxên fêrker jî derxe holê. **Hamon** li xwe mikur tê weke mînak ku li Almanyayê "*encamên hilbijartinên giştî* [yên îlona 2009ê], *yên ku bûn sedem ku SPDê encama herî xirab* [% 23yê dengan] *a di nav sedsalekê de birêveberîya wê der barê guhertina pêwîst a dîyarkirina alîyê berê xwe de razî kir.*" (7)

### Sosyalîstên yûnanî kêfa xwe tînin ku ji Margaret Thatcherê zûtir tevgerîyane...

"Başkirineke rewşê ya doktrînî" ya asteke pir dilnizm li Fransayê jî dabû der, piştî têkçûna sosyalîstan di hilbijartinên giştî yên sala 1993yê de, li Meliktîya Yekbûyî (Britanya) piştî serketina partîya muhafezekar a sala 2010ê. Û bêguman em ê rewşeke bi heman rengî li Îspanya û Yewnanistanê jî tesbît bikin, lewra hema hema hîç muhtemel xuya nake ku hukûmetên sosyalîst ên van welatan şkestina xwe ya bê bikin stûyê siyaseteke bi helemanî şoreşger... Ji bo parastina doza **Papandreû**, parlemantera sosyalîst a yewnan ***Elena Panarîtîs*** îşaret bi referanseke kes ne li bendê jî kir: "*Ji* ***Margaret Thatcher*** *re yanzdeh sal diviyan da ku reformên xwe li welatekî pirsgirêkên wê yên avahî û strukturel siviktir bûn, pêk bîne. Me bernameya xwe hê nû berîya çardeh mehan da dest pê kirin!*" (8) Kurt û kurmancî *"Papandreû ji Thatcher çêtir e!"*

Ji bo xilasbûna ji vê torê divê lîsteya şertên berîya destpêkirina globalkirina malî were amade kirin. Di vê navber û cih de pirsgirêkeke derdikeve holê: em pirbûn û bipêşketina zanistî ya hêmanên ku ji sîh salan ve bi pêşketina aborî ya dewletan birin qada spekulasyonên kapîtalîst û siyaseteke têra xwe safik a reforman (kêmkirina newekhevîya bacan, hêdî hêdî bi pêşdebirina hêza kiriyarîyê ya mûçegiran, parastina budceya perwerdeyê û hwd.) ji niha û pêde hejmareke girîng a qutbûnan ferz dikin. Qutbûna ji nîzama heyî ya ewropî, lê belê her weha qutbûna ji siyasetên rabihurîyê yên sosyalîstan.

Weke mînak, ji ber nexistina ber lêpirsînê ya "serxwebûna" Bankeya Navendî ya Ewropî (ya ku peymanên ewropî misoger kirin ku nekeve ber ti kontrolên demokratîk), ji ber sistnekirina Pakta Îstîqrarê û mezinbûna aborî (ya ku di demên qeyranê de bîhnê li tevahîya stratejîyên dilxwaz ên li dijî bêkarîyê diçikînin), ji ber eşkerenekirina hevgirtina di navbera lîberal û sosyal-demokratan li Parleman Ewropayê (ya ku kir ku sosyal-demokrat destekê bidin namzedîya kevne-bankevanê **Goldman Sachsê, Mario Dragui**, da ku bibe serokê Bankeya Navendî ya Ewropî - BNE), jixwe em hîç behsa pevguherîna-azad jî nakin (doktrîna Komîsyona Ewropayê), ji ber kontrolkirina deynê dewletê (da ku pereyên spekulatoran ên ku li dijî welatên herî lawaz ên qada euroyê pere razandine, nedin wan) (9); ji ber van hemû sedeman di serî de dîyar e ku lîstik wê xirab bimeşe.

Heta ji destpêkê de sosyalîst têkçûyî ne. Ya rastî tu tişt nahêle ku em bawer bikin ku **Hollande** li Franseyê, **Sigmar Gabriel** li Almanyayê yan jî **Edward Miliband** li Meliktîya Yekbûyî wê li devera ku **Obama, José Luis Zapatero** û **Papandreû** şkestin, bi ser kevin. Bisêwirînin ku "*hevgirtineke ku ji yekîtîya siyasî ya Ewropayê navenda projeya xwe çêke"* çawa ku **Massimo d'Allema** li Îtalyayê hêvî dike, destûrê dide "*ronesansa pêşketinparêzîyê*" (10) (bi niyeta herî baş nirxandî) dişibe xewneke mirov hişyar bibîne. Di rewşa heyî ya hêzên siyasî û civakî de Ewropayeke federal bi tenê wê bikaribe ji serî ve amûr û hêmanên lîberal ên ku ji niha ve bîhnê li mirovî diçikînin asteng bike û bi rêya dana desthilatdarîyê li dezgehên teknokratîk ên ku li derve girtî ne, gelî hinekî din ji serwerîya wî bike. Ma gelo pere û bazirganî jixwe qadên ku ji mêj ve "federalkirî" nînin?

Bi her halî, heta ku partîyên çepgir ên nerm nûnerîya piranîya hilbijêrên pêşverû dikin –çi bi rêya alîgirîya projeyên wan û çi jî ji ber hisa ku ev partî yekane perspektîf e ji bo destguherîna desthilatdarîyê ya nêzîk dibe– avahî û sazîyên siyasî yên tundrewtir (yan jî ekolojîst) neçar in bi rola figurantîyê, ya hêza alîkar rabin, yan jî tevî ne tu tişt bin, bifikirin ku dest jî wan nabe. Bi % 15ê dengan, çilûçar parlemanter, çar wezîr û rêxistineke ku bi dehan hezar mîlîtan dicivandin, *Partîya Komunîst a Fransî* (PCF) di navbera 1981ê û 1984ê de ti carî di dîyarkirina siyaseta aborî û malî ya **François Mitterand** de ne xwedî giranî bû. Şkestina *Partîya Jinûveavabûna Komunîst* li Îtalyayê ya ku girtiya hevgirtina xwe ya bi partîyên navendê yên çepgir re bû, ne pêşîyek bû ku bêhtir kela canê mirovî radikir. Hingî armanc ew bû ku buhayê wê çi dibe bila be pêşîyê li vegera ser hukim a **Silvio Berlusconi** bê girtin –lê Berlusconî dîsa jî vegeriya, lê belê derengtir.

Bereya çepgir (ya ku PCF jî endama wê ye) hêvî dike ku bersivê bide van axaftinên bi vî rengî. Bi zexta li PSyê hêvî dike ku bike ew ji "*şibihînên pêşîyên xwe*" xilas bibe. Di serî de ev îdîa wek xwe xapandinekê xuya dike. Bi her halî, heke ji bilî pêwendîya hêza hilbijêran û neçarbûnên sazûmanî, ew daneyên din jî bigire nav xwe, hingê ev bereya çepgir dikare ji rabihurîya xwe ya dîrokî bibihure. Bi heman rengî, ti destketîya mezin a civakî ya Bereya Gel (betlaneya bi mûçe, hefteya kar a çil saetî û hwd.) di bernameya (pir nerm ya) koalîsyona di nîsan-gulana 1936ê de biserketî de nenivîsandî bûn; tevgera grevan a hezîranê ew li ser patronên fransî û siyaseta rastgir ferz kirin.

Dîroka vê serdemê bi tenê bi zexta mirov nikare xwe li ber bigre ya tevgereke civakî ya li ser partîyên çepgir ên şermokî yan jî bizdiyayî nikare were rave kirin. Ya ku tevgereke raperîna civakî serbest berda serketina *Bereya Gel* a di hilbijartinan de bû, lewra vê yekkê hisa ku wê weke berê li bin guhê zext û zora polêsî û patronan nekevin bi karkeran re çêkiribû. Erê wêrek bûbûn, belê wan herweha pê dizanî ku partîyên wan hê nû dengê xwe dayî wan wê ti tiştî nedin wan, heke destê wan hinekî banedin û neşidînin. Sedema vê dîyalektîka biserketî –lê pir kêmdîtî– ya di navbera hilbijartin û seferberîyê, sindoqên dengdanê û fabrîkayê de ev e. Di rewşa heyî de hukûmeteke çepgir heke rastî zexteke bi heman rengî neyê, wê tevî teknokratîyeke ku êdî ji bilî lîberalîzmê nizane tiştekî din bike, bi bayê bazê xwe dûrî çavên raya giştî bike. Wê bi tenê fikreke wê ya sabit hebe, ew jî bike ku ajansên notdayînê yên ku herkes pê dizane her welatê siyaseteke bi rastî ya çepgir bimeşîne wê notên wê "kêm bikin", nota wan bilind bike.

### Wek stêrkeke rijyayî, Komara Navendî tîrêjên xwe yên dawîn direşîne

Ango, wêrekî yan jî xitimîn? Ji mêj ve em fêrî tehlûkeyên wêrekîyê – îzolebûn, enflasyon, xirabûna rewşê – kirine. Lê belê yên xitimînê? Dema rewşa Ewropaya salên 1930ê analîz dike, dîrokzan **Karl Polanyi** bi bîr dixe ku "*nedera kapîtalîzma lîberal tê de asêmayî*" li gelek welatan rê li ber "*reformeke aborîya bazarê ya ku di encamê de qira tevahîya sazî û dezgehên demokratîk hat anîn*" (11) vekir. Va ye, sosyalîstekî pir nerm ê weke **Michel Rochard** jî li defa hewarê dixe: Hişkkirina şertên li ser yewnanan tên ferz kirin, dibe ku li vî welatî bibe sedema jiholêrakirina demokrasîyê. Wî meha bihurî weha dinivîsî "*di rewşa hêrsa rabûyî de ku wê rewşa vî gelî be, em dikarin bifikirin ku ti hukûmeta yewnan wê nikaribe bêyî desteke artêşê xwe bigire. Ev hizirîna xembar bêguman ji bo Portugal û Îrlandayê jî ji bo yên din ên mezintir jî derbas dibe."* (12)

Tevî ku tevahîya artêşeke sazûmankirî û medyatîk destekê didinê û wê diherikînin nav reh û damarên civakê, komara navendê dihejije. Niha berê xwe daye biryareke navbera hişkkirina otoritarîzma lîberal û destpêkirina qutbûneke ji kapîtalîzmê. Qutbûna ji kapîtalîzmê hê dûr xuya dike. Lê belê dema gelî êdî hew bawer kir ji lîstikeke siyasî ya ku sextekarîyek e, dema ku ew bibîne hukûmet ji serwerîya xwe hatine kirin, dema ku ew bi israr doza birêkûpêkkirina bankeyan kir, dema ku bêyî zanibe hêrsa wî wê wî bi ku ve bibe, seferber bike, ev ê îşaret pê bike ku siyaseta çepê hê zindî ye.




1 Ji Komîsyona Ewropî, Bankeya Navendî ya Ewropî (BNE) û Fona Pereyan a Navneteweyî (IMF) pêk tê

2 Benoît Hamon, Tourner la page (destpêkeke nû), Flammarion, Paris, 2011, rûpel 14-19

3 AFP, 4ê îlona 2011ê

4 François Hollande, Devoirs de vérité (wezîfeyên rastîyê), Stock, Paris, 2006, rûpel 91 û 206

5 heman jêder, rûpel 51 û 43

6 Lionel Jospin, "Reconstruire la gauche (Jinûveavakirina siyaseta çepê)", Le Monde, 11ê nîsana 1992yan

7 Benoît Hamon, berhema li jor navbirî, rûpel 180

8 Alain Salles ji ber girtiye, "L'odyssée de Papandréou (Odyseya Papandreû)", Le Monde, 16ê îlona 2011ê

9 Weke mînak Hamon difikire ku "*ne mumkin e ku çepgir bikevin hilbijartinên Fransayê û dozê li fransîyan bikin ku ew hesabê vê yekê bidin*"

10 Massimo d'Alema, "Le succès de la gauche au Danemark annonce un renouveau européen (Biserketinên çepgirên Danîmarkayê bihareke ewropî didin zanîn)", Le Monde, 21ê îlona 2011ê

11 Karl Polanyi, La Grande transformation (veguherîna mezin), rûpel (di navbera 305 û 307 de)

12 Michel Rocard, "Un système bancaire à repenser (sîstemeke bankevanîyê ya ku divê li ser were hizirîn)", Le Monde, 4ê çirîya pêşî ya 2011ê

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurd.org

# Sedsalek berê li Amerîkayê (DYA), nîqaşeke bingehîn

**Reformîst, American Federation of Labor (AFL), Federasyona Amerîkî ya Karkeran, demek dirêj li hember şoreşgerên Industrial Workers of the World (IWW) -Karkerên Endustrî yên Cîhanê û Partîya Sosyalîst sekînîn. Di navenda raberizînên wan de pirsek: Gelo divê ku sendîka mafên karkeran yên acîl biparêzin an wan ji bo tekoşînên polîtîk yên dûr û dirêj amade bikin?**

Sala 1912ê, serokkomarê komarxwaz **William Howard Taft** ji ber zêdebûna şerên xebatê li Dewletên Yekbûyî bi endîşe ye. Lewre jî, ew ji Kongreyê dixwaze ku bala xwe bide ser têkilîyên pîşesazîyê. Cîgirê wî yê demokrat, **Woodrow Wilson**, neh endamên komîsyona lêpirsîna parlemanî ya derheqê vê peywirdar kirin. Li gulana 1914ê, ew bang li **Samuel Gompers** ê serokê *Federasyona Amerîkî ya Xebatê* (AFL) û Moris Hillquitê damezrîner û ramyarê *Partîya Sosyalîst* a di bin serokatîya **Eugene Dibbs** de dike, da ku cudatîyên li nav sendîkavanî û sosyalîzmê dîyar bikin. Ev cudatî li ser sedema heyînîya têkoşînên sosyal û armanca dawîn a têkoşîna sendîkayî xuya dibin: Parastina rojane ya berjewendîyên niha yên xebatkaran, yan jî amadekirina wan a ji bo têkoşîneke siyasî ya demdirêj. Di dema guhdarîyê de, **Gompers** pêşî pirsa xwezaya demokratîk a sosyalîzmê ji **Hillquit** dike. Bi dû re, rayedarê sendîkayî jî li ber lêpirsînê ye.

**Hillquit**: Gelo hûn, birêz Gompers, an jî Federasyon, bi rastî weha difikirin ku xebatkarên amerîkî îro hemû berhemên xebata xwe distînin? […]

**Gompers**: Bi min, kes nikare bi hûrgilî hesab bike ka xebatkar pareke çiqas mezin a berhemdêrîya xwe distînin. Lê belê rast e ku, bi xêra tevgera sendîkayî, ev par îro ji hemû demên dîroka modern mezintir e.

**Hillquit**: Rola sendîkayekê jî ev e ku para berhemdêrîyê ya ji bo xebatkaran veqetandî zêde bibe, ne wisa?

**Gompers**: Belê. Sendîka ji şirketê hêvî dikin ku ew ji bo xizmeta wan spasdarîya xwe şanî xebatkaran bike, lewre ku bêyî wan jîyaneke medenî nabe.

[…]

**Hillquit**: Eger di ber sala bê re, xebatkar % 5 zêde bistînin, gelo sendîka wê jê razî bibin û ji daxwazên xwe dakevin?

**Ger bûyer bi teorîyên we re, li hev neguncin, hûn ji xwe re dibêjin: "heyfa bûyeran"**

**Gompers**: Ku ez li gor zanîna xwe ya xwezaya mirovan bifikirim, bersiv neyînî ye.

**Hillquit**: Gelo tevgera karkeran wê dawî li daxwazên xwe bîne berî ku xebatkar para teva ya berhemdêrîya xwe bistînin, yanî berî ku, bi dîtina wan, edaleteke sosyal a rasteqîn çêbibe?

**Gompers**: Ez ê weha bersiva vê pirsa dabeşîya berhemên xebatê ku hûn çendî bi kubarî li ser radiwestin, bidim û bibêjim ku xebatkar -ez bêhtir dixwazim peyva xebatkar bi kar bînim, lewre ku ev însan in jî-, erê, xebatkar weke herkesî xwedî 'eynî daxwaz û 'eynî hêvîyê ne, ew naxwazin heta mirinê ji bo jîyaneke baştir bipên, ew vê jîyanê li vir û niha dixwazin, herweke şert û mercên xweştir ji bo zarokên xwe da ku ew bikaribin, rojekê, bi pirsgirêkên xwe jî bi ser kevin. Xebatkar hertimî rewşê didin guherandin û daxwazên xwe bi hemû hêza xwe diparêzin. Ew van hêzan bi awayekî asayî û aqilane bi kar tînin, ji bo ku pareke mezintir û timî di zêdebûnê de ya dewlemendîyan ji xwe re misoger bikin. Ew ji bo îdealên herî bilind ên edaleta civakî têdikoşin.

**Hillquit**: Di warê vebelavkirina dewlemendîyan de, gelo îdealên herî bilind ên edaleta civakî ne di sazkirina pergaleke weha de ne ku xebatkar, çi dest an çi aqilê xwe dişixulînin, çi berpirs an karker in, pareke tevahî ya berhemdêrîya xwe distînin?

**Gompers**: Hûn dizanin, masî bi gezkirina nîkê zeft dibe û mişk jî bi xwarina gepek penîr. Xebatkarê bi aqil bêhtir dixwaze bi pirsgirêkên îro mijûl bibe da ku bi pêş keve, li şûna şopandina xeyaleke ku tu caran di meşandina karên mirovane de rastî nebû û ez jê ewle me, dê rastî nebe jî. Xeyaleke weha ye ku eger bê rastîyê, metirsî heye ku ew ê bibe xirabtirîn pergala produksyonê ya aqil a mirovan îcad kiribe.

[...]

**Hillquit**: Gelo Federasyona Amerîkî ya Xebatê felsefeyeke civakî ya giştî daye ber xwe?

**Gompers**: Ew li gor dîroka rabihurî diçe û dersan jê distîne, da ku pirsgirêkên xebatkaran nas bike, xebata wan kêmtir zehmet bike, encamên baştir ên di warê çêbûna şert û mercên xebatê de bi dest bixe, ji bo mêr, jin û zarokan, îro, sibe û dusibe û heta sêsibe jî, ji bo ku heroj ji roja berê xweştir bibe. Prensîp, felsefe û armanca tevgera karkeran ev e: Misogerkirina jîyaneke xweştir ji hemîyan re.

**Hillquit**: Lê belê, ji bo van hewldanên başbûna roj bi roj, divê hûn fikireke taybet a başî û xirabîyê esas bigrin, ne wisa?

**Gompers**: Ne wisa ye. Eger hûn bernameyekê didin ber xwe, hertişt divê li gor wê bimeşe. Ku bûyer jî li gor teorîyên we nebin, ev tê maneya "dev ji bûyeran berde".

**Hillquit**: Birêz Gompers, ez vî tiştî ji we dipirsim. Hûn dibêjin ku hûn dixwazin qedera xebatkaran a rojane baş bikin. Lê belê, ji bo bibînin ka qedera wan ber bi başîyê yan xirabîyê ve diçe, divê pîvanên we yên cudakirina başî û xirabîya ji bo tevgera karkeran hebin, ne wisa?

**Gompers** [ew gotinên hev û du dibirin]: Deqîqeyekê. Gelo zelalbûnîyeke bêemsal lazim e, da ku mirov ferqa navbera meaşeke 3 dolaran ji bo rojeke heşt seetên xebatê û meaşeke 2.50 dolaran ji bo rojeke dwanzdeh seetên xebatê bibîne? Felsefeyeke sosyal a pir kompleks jê re ne pêwîst e.

**Hillquit**: Birêz Gompers, eger weha be, li gor feraseta we, gelo 4 dolar ji bo rojeke heft seetên xebateke di şert û mercên xweş de hîn baştir nîne?

**Gompers**: Bêguman.

[...]

**Hillquit**: Baş e. Lê dema ku we ev jî bi dest xist...

**Gompers**: Em ê zêde bixwazin.

**Hillquit**: Hûn ê têkoşîna xwe ji bo zêde pêşketinê bidomînin?

**Gompers**: Erê.

**Hillquit**: Ez dîsa 'eynî pirsê ji we dikim: Gelo têkoşîna tevgera sendîkayî wê heta naskirina tevahî ya karê xebatkaran bidome?

**Gompers**: Ew ê tucarî raneweste.

**Hillquit**: Ev pirsek e...

**"Em ji we dûrtir diçin. Lewra we ji xwe re asoyek hilbijartîye, lê ne em"**

**Gompers** [gotina wî dibire]: Em bigihîjin armancekê din jî, ya ku we niha anî ser zimên an yeka din jî. Xebatkar wê tucarî dev ji têkoşîna ji bo jîyaneke baştir, ji bo xwe, jin û zarokên xwe û tevahîya mirovahîyê bernedin.

**Hillquit**: Armanca sendîkayê, bidestxistina edaleteke sosyal a teva ji bo wan, jin û zarokên wan e?

**Gompers**: Ev têkoşînek e ji bo başkirina her roja jîyanê.

**Hillquit**: Her roj û her dem...

**Gompers**: Her roj. Sînorê wê tune.

**Hillquit**: Heta...

**Gompers**: Heta hetayê.

**Hillquit**: Bi gotineke din...

**Gompers**: Bi gotineke din, em ji we bêhtir pêş de diçin [ken û çepikên salonê]. Hûn asoyekî li ber xwe deynin, em weha nakin.


**Hillquit**: Hûn bi awayekî resmî îfade dikin ku AFL, ligel armanc û kirinên xwe, ji Partîya Sosyalîst a betalkirina pergala heyî ya qezenc û meaşan dixwaze, bêhtir pêş de diçe û hewl dide ku xebatkar berdêla tevaya berhema xebata xwe bistînin.

**Gompers**: Hûn dixwazin ku ez piştgirîya xwe ya ji bo organîzasyona civakî ya hin xeyalperestên we di xewnan de dîtine îfade bikim û heta bibêjim ku ez dixwazim pêşdetir herim jî. Ez weha dibêjim ku tevgera xebatkaran wê meyla mirovan a ji bo daxwaza şert û mercên jîyanê yên baştir bişopîne û xebatkar wê bi vê riyê de bimeşin, bêyî ku ji armanca we yan armanceke din a pêşdetir here bifikirin. [...]

Şerê cîhanê yê yekemîn wê bibe sedema jihevveqetîna tevgera sendîkayî ya amerîkî. AFL (û Gompers) ê piştgirîyê bidin beşdarîya şerî ya Dewletên Yekbûyî. Fraksyoneke anarşîst-sendîkayî, Industrial Workers of the World, wê li dijî vê yekê derkeve; zilmkarîya hikûmetê ya ji ber vê nihêrîna wan dê beşeke fraksyonê tune bike. Bi pey re, AFL wê weke Hillquit xwestibû tu caran li hember kapîtalîzma amerîkî dernekeve; berevajîya wê, ew ê hewl bide ku endamên wê herî pir ji dînamîzma wê feyde werbigirin.

**Çavkanî**: *"Rapora dawîn û şahîdîya ji hêla Komîsyona Têkilîyên Pîşesazî ve ji Kongreyê re pêşkêşkirî", Waşington, Government Printing Office, 1916, r. 1526-1529.*

Wergera ji fransî: Simko Destan



SERPIL ODABAŞI: **Bênav**, 100 cm x 40, teknîka tevlihev li ser tuwalê

www.arsivakurdi.org

Li gel partîyeke komunîst ya gelek hêzdar û di nava fûrandina niqaş û teorîyên rexnegirtî de, Îtalya, demeke dirêj bû navendeke referensa hêzên çep yên Ewrûpayê.

# Rûyê mîlîtanîzma îtalî

FRANCESCA LANCINI *

Rişteyên teze ên bi goşt – *casoncelli*– û mirîşkên heşandî yên bi beharata hindî: Li **Brescia**yê, şûngeha (1) sereke ya *Partîya Demokrat* (PD) sifreyeke xwarinên *"ji rengan û ji çêjan"* pêşkêş dike. Li pişt dezgehê keçeke ciwan a senegalî xizmetê dike. Bi temamî sembolek e ev dera ku Lîga Bakur ku bi helwestên xwe yên dijbîyanî, di nav koalîsyoneke rastgir ya ji sala 2008an ve, bajêr û derûdorê bi rê ve dibe. Kombûyî li dora maseyekê û qahwe li ber wan, gelek milîtanên kal, hema hema giş komunîstên berê, rojevê dinirxînin, ji "***Rubygate***" (2) heta şertûmercên karkerên fabrîkayên otomobîla ***Fiat***ê guftugoyan dikin. Li vê taxa populer jî weke li navendê, ji bîst û pênc salan ve ye ku bîyanî bi şênîyên xwemalî re tevîhev dijîn. Ew ji sedî 15yê rûniştvanên vê herêmê pêk tînin; hêza wan a kar di pîşesazîya giran, karûbarên xizmetê û terşvanîyê de xwedî rola motorê ye. Li Bakurê Îtalyayê, koçberîya bîyanî –dîyardeya ku diçe heta salên 1970yê– yek ji pirsgirêkên herî girîng e ji bo Partîya Demokrat. DP yekane partîya çepa navendî ye ku li Parlemanê tê temsîl kirin û herwiha ew ji alîyê her du partîyên din ên ku bendgirîya rastçepê weke tiştekî demode dinirxînin ve tê destek kirin: Îtalyaya nirxan û Tundrewên îtalî.

Partîya Demokrat a di 2007ê de ji nav yekîtîya pêşverûyên çep û katolîkên demokrat derket holê û bi gewde bû, piştî çar salan niha xwedî heft sed hezar endam û zêdetirî heft hezar şûngehan e. Bi statuya xwe, ew xwe reformîst, ewropî û navenda çepê dibîne. Lê belê alîgirên wê yên jidil gelek caran wê bi şîlobûn, zêde ji lihevhatinê re amade, ji pevçûnan re amade û beramberî herî xizanan, xemsar rexne dikin. Bi kurtî, li gor wan, ew ji xeyala xwe ya guherandina cîhanê vegeriyaye. Karkerê malnişîn ê 68 salî **Ugo Zecchînî** dibêje: "*Ez jî koçber im. Ez ji Toskanayê dihatim û ji bo bênirxkirina min ez weke başûrîyekî dihatim dîtin. Ji ber vê yekê ez xwe nêzîkî kesên bîyanî ku ji bo li bakur bixebitin hatine, hîs dikim. Cihêkarîyên ji alîyê Lîgê ve hatine ferz kirin, pirsgirêkên cidî ne û çepa îro baş bi vê yekê nehesiyaye*". Di çarçoveya hewldaneke dîyalogê li gel Lîga Bakur de, sekreterê Partîya Demokrat, **Pierluîgî Bersanî**, li hemberî vê pirsgirêkê hinekî xweşbînî nîşan da: *"Ez dibêjim Lîg ne nijadperest e, lê belê, ez bala we dikşînim: Bi handana hin refleksan, mirov dikare nijadperestîyê hilberîne"*. (3)

Eger hûn bawerîyê bi gotinên **Zecchînî** bînin, kevnemilîtanê qedîm ê komunîst ku îro endamê Partîya Demokrat e û alîgirê çepeke reformîst e, ev korîtî wê bûbe sedemê nakokîyekê: Eger hejmareke mezin a karkeran di salên dawîyê de dengê xwe dabin Lîga Bakur, ji ber ku çepa vî welatî hêdî hêdî têkilîya xwe ya bi beşên xizan ên civakê re winda kiriye. Populîzma ku xwe di slogana "Patron li gel me ne" îfade dike, xuya ye wê bûbe cazîbeyek ji bo karker û karmendên bi meaş ên ku dawîya mehê bi zehmetî tînin. **Zecchînî** wiha dewam dike: *"Çepa berê, tiştekî din bû. Ji nav bermahîyên piştî şer, ew dikete nav hewldana biserûberkirin û başkirina civakê. Wê dikir ku em bikaribin xwe weke aktorên ronesansa welêt bibînin. Perwerdeya me ya siyasî ji ciwantîya zû ve bi ketina nav fabrîka û xweqeydkirina li sendîkayan dest pê dikir û di pey re jî me karta xwe ya endamtîya Partîyê bi dest dixist. Fabrîka ji bo me weke zanîngehê bû. Bi civîn û mîtîngan, em dibûn xwedî hişmendîya xwe ya derbarê şertûmercên me û cîhana derve de. Bi awayê herî rasterast me hîs dikir ku em dikarin xwe ji sefalet û bêedaletîyan rizgar bikin".*

### "Me di nav rehetîyê de xwend û em bi hêsanî jîyan, lê belê tu perwerdeyeke me ya polîtîk nîne"

Lê belê ji salên 1980yê ve, ***Brescia*** weke deverên din ên Îtalyayê rastî guherînên girîng hat: Pîşesazîyên mezin ên weke şirketên piçûk parve bûn, sendîka gav bi gav bûn çiqil û şax û ji partîyên siyasî qetiyan; tevgera karkeran a hûrhûrbûyî, ji tiştê ku ew dikir hêz bêpar dimîne. Û bi cîhanîbûnê, xebatkarên nû yên xizan bi tênê û bêdeng dimînin. **Tommaso Gaglia**yê mezûnê beşa wêjeyê yê 27 salî yê ku bi organîzekirina çalakîyên çandî ("sîne- forum", ziyafetên pirqewmî, konser, ûhwd.) hewl dide ji nû ve vê derdora Partîya Demokrat zindî bike, wiha li xwe mikur tê: *"Pêvajoya salekê, ji bo peydekirina karekî, bêyî ku bersivekê bistînim, min nameyên namzedîyê şandin. Em ciwan, em nizanin ka paşeroj çi ji me re dihêle, lê belê divê em di nav ferdperestîyê de xwe winda nekin. Ji serdema lîseyê ve, ez bi siyasetê ve mijûl im, ji ber ku ez ketime pey lêgerîna rêyeke ku bi awayekî berbiçav destûrê dide guherandina tiştan, weke ku nifşa Zecchînî jî wisa kir"*. Serdema dibistanên partîyê têra xwe dûr e: *"Şansê me ji yê dêûbavên me zêdetir e. Me perwerde dît û me ciwanîya xwe di nav rihetî û xweşîyê de derbas kir, lê belê me ti perwerdeya siyasî nedît. Partî di vî warî de ti tiştî nake û jixwe deverên hevdîtin lê pêk tên jî pir kêm in"*.

Qata jor a van şûngehên ku ji buroyên fireh ên *Partîya Demokrat* pêk hatine, bûye cihê hevdîtina mîlîtan û rêvebiran. Di navbera wan de, **Pîetro Bîsînella**yê 45 salî, sekreterê herêmê û şaredarê wargeheke ku bûye sembola bihevrejîyana kesên xwecih, hindistanî û pakîstanîyên ku li nav kargehên çandinîyê dixebitin, an jî **Mîşele Orlando**yê 35 salî yê ku bajarekî sereke yê çep birêve dibe û weke ku ciwanên kadro yên Partîya Demokrat bi nav dikirin, *rottamatori* –"yên ku têkilîyên wan nemane"– venûkirineke kadroyên rêvebir hêvî dike. Yek ji mîlîtanên herî çalak, Glorîa Bargîgîaya 29 salî hêvî dike ku ev ciwankirin wê bandorê li bingehê jî bike. Berî belavkirina belavokên rojane ew wiha dibêje: *"Dêûbavên min sosyalîst bûn û wan coş û heycana siyasî derbasî min kirin, lê belê tevî vê yekê jî ez xwe weke bîyanî hîs dikim. Ji nav kesên ku hem jî û hogirên min in, kêm kes li partîyekê qeydkirî ne. Çalakvanîya mîlîtanî hê jî ji alîyê delegeyên berê ve tê temsîl kirin".*

Di qahwexaneyeke wêjeyî ya navenda bajêr a nêzîkî zanîngehê de, ciwanên sendîkaya piçûk a xwendekaran *Sinistra per* (di wateya ferhengî de "Çep ji bo") zêdetir bi bawerî xuya dikin. Piştî hilweşîna Dîwarê Berlînê, di pêvajoya operasyona "Destên paqij" de – erdhêja huqûqî ya ku bû sedemê buhrana partîyên dîrokî û hatina ser deshilatîyê ya II. Komara îtalî– û bi "berluskonîzm"ê re (4), ew mezin bûn, lê belê ew hêvîyên xwe li nav jinûve piştrastkirina nirxên avakar ên çepê bi cih dikin: Divê *"pêşî yeksanîya şertên destpêkê pêk bîne",* Federico Michelî, xwendekara felsefeyê vê yekê wisa derdibire. *Reforma zanîngehê ya wezîrê perwerdê **Mariastella Gelmini**, ê ku dîplomaya xwe li vir li Brescîayê wergirt, fînansmanên raya giştî bi gotineke din, bûrsên perwerdê, yên ji bo odeyan û kantînê kêm dike. Eger em giş ne xwedî heman derfetan bin, gelo mirov çawa dikare demokrasîyê pêk bîne?"* Li gor **Mîchelî** yê ji bo pêşvebirina têgeha xwe ya çepê konseran, dersên wênekêşîyê, şahî û guftugoyan rojnameya zanîngehê û ***Facebook***ê bi kar tîne, hukûmeta rastê ji bo çandê zêde tiştekî nake. **Mîchelî** wiha dewam dike: *"Carna, ez pir diêşim dema dibînim ku ciwan parastina qencîyên hevpar ji xwe re nakin xem û serê xwe pê re naêşînin. Lê belê ez li ber xwe didim, lewre, weke ku **Antonio Gramscî** digot, "ez ji xemsaran nefretê dikim"."*

Li Pratoyê, şaredarîya bingehîn a Îtalyaya navîn, ev du roj in hewaya bayê bakur serdest e. Hesteke hevpar a melisîn û serîtewandinê xwe dide der. Mirov li wir hêvî dike ku têkeve nav wê firtoneya ku weke ku ji salan ve ye vî bajarê berxwedana li dijî faşîzmê, hildiweşîne, bajarê ku hê berî demeke nêz li herêma "sor" a Toskanayê keleha çepê bû. (5) Di 2009ê de, piştî şêst û sê salên di bin rêveberîya çepê de, şaredarî kete destê navenda rastê, di dema herî xirab a buhrana aborî ku li herêma tekstîlê ya herî berfireh a Îtalyayê xwe nîşan da. Di şeş salên dawîyê de, di pîşesazîya tekstîlê de, zêdetirî du hezar kes ji karê xwe bûn. 5.7 mîlyon endamên sendîkaya herî kevin a îtalî ya ku ji berê ve çepgir e, Konfederasyona Giştî ya Îtalî ya Kar (CGIL) hewl didin, çareserîyan bibînin, lê belê zêde jî naxwazin xwe bixapînin. Sekreterê li dora pêncî salî yê bûrsa kar a CGILê **Manuele Marîgollî** dibêje: *"Di salên 1970yê de, gava ez bûm delegeyê sendîkayî, ez difikirîm, -dibe ku bi awayekî kawikî be-, bi çalakîya mîlîtanî, ez ê karibim ji bo cîhaneke baştir bixebitim. Bêyî çalakîya girseyî, hêvî û xeyalên min wê neçûna serî. Lê belê hestê aîdbûnê girêdayî kapasiteya jêhatîbûna mirovî ye ya ku bikaribe di têkoşînê de bibe giranîyek. Bi navneteweyîbûna bazaran, mafên xebatkaran her diçe zêdetir dikevin bin tehdîdan û siyaset êdî nema tesîrê dike."*

### Çep demeke dirêj li ser pelên defneyan veket û ji bo ku siberojê dîsa vegere rewşa xwe ya caran, bi ser neket.

Heta deh salên dawîyê jî, **Prato** ti cara ranediza. Fabrîkayên wî rojê bîst û çar saetan vekirîbûn. Bi hatina reqabeta çînîyan û hindistanîyan, û otomatîzasyona hin karûbarên hilberînê, hejmara karkeran jî daket û ekîba şevê hema hema li hemû şirketan hate rakirin. Lê belê medya û cîhana siyasî bala xwe da ser çînîyên li bajêr ketin nav karûbarên afirandina tiştê ku weke "sectora paralel" a konfeksîyonê hat pêşkêş kirin û pê re jî gerûgeryana qaçax û karûbarê reş bi pêş ketin. (6) Ji bo serkeftinê di hilbijartinên şaredarîyê de bi dest bixe, navenda rastê giranî da vegotina ewlekarî û legalîteyê. **Marîgollî** vê rewşê jî wiha dest nîşan dike: *"Buhrana ku Prato tê re derbas dibe, ne bi hebûna bîst û pênc hezar çînîyên li vir dijîn, lê belê bi ya Komara populer dikare were îzah kirin. Bes in ev derew? Li Pratoyê, çînî ne bi tekstîlê ve, bi libaskirinê ve mijûl dibin. Ew ne raqîb in, ew ê karibûna bibin mişterî. Çareserîya buhranê di sînerjîyê de ye: Em, qumaşan hildiberînin û, li şûna dançêkirina konfeksîyonê li Romanyayê, me dikaribû ev yek bisparta wan.*" Ev e fikrê çepê û pêşketina sendîkalîstekî: *"Sazkirina têkilîyekê bi çînîyan re, tê wateya biserûberkirina wan û rizgarkirina wan ji nav şertûmercên koletîyê. Ji bo em karibin ji nû ve Pratoyê zindî bikin, divê projeya sererastkinê ya ji bo herkesî hebe."* Dema ku telefona wî bi israr lê dide, ew jî bi israr wiha dibêje: "*Li vê derê rast di hilbijartinan de bi ser ket, ji ber ku çep demeke dirêj li ser serkeftinên xwe yên berê raza û nezanî der barê paşerojê de bawerîyê bide. Encam: Karker ji xwe neçûn dengên xwe jî bi kar nanîn.*" Li welatekî ku tê de ji dawîya salên 1970yê û vir ve rêjeya xwevekişîna ji hilbijartinan her diçe zêde dibe (ji sedî 19,5 di hilbijartinên giştî yên 2008an de) – herçendî, di referandûma 12 û 13yên hezîrana 2011an de, hejmar gihişt asta têrkar jî,– sekretera herêmî ya Partîya Demokrat, **Îlarîa Bugettî**, ya 37 salî, tîne ziman ku der barê çepê de ew xwedî nêrîneke zelal e: "*Dibistan û tenduristîya civakê, xwegihandina xizmetên bingehîn, entegrasyona penaberan. Di salên 1990ê de, bi buhrana îdeolojîyê û ya partîyan û hatina nav siyasetê ya Berluskonî, em bûn şahidên erdhejeke ku hê jî em berdêlên encamên wê didin. Berluskonî modeleke civakî afirand û xweperestî ket nav siyasetê, ango ji wir û şûn ve êdî lîder ji tiştê ku tê gotin girîngtir e.*"

Li qehwexaneyeke navenda bajêr rûniştî, **Bugettî** dikeve nav coş û heyecanê gava ku gotin tê ser bîranîna rêhberekî karîzmatîk ê cihêreng: **Enrico Berlinguer**, sekreterê *Partîya Komunîst a Îtalî* (PCI) yê navbera salên 1972 -1984, tarîxa mirina wî. Niha ew yek ji rêveberên berê yên çepê yên herî bêrîkirî ne, ew êdî referanseke dema bihurî ye û bi nostaljî ew tê bi bîr anîn: Tevî xuyê xwe yê xwelipaşgir jî, ew ji ber bergehê xwe yê der barê paşerojê de, ji ber coşa xwe ya siyayî û helwêsta xwe ya sincî pir dihat teqdîr kirin. Di "mala gel" a Koîanoyê de, dilê çalakîya mîlîtan a çepa li bajêr, portreyekî wî yê reş û spî tê raxistin. Yek ji lingê çalakvanîyê û şûngehên PCI ya xwedî pênc sed endaman, **Mario Bensî**yê di salên xwe yên heftêyî de ye, wiha vedibêje: *"Ez im yê ku ev mal di 1975ê de ava kir. Niha demeke dijwar e ji bo çalakîvanîya mîlîtanî. Heta berî deh salan, "rêheval" ji bo vexwarina qehwê dihatin vê derê û diketin nav guftugo û sohbetên bêdawî. Îro, partî êdî bi gel re ne di nav danûstandinan de ye. Ji îdeolojîyê bêhtir nirxên me ji dest çûn, bi taybetî jî piştgirî û hevgirî. Niha her kes li xwe ye. Dibe ku berluskonîzm ketibe nav her yekî ji me. Serokwezîr, bi siyaseta xwe, televizyonên xwe û qanûnên xwe yên li gor berjewendîyên wî eyarkirî, karî hemû serwextîya rexnegir bifetisîne. Mîlîtan bûne kesên xeyalşikestî û xemnexur. Ew dibêjin: "Bi her halî, ev yek li her derê eynî ye"."* Gelek ji wan difikirin ku çepa îtalî dema desthilatdar bû, pevçûna berjewendîyan çareser nekiriye û rê ji **Berluskonî** re vekirî hiştiye.

Berluskonîzma ku weke perestgeha xuyayîbûn û halxweşîyê hatiye têgihîştin, û nifşekî alîgirên weke temaşevanên televizyonê afirand, dibe ku bi awayekî din jî çep bi jehra xwe xistibe. Mîlîtanekî çepê, nivîskarên du pirtûkên li ser mijarê **Sergio Puelli** (7) vê yekê wiha rave dike: *"Bi xizimgirîya xwe, rêvebirên temenên wan li derdora şêst salî ciwanên bikêrhatîtir tesfiye kirin. Ji ber vê yekê ye ku niha tê gotin ku lîderên ku karibin lingê xwe bidin yên lîderên rastê tunene."* Tarî dikeve erdê û rûniştî li dora maseyên li vê navenda weke maleke mezin a çîyê hatiye saz kirin, bi dehan mîlîtanên berê bi kaxezên îskambîlê dilîzin. Hinên din bi bîlardoyê dilîzin, her çi ciwanên taxê ne, ew jî li maçeke fûtbolê ya li ser ekrana televîzyonê temaşe dikin. Piştî şîvê, der barê wargehên komkirinê yên nazîyan de wê fîlmek were nîşan dan û dora rojê jî sê sed kesên astengdar wê ji bo ziyafetekê bên vexwendin. Tevî dijwarîyan jî, mala gel weke cihekî girîng ê hevdîtinan dimîne û herwiha ji bo şahîyên zewacê yên civatên penaber jî vekirî ye. Ev yek jî dihêle ku çep hê jî xwedî hêvî be li vî bajarî ku tê de Lîga Bakur encameke baş a hilbijartinê bi dest xist û rasta tundrew a **Azione Giovanî** û **Casa Pound** xwe da xuya kirin. Niha em Pratoyê li pey xwe bihêlin ji bo biçin Barîya li herêma Pouilles a li başûrê Îtalyayê. Çep ji mêj ve li vir kêmtir bi cih bûye, lê belê di 2005ê de, cara pêşî bi xêra dengên ji alîyê **Nîcola Vendola** –*Nichi*– yê ku di serdema xwe ya duyemîn de niha hê jî serokê herêmê ye, hatin bi dest xistin, çepa Îtalî karî xwe bigihîne deshilatê.

Ev siyasetmedar, ku bi awayekî vekirî ji xwe re dibêje homoseksuel û katolîk, bû yek ji aktorên herî populer ê dika siyaseta neteweyî. Piştî veqetîna ji *Refondasyona Komunîst*, wî di 2010an de *Çepa Ekolojî û Azadî* (SEL) ava kir. Ev partîya nû ya îdîa dike ku *"hewl dide çepeke nû li Îtalya û Ewropayê saz dike"* hê di mijdara heman salê de, bû xwedî 45 hezar endaman û zêdetirî pênc sed şaxên xwecihî, û "fabrîkayan". Prensîpên bingehîn ên SELê cot cot tên xebitandin: Aştî û ne-şidet, xebat û dada civakî, zanîn û veguhertina ekolojîk a aborîyê û civakê. Pir zehmet e ka kîjan cureyê hevgirtinê wê li gel Partîya demokrat di nav hukûmeteke nû ya gengaz de were pêk anîn, lê belê rewş ew e ku sêwiyên Refondasyona jarbûyî, demokratên çepê yên ku piştgirî nedan *Partîya Demokrat* ya ku her diçe zêdetir bi rengê navenda katolîk tev digere, tevgerên altermondialîst û yên çepeke hê radîkaltir giş xwe tê de dibînin.

Li paytextê herêmê Barî ya ku mîlîtangirîya ji bo ***Vendola*** koka xwe jê girtiye, rewşeke dijber heye û naşibe ya şûngehên *Partîya Demokrat* lê serdest e. Eger li ***Brescîa***yê mirov xwe rexne dikin, li vir jî coşûxiroş serdest e û bi taybetî li himberî şef. Di nav partîzanên herî çalak de, mirov dikare xwe bigihîne gelek ciwanên ku milîtanîyê li nav "fabrîkaya Nîchî" dikin, koma piçûk a li ser navê hukûmeta ku, di kêmtirî sê salan de, li tevahîya Îtalyayê û hetta li derve şaxên nû vekirin. Li vir, Vendola, ku dikare di hilbijartinên bên de bibe namzedê serokwezîrîyê, weke dîyardeyeke bi temamî nû tê dîtin. **Ed Testa**, hunermendekî kanadayî, 32 salî, yê ku bi têgihîştina grafîka Fabrîkaya Barî ve mijûl bûye vê îzahê dike: "*Bi îlhamgirtina ji **Organizin for America de Barack Obama**, em weke komîteya hilbijartinê ya ji bo Nîchî derketin holê."* (8) Yekî din ê sî salî, **Roberto Covolo** jî wiha lê zêde dike: *"Piştî jinûve hilbijartina Nîchî ji bo wezîfa walîtîyê, me xwe raguherand laboratuwareke nû ya çalakîgerîyê."*

### "Roja îro, xwe di şexsîyetek de dîtin gelek hêsantir e ku mirov xwe di referansên kulturî de bibîne"

Li Fabrîkayê, herkes bi dilxwazî dixebite û ti kes ne mecbûr e xwe li partîyê bide qeyd kirin. Navend têrronahî, rengîn û mêvanperwer e. Nav avahîyê bi temamî bi amûrên berê bikarhatî hatiye bi serûber kirin û xemilandin: Dolabên ji kartonan, sewîlên plastîk, bîdonên şîr ên weke kursî tên bi kar anîn. Bi qasî bist ciwanan, piranîya wan di temenên xwe yên sî salî de, beşeke mezin a wextê xwe li ser Înternetê derbas dikin da ku têkilîyên li gel Fabrîkayên din qayîm bikin. *"Rûpela me ya alîgir ji alîyê heştê*

www.arsivakurdi.org

*hezar kesan ve tê şopandin, ya Nîchî jî ji alîyê çar sed hezar kesan ve. Lê belê ji bo nûçemalpera Fabrîkaya Barî tenê sed kes qeydkirî ne"*: **Covolo** qebûl dike ku vekişandina mîlîtanên nû ber bi xwe ve, nexasîm jî bêyî bikaranîna nîşana "Nîchî", ya mohrkirî li ser T-shirtan, pêjgîrên peravê û nîşanên din, ji bo wan jî pir zehmet e. Gelek çavdêr difikirîn ku sekreterê *Partîya Demokrat* **Pîerluîgî Bersanî**, ji karîzmayê bêpar e, lê belê ew **Vendola** bi "populisme" ê an jî bi lîstina rola "Berlusconîyekî sor" sûcbar dikin. (9) Endamên Fabrîkayê jî wiha bersivê didin wan: "*Em alîyê erênî yê kesayetîkirina siyasî bi pêş dixin daku zêdetir kesan tevlî navê bikin. Îro, ji referansên çandî bêhtir kesayetî bi kêr tê ku mirov xwe zûtir nas bike. Di ser de jî, Vendola kesayetîyekî wêrek e û ev yek li Îtalyayê nabe para herkesî.*" Mîlîtan ji taybetmendîya wî ya lihevanîna bûyeran pir hez dikin, bi gotineke din ji jêhatîbûna wî ya bi zimanekî coş û helbestî axaftina li ser siyasetê, ku hem dijwar hem jî balkêş e. Nizbet bi alîgirên Partîya Demokrat, ew xwe laîktir, xwezaparêztir û rêzgirên mafên kedkaran dibînin, lê belê karûbarê wan berî hertiştî danûstandin û ragihandin e. Dîrûşmeya optîmîst "Îtalyayeke baştir jî heye" mîna vegotineke olî tê pir bare kirin, bi wê çendeyê ku ji mirov kirî ku mirov li navendeke ajansa reklaman e. Propagandîstên wê ji ber valahîya di qada çepê de Vendolgirîyê weke tiştekî nû pêşkêş dikin, lê belê endamên Fabrîkayê di asta desnîşankirina naverok û bernameyên stratejîyeke pêşvebirina cîhanê de bi dudilî tevdigerin.

Ji bo peydekirina vê yekê, divê mirov biçe navenda SELê, ya ji Fabrîkayê şerpezetir û kêmronîtir. Li wir **Annalîsa Pannarale**, sekretera herêmî ya 35 salî, li ser pêwistîya hewldanên ji bo entegrekirina jinan û ciwanan di nav jîyana siyasî ya welatekî zêde kevin û mejîzilam de israr dike. Li gor wê, divê pêşikîyeke mutleq hebe: Xurtkirina enerjîyên bikaribin ji nû ve bên bi kar anîn ên ku herêma *Pouilles* wan îxracî deverên din ên welêt dike. Baş birêvebirina *Vendolgirî*yê herwiha bi desteserkirina malûmilkê Mafiayê û geşedana tûrîzmê re tê têkildar kirin. Li gel vê yekê jî, li vê herêma ku di wateya mîrasa xwezayî û hunerî de yek ji herêmên herî xweşik ên Îtalyayê ye, pirsgirêkên mezin hebûna xwe didomînin.

Pergala tunduristîyê, niha di bin lêpirsîna dadgeha ***Barî*** de, di buhraneke mezin re derbas dibe (10) û plana herêmî ya ku girtina hijdeh nexweşxaneyan daye ber xwe, dibe sedemê nerazîbûnan. Dezgehên pir baş li ber girtinê ne. Hejmareke mezin bijîjk bi peymanên wextî û bi meaşekî pir daxistî wezîfeya xwe didomînin. Beşên acîl ên nexweşxaneyan serdevde tije ne û lîsteyên nexweşên di rêzê de wisa dirêj bûne ku dawî li wan nayê. Pêşvebirina enerjîya bi bayê ji ber tesîra neyînî ya li hawîrdorê dike, rastî berxwedana jîngehparêzan tê. Sektora çandinîyê li ber hilweşînê ye. Siyasetên ji bo ciwanan ku ji alîyê *Vendolgiran* ve tên ecibandin, di eslê xwe de wê tesîra wan li ser rêjeya bêkarîyê ne zêde be, ya ku ji bo kesên temenên wan di navbera 15-24ê de hildikişe heta ji sedî 34ê. Ciwanên mirov li nav bajêr li wan rast tê, tînin ziman ku hêvîyeke wan a zêde tuneye. Ciwanekî ezep ê ku li meyxaneyeke li navendê li gel hevalê xwe ye, dibêje: "*Erê, ez Vendola nas dikim. Herçendî ez ji rastê bim jî, kêfa min jê re tê ji ber ku ew peyvbêjekî baş e. Lê belê ez bawer nakim ne li vir ne jî li Bakur ji bo min paşerojek hebe. Em giş, em ê biçin li welatên bîyanî bijîn.*" Ji wir ne dûr, li ketina Barî ya Qedîm, firoşkarek xeyalşikestina xwe wiha tîne ziman: "*Kes nakeve nav vê bazara sergirtî. Em, başûrî, em ho bûne li kolanan bimînin. Lê belê kî guhdarîya me dike?*" Li benderê, dezgehên masîfiroşan ên bi çîmento çêkirî vipîvala ne. Masîgirên ixtiyar du metre wêdetir, li ser kasayên ji daran eynî mîna berê masîyan radixin. Yek ji kesên di wir re derbas dibe dibêje: "*Ev cure nûjenî ya tê pêk anîn mirov nizane kengê ji alîyê siyasetvanan ve weke ne xwezayî tê dîtin.*" Bi qasê ji vir tê dîtin, mîlîtanên "Nîchî" aîdî serdemên pir dûr xuya dikin.

* Rojnamevan, Mîlan

1 "Şûngeh" tên wateya beşên xwemalî yên Partîya Demokrat

2 Di çileya 2011ê de, bûyereke sosret rû dide. Hat îdîa kirin ku Sylvio Berlusconî bi keçeke nexame re bi berdêla pereyan ketiye nav têkilîyên cinsî

3 *La Padania,* Milan, 15 sibat 2011

4 Bêjeya "berlusconizm" tê wateya deshilata takekesî, siyasî, aborî û medyatîk a Berluskonî û tesîra wî ya li ser civakê

5 Weke herêmên "sor" tên hesibandin, bi gotineke din, wargehên xurt ên çep, bajarên Emîlî-Romany, Marşe, Ombrî û Toskana

6 Li gor dadgehê, sêzdeh hezar çînî mafê rûniştina li Pratoyê wergirtine. Lê belê "kesên qaçax" û kesên li bajarên din ên Îtalyayê mafê rûniştinê bi dest xistine, ne di nav vê hejmarê de ne. Li gor çavkanîyên xwemalî wê hejmara wan li derdora bîst û pênc hezaran e

7 *Militanza di base. La metamorfosi della Sinistra tra anfitrioni e camaleonti,* Bastogi, Foggia, 2002; *Oltre i portroni. La caduta, annunciata, del centrosinistra,* Bastogi, 2010

8 Li destpêka rêveberîya Obama bi armanca komkirina destekên kampanyaya hilbijartinê ya ji bo pêşekîyên qanûnî yên serok, ev civata virtuel derketiye holê

9 Binêrin li Ernesto Galli Della Loggia, "L'orecchino populista", *Corriere della Sera*, Milan, 21 kanûn 2010 û Marco Travaglio, "Il Berlusconi rosso", *Antefatto*.it, 8 tebax 2009

10 Lêpirsîna berfireh a li ser sextekarîyên li nav sektora tenduristîyê ya Pouilles hate bi rê ve birin dîsa derbeyek li hukûmeta herêmî ya Vendola û bi taybetî li du hilbijartîyê Partîya Demokrat da: Serokê berê yê desteya herêmî Sandro Frisullo, û alîkarê serokê berê yê Tendurisîyê Alberto Tedesko

Wegera ji fransî: Baran Nebar



SERPIL ODABAŞI: **BOM!**, 50 x 50 cm, teknîka tevlihev li ser kaxizê

## Ezmûn

Ji bo ji pozbilindî, zikreşî, xirabî, tolazî û gunehên bêtir kokdar û mezintir ên ku navên wan ji xizanî û dewlemendîyê rizgar bibin, **Lîkurgus** kir ku welatîyên wî biryara tevahîya erdan bikin, milkê giştî bidin û ji nû ve parvekirina wan pêk bînin. Bi vî rengî ew êdî bêîstîsna li ser lingekî wekhevîyê bi hev re jîyan, lewra hemû bûn xwedîyên heman mîqdara erdî û ji ber vê jî bûn xwedîyên heman navgînên hebûnê. Ew bi tenê di nirx de li mezintirbûnê geriyan, lewma wê tu cihêtîyên din û tu newekhevîyên din nebûyana, ji bilî rûreşîya bêexlaqîyê û pesindayîna qencîyê."

Plutarque, Vie de Lycurgue 8 (Plutarx, jîyana Lîkurgus 8), *(ji alîyê Bernard Latzarus ve hat wergerandin). Lîkurgus kesayetîyek e ku rastîya wî ya dîrokî tê nîqaş kirin, û navê giştî ye ku dîrokzan li qanûnçêkerê Spartayê yê dawîya sedsala 9ê berîya Îsa dikin.*

"Tevahîya erdên di bin esmanan de wê ji alîyê gelê li bin esmanan bê çandin... Erd wê ji alîyê herkesî ve were çandin, birinc ji alîyê herkesî ve bê xwarin, herkes wê cilûbergan li xwe bike, herkes wê pereyan xerc bike. Wê newekhevî nemîne û tu kes wê bê xwarin û ardû nemîne."
*Qanûna çandinîyê ya li Meliktîya Esmanî ya Ahenga Mezin (Taiping Tian Guo) hatî qebûl kirin, ev li Çînê di navbera 1851 û 1864ê de dewleteke muxalif bû.*

"Dema ku gel her tiştê der barê dewletê de parve bike, hingê me yê bi rastî armanca 'başî û refaha gelî' pêk anîba; me yê ew dinyaya *datong*ê (yekîtîya mezin) a Konfuçyus doza wê dikir pêk anîba."
*Sun Yat-sen, şoreşgerê çînî [1866-1925], sê prensîpên gelî, dersa çardehemîn, ber bi 1912ê ve)*

## Du rûyên Partîya Sosyalîst

"Dema nakokîyên talî yên xwedî milkan ji bo berjewendîyên karkeran bi kar bîne jî, yan jî bê hemdê xwe xebat û çalakîya xwe bi ya partîyeke siyasî ji bo parastina maf û berjewendîyên proleteryayê bike yek, *[partîya me]* her partîyeke muxalefeta bingehîn dimîne û mirov nikare wê daxîne asta tevahîya çîna bûrjûwa û dewleta ku amûr di destê wê de ye. *(...)* Bi armanca xwe, bi îdeala xwe, bi navgînên xwe yên bi kar tîne Partîya Sosyalîst a ku ji bo di cîh de pêkhatina reformên çîna karker doza wan dike, dixebite. Partîyeke reformê nîne, belê ew partîyeke têkoşîna çîn û şoreşê ye."

*Danezana dawîyê ya kongreya damezrêner a Partîya Sosyalîst, şaxê Înternasyonala Karker ê Fransî, nîsana 1905ê, Serge Berstein ji ber girtiye,* Léon Blum*, Fayard, rûpel 86.*

"Em guherîn. *(...)* Erê, em difikirin ku aborîya bazarê navgîna hilberînê û pevguherînê ya herî bikêrhatî ye. Na, êdî em ji qutbûneke ji kapîtalîzmê bawer nakin. *(...)* Haya me jê heye ku kapîtalîzm asoya me sînordar dike, ji bo dehsala bê û bêguman ji bo demeke dirêjtir jî. Lê belê me di heman demê de biryar daye ku em bêserûberîya wê sererast bikin."

*Piere Mauroy, sekreterê pêşî yê PSyê, pêşgotina ji bo* Un nouvel horizon, Projet socialiste pour la France (asoyeke nû, projeya sosoyalîst ji bo Fransayê)*, Gallimard, Parîs, 1992, rûpel 11.*

## Internasyonalîzm

"Şerê dawî yê ku beşeke wî ya mezin şerekî dagîrkirina kolonîyan bû, di heman demê de şerekî ku bi alîkarîya kolonîyan hat meşandin bû. Bi nisbetên heta hingê nedîtî gelên kolonî xistin nav şerê ewropîyan. Hindistanî, reşik, ereb û malgaş li ser erdên Ewropayê li ser navê çi tekoşiyan? Ji bo mafên xwe yên ku demeke dirêjtir koleyên Ingilistanê û Fransayê bimînin. *(...)* Bi vî awayî pirsa kolonîyal bi tevahîya firehîya xwe, ne bi tenê li ser berên kesk ên kongreyên dîplomatan li Parîsê, lê belê li kolonîyan bixwe jî rojev e."

*Lenîn, axaftina dawîanîna li 1emîn Kongreya Înternasyonala Komunîst, 7ê Adara 1919ê.*

"Em dengê karkerên fransî ji pişta derabeyên girtîgehan dibihîsîn, ji wan girtîgehên ku hukûmeta plûtokrat a fransî ew avêtinê, hukûmeta ku ji hêrsa wan a mezin ditirse û li ber agirê girtiye dilê wan dilerize. Guhên me dengênîya pêlên deryaya bilind dibe ya karkerên brîtanî bihîstin, pêlên ku li lat û zinarên li ser wan keleha kapîtalîzma brîtanî bilind dibe, ev kîrkoka gelan, ev çeteyên navneteweyî, ev wêrankerên jîyanê! Bi kêfxweşîyeke jidil, em vê hemûyê dibihîsin û bawerîya me di hinavên me de mezintir dibe ku di nêzîk de ew roj wê bê ku kerb û derdên me nemînin û têkoşîna me bi ya we re bibe yek.

Em pê bawer in ku hûn ne bi tenê ji bo biserketina xwe, azadîya xwe şer dikin. Em bawer nakin ku hûn ê xwe ji zincîran rizgar bikin û me qeydûbendkirî bihêlin. Em bawer dikin ku piçûkdîtina efendîyên we li dijî karkerên rojhilat da ku li ser herdu alîyan jî çêtir serdest û zalim be, herikandî hinavên we, hûn ê weke kirasekî lewitî biavêjin. Bi tenê serketineke hevbeş a karkerên Ewropa û Amerîkayê û girseyên kedkar ên Asya û Afrîkayê wê azadbûna hemûyan were, ku lê kar bi tenê bi kêrî çendek zilamên dewlemend tê.

Heke hûn xwe rizgar bikin û me di rewşa koletî û xizmetkarîyê de bihêlin, hûn ê bi lez ji nû ve bikevin rewşa kole û xizmetkaran, lewra ji bo ku me di qeyd û bendan de û di girtîgehan de bigirin, hûn ê neçar bin li rojhilat û li başûr hêzên gardîyanên girtîgehan û polîsan jî bi xwe biparêzin, ava bikin; hûn ê neçar bin artêşan rakin da ku me sertewandî bihêlin; hûn ê neçar bin desthilatdarîya li ser me bidin general û walîyên xwe. Û ew ê ku bi tahma jîyana bê ked û xebat a li zirara me hisiyaye, pê tahmişkî bûye û fêrbûye gelek nifşên karkerên rengî bixin xizmetkar, wê berê singûyên xwe bizivirînin ser we jî û dewlemendîya li Asya û Afrîkayê berhevkirî wê ji bo ku we dîsa bikin kole, were bi kar anîn. *(...)*

Hûn nikarin xwe azad bikin bêyî ku di têkoşîna me ya azadîyê de hûn pişta me bigirin. Dewlemendîya welatê me di destê kapîtalîstan de ye, navgînek e ji bo ku serî li we bitewînin. Heta ku kapîtalîstên brîtanî dikarin bi awayekî serbest keda cotkarên hindistanî, misrî û tirk bimijin, heta ku ew dikarin ji wan bidizin, heta ku ew dikarin li ser wan ferz bikin eskerîyê di artêşa brîtanî de bikin, wê timî têra wan dewlemendîya wan û xizmetkarên wan hebin da ku serî li karkerên brîtanî bitewînin. Bêyî serhildana me serketina proletarya dinyayê li dijî sermayeya dinyayê nabe. Û ji ber ku bêyî ku hûn bi me re bibin yek, hûn nikarin desthilatdarîyê ji dest kapîtalîstan bistînin, em jî bêyî ku bi we re bibin yek, nikarin desthilatdarîyê bikin ya xwe. *(...)* Hûn û em bibin yek, em hêzeke neşkestbar pêk tînin."

*Banga li karkerên Ewropayê ya ku ji Kongreya Gelên Rojhilat hat kirin, ev kongre 1ê îlona 1920ê li Bakuyê ji alîyê Înternasyonala Komunîst ve hatibû organîze kirin. Civîna ku nûnerên ji dehan welatan, ji Hindistan heta bi Tirkiyeyê, ji Çînê heta bi cîhana ereb dianîn cem hev, armanca wê ew bû ku gelên welatên kolonîkirî û proletaryaya dinyaya kapîtalîst bike yek.*

## Hêmanên Stîlê

**Nirx**
"Mirovekî şoreşger serî natewîne, lê belê maqûl û dilnizm e; ew basîd e û tu luksa mutewazîbûna qelp jî nîşan nade; ew dijminê tevahîya derewan, çavlêmiçkirinan û nimayişkarîyê ye û nabe ku bi wan re li hev were. Ji ber ku armanca wî biserketina Şoreşê ye, ew tu caran wê rûreş nake, lê belê dijminên xwe şermezar û rûreş dike bêyî ku şoreşê bixe nav wan; ew heqaretê lê nake, lê belê ew wê ronî dike; û ji bo paqijîya wê çavnebar e, dema ku ew behsa wê dike, ji bo rêza jê re digire li xwe miqate ye; ew xwe weke wekhevê otorîteyê be ku qanûn e, nîşan nade, ew xwe weke wekhevê mirovan û nexasim jî bextreşan nîşan dide. *(...)* Mirovekî şoreşger lehengekî maqûlbûn û rastîbûnê ye."

*Saint-Just au Comité de salut public (Saint-Just li komîteya silametîya gelemperîyê), 15ê nîsana 1794ê.*

## Şaredarî

"Luiz Inácio da Silva,
Kevne-boyaxvanê pêlavan, kevne-boyaxvanê cawan, kevne-karkerê tornayê, kevne-sendîkavan.
Brezîlîyekî weke we."

*Slogana kampanyaya hilbijartina walîtîya eyaleta São Paulo ya Luiz Inácio da Silva sala 1982yê bi kar anî.*

## Qutbûn

"Di salên 1960ê de meyila me ew bû ku em siyaseta çepê ne bi armancên ku dixwest bigihêje wan, lê belê bi navgînên ku wê ji bo bigihêje van armancan bi kar dianîn, terîf bikin. Armanca herkesî li ser li hev dikir sosyalîzm bû, navgîn yan jî rê, şerê çekdarî yan jî têkoşîna bi sazûmanî bû. Li gor van pîvanan çepeke şoreşger û yeke reformîst ji hev dihat cihê kirin. Di salên 1990ê de me dest pê kir peyva 'çepa nû' bi kar anî, da ku carinan behsa çepa dev ji têkoşîna çekdarî berdayî da ku dest bi têkoşîna bi sazûmanî bike û carinan jî behsa 'çepa civakî' ya ji gelek hêmanên cihê yên weke miletên xwecihî, jin, jîngehparêz, parêzvanên mafê mirovan û hwd. pêkhatî bike. Ez bixwe dixwazim terîfeke tengtir a elaqedarî armanca mirov dixwaze bigihêjiyê, pêşnîyaz bikim û ji bo vê jî divê em ji xwe bipirsin ka gelo ya em lêdigerin ciwankirina kapîtalîzmê ye, bi mirovtirkirina wê, yan jî civakekê ava bikin ku pêdiviya pê nahêle. Ango, li gor min çep weke tevahîya hêzên ku ji bo avakirina civakeke alternatîfa sîstema kapîtalîst a mêtinkar û mentiqê wê yê kar têdikoşin e, ez jî li civakeke karkeran difikirim ya ku li gor mentiqê mirovperwer û piştgir hatiye bi rêk xistin da ku bersivê bide pêdiviyên mirovî *(...)*, ango li civakeke sosyalîst."

Amérique Latine, Laboratoire pour un socialisme du XXIe siècle (Amerîkaya Latîn, labaratuwara ji bo sosyalîzmeke sedsala 21ê)*, weşanên Utopia, Parîs, 2010. Marta Harnecker şexsiyeteke tevgerên azadîyê yên latîno-amerîkî ye, şêwirmendîya hukûmeta Hugo Chávez kiriye li Venezuellayê.*

## Bi awirên ji rastê ve çep

"Di dawîyê de êdî dibe ku rasta fransî tiştê sosyalîstên ingilîz berîya deh salan kirî, bike."
*Nicolas Sarkozy, zanîngeha havînî ya Tevgera Şirketên Franseyê (Medef), 30yê tebaxa 2007ê.*

"Dema ku ez dibihîsim Gerhard Schroder li Almanyayê ev salek bêtir e, ji min re behsa projeya xwe ya dawîlêanîna tezmînata ji bêkaran re dike û Tony Blair behsa taybetkirina nexweşxaneyan dike, ji me hersêyan ez xwe ne weke yê herî kêm çepgir his dikim."
*Jean-Piere Raffarin,* Le Monde *ji ber girtiye, 27ê sibata 2004ê.*

"Sosyal-demokrasî, qebûlkirina lîberalîzma hov e, da ku ji hedê xwe zêdetir gotinên poşmanîyê bikin."
*Philippe Séguin,* Acteurs de l'économie*, Lyon, çirîya paşîn ya 2004ê.*

"Di dawîyê de bi ya min devera herî lawaz a siyaseta çepê –ya herî bingehîn– ew e ku ew çepgir nîne! Ev tesbîta krîtîk a ku gelek hilbijêr û sempatîzanên çepê jî bi dizîka parve dikin, piranîya heyî zivêr dike û dike ku nizanibe berê xwe bide ku. Bi tenê rastî diêşîne. Wicdanê çepa hukûmetî ne rehet e. Ew baş pê dizane ku birêveberîya wê ya aborî di bin nîrê aborîya bazarê û kapîtalîzma globalbûyî de ye; ew baş pê dizanê ku jê nayê alternatîfeke cidî pêşkêş bike. *(...)* Çiqasî hejmara taybetkirinan zêde bibe (France Télécom, Crédit Lyonnais, Thomson, CIC, GAN, Aérospatiale, Air France...), çiqasî borsa bilind bibe (di nav sê salan de nêzî % 100ê), çiqasî qadên hevrikan fireh bibin (tele-ragihandin, enerjî, sektora bankeyan, sîgorte) ewqasî zêde ji me re tê rave kirin ku ev hemû di nav çarçoveyeke sosyalîst û mirovî de pêk tê."

*François Fillon,* Libération*, Parîs, 7ê adara 2000ê, der barê hukûmeta "çepa pirreng" de a ku Lionel Jospin ew bi rê ve dibir.*

Wergera ji fransî: Luqman Guldivê

www.arsivakurd.org

Gelo hêsantir e ku mirov awayên xerckirinên xwe rexne bike an awayên afirandinên xwe? Ger kes nemabe ku bi firehbûna kriza jîngehê ya li pêşîya însanîyetê nehesîya be jî, krîza ku li hember medenîyetê ku berdewama wê ye, kêm kes pê dizanin. Mirovê karibe vê pirsgirêkê çareser bike, tenê dema ku mirov nexweşîyê bi awakî zelal tesbît bike û bi cidîyeta meseleyê bihese.

## DOZA JÎNGEHPARÊZÎYÊ Û DOZA MIROVPARÊZÎYÊ

# Neslê mirovan jî biparêzin, ne tenê xwezayê!

LUCIEN SÈVE *

Erdê dinyayê -em weha jîngeha xwe ya xwezayî bi nav dikin -, ber bi xirabûneke mezin diçe, haya hema bibêje herkesî jê heye û hemû partîyên siyasî *doza jîngehparêzîyê* qet nebe di axaftinên xwe de derbas dikin. Erdê mirovî -em weha cinsê mirovî bi nav dikin-, ber bi xirabûneke weha mezin jî diçe, haya hema bibêje tukesî jê nîne û partîyeke siyasî jî tune ku bi qasî doza jîngehparêzîyê, behsa *doza mirovparêzîyê* jî bike. Armanca vê nivîsarê, pirsîna vê cudatîyê ye.

Ji kesên herî kêm meraqdarên siyasetê jî bipirsin ka doza jîngehparêzîyê çi ye. Bêguman, ew ê ji we re bibêjin ku germbûna îklîmê ya ji ber gazên serayê me ber bi dewreke felaketan dibe, ku gemarbûna erd, av û hewayê li pir deveran digihîje rêjeyên êdî nayên ragirtin, ku xilasbûna serkanîyên nayên nûkirin esas dawîya awayê me yê hilberandin û xerckirinê bi xwe re tîne, ku bikaranîna enerjîya nukleer jî tijî rîskên bêçare ye. Piranîya wan jî wê êrişên li ser cihêrengîya bîyolojîk zêde bikin û wê bi gotinên xwe, pêwîstîya ecele ya bi kêmkirina mohra welatên zengîn a li ser jîngehê îfade bikin û weha dawî li axaftinên xwe bînin.

Kesên ne meraqdarên siyasetê bin, çawa van hemû tiştan dizanin? Bi riya medyayên bê navber agahîyên li ser jîngehê diweşînin. Bi tecrubeyên rasterast ên van agahîyan timî piştrast dikin, ji rewşa hewayê heta bi bihayê benzînê. Bi axaftinên zanyar û siyasetmedarên ku van agahîyên netemam dikin nêrîneke dinyayî û ji vê nêrînê jî, bernameyeke siyasî ya li herderî pêşxistî derdixînin. Bi derbasbûyîna dehsalan, çandeke weha saz bû ku berjewendî û çalakîyên berfireh ên vê meseleya mezin, *doza jîngehparêzîyê*, pêk tînin, li hev anîne.

Piştî vê, derheqê *doza mirovparêzîyê* jî bipirsin. Bêguman, di serî de tukes wê di pirsa we tênegihîje. Ka em şirove bikin: Gelo hûn di vê bawerîyê de ne ku mirovahî bi qasî dinyaya me xira dibe, ku alîyê medenî ya *cinsê mirovî* bi rastî di bin xetereyê de ye, xetereyeke weha ku li gel meraqa acil a parastina xwezayê - doza jîngehparêzîyê -, divê meraqeke parastina *mirovahîyê* jî, di tarîfeya kalîtatîv a peyvê de, bi qasî wê girîng jî hebe -doza mirovparêzîyê? Ev pirs wê xelkê matmayî bihêle. Pir kes wê bibêjin ku hûn meseleyê dinepixînin. Helbet, ew ê mijarên cihê endîşeyê jî bi bîr bîne -sertbûna mercên jîyanê, pêleke rabûna ezperestîyê, dûrxistina jîyana umumî ji exlaq û fikarên ji bo siberojê... Lê belê, fikira ku mirovahîya me bi qasî dinyayê di bin metirsîyê de ye, dê ji bo wan ecêb be.

Ka em israr bikin. Gelo em ber bi cihaneke weha naçin ku jîyana *mirovane* lê heram dibe? Gelo em bi imkanên xwe yên heyî, quweteke xirab û zêde nadin meteloka kevin a dibêje ku *"mirov ji mirovan re gur in"*, heta ku li pir waran jî bibe qanûn? Kar, mînakeke sereke ye ku xirabûna şert û mercên wê bi awayekî ku mirov fikaran bike her ber bi jêr diçe.

Hilberîna xebateke bi kalîte û bi nirx her diçe zehmetir dibe, berpirsiyarî ji xebatkaran tê xwestin û di heman demê de tê asteng kirin,, reqabetkirina wan a birêkûpêk, îmhakirina bi qesd a sendîkavanîyê, pedagojîya *"Fêrî xwefirotinê bibin"* û *"Bibin kujer",* birêvebirina şirketê ya bi terorê, hertiştê ku di nuxteyeke dawîn de dicive û dibe sedema xwekuştinên li qada kar, dîktaya herheyî ya qezencdêrîya duhejmaran, prîma daîmî ya ji bo çavbirçîtîya hissedar, zêdebûna neheqiyên bê exlaq û patronên keleş, bi kurtasî, dîntîya nûlîberal, awayekî xebîs ê kapîtalîzma dawîn. Gelo em bi riya jimirovahîbûneke rasteqîn de naçin?

Lê belê, ew ê bibêjin, haya herkesî ji van tiştan heye, ji bilî vê navlêkirina ecêb a *doza mirovparêzîyê*. Gelo jirêderketinên civakî yên meraqdêr nabin cihê hişyarî, lêkolîn û çalakîyan? Mesele drama kar: Gelo fîlmên baş haya me pê naxin, psîkologên weke **Marie Pezé** an **Yves Clot** (1) rohnî nadin ser, li her alî banga redkirina birêveberîyên jimirovahîker li me nakin? Haydarîyeke teva ya xirabîyên ranegirî yên pergala dinyayî ya ku me bi rê ve dibe, di çêbunê de ye. Hêzên siyasî yên di Enîya Çepê de yekbûyî, banga devjêberdana kapîtalîzmê dikin da ku rizgarkirina mirovî pêşdetir bixin. Partîya Kesk, armancên civakî û sazûmanî yên xurt, demokratîk û destbiratîyê bi doza jîngehê ve girêdide. Aborînasên pirhejmar li dijî pîvana teng a *Hatina Hundirîn a Brut* (HHB), nirxandinên serkeftîbûnê yên ku xirabîyên mirovî digel başîyên produktîvîst di xwe de vedihewînin, bi kar tînin. Tevgerên civakî yên ji bo li dinyayê vegerandina mirovahîyê, li herderî çalak dibin. Gelo doza mirovparêzîyê, eger em ê bi vî hawî biaxivin, ji mêj ve pê nehat hesîn û nehat pejrandin jî?

Na, qet nebû. Yên ku pê bawer in, berfirehîya doza pêwîst tam nehesibandin.

Lewre ku, li vir mijar weke ya jîngehê ye: Ev dozên *şaristanî* aîdên siyasetê ne, lê jê mezintir in jî, ji ber ku bijarteyên exlaqî yên ji tercihên siyasî yên asayî kûrtir, dikin hedefa xwe. Meraqdarîya li ser rêçûyîna cinsê mirovî nayê maneya betalkirina dijberîya çep û rastê, lê belê pêdivîya dijberîyeke weha ya li ser wateya xweser a siberoja medenîyeta me îfade dike, lewre ku ev peyvên *rast* û *çep* ên pir zêde ji qîmê daketî êdî têrî vî tiştî nakin. Em dixwazin bibin mirovahîyeke çawa? Pirsa cidî ya li bingeha doza mirovparêz ev e. Vê pirsê jî, xebata ramyarî û însîyatîfa ji bo wê hewce hîna bi xwe re neaniye.

Bi qasî doza jîngehê acîl be jî, doza mirov heta niha bi têra xwe nehat pejrandin, nehat fikirîn, heta nehat bi nav kirin jî. Ev rewşeke dramatîk e. Jirêderketina şaristanîyê ya pir xeternak a ku, di serî de, dikeve ber çavan, malûmilkkirina giştî ya mirov e

Weke nimûne, li derveyî wextên felaketê, êdî ne mumkun e hilberîna mal û xizmetan bêyî bi tatêl û fikara girantir a *hilberîna kesan* re bê têkîldar kirin, ev rewşeke acil e ku *fikirîna* mirovnasîyê li ser me ferz dike. Weke jîngehnasî, divê mirovnasî zanîneke rastîn bibe ya ku rê li ber kirineke adîl jî veke. Di vî warî de em hê jî pir dûrî zanîna xwestî ne û ji serî ve ev têgiha efsûnger li ber me disekine: "Mirov". Peyveke xwerû ji bo rastîyên ewqas ji hev cuda: Cinsê bîyolojîk *Homo sapiens*, *cinsê mirovî* yê bi dîrokê re pêşketî, *civata* civakî, *ferdê* takekesî û bi ser de, mirovê *mê* herweke mirovê *nêr* -hemû ev tişt di "mirov" de tevlihev? Gelo warekî din ê zanyarîyê heye ku têgiheke weha prîmîtîv qebûl bike? Dîsa jî, ev tevlihevparêzîya gotinan parastî dibe, lewre ku ji alîyê hema bêje herkesî ve tê bi kar anîn, heta nivîskarên timî vegotî yên weke **Nietzsche** an **Heidegger**. Gelo tesaduf e? Gelo tesaduf e ku ramyarê yekane yê hevdem ku, bi tundrewî, ev abstraktbûyîna xirabe ya "mirov" xist ber lêpirsînê, **Marks** e.

Bi qasî doza jîngehê acîl be jî, doza mirov heta niha bi têra xwe nehat pejrandin, nehat fikirîn, heta nehat bi nav kirin jî. Ev rewşeke dramatîk e. Xebateke esas weha xwe li ser kesên eleqedar ferz dike: Divê, qet nebe, kurtasîyeke mijarên sereke yên dikarin tevin bidin fikireke mirovahîya di bin metirsîyê de bê pêşkêş kirin. Xetên li jêr têkildarên hewldaneke weha ne, ya ku, sê sal berîya niha, di dawîya kitêbeke qalind de weşiyabûn.

Jirêderketina şaristanîyê ya pir xeternak a ku, di serî de, dikeve ber çavan, *malûmilkkirina giştî ya mirov* e. Kapîtalîzmê, serdestîya tevahî ya malûmilkê bi cih anî, lewre ku ew firotina karên bêyî ku karker meaş bistînin, bingeha qezencên ferdî ye, hêsan dike. Ew hêza mirov a xebatê dike milkek û weha ferdan dixe şûna tiştan û tiştan dixe şûna ferdan: Sultanê mezin ê kapîtalê xwedêgiravî *"kar dide hêza xebatê",* lê belê, di rastîyê de, meaşdar neçar dimîne karê belaş bide kapîtalîstan... Jixwe, tiştê nû û xiraker ev e ku êdî tiştekî mirovane jî ji dîktaya fînansê nafilite: Divê hertişt bibe cihê qezencên duhejmarî, ji parçeyên jihevkirî heta nivînê nexweşxaneyê, ji ticareta li ser Înteretê heta alîkarîya dersên xwendekaran, ji nûkerîya dermanxaneyî heta pevguhastina sporvanên navdar... Ev tê maneya birêveberîyeke şirketan a xedar: Gemarîya şertên xebatê bi qasî gemarîya avê dramatîk dibe. Ev herweha tê maneya fînansekirina giştî ya çalakîyên xizmetê yên ferdan perwerde dikin û pêş de dixin -tenduristî, spor, perwerdekarî, lêkolîn, afirandin, kêf, agahî, ragihandin... Rabûna van xizmetan, rêçûna ber bi dinyayeke ku tê de dewlemendî eşkere şûna mirovî, dîyar dike. Kapîtalîzm bi lezgînî vê riyê taqîb dike da ku mantiqên xwe tê de bike serdest. Ji ber vê yekê, qanûna pereyî armancên xweser ên van aktîvîteyan dide ji bîr kirin. Reklam weha amûra çand û destbiratîyê bi navê televîzyonê dike amûreke firotina *"wextê mêjîyê mirov ê berdest "* ji xwedîyên reklaman re. Perwerdeya ferdan jî di bin destê rêjeya qezencê de ye: Gelo em ê vî sûcî qebûl bikin?

### Bêşaristanîkirina bêsînor

Ev helhela ticarî jî, meyleke bixwe kujer di xwe de vedihewîne: *Meyla bênirxkirina hemû nirxan*. **Kant** di warê exlaqî de weha biryar dabû: Nasîna şerefa mirov tê vê maneyê ku ew "bê fiyat" e; vegerandina hertiştî li nirxên diravî, bêşerefîyeke giştî çêdike. Ev di warê kognîtîv de, herweke li alîyên estetîk, hiqûqî û exlaqî rast e: Bê nirxên ku "bi xwe û bê hidûd" derbasdar in, mirovahîya medenî winda dibe. Lê em niha vê drama rojane dijîn: Meraqa rastîyê, ya edaletê, ya şerefê bênavber tê bin pê kirin... Dîktatorîya qezencdêrîyê ji bo kuştina bênirxîyê, bêberjewendîyê belaş sûîkastan çêdike. Em li ber sekûka trajîk a dinyayeke ku mirov tê de *bênirx* e, radiwestin. (2) Berbelavbûna kesên "bêyî" -bê kaxiz, bê kar, bê mal, bê siberoj...- tê maneya, bi gotina ***Aimé Césaire***, "sazkirina mirovên berdest". Li nik wan jî, kesên "bi nirxê zêrîn" xweş dixwin- meaşên nayên bawer kirin, paraşûtên zerîn, xavyar ji bo kuçikan...-, û ev ji xwe tê aynî maneyê: Hemû pîvanên nirxê ji holê radibin. Heta ku "nirxê" xwerû ya hemû nirxên din dinirxîne û weha dest nîşanî xwe dike, jixwe bê nirx e. Fînans timî di nepixîna hejmarên dîjîtal de ye, berîya ku bilqik biteqin û pere bi mîlyaran winda bibe -lê belê, ji bo hilberînerên sektora reel, rastî dijwar e. Gelo ev betalkirina nirxan ji heliyana bûza qutûban kêmtir ciddî ye? Em bi mirovahîya xwe dileyizin: Gelo haya me ji vê rewşa tirsnak heye?

Ev paşketina ha, yeke din a herî xirab bi xwe re dibe: *Windabûna bêçare ya maneyê*. Ev paşketineke nû ye, lewre ku ji bo demeke dirêj, kapîtalîzm bi mane bû; tevî kedxwarîya xwe, wê mirovahî bi pêş xist. Lê belê, hilketina fînansê -şiklê dewlemendîya herî jimirovahîbûyî- li tepeyên herî bilind, em xistine dewreya bêmanetîya teva: Komkirina maliyeyê her diçe zêdetir bê dawî û bê armanc dibe. Em şahîdên tekçûna dîrokî ya sinifekê ne ku niha bêyî tu armanceke medenî, kedê dixwe û weha dixwaze me bi vê "dawîya dîrokê" mehkûm bike.

Kurtbînîya hovane ya vegera envestîsmanê, ku tu projeya mirovî di xwe de nahêle, vê mirina maneyê li herderî belav dike. Lewre jî, globalîzebûyîna bi riya fînansê, serkeftina gevzok a "nedinyayekê" ye, ku absûrd û hogirê wê, fanatîzma dînî, tê de hertiştî dagîr dike. Ev korbûna strukturî niha jî xira dibe, dema ku cinsê mirovî digihîje hêzên heybet û di bin xetereke mirinbar de, divê haydarîya siberojê li cem me çêbibe. Li derveyî tu kontrola kolektîv, di vê kêmanîya demokrasîya rasteqîn a ji ber tamferdîtîyê çêbûyî de, afirandinên me yên maddî û manewî dibin wek hêzên kor ên me teslîm digirin û bin pê dikin -bêhişîya bêçare ku çi ***G8*** nikare asteng bike. Ji ber vê yekê, hestyarîya mirovahîyeke bê serî ya dike li dîwarê xwe çêdibe- dîwarê hem jîngehî û *hem jî mirovî*. Lê belê, eger cinsê mirovî *ji cins bibe*, qedera *Homo sapiens* bixwe di bin xetereke giran de ye. Em li ser berjêra halê xirabtirîn bi lez dibin - gelo dengê vê qerînê tê we?

Malûmilkkirina mirov, bênirxkirina nirxan, windabûna maneyê -divê em wêrek bin û bibêjin ku *jimedenîyetbûneke bêçare* çêdibe. Ev nayê maneya pesindayîna du sedsalên bihurî yên tijî rezaletên civakî û jenosîdî. Lê belê, bi serkeftina teva ya "şirîkîya serbest" li dawîya sedsalê, hikumdarîya heta hetayê ya demokrasîyeke aram li me dabûn pêş dîtin. Berevajîya vê, em ber bi belavbûna dîkatorî û şidetê ve diçin û cureyekî herî xirab a şidetê jî, şideta nerm. Şerên xwînrêj ên berbelav -paqijkirina nijadî, talankirina çekdar a welatên feqîr, jîrîya kujer a terorîzmê, resmîkirina îşkenceyê, hovîtîya fetisîner a nûçeyên cînayetê, hertiştê ku fîlozofekî wek "barbarîya nedinyaya globalîzebûyî" bi nav kir. (3) Bêhtirî wê, şidetên paqij jî -reqabeta heta mirinê ya fîrmayan, pêla jikaravêtinên borsayî, çavdêrîya pêşketî ya şirket û bajaran-, şidetên nîşanî jî di nav de- ta'deyên wijdanî yên rojane, lêzêdekirina hemû fobîyên kesê din, jiçandbûna welatî ya ji ber sînîzma serdest... Kêmkirina *haydarîya sinifî* heta nuxteya heyî, lêhaynebûna raxistina dinyayê û cihê wan a tê de ya hewqas jin û mêran, ev paşveketineke aqilî ye û encamên wê felaketî ne. Bila em tu caran ji bîr nekin ku nazîzmê *"ein Volk, ein Reich, ein Führer"* (4) - îdeolojîya "mirovê" bê sinif- kir şûna ramyarîya marksîst ya sinifan û weha koka xwe daye...

Li van çar xusûsiyetên girîng yekî din zêde dibe û dike metirsîyeke pênchejmar: *Qedexekirina pergalî ya alternatîvan*. Qedexekirineke ji qesdan: Sinifa qezencdar doh ji ber bayê şoreşê hejiya û çi ji destê wê tê dike da ku vê rîskê heta hetayê ji holê rake -hûn bi tenê li helwêsta medyayên wê ya li hember "çepa çepê" binihêrin bes e. Berî her tiştî, mantiqên pergalê bi xwe vê qedexeyîyê jixweber dikin. Ji bo Marksî, lewre ku girseya proleter li gel kapîtalê mezin dibû, kapîtalê jî yên ku dê dawîya wê bianîyana çêdikirin. Lê ev xweşbînîya dîrokî îro di bin gumaneke cidî de ye: Şoreşa hilberinê meaşdaran ji hev dike, qudsîbûna biryara fînansî wan bêçare dihêle, giranîya neguherbarîyê jî dilawerîya wan dişkîne: Meyla heybet a dixwaze hertiştî biguherîne, bê encam dimîne. Ev bêhêzî li herderî dubare dibe- derewên siyaseta sazûmanî weha tenê beşdarnebûna hilbijartinan bi xwe re tîne. Heytûhota qezencdêrîyê rê dide ku em xirabtirîn rewşê wek qedera xwe bibînin. Pergala ku dirûşma wê ya sereke bi xwe *azadî* ye, *TINA* ya **Margaret Thatcher** ji xwe re kir slogan: *" There is not alternative!"* Jixwe, gelo em ê *çawa* ji serdestîya bêdawî ya bazarên fînansî û dezgehên nirxandinê bifilitin, eger krîza muezzem a 2008ê pergal bi tu awayekî cidî neguherandibe? Îqlîma heyî ya dawîya Împaratorîya Romî, bes di serdema nukleer û Înternetê de, gelo wek felaketeke dawîn xuya nake?

www.arsivakurdi.org

Ev pirs wê li ba we peyda bibe: Ku metirsî hewqas cidî be, çima bi qasî metirsîya jîngehê li ser nayê rawestandin? Ez ê li vir bi tenê derbirîneke esas bînim ser zimên. Rawestandina li ser pirsa mirovparêzîyê tê maneya sûcdarkirina rasterast a ta'deya tevnî ya kapîtalîzmê li hember mirovan; bêguman ev berbe-lavbûna vê fikirê hêsan nake. Fikira jîngehparêz di çandeke cuda de dîyar dibe, ku berê wê ji awayê nemirovî yê hilberinê bêhtir, li awayên xirab ên danûstandinê, ji zilma rêjeya qezencdêrîyê bêhtir, li dagîrkerîya teknozanyarîyê, ji berjewendîyên sinifî bêhtir, li bêberpirsyarîyên civakî ye. Bi vî hawî, ew li şûna şoreşeke têkilîyên hilberinê dikare reformeke fezlî ya danûstandinê pêk bîne. Jîngehparêzîyeke weha sînorkirî ji bo borsayan ne xeter e. Heta ew dikarin pê re operasyonên siyasî û pevguherînên ticarî yên xweşik bimeşîne: "Fikira kesk" dibe fikireke cihanî... Lê belê, di rastîyê de, drama jîngehê bi qasî yê mirov, ji ber kurtbînîya kujer a qezencdêrîya maksîmûm çêdibe. Herdu doz jî *ji hev nayên kirin*: Jîngeh û cinsê mirovî dê xwerû bi hev ve bên rizgar kirin. Lewre, jîngehparêzîyeke ku êrişeke biryardar nabe ser pergala qezencê, bê siberoj e. Armanca pirsa nezelal a "jîngehparêzîyeke çepgir" jî ev e.

Ku em wesfê wê weha bidin, rewşa niha ya cinsê mirovî pir reş xuya dike. Gelo em tenê li alîyekî meseleyê nanihêrin? Gelo navê em li pêşfikirên objektîv û înîsyatîvên subjektîv ên ji bo derbaskirina muhtac a kapîtalîzmê jî mêze bikin? Bêguman. (5) Pir tişt weha bi me "qedereke xirabtirîn" didin xuyan; divê em wan nepejirînin. Em dikarin vê meylê berevajî bikin. Lê ji bo em bi serkevin, divê haya me ji giranîya vî karî hebe: Liserxwegirtina tevahîya doza mirovparêz û *înşakirina* wê biqasî doza jîngehparêz. Înîsyatîv wê pê re werin. Ji nerazîbûnên Ewropayê heta welatîyên amerîkî yên ku gazincên xwe li ***Wall Streetê*** diqîrin, barê *exlaqî* yê nerazîbûnên ku îro pêk tên dîyar e û dengê alîyê exlaqî yê dozên şaristanî vedide. Tevgereke kûr siyasetê dihejîne. Bi gotineke **Jaurès,** nerazîbûneke hindik mirov ji siyasetê dûr dixîne, nerazîbûneke pir wî lê vedigerîne. Wekî din, divê ev tevger çalakîyên nû bi xwe re bîne, ne şoreşeke kevnare ya ji bo guherînên ji jorê ve, ku têkçûna wan berbiçav e, lê belê dane destpêkirina *li hemû qatan* a bixwevegirtinên hevpar bi riya şiklên nûker ên înîsyatîv û rêxistinkirinê- dem dema îcadkirinê ye. Berdêla wê, em ê bikaribin qedera xirabtirîn têk bibin. Haydarîya rastbîntirîn a pêkaniyê û nêrîna bilindtirîn a pêwîstîyê bi hev re: îro, divê rizgarkirina cinsê mirovî dest pê bike.

Nameya Marks a ji Ruge re li gulana 1843ê, dawîyeke kamil pêk tîne ji bo nivîsê: *"Hûn dibînin ku ez dema niha pir bilind nanirxînim, lê tevî vê yekê ez jê bêhêvî nebûm, ji ber ku rewşa wê ya bêhevî jixwe min hêvîdar dike."*

* Fîlozof. Pirtûka wî ya dawîn, *Penser avec Marx aujourd'hui* - t2, *L'homme? [Îro li gel Marksî fikirîn* -cld. 2, *Mirov?*, La Dispute, Parîs, 2008.

1 *Bnr.* Marie Pezé, *Ils ne mouraient pas tous mais tous étaient frappés [Hemû nedimirin, lê li hemûyan dihat xistin]*, Pearson, 2008; Yves Clot, *Le Travail à cœur [Karê ji dil]*, La Découverte, 2010

2 Ev sînîzma nexuyanî ya dirûşma reklamî ya bi nav û deng: "Ji ber ku ez bi qasî nirxê wê me" - jinek *bi qasî nirxê* berhemeke marketîng e...

3 André Tosel, di *Civilisations, cultures, conflits [Şaristanî, çand, pevçûn]*, Kimé, 2011, r. 139 û tevahîya şapitreya 4ê a pir hêja

4 "Milletek, keyatîyek, rêberek". *Bnr.* analîza fikira Heidegger a di *"L'homme?" ["Mirov?"]*, r. 276-292

5 *Bnr.* Bi vê maneyê pirtûka Jean Sève, *Un futur présent, l'après-capitalisme [Siberojeke heyî, pişt-kapîtalîzmê]*, La Dispute, 2006

Wergera ji fransî: Simko Destan

Ji dema avabûna xwe ya di 2006an de, Twitter ji bo bikarhênerên înternetê li ser tevna înternet û telefonên destan derfeta berbelavkirina peyamên kurt pêşkêş dike. Ev xizmeta nû ya hêsan û belaş, êdî tesîrê li sed milyonan bikarhêneran dike. Gelo di demeke nêz de, li gorî coşa wergiran, ewê karibe bibe "nebza agahdarî ya gerstêrka me"?

### SED Û ÇIL NÎŞANEYÊN JI BO SERÛBINKIRINA AGAHÎYAN

# Twitter heta gêjbûnê

MONA CHOLLET

Panzdesalek piştî destpêkirin û belavbûna di navbera bi milyonan kesan de, taybetmendîya Înternet û çapemenîya ku ji ali bikarhênerên wî hatiye avakirin, gelo dikare ji çarçeweyên gelek analîzan derkeve? Ev şebeke gelek caran wek pirsgirêkeke basît yê di navbera alavên agahdarîyê yên ji berê ve hene, tê naskirin; lê belê lêkolîner **Domînîk Cardon**, li hember vê fikrê dertê, "raxistina li ser înternetê, modelên ku berê hazir û amade, yên çapemenîya klasîk bi awayekî tembelî û keslanî: bikaranînek kontrola edîtoryal, aborîyeke kêmpeyda û nêrîneke passîv a gel". (1)

Halbûkî karakterê înternetê bi taybetî bi bûyera ***Web 2.0*** û nermealavên wê bikaranîna wê gelek hêsan kiriye. Platformên blog an ji bikarhênerên internetê re, ku zanîneke wan a programasyonê tunebe jî, derî vekir, da ku karibin weşanên xwe çap bikin. Îro, ku hemû malper standardîze bûne, zengînîya wan ya afirandinê jî kêm bûye, ev jî xeyalên hinek serkêşên vî warî dişkîne. (2)

Pêşketina van şebeke û torên civakî, herwekî *Myspace* ku bêtir muzîsyen bikartînin, *Facebook* û *Twitter*ê ev mesele, ji alî berhemdêran anîn merheleyeke gelek bilindtir. Her çiqas uslûb û şêwazên wan wek hev bin jî, ***web sosyal*** *"gelek alîkarîya kesên ji kultura modeste dike, ev kes li gor nivîsa li ser blogê, bêtir bi hêsanî, kurtî û sivikî xwe ifade dikin"*. (3)

Evîna ji vî warî re nayê înkar kirin: lê belê sukse ya wê ji bo demek dirêj garantî nîne, yê herî nûava Google+, ku di dawîya meha hezîrana 2011ê de derket pîyasê, di nava mehekê de, ji bist û pênc milyonan zêdetir kesî xwe lê qeyd kirîye. ***Facebook***ê, ji bo hewqas kesan sê sal wext derbas kir û ***Twitter***ê 33 meh. (4) Demek bi şûn de, di destpêka meha tebaxê de, ***Twitter***ê qiymeta xwe derxist heyşt milyar dollaran, gelek kes behsa delavêreyên spekulatîf dikin, her weha modela aborî ya vê malperê (sayt) hîna jî hinekî seqet e.

## Agahî, galegal û şîrove

Twitter, di vî warî de, ji bo bidestxistina mafên Webê, nermayetîyeke pir bilind şanî dide. şîrket, di vî warî de bi xwe gelek bawer e û înîsîyatîf û pêwîstîyên bikarhênerên înternetê, internetvanan dide ber çavan, qîmet dide wan û peyder pey wan qebûl dike. Pirsa ku di sala 2006ê de, di dema damezirandinê de, bi slogana: "Hûn aniha çi dikin?" li ser "interface" (qada temasê) a wî peyda bibû, ne ew bû ku agahdarîyên herî balkêş û herî zêde berhev bikin; ev tişt gelek caran ji alî bikarhênaran ve nedihat zanîn jî, ku gelek caran, ji bo her tiştên ku bi zor tên aqilê mirov, bi sed û çil karakterên t***weets*** ê bi kar dianîn. Bi vî awayî, karibûn kovarên xwe yên çapemenîyê avabikin, rojevê şirove bikin, tew bi şêweyeke yekser, ji hev pirsa bipirsin, anonsên civînan û çalakîyan ji hev re bişînin, bi hev re henek û yarîyan bikin, wêne û vîdeoyan bi hevre par bikin, herweha hemû babet anonsên biçûk ji hevre bişînin... şîrketê ev çalakî hemû dan ber çavan û di vebûna çirîya paşîn a 2009ê de sloganek din tespît kir, ew jî ev bû: *"xeber çi ne?", "nûçeyên nû çi ne?"* sloganek hîn eşkeretir.

Bikarhêner gelek fêrî vî tiştî bibûn û jê hezkiribûn, tiştên ku kêfa wan jê re dihat û bala wan dikişand, hema li ku derê peyva ***tweet***ê yanî "wît-wît" dibihîstin, derhal bi bersîva "RT" ("retweet"), yanî "***cardin wî-wît***" bersiva xwendevanên xwe didan û mesaja xwe ji wan re diweşandin. Di sala 2010ê de, vê carê bikaranîn ket nava servîsê û bi bişkokeke ***"retweet"***ê di sîstemê de cîhê xwe girt.

Ji ber ku nuha hinekî zahmet e ku mirov vê aktora girîng a ku di nav Înterneta îroyîn de beşdar e, karibe klasîfîye bike. Gelo îro, mirov dikare bêje ku *Tweeter* jî wek *Facebook*ê, karê "tora civakî" dike û destûrê dide ku di nav hevalan de dan û standin pêk bê ? An jî, wek ajanseke çapemenîyê ku hemû kes dikarin hem weşanên xwe bişînin û hem jî wergirin? Damezrênerên wê tu carî fam nekirin li ser kîjan nigî dans bikin. Di sala 2010ê de, serok û direktorê giştî û hevdamezrênerê wî, **M. Evan Williams**, vê torê wek "tora agahdarîyê" (5) dide nasîn; salek bi şûn de, hinek fonksîyonên nûjen peyda dibin ku îmkanan didin da ku hêsantir "hevalên xwe peyda bikin".

Hedefên ku Twitterê dane ber xwe, di yekdemê de, bi şîrketên din re reqabetê dike û berberîyê dikişîne, ji alîyê din ve jî alîkarîya kesên ku nû qeydên xwe çêkirine dike, da ku bi hêsanî karibin marka û şopên xwe peyda bikin. Ev înîsîyatîf ji alî hinek kesan ve qebû nedît. Her wekî: "*Hevalên xwe li ser Twitterê peyda bikin",* bersiva gelek kesan bû *: "na spas!",* hinek kesan jî protesto kir û herwekî : "*hevalên min amade nînin ku meraqa minî zêde (obsession) ya ji bo **Katy Perry** (şantoza popê ya amerîkî) fam bikin."* (6) Li ser Twitterê, bikarhênerên internetê hîn bêtir li ser mijarên ku wan eleqedar dike disekinin, meseleya dîtina heval û hogiran kêmtir bala wan dikşîne, her çiqas kesên ku mesajê dişînin nasbikin jî, ev tişt nayê guhertin, li vir helwest cûda ye.

Wekî din jî li vir her tişt eşkere ye: tiştên ku tên şandin *(wît-wît),* kî tê taqîb kirin, kî te taqîb dike, hemû eşkere ye, Halbûkî li ser Facebookê, ketina ser torê bi sînor e û ev sînor qayde ye. Kesên Twîtterê kêm caran fonksîyona *"parastina wît-wît"*ê bi kar tînin. Armanca Twitterê ew e ku ; mesaj bi awayekî herî berfireh belav bibe. Stûna bi navê "tendances" nûjenî, şanî dide kîjan mijar hîn bêtir li ber çavan e û di rojevê de ye, ev bûyer çi li cîhanê be, çi li welatekî û herweha li bajarekî be jî ferq nake. Divê bê zanîn ku ev alav di warê teng de bêtir bi qudret e, li cîhekî ku her kes hingivê xwe bi xwe çêdike û tahma wî bixwe hildibijêre, yanî hesabê xwe bi xwe vedike. Ev çiqas cidî an jî necidî be, çiqas gelemperî an jî gelektaybetî be, esabek dikare bi navê şexsekî an jî şîrketekê bê vekirin, herweha bi navê komel û grûbek mîlîtan û bi navê medîa yê…Divê bê zanîn ku ji sedî çilê bikarhêneran hîç tiştekî naweşînin: ji sedî heştê zêdetirê weşan, ji alîyê ji sedî bîstê endaman tên avakirin. (7)

Wêneyên gerekê anjî yê kêfxweşîyekê cihê xwe hêsantir li ser Facebookê peyda dikin. Lê belê Twitter, ku tu carî ne makîneyeke nivîsê ya dîjîtal, sar û bê teraf e, Twitter, têkilîyên nû bi agahdarîyê ve ava kiriîye û gelek têkilîyên cûre cûre bi çavkanîyên cûda dirûst kirîye. Berê tenê di warê şexsî de, yan jî di derdora nas û dostan de, yan jî yên rojnamevan û editorîyal de, meraqa ji bo aktualîteyê hate merheleyeke bilindtir û gelêrî. Twittosphere agahdarîyên nedîtî, axaftin û şirovekirin û analîzn dike, çalakîyên ku berê bi temamî cûda bûn, ev jî gelek caran li gel şirketên din ku xwedîyên vê sîstemê nînin hesûdîyan peyda dike. **Cardon** vê fikrê rast nabîne: *"ger qebûlkirina subjektîvîzmê, ji destberdana şêweyên rastîyên qebûlkirî, lîstikên bi agahdarîyê, nukte û ferqiyeta bi heya, fesadî û provakasyon û hwd, dest pê dikin dibin merkeza navbenda têkilîyên agahdarîyê, di wê gavê de hînbûna rastîyê û fêrbûna bûyerên nûjen jî tê xwestin û ev xwestin her zêde dibe."* (8)

Derew û fesadî zû eşkere dibin: xebat û lêkolînên ku berê tenê karên rojnamevanan bûn, îro ev kar li ser milên internetvanan e, bi şêweyeke bêhempa bi cîh dibe. Herwekî di meha tebaxa 2011ê de çend hefte piştî ku bûyera blog ***"A Gay Girl in Damascus "*** *(Lezbîyenek li şamê)* diyar bû ku derew e, xwendekarek îngilîz li ser Twîtterê bloghênereke din ya Ereb ya sexte dîyarkir, ji ber ku xwendekar ferqkiribû ku nivîsên keçikê hevûdin nedigirtin û hevdû temam nedikirin vê yekê bala wî kişandibû. (9)

Gelik caran Twitter bi sifeta "kêra swîsreyî" tê naskirin, ew navûdengîya xwe ji ber cûdatîya bikarhênerên ku wan di nava kodên civakî de yên gelek xurt bi heval dike distîne. Wek hemû torên civakî, di çarçeveya homojenîyê de, tîpên ku dikarin bi salên ronahîyê ji hevdû dûr xwe tê de bibînin. Hemû ji yek rûberî ne, zimanekî bi kar tînin, jiyaneke civakî ya vîrtuel (sanal) dijîn. Ji vir Esperantoyeke dîjîtal dertê holê ku aktorên wî jî xwepêşanderên Ereb in, yên zivistana 2011ê, yan jî isyankarên îspanyol, ku hemû şîarên wan li ser pankartên wan ji hevbûn, herweha sembol û îşaretên dilxwazên wan hevdû temam dikin. Lê ferqa mezin ku hinek endaman ji yên din cûda dike, dikare bîranînên xweş bîne bîra xwe: meha sibatê li Bahreynê, terafgirên demokrasîyê ku li hember zor û zordestîya hukûmetê li ser xwepêşanderan, îsyan kirin û li ser *Twitter*ê rexne û protestoyên xwe li hember prensesên malbata desthilatdar dîyarkirin, lê li hember vê bersîvên nedîtî yên gelek çors û bitir girtin: *"Musaade bikin ku kesên elît vî karî di nav xwe de biaxifin, dev ji hesûdî û zikreşîyên bi dizî yên li hember me berdin. Ger jîyana we di nav gû de be! ne sûcê me ye! Perên we tune, ne wisa? Me fêm kir bê pereno!!! Jîyana xweş ya kesên wek me, we kezebreşî dike? Hihh!!!"* (10)

Bikaranîna hêsane ya alav û aletan bû sebebê meşhûrbûna wan, bi vî şêweyî cîh li Ajansên Seyehetan û ekîbên televîzyonan teng kirin. Tweetek di formata SMSekê de ye? Gelek bikarhêner dikarin bi telefonên destan xwe bi torê ve grêdin, ku carekê nûçeya girîng der çû, bi awayekî bê sînor li hemû deran belav dibe. Rojnamevanekî ***Le Figaro***yê, li gel hevkarên xwe, di dema bûyera teqandina bajarê ***Bombay***ê de, ya meha 11an a sala 2008ê (11), weha digot *"Bi ya min, bi qasî ku dizanim tu tiştek li ruyê dinyayê bi qasî Twitterê bi lez û bez tune"*

Xwedî agahdarîya kolektif, "twittsfer"ê dike navendeke herî bêbinî ya niqaşan. Mirov dikare ji afirandinên herî baş heta tiştên herî xirab ku ji alî milyonan tên weşandin li ser peyda bike. Germbûna navbera herdû alîyan, -diktatorîya hîsîyeta-, û -ji hîsîyeta dûrketîn- Lê wekî din jî: pêşketinên raman û vîzyonên bi perspektîf, analîzên rexnegir, ku bi her halê xwe ji medyaya klasîk cudatir e.

"Grîngîya zeman" ne tenê di taqîbkirina bûyeran de ye, lê belê di analîza kolektîf de ye, ev jî, herdem guhertinên nû taqîb dike. Ev guhertinên bê fitûr û biser de jî, xezeba Twitterê bi ser ve ke, îcar ji xwe re pirsê meraq bikin!!! Kapasîteya insanîyetê, ya fêmkirinê, ya balder û têkilbûna hîsîyetan tu carî hewqas nebibû mijara meraqê di dîrokê de. Mantiqa mediatik, bêtir bala xwe dide ser mijarên balkêş û cuda, mijarên wextê wan derbas bûbin û dubare bin wê hîç eleqe nakin. Kesên ku adara çûyî ji bo mudaxeleya Libyayê, tora civakî bernedida û ji ser ranedibû û mirov digot belkî jîyana pê ve girêdayî ye, îro, çend meh bi şûn de venagerin, lê mêze jî nakin. Tew îro hinek kes bi rehetî dikarin bêjin: *"ev nivîsar, ev gotar, her çendî rojek di ser re derbas bûye jî, dîsa jî heq dike ku mirov wê bixwîne."*

## Tirsa ji "negihîştina tiştekî"

Twitter dikare bi rehetî mirovan bi nûçeyên rojane ve girê bide, eynî weke pinpinîka bi cameke ronî ve bizeliqe û di demekê de bijî ku ne firehbûna wê û ne jî kûrbûna wê mabe. (12) Ev sayt, ku di arşîvên xwe de, zahmetîya mijarên tematik dikşînin, ji vêya ditirsin, "gelo ji tiştekî mam!!!" "li xwe binêrin, li me binêrin, em tev hîpnotîze bûne, ji ber çem û robarên bêjeyan, agahdarîyan, fikir û hisîyetan ku li ser ekranên me yên destdankî (tactile) derbas dibin". Ev e hewara rojnamevan **Jean –Christophe Feraud**. (13)

Mesele giş ew e ku mirov bizanibe, ji ava dijital vexwe bê ku tê de bifetise. Li hember vê şert û bûyera civakî, dilê mirov dibije kesên bîst sal berê ku gunehê xwe bi xwe dianîn û digotin ji alî êrîşa wahşî ya teknolojîya nûjen, têkçûne û di ber re çûne: ev dînîtî jî mesela faksê bû. Yanî bi faks an jî bê faks? Hemû pirs ew bû!!! (14)

1 Dominique Cardon, *La Démocratie Internet. Promesses et limites*, "La République des idées", (***Demokrasîya internetê. Soz û lîmît "Komara ramanan"*** ) Seuil, Paris, 2010

2 *Cf.* Philippe De Jonckheere, " Début ", Le Bloc-notes du Désordre, ***("Destpêk", Deftera bê rêk û pêkîyê)*** 26-06-2011, www.desordre.net

3 Dominique Cardon, *La Démocratie Internet,* (***Demokrasîya înternetê***) *op. cit.*

4 Google+ : bon démarrage, mais la route est encore longue", ***(Google+ : destpêkek baş, lê rê hîn dûr û dirêj e")*** 04-08-2011, www.generation-nt.com

5 Twitter ne veut plus être un réseau social, ***(Twitter naxwze êdi bibe toreke civakî)*** 17-03- 2010, www.infos-du-net.com

6 Twitter se met-il la pression?, (***Gelo Twitter, xwe dixe binê zextan ?)*** 19-07-2011, www.gizmodo.fr

7 Is Twitter a waste of time ?, ***(Gelo Twitter wendakirina zeman e?)*** 2 juin 2011, www.problogger.net. De même pour les autres chiffres cités

8 Jusqu'où va la démocratie sur Internet ? Interview de Dominique Cardon ***", (Demokrasî, heta kuderê dimeşe li ser internetê?"*** *Hevpeyvîn bi Dominique Cardon re.****)*** www.nonfiction.fr, 7 juillet 2011

9 Twitter investigation uncovers another Middle East Hoax, *(Twitterê* ***Rojhelata Navîn Hoax****eke din derdixe holê*) 02-08- 2011, http://thenextweb.com

10 *Cf.* " Bahrain Antoinette : Let Them Eat LOL :-) ***(Berde bira bixwin, LOL :-)",*** The Grumpy Owl, 18-02-2011

11 Laurent Supply, "Ma soirée Bombay, ou pourquoi Twitter est désormais indispensable", ***(şeva min ya Bombayê, yan jî çima ji nuha û pê de Twitter mecbûrî ye)*** Suivez le geek, 27-11- 2008, http://blog.lefigaro.fr

12 *Cf.* "Faire face à une civilisation qui vit dans le présent", 06-09-2010, www.internetactu.net, et Hartmut Rosa, *Accélération. Une critique sociale du temps*, traduit de l'allemand par Didier Renault, ***(Li hember medenîyeteke ku di dema îroyîn de dijî" û Hartmût Rosa, Lezbûn. Rexneyeke civakî ya wextê****, ji almanî ji alî Didier Renault ve hatiye wergerandin* ***)*** La Découverte, Paris, 2010

13 Frères humains, qu'est-ce que Twitter fait de nous?, Sur mon écran radar, ***(Brayên insan, Twitter dê me têxe çi halî?", li ser ekrana min ya radarî)*** 11-09-2010, http://monecranradar.blogspot.com

14 Maurice Ronai, " Faxer ou périr " ***(Faks şandin an mirin),*** *Le Monde diplomatique*, Gulan 1991

Wergera ji fransî: Vehbi Aydin

## Ber bi kapîtalîzma zimanî ve

# Qîmetê peyvan bi qasî yê zêrî bilind dibe

FRÉDÉRIC KAPLAN *

Dîroka ***Google***yê xwerû bi du algorîtman *(fermanên li ser Înternetê qeydkirî ku destûrê didin lêgerînên li ser Googleê bên bersiv dan)* tarîf dibe: Yekem algorîtma ku dikare li gor hin peyvan rûpelan bibîne ew navdar kiriye; û algorîtma duyem ku qîmetekî bazirganîyê dide van peyvan jî, ew zengîn kiriye. Ji van rêbazên hesabê yên navbihurî, **Lary Page** û **Sergey Brin** ya pêşî, dema ku li Stanfordê (Kalîfornîya) xwendekarên doktorayê bûn, saz kir. Ev jî tarîfeyeke nû ya guncawbûna malperên Înternetê li hember daxwazên bikarhêneran bû. Sala 1998ê, amûrên lêkolînê jixwe dikarî rûpelên peyvan/ên xwestî tê de rêz bikin, lê belê ew bi safî li gor hejmara rasthatinên ekspresyona lêkolayî dihatin rêz kirin. Înternet çiqas mezin dibû, encamên ji bikarhêneran re pêşkêşkirî jî hewqas tevlihev dibûn. Damezrînerên Googleyê guncawbûna her rûpelê li gor hejmara girêdanên hîpertekst ên destnîşanî wê rûpelê dikin, hesab kir -Prensîpeke îlhama xwe ji ya ku ji demeke dirêj ve qebûlkirna nivîsên akademîk misoger dikir, digirt. Vê pêşferaseta bingehîn rê da ***Google***yê ku di destpêka salên 2000ê de bibe derîyê herî mezin ê têketina ***tor***ê.

Li wê demê, piranîya çavdêran bawerîya xwe bi îmkana fîrmaya kalîfornî ya qazanca ji xizmetên xwe nedianî. Lê bi îcada algorîtmeke duyem, wê di nav fîrmayên herî dewlemend ên dinyayê de cih girt. Bi her lêkolîneke bikarhênerên Înternetê, **Google** çend girêdanên malperên şirketan ên bi reklamên kurtnivîskî ve kirî pêşkêş dike. Ev reklam, berîya encamên lêkolînê yên xweser tên pêşkêş kirin. Reklamdar dikarin reklama xwe bi ekspresîyon an peyvên kilît yên tercihkirî ve girêdin; mînak, lêkolînên bi peyva "*tatil*". Ew tenê dema ku înternetvan bi rastî li ser lînka malperê ya pêşkêşkirî ditikîne û dikeve malpera wan (şirketan), pare didin. da ku reklamên ligel peyveke lêgerînê wê li ser ekranê werin nîşan dan, hilbijêrin. Algorîtma ligel sîstemeke mezatê a bi sê qonaxan dixebite:

- Mezata li ser peyveke kilît. Şirketek ekspresîyon an peyvekê, weke "tatil ", hildibijêre û bihayê maksîmûm a ku ew dikare bide eger -înternetvan bi vî hawî digihîje malpera wê-, dîyar dike. Ji bo alîkarîya kiryarên peyvan, Google mîqdara mezata lazim ji bo şansekî baş a derketina li ser rûpela pêşî dîyar dike. Kiryar dikarin reklamên xwe bi tarîx an cihên taybet bi sînor bikin. Bes hay jê hebin: Wek em ê bibînin, mezata herî bilind şûna pêşî ya li ser rûpela Înternetê misoger nake.

- Hesabê rêjeya kalîteya reklamê. Google pîvaneke ji 1ê heta 10ê bi kar tîne û weha puanekê/ notekê dide her reklamê; li gor minasibîya nivîsa wê li hember daxwaza bikarhêner, li gor kalîteya rûpela pêşkêşkirî (balkêşîya naveroka wê û lezgînîya barkirinê) û hejmara naverast a tikandinên li ser reklamê. Ev puan/not bikêrhatîbûna reklamê dipîve û weha hem vegerên baş ji bo reklamdêr, hem jî qezencên mezin ji bo Googleyê misoger dike, lewre ku ew bi tenê dema ku înternetvan li ser girêdana pêşkêşkirî ditikînin, pere qezenc dike. Algorîtma taybet a vê puanê dide veşartî dimîne û Google dikare li gor dilê xwe wê biguherîne.

- Hesabê rêzê. Rêza li ser ekranê xuyakirina reklaman bi formûleke sade tarîfe dibe: Rêz, mezatê caran puan/ not e. Reklameke nota wê baş e bi vî rengî dikare mezateke erzan telafî bike û derkeve pêş. Google weha şansên xwe yên ku bikarhêner li ser reklamên pêşnîyazkirî bitikînin, bilindtir dike.

Ev leyistika mezatan, ji bo her daxwaza her bikarhêner dîsa tê hesab kirin -yanî serê sanîyekê çend mîlyon caran! Di sêmehîya sêyem a 2011ê de, vê algorîtma duyem, mîqdara 9.72 mîlyar dolaran bi fîrmaya ***Mountain View***ê da qezenc kirin -hejmareke ku ji heman dema sala 2010ê % 33 bilindtir e. (1)

Bazara zimanî ya ku Googleyê weha saz kir, jixwe dinyayî û pirzimanî ye. Li ser vê, Bazara Peyvan a pê ve girêdayî, tevgerên semantîk ên dinyayî baş dest nîşan dike. Google jixwe aletên sade û leyistokane pêşkêşî mirov dike da ku li beşeke daneyên berhevkirî yên li ser qîmeta peyvan bikole. Em weha dibînin ku guherînên bazarê li gor derbasbûna demsalan *(peyvên "skî" û "kincên çîyayî" zivistanê, "bîkînî" û "krema dij tîrêjên tavê" havînê biqîmettir dibin)* şirove dibin. Bilindbûn û daketina qîmeta peyva "zêr" jî, rewşa malî ya cîhanê didin xuyan. Google jixwe ji bo peyvên cihê reqabeteke xurt ***("evîn", "seks", "belaş")*** pereyekî baş qezenc dike, her weke ji bo navdaran ***("Picasso", "Freud", "Îsa", "Xwedê")*** û di warên zimanî yên cihên spekûlasyoneke kêmtir de jî. Hertiştê ku navê wî heye, dikare bibe sedema mezatan.



SERPIL ODABAŞI: **Bênav**, 100 cm x 70, teknîka tevlihev li ser kaxizê

### Modela statîstîk û pirzimanî ya Googleê ji ferhenga salane ya akademîsyenan aktueltir e

Google zemîn bi dest xist ku kapîtalîzm zimên jî bixe xizmeta xwe, ku peyv bibin milk û ku modela bazirganîya bi spekulasyona zimanî pir kar tîne, biafrîne. Tevahîya proje û nûkirinên wê yên teknolojîk ên din -birêvebirina peyamên elektronîk ên bi mîlyonan bikarhêneran, an jî dîjîtalkirina tevahîya pirtûkên li dinyayê weşandî- dikarin li gor vê nihêrînê bên analîz kirin. Tirsa aktorên kapîtalîzma zimanî çi ye? Ku ziman ji destê wan biçe? Ku bişkê û rastnivîsa wê xirab bibe, ku hesabkirina peyvan nemumkun bibe.

Dema **Google** yekser peyveke xelet nivîsandî serrast dike, ew xwerû xizmetê nade wê: Pirî caran, ew ji materyaleke bê qîmet (peyveke xelet nivîsandî), serêkanîyeke aborî ya tavilê qezencdêr derdixe. Dema Google destpêka hevokeke di malika lêkolînê de nivîsandî temam dike, ew ne tenê wextê bi wê dide qezenc kirin: Ew wê dibe nav zimanê ku ew pê peran qezenc dike, ew wê dibe ser şopên riya statîstîkên înternetvanên din jê derbas bûn. Teknolojîyên kapîtalîzma zimanî weha dibin sedema dûzbûyîna zimên. Em ê çiqas protezên zimanî bi kar bînin û bihêlin ku algorîtm bêjeyên me serast û temam bikin, ev dûzbûn jî dê hewqas biserkeve.

Ev ne teorîya komployê ye: Google bi qestî zimên naguherîne. Dûzbûna behskirî, tenê encameke mantiqa modela wê ya ticarî ye. Ji bo mirov di cîhana kapîtalîzma zimanî de serkevtî be, divê ji zimannasên roja îro baştir kartografîya zimên bike. Di vî warî de jî, Google xwedî stratejîyeke nûker e û ligel bikarhênerên xwe nêzîkbûneke zimanî ya bê emsal bi pêş de xist. Em her roj bêhtir bi riya înterfaseke Googleyê xwe îfade dikin; ne tenê kengî em li tiştekî dikolin, lê herweha dema ku em bi ***Gmail***ê peyameke elektronîk, an jî bi ***Google Docs***ê nivîsekê dinivîsin, dema ku em li ser **Google+** agahîyekê dest nîşan dikin û heta bi devkî jî, li gel înterfasên naskirina dengî yên Googleê têdixe bikarhatîyên xwe telefonên destan jî. Her roj, bi mîlyonan kes bi riya Googleyê dinivîsin û diaxivin. Ji ber vê yekê, modela wê ya statîstîk û pirzimanî, ku ew hewlê dide hemû daxwazan ber bi wê ve vegerîne, tim hûrgilîtir dibe û ji ferhenga salane ya akademîsyenên me aktueltir e. **Google** deqîqe bi deqîqe tevgerên zimên dişopîne ji ber ku wê herî pêşî tê de maddeyeke pir dewlemend dîtiye û awayên xebitandina wê jî îcad kirine.

Kefşkirina vî zemîna kapîtalîzmê yê heta niha nenas bû, erdekî nû ji şerê aborî re vedike. **Google** bi rastî pir bi pêş ket, lê belê reqîbên ku di qeydên wê reqabeta nû gihîştin wê rojekê jî derkevin holê. Ev qeyd jixwe pir sade ne: Em ji aborîya balkişandinê derketin û dikevin nav aborîya îfadeyê. Armanc êdî vegirtina awiran nîne, lê medyakirina şor û nivîsê ye. Yên ku wê bikaribin li gel hejmareke mezin a bikarhêneran, têkilîyên zimanî yên taybet û mayînde deynin, da ku zimên şikil bikin û bitewînin, bazareke zimanî ya di bin çavan de biafirînin û spekûlasyona peyvan bi rêk xînin, wê qezenc bikin. Bikaranîna zimên bûye armanca çavbirçîtîyan. Guman nîne ku ziman jî wê, di demeke kin de, ji ber vê yekê bê guhertin.

* Lêkolînerê li Dibistana Polîteknîk a Federal a Lozanê, nivîsînerê *La métamorphose des objets [Metamorfoza objeyan]*, FYP Editions, Lîmoj, 2009, û *L'Homme, l'Animal et la Machine [Mirov, Heywan û Makîne]*, CNRS Editions, Parîs, 2011 (li gel Georges Chapouthier).

1 "Google Q3 2011: $9.72 Billion In Revenue, $2.73 Billion In Net Income " ["Google Q3 2011: $9.72 mîlyarên hatinê, $2.73 mîlyarên qezenca safî "], www. techcrunch.com 13 cotmeh 2011

Wergera ji fransî: Simko Destan

## Wênesaza vê hejmarê

### Serpil Odabaşi



Di sala 1975ê de li Amedê ji dayîk bû. Dibistana seretayî û navîn li Amedê xwend.

Di sala 1995ê de li Zaningeha Gazî dest bi perwerdeya beşa wêneyê kir. Di dema cûntaya 12ê îlonê de malbata **Odabaşi** bi dijwarîyan re rûbirû ma. Di wê pêvajoyê de **Odabaşi** di karên cûrbecûr de xebitî û perwerdeya xwe domand. Hunermend **Odabaşi** li dijî binpêkirina mafên mirovan wek çalakvanê mafên mirovan kar kir û 3 sal di *Weqfa Mafê Mirovan* de xebitî. Hunermend li gel helwêsta xwe ya dijberîya şer, desthilatî û zayendparêzîyê bi mîzahê re jî têkildar bû. Nêrîna hunermendê, ya îronîk tesîr li ser wêneyên wê jî kirin.

Odabaşi, bi salan li Stenbolê wek mamosteya wênekarîyê xebitî. Yekemîn pêşangeha xwe ya şexsî sala 2001ê bi navê ***"Parçebûn"*** li Enqereyê vekir. Ev pêşangeha hunermend bi taybetî li ser mijarên wek ewleyîya şexsî, taqîbat û guhlêbûnê bû.

Paşê jî hunermend bi pêşangehên xwe yên li bajarê Atînayê bi navê "***Apoletên li kuçeyan"***, li Amedê ***"Maskeya berfê"*** li *Navenda Çanda Alman a Îzmîrê* ***"Qet(i)la wî/wê mubah e"*** û li Enqereyê li navenda huner a hevdem ***"Tunebûna min ji bo hebûna te"*** xwest ku balê bikşîne ser mijarên wek cûdaxwazî, kuştinên nefretane û di jîyana rojane de faşîzm. Li gel berhemên bi mijarên mîlîtarîzm, cinsîyetparêzîya civakî, lînç, penaberî û homofobî berhemên wê yên portreyên şexsî jî hene. Wêneyen wê li şahîyên zaningehan û mihrecanan de jî hatin pêşkêş kirin. Odabaşi, ji bo piştgirîya zarokên mexdûrên qanûna li diji terorê (TMK) jî li Amed, Wan û Çolemergê jî pêşangeh vekir.

Hunermend li gel xebata xwe ya wênesazîyê bergên pirtûk û kovaran jî amade dike. Odabaşi endama ***"Yekitîya Hunermendên Çalakvan a Navnetewî"*** ye. Di hevpeyvîneke xwe de bi gotinên wek *"min xwest bi neynikekê bûyerên li Tirkîyeyê diqewimin nîşan bidim"* armanca xebatên xwe rave dike.

Di derheqê hunermend de ji bo agahdarîyên zede li navnîşana http://srpl.info/ binêrin.

www.arsivakurd.org

# ÇAND Û HUNER

## Temendirêjtirîn rojnameya kurdî ya kurdan 'Li wî alî Arasê axîneke ji kezebê'

# Riya Teze

Salihê Kevirbirî

Di serdem û pêvajoyeke ku li Tirkîyeyê nîqaşa weşana bi kurdî tê kirin de, li 'wî alî Arasê', bi zimanê kurdî/kurmancî ev 81 sal in ku rojnameyek weşana xwe dike: ***Riya Teze***.

Rojnameya ***Riya Teze*** ku li Erîwana Ermenistanê weşanê dike, ji sala 1955ê heta destpêka sala 2001ê bi tîpên kîrîlî dihat weşandin, lê ev 10-11 sal in ku weşan careke din veguhestiye ser tîpên latînî. Jixwe ji avakirinê heta 1937ê rojname bi tîpên latînî dihate weşandin. ***Riya Teze*** rojnameyeke wisa ye ku em dikarin bibêjin, 'temendirêjtirîn rojnameya kurdan a li seranserê cîhanê ye. Temenekî wiha ku ji '***Hawar***'a **Celadet Bedirxan** jî kevintir.

Rojnameger û nivîskar Têmûrê Xelîl ku li gor bilêvkirina wî *'17 salan di redaksîyona rojnameyê de xebitiye'*, dîyar dike ku dema ***Hawar*** dest bi weşanê dike, çend hejmarên ***Riya Teze*** û hinek pirtûkên kurdî yên li Erîwanê çapbûyî ji wan re hatine şandin û kovarê di sala 1932yê de, di hejmara xwe ya 8ê de derbarê vê mijarê de bi nasnavê **Herekol Azîzan** nivîseke **Celadet Bedirxan** çap kiriye. Nivîsar bi vî awayî ye:

*"Rojnameke kurdmancî, bi herfên nû, bi kurdmancîyeke xwerû, li Rewanê, di şiklekî spehî û çeleng de derdikeve. Vê paşîyê çend hejmarên wê gehiştine destê me. Çavên me pê biruhn bûn, dilê me şa û geş bû. Kurdmancên Rewanê ji rojnamê pêve çend kitêb jî derêxistine. Me sê-çar roj mijûlahiya xwe bi wan kirin. Ji nav rûpelên wan ên taze û ter bêhna kulîlkên Çiyayê Elegezê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal û şapikê kurdmancî, xencer û piştxencera kal û kalikên me dihatin dîtin. Riya Teze wek navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e. Lê ji Hawarê kevintir, bi emr jê mezintir e. Hejmara wê ya paşîn ko gehiştiye destê me a pêncî û nehan e. Li gora ku Riya Teze rojnameyeke dehrojkî ye, berî salekê û hin dest bi derketinê kiriye".*

Di heman hejmarê de **Celadet Bedirxan** ji kitêbeke ji Erîwanê hatiye şandin, du helbest weşandine û piştre jî wiha gotiye: *"Ji bona îro me hevqas got, pêşdetir em dîsan ji Riya Teze behs bikin. Em ji hevalê xwe re riyeke xweş û dawiyeke geş hêvî dikin. Divêt ku her gav me hay ji hev hebit û gerek e ku em hevdu ser xebata hev serwext bikin."*

**Têmûrê Xelîl** her wiha dîyar dike ku ***Hawar***ê behs nekiriye bê kê ew hejmarên ***Riya Teze*** û kitêbên kurdî ji Erîwanê bo wan şandine û wiha berdewam dike: *"Lê em dizanin ku ew **Heciyê Cindî** yê nemir bixwe bûye û ji bo wê yekê dewletê ew girtiye, xistiye zindanê. Bi qasî salekê ew di zindana Stalîniyê da maye."*

Di sala 1929ê de **Erebê Şemo** û **Îsahak Marogulovê** Asûrî bi tîpên latînî dest bi xebata nivîsînê dikin. Di dibistan û gundên kurdan de perwerdehîya kurdî didin. Hinek cudahî di navbera alfabeya wan û ya **Celadet Bedirxan** de heye. Ji ber ku xwendin û nivîsandin wê demê di nav kurdan de kêm e, pêwîstî bi rojnameyekê heye. Salek paşê ango di 1ê Nîsana 1930ê de di bin banê dewletê de rojnameya ***Riya Teze*** li Erîwanê dest bi weşana xwe dike. Ji kurdan ji ber ku kesên serwerî bikin nîne, heta sala 1934ê rojname di bin rêveberîya ermenîyên bi navê Gevork Parîs, Hraçya Koçar û Harûtyûn Migirdiçyan de derdikeve ku fermalûyên Anatolî û Kurdistanê ne û baş bi kurdî dizanin. Piştî berpirsiyarîya her sê kesên ermen êdî ji sala 1934ê û wê de berpirsiyarî dikeve destên kurdan. Ji sala 1934ê heta 1937ê **Cêrdoyê Genco** berpirsiyarîya rojnameyê kiriye.

Di sala 1937ê de dema Stalîn e û şev û roj li kurdan herimîye! Bi navê kurdî tiştek nayê kirin. Her tişt tê qedexe kirin. ***Riya Teze*** jî nesîbê xwe ji vê yekê werdigire.

Heta 1955ê rewş wiha kambax e ji bo kurdên Ermenistanê. Di sala 1955ê de ligel Radyoya Kurdî û gelek sazî û dezgehan, Riya Teze dîsa ji xwendevanên xwe re dibêje 'Merheba'. Ji sala 1955ê heta 1989ê **Mîroyê Esed** berpirsiyarîyê dike. Piştre bi qasî sal û nîvekê **Tîtalê Efo** dibe berpirsiyar. Ji sala 1991ê heta 2006ê berpirsiyarîyê rojnameyê **Emerîkê Serdar** e. Di rastîya xwe de Serdar sala 1962yê dikeve nav xebata rojnameyê û bênavber 45 salan ked û emegeke mezin dide. Ev çend sal in ku wî ji ber qelsbûna bînahîya çavan karê rêveberîyê terikandiye û li mala xwe ya Erîwanê tevî keça xwe **Nûra**yê dijî.

Piştî Emerîkê Serdar, **Grîşayê Memê** dibe berpirsê rojnameyê, mixabin rêveberîya wî zêde najo, di dawîya sala 2010ê de rehma Xwedê dike.

Riya Teze di dema Yekîtîya Sovyetê de yekem rojnameya kurdî bû. Heta sala 1994ê di hefteyê de du caran derdiket. Lê niha ji ber sedemên aborî mehê carekê derdikeve. Rojname 4 rûpel e. Wan çaxan Riya Teze ne tenê li Ermenistanê her wisa li seranserê Sovyetistanê belav dibû. Diçû Ewropa, Amerîka û Kanadayê jî. 4000 heb çap dibûn û bi riya abonetîyê hemû jî belav dibûn.

Di navbera salên 2000-2004ê de 4 caran li kurdên me yên Ermenistanê qesidîm. Min bixwe çend caran serdana rojnameyê kir û ji wan serdanan gelek kêfxweş û sûdewar bûm. Wê demê di rojnamê de çar kesan kar dikir: **Emerîkê Serdar, Grîşayê Memê, Rizganê Cango û Mirazê Cemal**. Vê gavê di kunyeya rojnameyê de wekî kedkar ev nav hene: Tîtalê Keremê Seyad (Redaktorê Sereke), Rizganê Cango (Xwedîyê Rojnamê) û Mirazê Cemal (Cabdarê Hejmarê.)

Di serdana xwe ya dawîyê de, di odeya biçûk a rojnameyê de hîn bîbûm ku rojname piştî hilweşîna Sovyetê bi tenê li Ermenistanê tê belav kirin û tîraja wê jî daketiye 500ê. Emerîkê Serdar dîyar kiribû ku ew vê hejmarê jî bêheq li nav gundên kurdan belav dikin, nûçegihan ango li gor bilêvkirina kurdên Erîwanê miqaledarê 60 salî Mirazê Cemal yek bi yek li gundên kurdan digere û rojnameyê belav dike.

Heta hilweşîna Sovyetê, ***Riya Teze*** weşana *Partîya Komunîst* bû. Lewma jî wan salan rewşa rojnameyê baş bû. **Grîşayê Memê** dîyar kiribû ku wan salan ji 14 qatên avahîya ku ew tê de ne, hema bibêje tevahîya qatekê ango 11 ode ji bo wan hatibûn terxan kirin, lê niha ew di nav du odeyên biçûk de hewl didin ku bijîn! Emerîkê Serdar jî gotibû ku di dema Sovyetê de 25 xebatkarên wan ên kurd hebûne, lê niha mane 4 kes.

Ji destpêkê heta niha gelek navên mezin di nav xebata Riya Teze re derbas bûne:

Hecîyê Cindî, Qaçaxê Mirad, Şekroyê Xudo, Emerîkê Serdar, Xelîlê Çaçan, Babayê Keleş, Tîtal Mûradov, Elîyê Ebdilrehman, Egîdê Xudo, Hesenê Qeşeng, Mikayîlê Reşîd, Pirîskê Mihoyî, Porsora Sebrî, Tîtalê Efo, Karlênê Çaçanî, Şerefê Eşir, Egîdê Abasî, Paşayê Erfût, Letîfê Emer, Gayanê Hovhannîsyan, Tosinê Reşîd, Têmûrê Xelîl û gelekên din.

Temûrê Xelîl ku di dema amadekirina vê gotarê de li Erîwanê bû, tevî nameyekê du agahîyên hêja jî ji min re şandin. Bêyî ku dest didim hevokên wî, bi wê re parve dikim: *"1- Ez van dawîyan pê hesiyam ku hejmarên Riya Teze yên bi tîpên latînî, ku ji sala 1930 heta 1938ê derketine, 637 heb in. 2- Sala 1980yê, di roja 50 saliya ronahîdîtina hejmara xwe ya pêşin de, rojname ji aliyê Hikûmeta Sovyetistanê ve bi"Nîşana Hurmetê" hate xelat kirin."*

Şayanê gotinê ye ku di destpêka salên weşandina rojnameyê de, Dewleta Tirkiyeyê bi riyên dîplomatîk xwestiye kar û xebatên Riya Teze bêne berbend kirin û rûxandin. Ji gotareke Têmûrê Xelîl em pê dihesin ku xebatkarê dîplomasîyê yê Sovyetistanê li Erîwanê, Neymark di nameya xwe ya ku ji bo Wezareta Karên Derve ya Yekitîya Sovyetê re şandiye de (05.04.1935) wiha gotiye: *"Merciyên xwedî qerar yên Ermenistanê bi himet serokatiya rojnama "Riya Teze" dikin. Rojname wisa miqate û bi tahamûl e, mirov dikare mihakeme bike ku konsûlên tirkan yên vê derê, nikaribûn tu qulpan jê ra bibînin. Wek tê zanîn, hemû hejmarên wê ji teref tercûmanên tirkan gelekî bi himet tên tercûme kirin"* (Kovara Çira, hejmar 12, sal 1998, rûpel 11).

Di rûpela 12ê ya kovarê de tê gotin ku Neymark di nameyeke din de (09.05.1935) ku ji Serokê Qismê 1ê yê Wezareta Karên Derve ya Sovyetistanê re şandiye wiha nivîsiye: *"Li gor agahdariyên di destê min de, demek berê Aral û Yilmaz* -Aral û Yilmaz karbidestên dîplomatîk ên Tirkiyeyê bûn- *di derheqê pirsa kurdî da raporek bi dizî hazir kirine. Li gor înformasyonên di destê me da, muhtewa vê raporê ev e: Li Êrîwanê rojnama "Riya Teze" hebûna xwe berdewam dike. Hebûna wê li ser tixûbê Tirkiyê ji bo me tehdîd e û îşareta dijminatiyê ye..."*

Bila gotara me bi van peyvên berpirsiyarê nû yê rojnameyê Tîtalê Keremê Seyad bi dawî bê: *"Rojnameya me civakî û çandî ye. Di pêvajoya nû de gelek tişt hene ku em dixwazin bikin, lê her tişt bi derfetan ve girêdahî ye. Rojnameger divê di nav gel de bigere û derbarê wî de binivîse, qewimandinên girêdahîyê çand û hunera gel tê de biweşîne. Em deyndar in vî karî bimeşînin. Heyfa me li vê rojnameya kurdî ya jîyandirêj tê. Ev rojnameya gelê me ye ku di riyeke gelekî çetin û dirêj re derbas bûye."*

Hejmara yekem a Riya Teze



Prolеtarеd hemu dunjaje bь gьvin!
RJA ȚƏZƏ
Organ рeWra mьlete bcuk I komisariata mьrьtje Ermenistane u komitaahfbaje təzə kyrmançi
Şeşem 25 adare 1930 sale
№ 1
Əlifʙaje təzə I şərqe inglaʙəkə məzьnə
TƏBRIK


Hejmarek demên dawî ya Riya Teze


R'YA T'EZE
№ 5 (4860) GULAN (May) SALA 2011
Barzanî xelata Aştî û Çalakîya Diplomasîyê wergirt
R'OJA ZIMANÊ DAYKÊ Û BÎRANÎNA ŞEHÎDA LI GUNDÊ ELEGEZÊ

## Hin ji rêveber û nivîskarên Riya Teze


Babayê Keleş


Casimê Celîl


Egîtê Xudo


Elîyê Evdirehman


Emerîkê Serdar


Emînê Evdal



Eskerê Boyik


Grîşayê Memê



Karlanê Çaçan



Keremê Seyad


Mirazê Cemal


Mîroyê Esed



Qaçaxê Mirad


Rizganê Cango


Şekroyê Mihoyî


Têmûrê Xelîl


Tîtale Kerem


Tosinê Reşîd


Vanîkê Elîxan


Xelîlê Çaçan

# Helbestvanên dil, xew û xemrevk

JAN BADA

Helbestvanîya zimanê kurdî ji her alîyê ve gihîştiye asta bilind a cîhanê. Ji helbestên klasîk heta yên modern, ji post-modern heta piştî post-modernê jî, her awa nûnerîya helbestvanîyê li Kurdistanê heye. Sedema pêşketina helbestvanîya kurdî piştrastîya xwe ji dîroka çanda kurdî ya devkî digire; ji berê ve dengbêj, stranbêj û çîrokbêjan şevbêrkên civaka kurdî xemilandine û bûne kanîya afirandêrîya hestên berz û kûr.

Destpêka nivîskarîya kurdî bi helbestê ye. Helbest wek stran, wek destan hatiye honandin. Jixwe destpêka nivîskarîya cîhanê jî cudatir nîne, mirovan berî çîrok û çîrokbêjîyê, hestên xwe bi stran, destan û efsaneyan derbirîne. Hestên xwe kirine awaz li peyvan siwar kirine û di nav deşt û newalên xem û şadîyê de gerandine.

Zimanê kurdî di gelek qonaxên cuda de, bi stran û çîrokan, destan û metelokan xwe zindî hiştiye û bi devkî gihîştandine heta dema nivîsê, lê nivîs ji bo çand û zimanê kurdî hertim li paş vegotin û ravekirinê maye; yanî devkî li pêş bûye. Rewşa vegotina devkî ber bi nivîsê ve demeke dûredirêj ajotiyê heta ber bi sedsala 10ê ve. Eger em *Elî Herîrî û Baba Tahîrê Hemedanî* nejimêrin, helbestvanîya nivîskî piştî (ger *Mela Ehmedê Bateyî* 1417–1491 awarte bê pejirandin) sedsala 16ê dest pê kirîye. Du pêşengên vê demê hene ku di nav helbestvanîya kurdî de gelek payebilind in: *Melayê Cizîrî* (1570-1640) û *Feqîyê Teyran* (1590-1660). Helbest ji bo wan her du helbestvanên gewre dihat maneya huner û afirandinê, şanîdana hêz û bedewîya zimanê kurdî di asta berz de.

Piştî wan her du helbestvanan, helbest bi *Ehmedê Xanî* (1651-1707)re berê xwe dide zanyarîya neteweyî; hestên raman û zanyarîya xwenasînê, rêyên serfirazîya ji bin desthilatîya dijminîyê, nebûna desthilatîyeke kurdewarîyê, nebûna rêzdarîya pênûs û hilberîna hişmendîyê dibin mijara berhemên vî helbestvanê gewre yê sedsala 17ê.

Nêzîkî du sed sal demeke rawestî dest pê dike; hew berhemên nivîskî hene heta sedsala 19ê. Eger hebin jî kêm in û bi piranî negihîştine roja me. Di sedsala 19ê de ronesansa kurdî ya helbestvanîya zimanê kurdî dest pê dike û êdî hew radiweste û heta roja me berdewam e. Gelek helbestvanên gewre berhemên wê sedsalê ne, çend nav ji bo nimûne: *Nalî* (*Mela Xidirî Ehmedî Şaweysî Mîkayelî*, 1785-1855), *Mewlewî,* (*Evdilrehîmê Seîd* 1806-1882), *Hacî Qadirê Koyî* (1815-1897), *Mehwî* (*Mela Muhammed Mela Osman Belxî*, 1830-1906), *Pîremêrd* (*Tewfîq Mehmûd Hemze*, 1867-1950), *Şêx Rizayê Talebanî* (1835-1909), *Wefayî,* (1838-1912), *Qanî* (*Mihemed Kabulî*, 1898-1965), ûwd.

Sedsala 20ê bi heman awayî berhemdar e: *Evdila Goran* (1904-1962), *Cigerxwîn* (*Şêxmûs Hesen*, 1903-1984), *Osman Sebrî* (1905-1993), *Qedrî Can*(1911-1972), *Yûnis Dildar* (1917-1948), *Hejar* (*Ebdurehman Şerefkendî*, 1920-1990), *Hêmîn* (1921-1986), *Ehmed Herdî* (1922-2006), *Seydayê Tîrêj* (1923-2002) *Heciyê Cindî, Faîk Bêkes, Casimê Celîl ûwd.*

Û çend helbestvanên dema nû: *Şêrko Bêkes, Evdila Peşêw, Ehmed Huseynî, Eskerê Boyik, Zeynel Abîdîn, Jan Dost, Rojen Barnas, Ferhad Pîrbal, Rênas Jîyan, Seydayê Keleş, Selîm Biçûk, Sebrî Botanî, Kawa Nemir, Hêvî Berwarî, Xelîl Duhokî, Xelat Ehmed, Selwa Gulî, Nesrîn Fexrî, Goran Haco, Wezîrê Eşo, Jana Seyda, Kejal Ahmed, Huşeng Broka, Tengezarê Marînî, Xamevan* û gelekên din.

Di dema nû de gelek helbestvan hene û her diçe hejmara wan zêdetir dibe. Eger navên wan di nav vê nîvrûpelê de bi cî nebe, ew tê maneya dewlemendîya helbestvanîya zimanê kurdî.


Mirov dikare helbestvanîya kurdî ji gelek alîyan ve dabeş bike; ji alîyê qonax û serdemên dîrokê, ji alîyê naverok û şeweyên nivîsandinê, ji alîyê mijar û formê ûwd. Helbestên klasîk (dervayê hin destan û efsaneyan) bi piranî bi wezin hatine nivîsandin. Şêweyê ristesazîya wan wek mijar û naveroka wan gelek xurt e. Xwe bi pîvana kîte û erûzê girê dide. Xwedîyê çarîne û hejmaran e, riste bi heman û pircûre hejmaran lê lihevhatî tên bi kar anîn.

Li tenişta helbestên bi pîvan tên nivîsandin yên bê pîvan jî hene û her diçe bê pîvan xurtir dibe. Pir caran gava helbest bi pîvan be, wek klasîk tê bi nav kirin, lê her helbestên bi pîvan nabe klasîk. Klasîk hinek jî bi dem û serdemê ve girêdayî ye, qaîdeyên klasîk divê seranser û sedesed bên cî, wekî din nabin klasîk. Dema me serdema helbestvanîya serbest yanî bê pîvan e, lê her helbesta serbest jî nabe helbesta hevdem yan a nûjen.


Serdema em tê de dijîn dîsa jî, ji alîyê helbestvanîyê ve berhemdar e, şêweyên nû derdikevin û asta helbestvanîya kurdî ya nû li paş asta helbestvanîya cîhanê nîne. Ji alîyê helbestê ve berhemên kurdî dikarin bi serbilindî xwe bidin ber berhemên cîhanê û bi wan re, bi hev re di govenda çanda gelên din de carûbar serkêşîyê bikin.


## Jîyan bi kurdî xweş e!



Baba Tahirê Hemedanî



Cegerxwin


Dildar



Ehmedê Xanî


Evdila Peşêw



Feqiyê Teyran


Fêrîkê Ûsiv


Hecî Qadirê Koyî


Hecîyê Cindî


Hejar


Hêmin



Mele Mehmûdê Beyazîdî


Şerefxanê Bedlîsî


Melayê Cizîrî



Şerko Bêkes


Ehmed Huseynî


Mihemed Nûrî



Mîrza Xelîl


Fatma Savci


Nalî


Osman Sebrî


Pîremêrd



Qanî Mihemed Kabûlî



Qedrîcan


Jana Seyda


Şêx Rizayê Talebanî


Selwa Gulî


Seydayê Tîrêj


Evîn Şikakî


Wefayî

# NAVEROK

ÇIRÎYA PAŞÎN 2011



Baskîyek û kurdek
ZEKINE TÜRKERI
▶ R. 1

Rehîneyên şerê dijberîyeke xwîndar
BIRGIT CERHA
▶ R. 1

Çepîtî li ku ye?
SERGE HALIMI
▶ R. 1

Dîsa li ser 17ê çirîya pêşîn a 1961ê
DOMINIQUE VIDAL
▶ R. 2

JI ÇAPEMENÎYÊ
▶ R. 2

Hikûmeta tirk û gefên li ser kurdan
WENDY KRISTIANASEN
▶ R. 6

Çîn ji ber komira xwe nexweş e
ANY BOURIER
▶ R. 7

Împarator çawa têk diçin?
PHILIP S. GOLUB
▶ R. 8

Wall Street di armancê de
JEFF GOODWIN
▶ R. 9

Hindistan: Rewşenbîr, îdîaya maoîst û zordestî
NICOLAS JAOUL Û NAÏKÉ DESQUESNES
▶ R. 10

Kurdên ji dewletê bêparhiştî, nabe ku dersên dîrokê ji bîr bikin
KENDAL NEZAN
▶ R. 12

Rêyên Sosyalîzmê li Amerîkaya Latînî
WILLIAM I. ROBINSON
▶ R. 14

Çîroka etîketeke siyasî
LAURENT BONELLI
▶ R. 15

Sedsalek berê li Amerîkayê (DYA), nîqaşeke bingehîn
▶ R. 17

Rûyê mîlîtanîzma îtalî
FRANCESCA LANCINI
▶ R. 18

Neslê mirovan jî biparêzin, ne tenê xwezayê!
LUCIEN SÈVE
▶ R. 20

Twitter heta gêjbûnê
MONA CHOLLET
▶ R. 21

Qîmetê peyvan bi qasî yê zêrî bilind dibe
FRÉDÉRIC KAPLAN
▶ R. 22

ÇAND Û HUNER
▶ R. 23

## Forma Abonetiyê

Nav:
Name

Navnîşan:
Address

Koda Postayê: Postcode | Bajar: City

Telefon:

E-Mail:

**Abonetiya salane** (12 hejmar!)

☐ Almanya (50 €) ☐ Derveyî Almanyayê (60 €)

☐ Abonetiya dîjîtal (20 €)

**Independent Kurdish Media Group GmbH (IKMG)**
**Carnotstr. 4 - D-10587 Berlin**

Berliner Volksbank - Hesab/Account/Konto: 2284 1230 10 - BLZ: 100 900 00
IBAN: DE78 1009 0000 2284 1230 10 - BIC/SWIFT: BEVODEBB

www.arsivakurdi.org